hejmar 1 havîn 1987

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

NÛKIRINA KURMANCÎ

Kurmancî zarekî gelekî dewlemend e. Di hin warên jiyana rojane de, di peywendiyên bi xwezayê (tabîetê) re, peyvên wê ji yên zimanên mezin ên ewropayî kêmtir namînin. Mesela ji bo navên pez û dewaran, ji bo navên dengên tişt û heywanan de ew ji fransizî û îngilîzî jî zengîntir e. Ew berî rûsî û zimanên slav ên din bûye zimanekî edebî û hê di sedsalên XIV û XV de berhemên giranbiha dane.

Mixabin, ji bo sedemên siyasî, ji ber bindestketina gelê kurd û parvekirina welatê wî, rê li ber vê pêşveçûyina dîrokî hate bestîn, an asê kirin. Kurmancî wilo bê xweyî, li jêr êriş û gefên çandên biyanî kete sedsala XX an, ya nûjeniyê (moderniyê), ya rojname, radyo û televizyonê. Bi awayê ku civaknas dibêjin mirovahî di heftê salên dawîn de ji heft sed salên berê bêtir veguherînên civakî (sosyal) û çandî (kulturî) derbas kiriye. Çerxa dîrokê bereberê zûtir digere, bergehên mirovan frehtir dibin, nûyîtî li çar aliyên cihanê zûtir belav dibin, dinya hin bi bin "biçûktir" dibe. Di vê meşa han de qels, kulek, brîndar, naamade dikevin, û hin ji wan jî ji rûpelên dîrokê winda dibin.

Ji salên 1920î ve Kurdên Iraqê karîne bi kurmanciya xwarê ango bi "soranî" binivîsin, pirtûk, kovar û rojnameyan derînin. Zaroyên wan di xwendegahên despêkî û navîn de zimanê xwe yê dê dixwînin, di radyo ûtelevizyonan de bername û weşînekên "soranî" hene. Zimannasên kurd ên îraqê bi salan li ser pirsên rastnivîsîna "soranî" xebitîne, hê jî dixebitin. Lewre rewşa van ji ya kesên ku bi kurmancî dipeyivin (Kurdên Tirkiye, Sûrye, û yên bakura Kurdistana Îran û Iraqê, tevhîhev bêtirî 65% ê gelê kurd) pirr baştir e.

Xebatên ku di salên 1930-1940î de Kamran A. Bedirxan û Celadet Bedirxan pêk anîne ji bo rastnivîsîna kurmancî gaveke hêja ne. Lê pêşvebirin û kûrkirina vî karî ferz e, pirseke jindarî ye. Heke rojekê li perçeyeke Kurdistanê gelê kurd bigihê azadiya xwe, wê demê dê Akademiyeke ziman, bi riya imkan û gengaziyên dewletê (radyo-televizyon, rojname, xwendegah) li ser pirsên zimên biryaran bistîne û wan biryaran bide qebûl kirin. Lê ev roj dê kengî bê diyar nîne. Heye ku ta wê rojê, li jêr tesîra televizyon û xwendegahên tirkî û erebî birrekî mezin ê gelê kurd kurmanciya bav û kalên xwe ji bîr ke an jî tenê zimanekî jarketî, tevlihev bipeyve. Kurmancî jî bibe wekî zimanên îrlandî, welşî an brotonî, zimanekî "folklorî" ku tenê carna di govend û dîlanan de tê bi karanîn.

Welatparêzên xwedî berpisiyar, nemaze xwenda û ronakbîr, li ber sernivişt û qederê serî natewînin, wekî berxên sernerm li hêviya kêra qesab namînin. Parastina zimanê pêşiyên me bingehê evîna welêt e, rehê jindarî yê welatparêziyê ye. Lewra divê ku her Kurdê welatparêz li gora karîn û zanîna xwe beşdarî vî şerê parastin û nûkirina kurmancî bibe.

Ji bo nûkirin û dewlemendkirina kurmancî Enstîtu salê du caran, her carê hefteyek nivîskar, zimannas û rojnamevanên kurmanc ên ji hemû navçeyên Kurdistanê dicivîne. Ew di her civînekê de li ser peyvnasiya (terminolojiya) şaxeke ziman dixebitin. Civîna bihara 1987 li ser rastnivîsîna navên rojan, mehan, hejmaran û li ser navên coxrafî xebitî. Biryarên vê civînê di rûpelên vê rojnameyê de tên belav kirin. Ewê heya payizê Enstîtu xarîteyeke cihanê û yeka Kurdistanê bi kurmancî çap bike û bixe nav xelkê.

Di vê civînê de pisporên kurd ên ji navçeyên Agirî, Şapûr (Kurdistana Îranê), Akre û Kerkûk (Kurdistana Iraqê), Hekarî, Diyarbekir û Mêrdînê (Kurdistana Tirkiye), hebûn. Ev civîn ji 18 ta 24ê nîsanê li bajarê Barselonayê, paytexta Navçeya xweser (otonom) a Kataloniyayê li Spanyayê çêbû. Civîna payîzê jî her li wî bajarî bi arîkariya hikûmata xweser a katalanî çê dibe û ewê li ser peyvnasiya (terminolojiya) siyasî û îdarî be.

Her Kurdek dikare pirs û pêşneyarên xwe yên li ser rastnivîsîna ziman ji "Komisyona kurmancî" ya Enstîtuyê re binivîse. Em hêvîdar in ku her Kurdê ku pê diqede dê arîkariya vê xebata bingehî bike. Bila pirsa ziman bibe ya heryek ji me, ya me hemûyan, pirsek neteweyî. Tenê bi vî awayî emê bikaribin di nav salan de kurmanciya me ya şêrîn ji talûke û gemaroyê rizgar bikin.

KURMANCÎ

Encamên civîna Barselonayê

Nivlskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên ku ji 18 ta 24ê nîsanê li bajarê Barselonayê (paytexta Katalonyayê) li ser pirsên rastnivîsîna kurmancî xebitîn gihane encamên (netîceyên) ku em di rûpelên vê rojnameya taybetî de belav dikin. Ewê Enstîtu piştî her civîneke zimanî hejmareke vê rojnameya *Kurmancî* derîne.

RASTNIVÎSÎNA JIMARAN

0	Sifir (Nîn)	**16**	Şazdeh
1	Yek	**17**	Hevdeh
2	Du, dido	**18**	Hejdeh
3	Sê, sisê	**19**	Nozdeh
4	Çar	**20**	Bîst
5	Pênc	**21**	Bîst û yek
6	Şeş	**30**	Sî
7	Hef	**31**	Sî û yek
8	Heşt	**40**	Çil
9	Neh	**50**	Pêncî
10	Deh	**60**	Şêst
11	Yazdeh	**70**	Heftê
12	Dozdeh	**80**	Heştê
13	Sêzdeh	**90**	Nod
14	Çardeh	**100**	Sed
15	Panzdeh	**101**	Sed û yek

200 : Du sed; **1000**: Hezar;
1 000 000: Milyon; **1 000 000 000**: Milyar;
1 000 000 000 000 (1 000 milyar): Trîlyon

JIMARÊN RÊZÊ

1. Yeka	yekem	yekemîn
2. Didoyan	duyem	duyemîn
3. Sisêyan	sêyem	seyemîn
4. Çaran	çarem	çaremîn
5. Pêncan	pêncem	pêncemîn
6. Şeşan	şeşem	şeşemîn
7. Heftan	heftem	heftemîn
8. heştan	heştem	heştemîn
9. Nehan	nehem	nehemîn
10. Dehan	dehem	dehemîn
11. Yazdehan	yazdehem	yazdehemîn
20. Bîstan	bîstem	bîstemîn
30. Siyan	siyem	siyemîn
40. Çilan	çilem	çilemîn
50. Pênciyan	pênciyem	pênciyemîn
60. Şêstan	şêstem	şêstemîn
70. Heftêyan	heftêyem	heftêyemîn
80. Heştêyan	heştêyem	heştêyemîn
90. Nodan	nodem	nodemîn
100. Sedan	sedem	sedemîn

NAVÊN COXRAFÎ




AMERÎKA


Kanada	Otawa
Alaska	Xelîca Alaskayê
Dewletên Yakbûyî yên Amerikayê	Waşington (Washington)
Kuba	Havana
Haîtî	PortoPrens
San Domînîk	Santo Dominigo
PortoRîko	SanJuan
Antîlên Mezin	
Antîlên Biçûk	
Meksîka	Meksîko
Belîz	
Belmofan	
Guatemala	Guatemala
Salvador	San Salvador
Hondûras	Tegucigalpa
Nikaragua	Managua
Kosta Rîka	San Jose
Panama	Panama
Kolombya	Bogota
Venezuela	Karakas
Brazîl	Brazîlyla
Giyana	Corc Tawn-Amazon
Sûrînam	Paramarîbo
Giyena Fransayê	Kayen
Ekwador	Kîto
Perû	Lîma
Bolîvya	La Paz
Paraguway	Assunsiyon
Arjantîn	Buenos Aires
Ûrûguway	Montevîdeo
Şîlî	Snatiyago
Girava mezin a Agiristanê	
Tengava Macelan	
Malvînas (Falkland)	Stanley
Xelîca Sen Xorxê	
Xelîca Korkovado	
Girava Corciya Başûr	
Tengava Dêwan	
Antîlên Başûr	
Welatên Graham	

EWROPA

-Fînlanda	Helsinkî
-Swêd	Stokholm
-Norwej	Oslo
-Danmark	Kopenhag
-Îsland	Reykyawîk
-Gronland	
-Faroarna	
-Brîtanya Mezin	London
-Îngilîstan	
-Îrlanda Bakur	Belfast
-Skotland (Scotland)	Glasgow
-Wêls	
-Îrland	Dublin
-Polonya	Warşova
-Çekoslovakya	Prag
-Romanya	Bûxarest
-Macaristan	Budapest
-Bulgaristan	Sofya
-Yunanistan	Atîna

-Albanya	Tîrana
-Yûgoslavya	Belgrad
-Otriş	Viyen
-Lîxtinştayn	
-Îtalya	Roma
-Malta	Valleta
-Sardînya	Kyalerî
-Korsîka	Bastya
-Swîs	Cenev
-Fransa	Parîs
-Monako	Monte Karlo
-Spanya	Madrîd
-Andora	
-Portugal	Lîsbon
-Almanya	
-Rojhelat	Berlîna Rojhelat
-Almanya Rojava	Bon
-Luksembûrg	
-Beljika	Brukesl
-Hollanda	Amsterdam





ASYA


Afxanistan	Kabul
Pakistan	Îslamabad
Hind	Delhî
Srî Lanka	Kolombo
Bengladeş	Dakka
Bûrma	Rangûn
Tayland	Bangkok
Kamboçya	Phnom Pen
Laos	Viyang Şan
Viyetnam	Hanoy, Ho Şî Mîn
Maleziya	Kuala Lumpur
Sîngapûr	
Endoneziya	Cakarta, Bandûng
Gineya Nû	Port Moresbî
Awistralya	Sîdney (Sydney)
Zelanda Nû	Wellington
Kaledonya Nû	Nûmeya (Noumea)
Giravên Silêman	
Fijî	
Filîpin	Manîla
Taywan	Taypê
Hong Kong	Viktoriya (Victoria)
Çîn	Pekîn (Beyjing)
Nepal	Katmandû
Bûtan	
Moxolistan	Ûlan Batûr
Koreya Bakur	Piyongyang
Koreya Başûr	Seûl
Japon	Tokyo
Yekîtiya Sovyetî	Moskov

AFRÎKA

Misr	Qahîre
Lîbya	Trablûs
Tûnis	Tûnis
Cezayir	Cezayir
Mexrib (Marok)	Rebat
Sehra	
Sehraya Rojava	El Eyûn
Giravên Kanariyê	
Morîtanya	Nûakşot
Malî	Bamako
Senegal	Dakar
Gambiya	Banjûl
Gîneya Bisao	Bîsao
Gîne	Konakrî
Siyera Leon	Frîtawn (Free Town)
Lîberya	Monrovya
Kotdîvuwar	Abidcan
Gana	Akra
Bûrkîna Faso	
Voltaya Jorîn	Wanadûgû
Togo	Lome
Benen	Kotonû
Nîjerya	Lagos
Kamrûn	Yaûnde
Gîneya Ekwatorî	Malabo
Nîjer	Niyamey
Çad	Nicame`na
Sûdan	Xartûm
Afrîka Navendî	Bangî
Etyopya	Adîs Abeba
Erître	Esmere
Cibûtî	Cîbûtî
Somalya	Mogadîşû
Kenya	Nayirobî
Ûganda	Kampala
Rwanda	Kîgalî
Brundî	Bujumbura
Tanzanîka	Dar Es Selam
Malawî	Blantîre
Mozambîk	Mabûto
Madagaskar	Antana Narîvo
Kanala Mozambîkê	
Girava Rewinyon	
Girava Morîs	
Zengîbar	Zengîbar
Zîmbabwe	Salsbûry
Swaziland	Mbabane
Lesoteo	Maserû
Afrîka Başûr	Pretorya
Botswana	Gabaron
Namîbya	Windhûk
Zambiya	Lûsaka
Angola	Lûanda
Zaîr	Kînşasa
Kongo	Brazîl
Gabon	Librvîl

OQYANÛSYA

Antartîka	
Oqyanûsa Arktîk	
Polînezya	
Mîkronezya	
Melanezya	



TIRKIYE

Enqere
Edene
Stembol
Qeyserî
Qonya
Antaxya
Îskenderûn

IRAQ

Bexda
Besra
Kerbela
Kûfe

SÛRIYE

Şam
Heleb
Hums
Lazkiye
Dêrezor

ÎRAN

Taran
Tewrêz

ROJHELAT

Lubnan	Beyrûd
Îsraîl	Tel Avîv - Quds
Urdin	Amman
Kuweyt	Kuweyt
Erebistana Seûdî	Riyaz
Yemena Bakûr	Sen'a
Dubey	Şarîqe
Mûrîtiyên Erebî yên Yekbûyî	Ebû Zebî
Bahreyn	Mename
Uman	Mesqet
Qibris	Levkosia
Yemena Başûr	'Eden
Qetar	Dohe

DEMÊN SALÊ

Di salê de çar **dem** an werz (mewsim) hene:
BIHAR, HAVÎN, PAYÎZ û ZIVISTAN
Her dema salê sê meh dom dike.

Mehên biharê: Adar, Nîsan, Gulan
Mehên havînê: Hezîran, Tîrmeh, Tebax
Mehên payîzê: Îlon, Çirî, Teşrîn
Mehên zivistanê: Kanûn, Çile, Sibat

NAVÊN MEHAN

kurdî	*almanî*	*fransizî*	*îngilizî*	*tirkî*
Çile	Januari	Janvier	January	Ocak
Sibat	Februar	Février	February	Şubat
Adar	März	Mars	March	Mart
Nîsan	April	Avril	April	Nisan
Gulan	Mai	Mai	May	Mayıs
Hezîran	Juni	Juin	Juni	Haziran
Tîrmeh	Juli	Juillet	July	Temmuz
Tebax	August	Août	August	Agustos
Îlon	September	Septembre	September	Eylül
Çirî	Oktober	Octobre	October	Ekim
Teşrîn	November	Novembre	November	Kasım
Kanûn	Dezember	Décembre	Decembe	Aralık

ROJÊN HEFTÊ

Gotina **hefte** ji jimara heft tê, bi xwerû kurdî ye.
Di **hefteyekê** de heft roj hene. Va ne navên rast ên van rojan û wergerandina wan a bi zimanên biyanî:

kurdî	*almanî*	*fransizî*	*îngilizî*	*tirkî*
Yekşem	Sonntag	Dimanche	Sunday	Pazar
Duşem	Montag	Lundi	Monday	Pazartesi
Sêşem	Dienstag	Mardi	Tuesday	Salı
Çarşem	Mittwoch	Mercredi	Wednesday	Çarşamba
Pêncşem	Donnerstag	Jeudi	Thursday	Perşembe
Înî	Freitag	Vendredi	Friday	Cuma
Şemî	Samstag	Samedi	Saturday	Cumartesi

hejmar 2 zivistan 1988

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

BARSELONA 2

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên dervayî welêt salê du caran, di bihar û payîzê de, ji bo hefteyekê dicivin, li ser pirsên rastnivîsîn û nûkirina kurmancî dixebitin.

Di civîna bihara 1987 an de giraniya xebatê li ser peyivnasiya (terminoloijiya) coxrafî û li ser rastnivîsîna navên rojan, mehan û hejmaran bû. Navên welatên cihanê, ên çiya, deşt, çem û bajarên sereke, bi zimanê kurmancî hatin tesbît kirin. Encamên civînê di hejmara 1a rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî *Kurmancî* de hatin belav kirin. Ji ber van encaman nexşeyeke (xarîteyeke) rengîn a cihanê bi zaravayê kurmancî hate pêk anîn û çap kirin.

Civîna payizê ji 7 ta 14 teşrîn 1987an de dîsa li bajarê Barselonayê (paytexta Katalonyayê), bi arîkariya dostane ya hikûmeta otonom a katalanî çê bû. Di civînê de ji rojhelat ta rojava, ji bakur ta başûrê navçeyên kurmancîaxêvên Kurdistanê çibigre ji her herêmê beşdar hebûn. Di rojên pêşîn ên civînê li ser navên coxrafî yên Kurdistanê hate xebitîn. Di şêst salên dawîn de dewletên ku welatê me li hev par kirine navên piraniya bajar, bajarok, deşt û çiyayên me jî guherîne, navên nû li van danîne. Guhartina navan destpêka guhartina zanava (huwiyeta) kesekî, gelekî an welatekî ye. Lewra gava ku Konkîstador ên spanî an dagîrkerên brîtanî an îgilîz welatek zevt dikirin tafil navên nû li wan datanîn û, piştî çend nifşan (neslan), derveyî çend zana û diroknasan, kesî êdî navên kevn ên van welatan nedizanî.

Di sedsala XX an de li me jî wilo qewimiye. Welatê me ji me re bûye biyanî (xerîb). Em Kurdên Îran û Iraqê li aliyekî bihêlin, îro çend Kurdên Tirkiyê dizanin ku navê kurdî yê *Adiyamanê* Semsûr e, ku yê *Kurtalanê* Misric e, *Bingol, Çewlik e...*

Ji bo ku ev nav neyên ji bîr kirin, nifşên nû ew binasin, Enstitu ji ber encamên vê civîna payizê xarîteyeke rengîn a Kurdistanê da çap kirin, tê de navên kevn ên bajar, bajarok, çem, gol, deşt û çiyayên Welatê Kurdan bi awayekî zanistî bi cî kir û li bin navan, di nav kevanekan de, navên wan ên resmî jî nivîsî da ku welatiyên me çêtir tê bigihên. Weka her xebata destpêkî ev xarîta jî bê kêmasî û şaşî nîne. Ewê di çapa duwemîn de bên rast kirin.

Di bernameya Civîna payizê de hin pirsên din jî hebûn: navên îdarî, navên meywe û heşînatiyan, reng, hwd... Bi carekê bersîvdana pirsên wilo freh mimkin nebû. Pirsên ku hatine safî kirin di vê hejmara Kurmancî de tên belav kirin. Ên din ewê gav bi gav, piştî şêwr û lêgerînên bêtir, di civînên pêşiya me de zelal bibin. Herwekî di encamên vê Civînê de jî dixuye amanca vê xebatê çêkirina peyv û gotinên nû nîne. Heya ku ji me tê, em lê digerin ka li navçeyên cihê yên Kurdistanê ji bo tiştekî çi nav bêtir tê bi kar anîn. Em wî navî û, heke ku hebin, guhartoyên (variyantên) wî yên deverî tesbît dikin û belav dikin. Gava ku di tu zaravê kurdî de ji bo tiştekî an mefhûmekê navek nîn be, wê demê li ser çêkirina peyveke nû, li gora aheng û mantiqa kurmancî, diponijin. Baş di bîra me de ye ku zimanekî çêkirox, zêde *xwerû û petî* heye ku dilê hin ronakbîr û xwendayan xweş bike lê piraniya xelkê tê nagihê, xelkê ji hevûdu û ji xwendayan dûr dixe. Gava ku Kurdekî ji rêzê, hinek bi xwendin û nivîsandinê dizane, bikaribe bi serbestî, bi zimanê xwe yê rojane, kovar an romaneke kurdî bixwîne û jê zewq bistîne emê bikaribin bêjin ku kurmancî êdî bi rastî bû, an cardin bû zimanekî nivîskî yê gelêrî. Zimanê ku bi frehî hate nivîsandin û xwendin jî êdî zû bi zû winda nabe. Amanc û merema xebata me jî her ev e.

KURMANCÎ

ENCAMÊN CIVÎNA PAYÎZÊ

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên ku ji 7 ta 14ê teşrîna 1987an li barjarê Barselonayê li ser pirsên rastnivîsîna kurmancî xebitîn, gihane encamên (netîceyên) ku em di rûpelên vê rojnameya taybetî de belav dikin.

RENG

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
spî	beyaz	blanc	white
reş	kara	noir	black
sor	kırmızı	rouge	red
zer	sarı	jaune	yellow
kesk, sewz	yeşil	vert	green
şîn	mavi	bleu	blue
qehweyî	kahverengi	marron	brown
qemer	yağız	basané	swarthy
qemerê vekirî, esmer	esmer	brun	dusky
gewr, spiyê girîî	açık gri, açık	clair, gris clair	light, light grey
qerqas, çîl spî	bembeyaz	blanc éclatant	bright white
binevşî, mor	mor	violet	purple
pembe	pembe	rose	pink
erxewanî	şarabrengi	pourpre	crimson
kej	kumral, sarışın	blond	blond, fair
bor	kızıl	roux	red-haired, redhead
boz	boz	gris-pommelé	dapple-grey
çûr	açık sarı	jaune clair	light yellow
qîçik	saman sarısı	jaune paille	straw colour
qer	parlak siyah	noir brillant	bright black
şê (qehweyê bi sorayî ve)	al (at için)	alezan	chestnut
genimî	açık esmer	couleur de blé	wheat colour
şîrî	sütbeyaz	opalin, laiteux	opaline
xakî	haki	kaki	khaki

MEYWE

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*ingilîzî*
sêv	elma	pomme	apple
porteqal	portakal	orange	orange
hirmê	armut	poire	pear
hêjîr	incir	figue	fig
hinar	nar	grenade	pomegranate
zebeş, şûtî	karpuz	pastèque	watermelon
xox	seftali	pêche	peach

tirî	üzüm	raisin	grapes
kelek,gundor, petêx, qawin, qire	kavun	melon	melon
arûng, zerdele, qeysî, mişmiş	kaysı	abricot	apricot
tûtfrengî	çilek	fraise	strawberry
tû	dut	mûre	blackberry
behîv	badem	amende	almond
gûz	ceviz	noix	walnut
gêlaz, qeresî	kiraz	cerise	cherry
wîşne	vişne	griotte	morello cherry
biyok, bih	ayva	coing	quince
alûçe	yeşil erik	mirabelle	green plum
încas, hulûreş	kara erik	prune	blak plum
lîmon	limon	citron	lemon
mûz	muz	banane	banana
mandarîn, klementîn	mandalin	mandarine, clémentine	mandarin, clémentine
fistiq, piste	fıstık	pistache	pistachio
findiq, bindeq	fındık	noisette	hazelnut
bitim	bıtım	lentisque	
kezwan, şînok	menengüç	térébinthe	
givîj	akdiken	aubépine	hawthorn
xurme, qesp hembelaz, xatûnok	hurma	datte	date
dendûreşk	böğürlten	mûre sauvage	bramble
ananas	ananas	ananas	pine apple
şekok, girsik	ahlat	poire sauvage	wild pear
tihok, tawik	dağdağan	baie de sureau	elderberry
belût	palamut	gland	acorn
kestane	kestane	chataîgne	chestnut
tereqî	nektarin	nectarine	nectarin
zeytûn	zeytin	olive	olive

HÊŞÎNAHÎ - S E W Z Î

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
pîvaz	soğan	oignon	onion
sîr	sarmısak	ail	garlic
pîvazterk	yeşil soğan	oignon	shullot
xiyar, arû	salatalık	concombre	cucumber
bejik	kıtır	variété de concombre	variety of cucumber
acûr	acur	conbombre russe	russian cucumber
îsot	biber	poivron	green
kelem	lahana	chou	pepper
gulkelem	karnıbahar	chou-fleur	cabbage
kelemê Brukselê	Brüksel lahanası	chou deBruxelles	cauliflower Brussels sprout
sorkelem	kızıl lahana	chou rouge	red cabbage
kartol, patat, qompîr	patates	pommes de terre	potato
sêvaxîn	yerelması	topinambour	helianthe tuberaux
xes	marul	laitue	lettuce
gizêr	havuç	carotte	carrot
pirasa	pırasa	poireau	leek
şiwît	dereotu	fenouil	fennel
bexdenûs	maydanoz	persil	parsley
firingî, şamik, bacanê sor, temate	domates	tomate	tomato
balican, bacan	pathcan	aubergine	aubergine,eggplant
fasûlye, lobî, lobye	fasulya	haricot	bean
nok	nohut	pois-chiche	chickpea
nîsk	mercimek	lentille	lentil
maş	börülce	féerole, faséol	horse bean
baqil	bakla	fève	broad bean
tevrik, tivir	turp	radis	radish
binerdik	şalgamın bir türü	variété de navet	variety of turnip
şêlim	şalgam	navet	turnip
silk	pancar	betterave	beet
silka sor	kırmızı pancar	betterave rouge	beetroot
silkên şekir	şeker pancarı	betterave sucrière	sugar beet
kundir, kulind	kabak	courge	marrow, pumpkin
dolmik, rextik	kabak	courgette	courgette
bamiye	bamya	gambo, bamias	okra, gumbo
engînar, neynokên bûkê	enginar	artichaut	artichoke
xerdel	hardal	moutarde	mustard
meroje, kiling	kuş konmaz	asperge	asparagus
garis	darı	millet	millet
lazût, gilgilê Stembolê, garisê Stembolê, genimê Şamê, genimok	mısır	maïs	Indian corn, corn
rêwas, rûbês	ravent, okçul	rhubarbe	rhubarb
îspanax, silqok, siyele karî, kuvark, kumik, figerojşk, karkulîlk	ispanak	épinard	spinach
karok	mantar	champignon	mushroom
tûzik	tere	cresson	watercress
tolik	ebegümeci	mauve	mallow
rihan	fesleğen	basilic	basil
pûng	yarpuz	menthe sauvage	spearmint
kereng	kenger	chardonnette	cardoon
nane, pûjan	nane	nane	mint
catirî	kekik	marjolaine	marjoram
sîrik	yabani sarmısak	ciboule	scallion
sîrim		ciboulette	chive

PEYVEN KURDÎ DI KLASÎKÊN ME DE

Mewlûda Kurmancî

Reşo ZÎLAN

Mewlûda Kurmancî ya ku em ê lê piçekî hûr binihêrin û hin peyvên kurdî yên ku tê de derbas dibin, berpêşî we bikin, ya Mela Huseynê Bateyî ye. Ji bilî mewlûdnameya Bateyî, Mela Ebdilkerîm Mideris û Mih-emede Reşad El-Miftî ji mewlûdname nivîsandine. Di nav van herdukan de mewlûdname ya El-Miftî bêtir nêzîkî ya Bateyî ye. Di van salên dawin de, melayek ji melayên Kurdistana bakur, mewlûdnameya Bateyî li gor zanîn û kurdiya xwe, bêî ku kêşa wê ya yazdeh kîteyî têk bide, kiriye kurmanciyeke nû. Di van hiç

yekê de tam û çêja rastîn ya mewlûdnameya BATEYÎ dîtin ne mumkun e. Mewlûdnameya Bateyî, bê guman ji hemûyan têkûztir, edebîtir, giranbihatir û binavûdengtir e. Ev di nav şêniyên Kurdistanê de, yên ku bi zaravayê kurmancî dipeyivin, gelekî belav bûye û nas e. Mirov bê şik dikare bibêje, ku di nav klasîkên kurdî de ya herî bêtir çap û belav bûye, nas e û tête xwendin, Mewlûda Kurmancî ye. Dêlindêzên xwendin û dayîna mewlûdan êdî ji roleke olî û ayinî bêtir, roleke civakî dilîzin. Ew gelek caran ji bo bîranîna miriyan, pîrozkirina di tistekî de biserketinê, bi sax û xwe,sî ji xerîbî û eskeriyê vegerê û herweha ji bo belavkirina xêr û qenciyê û hwd. tête xwendin û dayîn.

Gelo Mala Huseynê Bateyî kî ye û çi kes e ? Çi berhem û afirandinên wî hene ? Herçendî ev pirs ne babeta vê nivîsarê be jî, dîsan jî pêwîst e ku em gelekî bi kurtî li ser van pirsan rabiwestin.

Gelek kesên ku li ser BATEYÎ û mewlûdnameya wî nivîsandine; Bilîç Serko, M.Emin Zekî, 'Elaeddîn Sucadî, Herekol Azîzan, Prof. Qanatê Kurdo, Dr. Kemal Fûad, E.B. Soane, Thomas Bois, V.F. Mînorsky û gelekên din, bêî ku bi belge bipeyîtînin, dibêjin navê wî "Mela Ehmedê Bateyî" ye. Lê heçî navê "Ehmed" e, wî hiç li cîhekî û li hîç helbestekê bi kar neaniye welê xûya dike ku çavkaniya vî navî, A. Jaba ye. Herwekî tête zanîn A. Jaba, balyozê Rûsyayê li Erziromê, hemû agehî û enformasyonên xwe yên li ser klasîkên kurdî û nivîsevanên wan ji Mela Mehmûdê Beyazidî wergirtiye. Mixabin gelek ji wan jî şaş in. Wisan diyar e, ku cara pêşîn ev nav bi şaşî bi riya pirtûka A. Jaba belav bûye û yên din jî jê û ji hev wergirtine. Di çapeke Stembolê û her weha di çapa Gîw Mukriyanî ya Mewlûda Kurmancî de navê wî "Hesen" hatiye nivisîn, ku ev jî ne rast e. Lê navê rastî yê xwedî û nivisevanê Mewlûda Kurmancî, her wek neviyên wî bi xwe jî dibêjin û di nav mela, feqî û şêniyên Kurdistanê de belav e û di pişta mewlûdnameya wî de jî hatiye nivîsîn, Mela Huseynê Bateyî ye. Ew bi xwe ji eşîra Hertoşîyan (Ertroşiyan) e û ji gundê Bateyî ye. Ev gund li herêma Hekariyan e û dikeve nêzîkî geliyê Tiyarê û gundê Marûnis.

Tête texmîn kirin, ku wî di medreseya Mîr Hesenê Welî de, li gundê Muksê xwendiye. Ev medrese, medresa mezin û binavûdeng e. Dibêjin carina heya 300 feqeh lê dixwendin û qasî 10 mamosteyan jî tê de ders didan. Wî piştî dawîanîna xwendina xwe ya medresê, bi xwe ders dane feqihan. Ew bi zanist û nivîsîna helbestan ve mijûl bûye. Herweha çûye hec û helbesta xwe ya "Hilo raba Ebû el-Qasim" li ser gora pêxember gotiye.

Heçî zanîna dem û zemanê ku ew tê de jiyaye, yek car dijwartir e. Gelek kesan, wek A. Jaba, B. ∑erko, M.E. Zekî, 'E. Sucadî, H. Azîzan, Prof. Q. Kurdo, T. Bois, V.F. Mînorsky û gelekên din gotine ku ew di navbera salên 820-900-ê koçî, ango 1417-1495-ê zayînî de jiyaye. SADIQ Behadin Amêdî, Bateyî hevçaxê Mela Mensûrê Gêrgaşî nîşan dide. Mela Mensûrê Gêrgaşî ji gundê Gêrgaşê ye. Ev gund dikeve başûra rojhelata Amêdiyê. Mela Enwerê Mayî dibêje ku "Ew di sedsala 11-an ya koçî de jiyaye, ango di sedsala 17-an ya zayînî. Lê herwekî mewlûdname ji aliyê olperestî û dîndariyê de afirandineke gelekî girîng e û cihê wê di dêlindêzên ayînî de bi qedr û rûmet e, ji aliyê kesekî wek Ehmedê Xanî (1650-1707) de nenasbûna wê pirseke girîng tîne pêşberî me. Heke hebûna wê ji aliyê Xanî ve bihata zanîn, ji wê çêlnekirin ne mumkun bû. Xanî, pêxemberê me yê neteweyî, di sertaca edebîyata kurdî Mem û Zînê de navê Bateyî nehaniye. Wî, di van malikan de navê Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrê û Feqiyê Teyran aniye û rûmeta berhem û afirandinên wan girtiye û gotiye ;

Min dê 'alema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn
B'nave ruhê Melayê Cizîrî
Pê hey bikira 'Eliyê Herîrî
Keyfek we bida Feqiyê Teyran
Heta bi ebed bimayî heyran
Çib'kim ko qewî kesade bazar
Nînin ji qumaşî re xerîdar

Ne xwe, heke Bateyî berî Xanî jiyaba û mewlûdname nivîsîba, divabû Xanî jê çêl bikira. Yan na, ji XANÎ re dibû kêmasîyeke mezin. Dîtina ev celeb kêmasî û li milekî din jî aliyê Xanî de nezanîn pûtepênedan û nedîtina mewlûdnamê ne mûmkun e. Rastiyeke din jî heye, ku mewlûdname û toreya xwendin û dayîna mewlûdê derengtir ketiye nav civata kurdî. Ji ber vê yekê ye, ku mewlûdnameyên bi zaravayê kurdiya jêrîn û bi zaravayê kurdiya dimilî jî ne xwedi tarixeke hinde dirêj in. Ev yek jî wê baweriyê dide me, ku Mewlûda Kurmancî ne ji sedsala 15-an e. Lê heye ku ew piştî Xanî, yan jî çend sal berî mirina wî, ango ji destpêka sedsala 18-an be...

Mewlûda Kurmancî heya niha gelek caran hatiye çap kirin. Destnivîsara herî kevn ku me dîtiye, ji sala 1270-yê koçî, agno 1853-yê zayînî ye. Ew bi destê kesekî ku navê Wî Ebdulhemîd e, hatiye nivîsîn. Rojhelatnas Albert von Le Coq ew destnivîsar di sala 1901-2-an de li ∑amê bi dest xistîye û piştre ew aniye Ewropayê. Ew destnivîsar niha li kitêbxaneya "Staatsbibliothek" Marburg/Berlinê ye.

Cara pêşîn A. von Le Coq di sala 1903-an de Mewlûda Kurmancî li Berlînê çap dike. Ew ji ber destnivîsara Mela Mihemedê Wanî, ku ji sala 1888-an e, bi awakî fotolîtografik hatiye çap kirin. Bi dû re Ehmed Ramîzê Liceyê di sala (1324) 1906-an de li Qahîrê çap kiriye. Mewlûda Kurmancî disan di sala 1906 û 1919-an de li Stembolê, di 1933an de bi destê Celadet Bedirxan li ∑amê di (1350) 1931an de li Stembolê, di 1966-an de bi destê Gîw Mukriyanî li Hewlêrê, di 1977 (?)-an de dîsan li Hewlêrê û di 1982-an de ji aliyê S.B. Amêdî de li Bexdayê hatiye çap kirin. Lê ev çap ji ya xwerû û orjinal cihêtir e. Mewlûdnameya Bateyî heya niha gelek caran li Kurdistana bakur foto-ofset, hatiye çap kirin. Lê bêî ku tarixa li ser bête guhartin û şaşiyên çapê bên rastkirin. Mewlûda Kurmancî di forma mesnewî de ye, ji 564 malikan û ji 18 beşan pêk hatiye. Malikên wê giştî ji 11 kîteyan pêk tên û kêşa wê li ser 11-an e. Rojhelatnas Wetzstein dibêje, ku "∑êx BATÊ yê Kurdan mewlûda *Îbn Hecer* bi helbestkî kiriye'kurdî". Lê di rastiyê de wî jê îlham wergirtiye, ne ku her yekser ew wergerandiye kurdî.
Destpêka Mewlûda Kurmancî weha ye ;

Hemdê bê hed bo Xudayê 'alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn

Dawiya wê jî weha ye :

Bo cemî'e muslimîn û salihe
Bo feqîrê Bateyî el-fatihe

Di dawiya her beşekê de ev neqarat heye;

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B'işq û şewqek hûn bibêjin es- selat

Gelek nivîsevan û lêger dinivisin û dibêjin ku ji bilî mewlûdnamê çend tiştên din yên Bateyî hene. Wek dîwaneke çîroka Zembîlfiroş, û hwd. Lê heya îro ji çend helbestên Bateyî û pê de çu tiştek bi dest neketiye. Heçî çîroka Zembîlfroş e, ew ne ya Bateyî ye. Lê ew ya Miradxwanê Beyazîdî ye.

BEŞ I

Namwer (Namuwer) *(f)* Xudannav, xwedînav
Mar û mûr Mar ji bo heywanên dixuşin (rawir) û mûr jî ji bo bihukan ango rawir û bihuk.
Negotî Eşkerenekirî, diyarnekiri, ji dev derneketî
Der *(f)* Li, di... de, di nav de.
Karsaz (karisaz) Kesê ku karekî bi rêk dixe û çêdike, çêker, xaliq
Bende Kole, bendî, 'ebd
Mihriban *(f)* Dilovan, bi şewqet, bi muhabet, rûxoş, xûynerm
Bedîd-Pedîd *(f)* Pendî, eşkere, aşikar, berçav
Ba *(f)* Bi
Aferîd Afirand, xulq kir
Ala Di kurmanciya nûjen de ev peyv wek AL hatiye nivîsîn û bi kar anîn. A rastî ne Al e, lê herwekî di zaravayê jêrîn de têt gotin, ALA ye. Ango; perçem, beyreq
Zeman Dem, çax, wext
Aferîn Bijî !

BEŞ II

An *(f)* Bîsk, kêlîk, xêlek, lehze
Hin *(e)* Bîsk, kêlîk, xêlek, lehze
Darû *(f)* Derman
Dîde *(f)* Çav
Bînahî Hêza dîtinê, dîtin
Destegîr Alîkar, destgîr, kesê ku bi destan digre
Gunehkar Kesê ku gunehek kiriye
Penah *(f)* Parêzgeh, star
Pûşt *(f)* Pişt, piştevan
Rahnî Ronahî, ronakî
Asîman, asûman, asîman *(f)* Asman,'ezman
Rewan, revan Tiştê ku diçe, diherike; li vir: jîn
Xakî pa *(f)* Xweliya pê, axa (toz) pê
Lew Lewma, loma, ji ber vê/wê
Goşîdar, gûşdar *(f)* Guhdar
Karûbar Kar û xebat
Xweşnewa *(f)* Xeş, xweşdeng
Çerx Daxdar
Daxîdar Daxdar, birîndar

(f) : Ango bi farisî ye.

BEŞ III

Dergeh Derî
Koh, Kûh Çiya, şax, kirr
Fer Teyîsok, îskok, birqok
Hember Bergind, bergîdan
Bexşîn Dayin, lê borîn
Dîger *(f)* Yê/ya din
Hilbûn Vêketin, pêketin (Çira hilbû = çira vêket, Agir hilbû = agir vêket, Agir hilkirin = agir dadan, agir vêxistin)
Hemnişîn Pêkve rûnişti, hevrûnişti
Çavxirab Çavneçê, çavpîs
Pur Maneya rastî ya vê peyvê, herwek di zaravayê jêrin de tête bi kar anîn, tijî, dagirtî ye. Bi kurdî ne **pur** lê **pir** e. Li vir bi maneya gelek de ye.
Şiyan Karîn, şekirin
Cergebez Govenda ku jin û mêr bi hev re digrin, reşbelek. Wekî din maneya qelebalix jî dide.
Lêk Li yek û du, li êk û du, ji hev, jê
Huşyar bûn Hişyar bûn; li vir: agehdar bûn, haydar bûn.

AL AN ALA ?

Hin Kurdên Tirkiyê di van salên dawîn de ji bo **perçem** (tirkî: *bayrak*, fransizî: *drapeau*, îngilîzî: *flag*) peyva **al** bi kar tînin. Ev peyv xwerû kurdî ye û gelekî kevn e, lê rastiya wê **ala** ye, ne **al** e. Melayê Batê di Mewlûda kurmancî de ev gotin wilo bi kar aniye:

Ya Reb imanê dixwazin em mudam
Jêrê alaya Muhemed wesselam.

* * *

KEY Û KEVANÎ

Kurdên ku gotina **kevanî** yê nizanibin kêm in. Piranî ew bi mana jina malê, pîrek, xêzan an xanim bi kar tînin. Lê gelo ev gotin ji ku tê ? Ji peyva **Keybanû** , ango jina **key** (qiral, şah) tê. Mana gotinê qiraliçe, şahbanû, melîke (tirkî: *kraliçe*, fransizî: *reine*, îngilîzî: *queen*) ye. Pêşiyên me **civanmêr** (tirkî: *centlmen*, fransizî: *gentilhomme*, îngilîzî: *gentleman*) bûne, bi gotinê be jî, qedrê jin û xatûnên xwe zanibûne.

BIJÎ AN AFERÎN

Kîjan rastir e ? Her du jî. Aferîn ji **afirandinê** (xulq kirin, jiyandan) tê û xwerû kurdî ye, di farisî û zimanên îranî de teşeyên nêzîk ên vê gotinê hene. Jê **afirandî** (mexlûq, tirkî: *yaratık*, fransizî: *créature*, îngilîzî: *creature*) çêbûye. Mana aferîn bijî ye.

NAVÊN ÎDARÎ

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
Dewlet	devlet	état	state
Hukûmet	hükümet	gouvernement	government
Serekkomar	cumhurbaşkanı	président de la république	president of republic
Serekdewlet	devletbaşkanı	chef d'état	head of state
Sermiyan	başkan	président	president
Serekwezîr	başbakan	premier ministre	prime minister
Komar	cumhuriyet	république	republic
Key, şah, qiral	kral, şah	roi	king
Şahitî, keyîtî, qirali	şahlık, krallık	royaume, royauté	kingdom, kingship
Keyperest, şahperest	monarşist	royaliste, monarchiste	monarchist
Paytext	başşehir, başkent	capitale	capital
Wezaret, wezaretxane	bakanlık	ministère	ministry
Wezîr	bakan	ministre	minister, secretary
Wezareta dadiyê	adalet bakanlığı	ministère de la justice	ministry of justice
Wezareta karên derve	dışişleri bakanlığı	ministère des affaires étrangères	ministry of foreign affairs
Wezirê derve	dışişleri bakanı	ministre des affaires étrangères	foreign mininter
Wezareta karên civakî	sosyal işler bakanlığı	ministère des affaires sociales	ministry of social affairs
Civakî, sosyal	toplumsal	social	social
Wezareta karên çandiniyê	tarım işleri bakanlığı	ministère de l'agriculture	ministry of agriculture
Çandin	tarım	agriculture	agriculture
Cotkar	çiftçi	agriculteur	farmer
Wezareta bazara kar	çalışma bakanlığı	ministère du travail	ministry of labour
Bazara kar	iş piyasası	marché du travail	labour market
Wezareta maliyê	maliye bakanlığı	ministère des finances	ministry of finance
Sivîl	sivil	civile	civilian
Mal, xanî	ev, mesken	maison, logement	house, accomodation
Wezareta hawirparêziyê	çevre bakanlığı	ministère de l'environement	ministry of environemnt
Wezareta enerjiyê	enerji bakanlığı	ministère de l'énergie	ministry of energy
Hawîr, hawir	çevre	environement	environement
Wezareta bazirganiya derve	dış ticaret bakanlığı	ministère du commerce extérieur	ministry of foreign trade
Bazirganiya derve	dış ticaret	commerce extéhieur	foreign trade

Bazirganî	ticaret	commerce	trade
Bazirgan, têcir	tüccar	commerçant	trader, merchant
Wezareta aboriyê	ekonomi bakanlığı	ministère de l'économie	ministry of economy
Wezareta tendurustiyê	sağlık bakanlığı	ministère de la santé	ministry of health
Wezareta zanistî û teknolojiyê	bilim ve teknoloji bakanlıgı	ministère des sciences et de techonologie	ministry of sciences and techology
Wezareta budcê	bütçe bakanlığı	ministère du budget	ministry of budget
Wezareta tûrîzmê	turizm bakanlığı	ministère du tourisme	ministry of tourisme
Wezareta sporê	spor bakanlığı	ministère des sports	ministry of sports
Neteweyên Yekbûyî	Birleşmiş Milletler	Nations-Unies	United-Nations
Parlement	parlamento	parlement	parliament
Wezareta karên hundir	içişleri bakanlığı	ministère de l'interieur	ministry of domestic affairs
Wezareta şer	savaş bakanlığı	ministère de la guerre	ministry of war
Wezareta çandê	kültür bakanlığı	ministère de la culture	ministry of culture
Çandî	kültürel	culturel	cultural
Xwenda	okumuş	lettré, instruit	educated
Welat	ülke	pays	country
Navçe	bölge	région	area, region
Hêl, alî, rex, la	yer	côté	side
Dever, cîgeh	lokal	endroit, lieu, place	place
Cî, şûn, der	yer	lieu, place	place
Herêm	distrikt	district, secteur	district
Bajar, şehr	şehir	ville, cité	city, town
Tax	mahalle	quartier	quarter
Bajarok	küçük şehir, kasaba	bourg, bourgade	staggling village, small town
Gund, dêh	köy	village	village
Wîlayet	il	département, préfecture	department, province
Belediye, şaredarî	belediye	mairie	city hall, mayoralty
Şaredar, serekbelediye	belediye başkanı	maire	mayor
Bajaravahî	şehircilik	urbanisme	town planing
Walî	vali	préfêt	prefect, governor

NAVGÎNÊN NEQLIYÊ

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
trên	tren	train	train
balafir, firinde	uçak	avion	airplane, aircraft
otomobil	otomobil	automobile	motor car
otobus	otobüs	autobus	bus
minîbus	minibüs	minibus	minibus
kamyon	kamyon	camion	lorry, truck
kamyonet	kamyonet	camionette	van
traktor	traktör	tracteur	tractor
cîp	jip	jeep	jeep
pîkap	pikab	estafette	pick-up
bisîklet, duçerxe	bisiklet	bicyclette	bicycle
motorsîklet	motosiklet	motocyclette	bike
sêçerxe		tricycle	tricycle
parxêl	at arabası, kağnı	char à bœufs	oxcart
helikopter	helikopter	hélicoptère	helicopter
taksî	taksi	taxi	taxi
mototren	mototren	train diesel	motor train

hejmar 3 havîn 1988

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

CIVÎNA BRUKSELÊ

Civîna biharê ya li ser pirsên rastnivîsîn û nûkirina kurmancî di rojên 17 - 23ê nîsanê 1988an de li bajarê Brukselê, paytexta Beljîkayê, çê bû.

Ji nivîskar, rojnamevan, ronakbîr û zimannasên kurd ên dervayî welêt ên ku hatibûn vê Civînê ev in : Khosrow ABDOLLAHÎ (Selmas), Moayed AHMED (Behdînan), Kazim BABA (Dêrsim), Lutfî BAKSÎ (Batman), Rojen BARNAS (Diyarbekir), Egîd DIJWAR (Bişêrî), Evdo (nûçegihanê Kurdistan Press), Derwêş FERHO (Mêrdîn), D. ÎZOLÎ (Dêrsim), Mûsa KAVAL (Hekarî), K. NEZAN (Diyarbekir), Hiner SALIM (Behdînan), Şahîn B. SOREKLÎ (Koban), Yücel YEŞİLGÖZ (Dêrsim), Memo YETKÎN (Semsûr) û Reşo ZÎLAN.

Ji vê lîstê dixuye ku di civîna biharê de ji bakur ta başûr, ji rohelat ta rojavayê navçeyên kurmancîaxêvên Kurdistanê beşdar hebûn. Giraniya bernameya civînê vêcarê li ser peyivnasiya (termînolojiya) rojnamevaniyê û ya anatomiyê bû. Sal bi sal hejmara kovarên kurdî zêdetir dibe, hewcedariya bi peyvên kurdî ji bo behskirina bûyer û qewimandinên rojane jî li wê gorê hingî diçe xwe xurtir nîşan dide. Di Civîne de li ser hin ji van peyvên bingehîn hate axaftin, hinên din, ku bêtir lê fikirîn û xebat dixwazin, man civîna payizê. Heçî anatomiyê, xebatên civînê dan xuyakirin ku zimanê me di vî warî de gelekî dewlemend e ; ji bo hin parçeyên laşê mirov di şûna navekî de çend nav hene. Lê herwekî ev nav di xwendegahan de nayên hîn kirin, hin Kurd, nemaze bajarî, baş nizanin bi rastî kîjan nav ji bo kîjan parçeyê laş e. Lewra em van navan li ser wêneyên zanistî yên anatomiya mirov bi cîh dikin, ta ku xeletî, tevlihevî û şaşbikaranîn kêmtir bibin. Xebata li ser anatomiyê ewê di civînên ku tên de jî dom bike.


Wekî her car, di bernameya Civîna Brukselê de jî, hin pirsên jiyana rojane hebûn. Îca, beşdar li ser navên biharatan û ên navgînên deryayî xebitîn. Ew wisa jî vegeriyan ser hin navên îdarî û siyasî ku di civîna berê de zelal nebûbûn.

Bernameyên civînan şeş meh berê tên kifş kirin. Komele, kovar an komikên kurd ên ku dixwazin hin pirsên taybetî pêşniyarî van civînan bikin, divê ku di wextê de daxwaziyên xwe bi name ji Enstîtuyê re binivîsin. Stûnên *Kurmancî* ji rexne û pêşniyarên xwendevan re vekirî ne.


Amanc û merema me ew e ku bi hevkariya Kurdên ku bi zimanê xwe dizanin û jê hiz dikin kurmanciya nivîskî têkûz, ahengdar, bi mantiq, zelal û spehîtir be.

KURMANCÎ

ANATOMIYA MIROV




kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
1- 18 SERÎ	**BAŞ**	**TÊTE**	**HEAD**
1 - Tasa serî, tepika serî, tepa serî, qoq	kafa tası, kafa tası zirvesi	crâne, sommet du crâne	crown of the head, top of the head
2- patik	artkafa	occiput	back of the head
3- por	saç	chevelure	hair
4-17 RÛ	**YÜZ**	**FACE**	**FACE**
4-5- enî	alın	front	forehead
4- pêşcênîk, beşik	alın çıkıntısı	bosse frontale	frontal eminence
5- navçav	iki kaş arası, belce	glabelle	supercilliary arch
6- cênîk	şakak	tempe	temple
7- çav	göz	œil	eye
8- hinarik	elmacık	pommette	cheekbone
9- dêm, lam, rû	yanak	joue	cheek
10- poz, difin, kepû, lût, bêvil	burun	nez	nose
11- bêrûmet		sillon naso-générien	nasolabial fold
12-		sillon sous-nasal	philtrum
13- dev	ağız	bouche	mouth
14- kujê lêvê	dudakların birleşme yeri	commissure des lèvres	labial commissure
15- çene, erzîng	çene	menton	chin
16- çenegeh	çene çukurcuğu	fossette mentonnière	dimple in the chin
17- çelefîk, çen, alçen	üstçene	mâchoire inférieure	jaw
18- guh	kulak	oreille	ear
19-21- STÛ	**BOYUN**	**COU**	**NECK**
19- qirik	boğaz	gorge	throat
20- çala gerdenê		fossette sous-sternal	hollow of the throat
21- çema stû	ense	nuque	nape of the neck




Anatomiya Serî

30-41 QERQÛDE, SKELET	ÎSKELET	SQUELETTE	SKELETON
kilox	kafatası	crâne	skull
30- textikê eniyê, hestiyê eniyê	alın kemiği	frontal	frontal bone
31- tasa serî	çeber kemiği	pariétal	parietal bone
nîve tasa rastê	sağ yan kafa kemiği	pariétal droite	right parietal bone
nîve tasa çepê	sol yan kafa kemiği	pariétal gauche	left parietal bone
32- hestiyê patikê	arkakafa kemiği	occiput	occipital bone
33- hestiyê beleguhê	yankafa kemiği	temporal	temporal bone
34- kerrika guh	kulak yolu	conduit auditif	external auditory canal
35- hestiyê çena jêrîn	altçene kemiği	maxillaire inférieur	lower jaw bone
36- hestiyê çena jorîn	üst çene kemiği	maxillaire supérieur	upper jaw bone
37- hestiyê hinarikê	elmacık kemiği	os malaire	cheekbone
38- hestiyê cênîkê	şakak kemiği	sphénoide	sphenoid bone
39- hestiyê kortika çav	göz çukuru kemiği	ethmoide	ethmoid
40- hestiyê kaniya çav	göz pınarı kemiği	unguis, os lacrymal	lachrymal bone
41- hestîn poz, difin, kepû, lût, bêvil	burun kemikleri	os nasaux	nasal bones

42-55 SERÎ	BAŞ	TÊTE	HEAD
42- mêjî	beyin	cervau	cerebrum, great brain
43- hîpofiz	hipofiz	hypophyse	hypophysis
44- corpus callosum	nasırlı cisim	corps calleux	callous corps
45- mêjîkok	beyincik	cervelet	little brain
46- pirika mêjî	Varoli köprüsü	pont de Varole	pons cerebri
47- pîvazoka mêjî	soğancık	bulbe	brain-stem
48- mêjiyê piştê	omurilik	moëlle épinière	spinal cord
49- sorsorik, kirkirok	yemek borusu	oesophage	gullet, oesophagus
50- zengilor	soluk borusu	trachée	trachea, windpipe
51- zimanê kirkirokê/zengilorê	gırtlak kapağı	épiglotte	epiglottis
52- ziman	dil	langue	tongue
53- valahiya poz, difin, bêvil, kepû, lût	burun boşluğu	fosse nasale	nasal cavity
54- sînûsa cênîkê	şakak sinüsü	sinus sphénoide	sphenoidal sinus
55- sînûsa eniyê	alın sinüsü	sinus frontal	frontal sinus








56-65 ORGANÊ BIHÎSTINÊ

GUH	KULAK	OREILLE	EAR
56- 58 guhê derva	dış kulak	oreille externe	external ear
56- kevçika guh	dış kulak kepçesi	pavillon	auricle
57- nermika guh, gurçika guh	kulak memesi	lobe	ear lobe
58- kerrika guh	kulak yolu	conduit auditif	external auditory canal
59-61 guhê navîn	orta kulak	oreille moyenne	middle ear
59- perdeya guh	kulak zarı	tympan	tympanic membrane
60- valahiya guhê navîn	orta kulak boşluğu	caisse du tympan	typmanic cavity
61- hestîkên bihîstinê, çakûç, sindan, zengû	orta kulak kemikleri, çekiç, örs, üzengi	osselets de l'oreille, marteau, enclume, étrier	ossicles, hammer, anvil, stirrup
62-64- guhê hundirîn	iç kulak	oreille interne	internal ear
62- labîrent	labirent	labyrinthe	labyrinth
63- şeytanok	salyangoz	limaçon	cochlea
64- rehê bihîstinê	işitme siniri	nerf auditif	auditory nerve
65- boriya Ostakî	Ostaki borusu	trompe d'Eustache	Eustachian tube
	çimika guh	tragus	tragus
	kevîya guh	anthélix	anthelix
	serçimika guhsarmal	hélix	helix

14-37 DEV û GEWRÎ	ağız ve boğaz	la bouche et le pharynx	mouth and throat
14- **lêva jorîn**	üst dudak	lèvre supérieure	upper lip
15- **pidî**	diş eti	gencive	gum
16-18 DIRAN an DIDAN	**DİŞ**	**DENT**	**TEETH**
16- **diranên pêşîn, diranên befşik**	kesici dişler	incisives	incisors
17- **diranên tûj, qîl**	köpek dişleri	canines	canine tooth
18- **diranen kursî, diranên paşî**	azı dişler	molaires	premolars
19- **kujêdev**	dudakların birleşme yeri	commissurre des lèvres	labial commisure
20- **esmanê dev, panîka dev, kama dev**	damak	palais	hard palate
21- **nermika esmanê dev**	yumuşak damak	voile du palais	soft plate velum
22- **zimanê biçûk, zimanok**	küçük dil	luette	uvula
23- **behîvok, aloq, gelale**	bademcik	amygdale	tonsil
24- **gewrî, hefik**	boğaz	pharynx	pharynx
25- **ziman**	dil	langue	tongue
26- **lêva jêrîn**	alt dudak	lèvre inférieure	lower lip
27- **çena jorîn**	üst çene	mâchoire supérieure	upper jaw
28-37 DIRAN	**DİŞ**	**DENT**	**TEETH**
28- **kîsikê diran**	dişkökü zarı	coiffe de la racine	periodontal membrane
29- **hesteyê diran**	diş çimentosu	cément	dental cementum
30- **sedefa diran**	emaye	émail	enamel
31- **aca diran**	fildişi kısma	ivoire	dentine
32- **pûka diran**	iç/orta tabaka	pulpe denttaire	dental pulp
33- **reh û damarên diran**	diş sinir ve damarları	nerfs et vaisseaux sanguins	nerves and blood vessels
34- **befşik**	kesici diş	incisive	incisor
35- **diranê kursi**	azı diş	molaire	molar
36- **koka diran**	diş kökü	racine	root
37- **taca diran**	diş tacı	couronne	crown
kepîr	kîreç	tartre	tartar
kepîr girtin	kireç tutmak	s'entarter	to fur up







38-51 ÇAV	**GÖZ**	**ŒIL**	**EYE**
38- birî	kaş	sourcil	eyebrow
39- palikê çavê jorîn	üst göz kapağı	paupière supérieure	upper eyelid
40-palikê çavê jêrîn	alt göz kapağı	paupière inférieure	lower eyelid
41- bijang	kirpik	cil	eyelash
42- reşika çav, iris	iris	iris	iris
43- bîbik	göz bebeği	pupille	pupil
44- masûlkeyên çav	göz kasları	muscles occulomoteurs	ocular muscles
45- gûza çav	göz yuvarlağı, göz küresi	globe oculaire	eyeball
46- spîka çav	göz akı	corps vitré	vitrous body
47- perdeya çav, gilêne	saydam tabaka	cornée	cornea
48- nîske	göz merceği	cristallin	lens
49- tora çav, retîna	ağ tabaka	rétine	retina
50- piniya kor	kör nokta	papille	blind spot
51- reha bînahiyê	görme siniri	nerf optique	optic nerve

Navê navgînên deryayê

Amadekar: Mûsa KAVAL

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilizî*
navgîn	araç	véhicule, moyen de transport	means, vehicle
derya	deniz	mer	sea
deryayî	denizsel	marin,e	sea, adj.
deryavan	denizci	marin, navigateur	seaman, navigator
deryavanî	denizcilik	navigation	navigation
keştîvan	gemici	marin, matelot	sailor, seaman
keştîvanî	gemicilik	marine	navy
bixêrî	baca	cheminée	chimney
bêrik	kürek	rame	oar
keştî	gemi	navire, bateau	ship, boat
xêlî	yelken	voile	sail
keştiya bi bêrik	kürekli gemi	navire à rames	noving boat
keştiya bayî	yelkenli gemi	bateau à voile	sailing boat
keştiya dûkelî, vapor	buharlı gemi	bateau à vapeur	steamer, steam ship
keştiya bi motor	motorlu gemi	bateau à moteur	motorboat
keştiya bi enerjiya nuklêrî	nükleer güdümlü gemi	navire à propulsion nucléaire	nuclear-powered ship
cenkeştî	savaş gemisi	navire de guerre	warship
keştiya barkêş	yük gemisi	navire de transport	transport ship
keştiya nexweşxane	hastahane gemisi	navire-hôpital	hospital-ship
keştiya xwendegeh	okul gemisi	bateau-école	training ship
keştiya masîgiriyê, masîvaniyê	balıkçı gemisi	chalutier, bateau de péche	trawler
keştiya rêberiyê	kılavuz gemisi	bateau-pilote	pilot boat
keştiya hawarê	cankurtaran gemisi	bateau de sauvetage	lifeboat
keştiya agirkujiyê	itfaiye gemisi	bateau-pompe	fireboat
keştiya geştê	eğlence gemisi	bateau de plaisance	pleasure boat
keştiya petrolkêş	petrol gemisi	pétrolier	tanker
balafirhilgir	uçak gemisi	porte-avion	aircraft carrier
stol	filo	flotte	fleet
keştiya rêwiyan	yolcu gemisi	paquebot	liner
qeyik	kayık	barque	small boat
mayinçîn	mayın döşeme gemisi	mouilleur de mines	minelayer
mayingir	mayın tarama gemisi	dragueur de mines	minesweeper
lezbot	sürat motoru, devriye motoru	vedette	launch, patrolboat
ferîbot	feribot	ferry-boat	ferry-boat
qeyika hawarê	cankurtaran kayığı	canot de sauvetage	lifeboat
noqav	denizaltı	sous-marin	submarine
kelek	sal	radeau	timber float
kod	küçük tekne	canot	small or open boat
lengergeh	iskele	échelle, embarcadère	landing stage
lenger	çapa demiri	ancre	anchor
bender	liman	port	port, harbour
sekûya benderê	rıhtım	quai	quay, embankment
fanosa deryayî	deniz feneri	phare	light house, beacon
lenger avêtin	demirlemek	jeter l'ancre	cast anchor, drop anchor
lenger hildan	demir almak	lever l'ancre	weigh anchor
keştiya hawarê	cankurtaran	bateau de sauvetage	lifeboat

Biharat

Amadekar: Reşo ZÎLAN

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilizî*	*latînî*
biharat	baharat	epices	spices	
rizyane, cehcehik	rezene	fenouil	common fennel	foeniculum vulgare
anix, anîs	anason	anis	anise	pimpinella anisum
zîre, kîmyon	kimyon	cumin	cumin	carum carvi
bîbera reş, îsota reş	karabiber	poivre noir	black pepper	piper nigrum
bibera spî, îsota spî	beyaz biber	poivre blanc	white pepper	piper albium
germok		poivre de la Jamaique	Jamaican pepper	pimenta officinalis
pûng	yarpuz	menthe sauvage	wild mint	mentha silvaticus
nane	nane	menthe poivrée	peppermint	mentha piperita
bîberiye	biberiye	romarin	rosemary	rosmarinis officialinus
zaferan	safran	safran	saffron	crocus stavius
gijnîj	kişniş	coriandre	coriander	coriandrum sativum
xaşxaşk	haşhaş	pavot	poppy	papaver
defne	defne	laurier	laurel	laurus nobilus
hêl	kakule	cardamome	cardamom	elettaria cardamomum
zencefil	zencefil	gingembre	ginger	zingiber officinal

darçîn	tarçın	cannelle	cinnamon	cinnamomum ceylanicum
mêxik	karanfil	clou de girofle	clove	eugenia caryophyllata
vanîl	vanilya	vanille	vanilla	vanilla planifolia
reşreşk, hefsûdank	çörek otu	carvi, cumin des prés	caraway seeds	nigella sativa
simaq	sımak	sumac	sumac	rhus cotinus
rihan	reyhan, fesleğen	basilic	basil	ocimum basilicum
catir, cehtirî	mercankök	origan, marjolaine	origan	origanum vulgare
tarxûn	tarhûn	estragon	tarragon	artemisia dracunculus
kurî	kuri	curry	curry	
riha zer, koka zer	hint safranı	curcuma, safran des Indes	curcuma	
pîjinda, şiwît	dere otu	aneth	aneth	anethum
tovxerdel	hardal	moutarde	mustard	
kuncî	susam	sésame	sesame	
zererek	keten	lin	flax	
îsota Kayenê	Kayen biberi	poivre de Cayenne	Cayenne pepper	
xweya lîmonê, lîmondûz	limontozu	acide citrique	citric acid	
bîbera sor	kırmızı biber	paprika	paprika	

Termên siyasî û îdarî

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
komar	cumhuriyet	république	republic
komarî	cumhuriyetçi	républicain, e	republican
sîstema komarî	cumhuriyetçi sistem	système républicain	republican system
komarxwaz	cumhuriyet taraftarı	républicain, partisan de la république	republican, who is in favor of republic
komarparêz	cumhuriyet savunucusu	défenseur de la république	defender of republic
komarperest	koyu cumhuriyetçi	républicain fanatique	fanatic republican
serbajar	başşehir, başkent	capitale	capital
berbajar	banliyö	banlieu	suburbs, outskirts
bergir	savunucu	défenseur	defender
bergirî	savunma	défense	defence
wezareta bergiriyê	savunma bakanlığı	ministère de la défense	ministy of defence
dadmend	adil	juste, équitable	just, fair
dadmendî	adalet	justice, équité	justice, fairness
wezareta dadmendiyê	adalet bakanlığı	ministère de la justice	ministry of justice
guhastin (biguhêze !), l.	ulaştırmak, nakletmek	transporter	to transport, to carry, to move
guhastin, *n.m.*	ulaştırma, nakliye	transport	transportation
wezareta guhastinê	ulaştırma bakanlığı	ministère des transports	ministry of transportation
hîn bûn, fêr bûn, l.	öğrenmek	apprendre	to learn
hîn kirin, fêr kirin	öğretmek	enseigner, instruire	to teach
hînbûn, fêrbûn , n.m.	öğrenme	apprentissage	learning
hînkirin, fêrkirin, n.m.	öğretim, talim	instruction	teaching, training, instruction
hevotin (bihêvoje !), l.	eğitmek, terbiye etmek	éduquer, apprivoiser	to educate, to tame
hevotin, *n.m.*	eğitim	éducation	education
hînkirin û hevotin	talim ve terbiye	instruction et éducation	teaching and education
wezareta hevotina neteweyî	milli eğitim bakanlığı	ministère de l'éducation nationale	ministry of national education
neheviji	terbiyesiz	inéduqué	uneducated
gihandin(bighîne !), l.	yetiştirmek	former	to train
gihandin, *n.m.*	yetiştirme	formation	training
ragihandin, (ragihîne!), 1	iletişim	communication, transmission	communication, transmission
ragihandin, (ragihîne !), l.	iletmek	communiquer, transmettre	to communicate, to transmit
tele-ragihandin *n.m.*	tele-iletişim	télé-comunication	tele-communication
navginên ragihandinê	iletişim araçları	moyens de communication	means of communication

civat	meclis, toplum	assemblée, société	assembly, society
civatkîan civakî	toplumsal, sosyal	social, e	social
civataşaredariyê	belediye meclisi	conseil municipal	town council
encumen	encümen	commission, comité	committee, commission
encumena şaredariyê	belediye encümeni	comité exécutif municipal	town council executive
tax	mahalle	quartier	quarter
awartin(biawêre!), l.	istisna etmek	excepter	to except
awarte	istisnaî	exceptionnel	exceptional
rewşaawarte	istisnaî durum	état d'exception	state of exception
birandin (bibirîne !), l.	yok etmek	exterminer	to exterminate
birandin, *n.m.*	yoketme	extermination	extermination
nijadkujî	soykırım	génocide	genocide
qir, qirkirin	katliam	massacre	massacre, slaughter
hinare	mesaj	message	message
hinartî, şandî, peyk	elçi	envoyé, messager	messenger
darayî,maliye	maliye	finance	finance
wezareta darayiyê, maliyê	maliye bakanlığı	ministère des finances	minstry of finance
endustrî	endüstri	industrie	industry
wezareta endustriyê	endüstri bakanlığı	minstère de l'industrie	minstry of industry
balyoz, sefîr	büyük elçi	ambassadeur	ambassador
balyozxane	elçilik	ambassade	embassy
konsul	konsolos	consul	consul
konsulxane	konsolosluk	consulat	consulate
ataşe	ataşe	attaché	attaché
pispor	uzman, bilirkişi	expert	expert
desthilat	otorite	autorité	authority
karîn, şiyan	iktidar, kudret	pouvoir	power
dengdan	oylama	vote	vote
hilbijartin	seçim	élection	election
hilbijêr	seçmen	électeur	elector, voter
hilbijartî	seçilmiş	élu	elected
bijare	seçkin	distingué	distinguished
namzed	aday	candidat	candidate, applicant
bernamzed	aday adayı	candidat à la canditature	candidate for candidacy
statu	statü	statut	status
referandum	referandum	référendum	referendum

Rastnivîsîna lêkera *BÛN*ê

Ez	im	me
Tu	(y) î	yî
Ew	e	ye
Em	in	ne
Hun	in	ne
Ew	in	ne

Mînak:

Ez	kurd	im
Tu	kurd	î
Ew	kurd	e
Em	kurd	in
Hun	kurd	in
Ew	kurd	in

Lê	Ez	gundî	me
	Tu	gundî	yî
	Ew	gundî	ye
	Em	gundî	ne
	Hun	gundî	ne
	Ew	gundî	ne

Lêkera **bûn**ê mana rewş guhartinê (fransizî : *devenir*, îngilîzî, *to become*) jî dibe û hingê wekî jêrîn tê bi kar anîn :

Ez	dibim
Tu	dibî
Ew	dibe
Em	dibin
Hun	dibin
Ew	dibin

TERMÊN ROJNAMEVANIYÊ

28-30 SÎNG, PÊSÎR	**GÖĞÜS**	**LE THORAX**	**THORAX (CHEST)**
28-29 memik, çiçik	meme	le sein	Breasts
28- sermemik, gupika memikê	meme ucu	le mamelon	nipple
29- xala memikê	ayla	l'aréole	aréola
30- navçiçik, navmemik, sersîng	göğüs	la poitrine	bosom
31- navteng, newq	bel	la taille	waist
32- kêlek	yan, böğür	le flanc	flank (side)
33- qorik, kemax	kalça	le hanche	hip
34- navik	göbek	le nombril	navel
35-37 ZIK	**KARIN**	**L'ABDOMEN** (le ventre)	**ABDOMEN** (stomach)
35- serzik	karın üst bölgesi	l'épigastre	upper abdomen
36- til	alt karın	l'hypogastre	abdomen
37- binzik, zikê piçûk	göbek altı	le bas-ventre	lower abdomen
38-berran	kasık	l'ain	groin
39- berzik, rûv, rêv	ferç, etek	le pubis	pudenda (vulva)
40- qûn, gurmik, tilmiqûn	kıç	la fesse	seat (backside, coll, bottom)
41- qelişteka qûnê	kıç yolu	le sillon, inter fessier	anal groove, anal cleft
42- qurmiçka qûnê	kıç kırışığı	le sillon sous fessier	gluteal fold



43-54 ENDAMÊN, LAŞÎ	**UZUVLAR, KOL VE BACAKLAR**	**LES MEMBRES**	**LIMBS**
43-48 ÇENG, MIL, ÇEPIL, PÎ	**ÜST UZUV**	**LE MEMBRE SUPERIEUR**	**ARM**
43- bend, pazû	kol	le bras	upper arm
44- qurmiçka enîşkê	dirsek kırışığı	le pli du coude	crook of the arm
45- enîşk	dirsek	le coude	elbow
46- zend, bask, bazend	bilek, alt kol, önkol	l'avant-bras	forearm
47- dest	el	main	hand
48- kulm, mist,	yumruk	le poing	fist (clenched clenched hand) fist,girmist
49-54 LING, QOR	**BACAK**	**LE MEMBRE INFÉRIEUR**	**LEG**
49- ran, hêt	bud	la cuisse	thigh
50- çok, jinû	diz	le genou	knee
51- binçok, binjinû	diz altı	le creux poplité	popliteal space
52- çîp, çîm	bacak	la jambe	shank
53- paq, baq	baldır	le mollet	calf
54- pê	ayak	le pied	foot

Lêkerên hevedudanî

(verbes composés)

Amadekar : Rojen BARNAS

Di kurmancî de du cur lêker hene ku ya pêşî lêkerên bingehîn in. Lêkerên bingehîn, besît in ku di gewda lêkerê di halê mesderî (infinitif) de perçeyên dîtir wekî navdêr (ism/substantif), rengdêr (sifet/adjectif), hoker (zerf/adverbe), pronav (zemir/pronom), pêrkît (préfix) an parkît (suffix) tune ne. Gewda lêkerê ya di halê mesder (infinitif) de xwerû ye.

Cura diduyan lêkerên hevedudanî (verbes composés) ne, ku gewda lêkerê bi piranî ji lêkerek û ji pêrkîteke xwerû an ji pêrkîteke hevedudanî, ji navdêrekê, ji rengdêrekê, an ji hokerekê pêk tê.

LÊKERÊN HEVEDUDANİ YÊN

A. Tofa Pêşîn

1. Lêkerên hevedudanî yên ku ji pêrkîteke xwerû û ji lêkerekê pêk tên:

da : dadan, dahatin, daketin, daweşandin, dakirin.
hil : hilanîn, hilavêtin, hilawistin, hildan, hilkirin.
ra : rabûn, rakişandin, rakirin, raxistin.
ve : vebûn, vedan, vejîn, vekirin, vekuştin, veniştin.
vê : vêketin, vêxistin.
we : weşandin.
wer : wergirtin, wergerandin.

2. Lêkerên hevedudanî yên ku ji pêrkîteke hevedudanî û ji lêkerekê çêdibin.

Pêrkîtên hevedudanî

jê = ji + wê/wî
lê = li + wê/wî
pê = bi + wê/wî
tê = di + wê/wî

Herwekî tê dîtinê pêrkîtên hevedudanî ji daçekek û ji pronavek pêk tên.

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ YÊN JI JÊ, LÊ, PÊ, TÊ ÇÊBYÎ:

jê : jêkirin
lê : lêkirin
pê : pê vedan
tê : têderxistin, têgihandin, têgihîştin, têxistin.

Rastnivisîna lêkerên hevedudanî yên ku bi jê, lê pê û tê çêdibin:

a) Di lêkerên mîna jêkirin, lêkirin, têgihîştin ku pêrkîtên wan hevedudanî ne û di laperandinê de ev pêrkît ji hevûdu nabişifin, divê pêkve bêne nivisandin.

Herwekî:

lêkirin (ava kirin, nivîsîn): Min dîwar lêkir.
Min xanî lêkir.
Ez xanî lêdikim.

b) Di lêkerên ku pêrkîtên wan ên hevedudanî di laperandinê de ji hev dibişifin, divê pêrkît ji lêkerê cihê bête nivisandinê.

Herwekî:

bar lê kirin: Min barê xwe li kerê kir.

3. Lêkerên hevedudanî yên ji pêrkîteke navdêrî, rengdêrî an hokerî û ji lêkerekê çêdibin.

Pêrkît herçend wek navdêr/rengdêr an hoker xwiyan bike jî, li vê derê erka wê êdî ne navdêrî/rengdêrî an hokerî ye, lêbelê tiqûtenê pêrkîtbûn e. Ji ber hindê pêrkît jêderka wê ji çi cur gotinê hatibe bila were, bi lêkerê ve tê nivisîn.

P Ê R K Î T A

Lêkera hevedudanî	**hokerî**	**navdêrî**	**rengdêrî**	**lêker**
berdan	ber	-	-	+ dan
berketin*	ber	-	-	+ ketin
çêbûn	-	-	çê	+ bûn
çêkirin	-	-	çê	+ kirin
derkirin	der	-	-	+ kirin
derxistin	der	-	-	+ xistin
girêdan	-	girê(k)	-	+ dan
rêdan	-	rê	-	+ dan
rêkirin**	-	rê	-	+ kirin
rokirin	-	ro	-	+ kirin
rûdan	-	rû	-	+ dan
rûniştin	-	rû	-	+ niştin

* *berketin* lêkereke hevedudanî ye, bi/li ber ketin biwêjeke (tabîr) lêkerî ye.
** rêkirin lêkereke hevedudanî ye, bi rê kirin biwêjeke lêkerî ye.

Xusûsiyetên laperandina lêkerên vê tofê:

a) Di laperandina zemanên fermanî (imperatif), dahatû (futur), bilaniya bûrî (imparfait du subjonctif) û şertê bûrî (conditionel 1ère forme) de; berlêkera bi-nayê bikaranîn.

Herwekî:

Çêke, rabe, lêxe. Ne ku: Çêbike, rabike, lêbixe.
Ezê çêkim, ezê rabim, ezê lêxim.
Min çêkira, ez rabûma, min lêxista.
Minê çêkira, ezê rabûma, minê lêxista.

b) Berlêkera di- wek qaîdeyek gelemper tê ber koka lêkera eslî.

Herwekî:

rabûn

gewda lêkerê	:	rabûn
pêrkît	:	ra
koka lêkerê/ lêkera eslî	:	bûn
paşlêker	:	-n
rabûn	:	ez radibim, ez radibûm.
çêkirin	:	ez çêdikim, min çêdikir.

Lê wek îstisna li hin navçeyên mîna Bişêriyê, Hevêrkan û Torê ev berlêkera di- di pêşiya gewdê de wekî ku lêkereke xwerû be tê bikaranîn.
Herwekî: dirabim, dirabûm, dilêxim.

c) Di laperandina neyînî (négation) ya lêkerên vê tofê de berlêkerên neyîniyê wekî me-, ma-, ne- dikevine navbera pêrkîtê û lêkera eslî.

Herwekî: Ez ranabim, ez ranedibûm, ezê ranebim, ramebe, bila ranebe.

B. Tofa diduyan

Lêkerên hevedudanî yên vê tofê ji navdêrekê an rengdêrekê û ji lêkerekê pêk tên.

1. Navdêr an rengdêr + lêker:

Ava bûn	Ava kirin
Hazir bûn	Hazir kirin
Pîr bûn	
Qaîl bûn	Qaîl kirin
Vala bûn	Vala kirin
Av dan	
Guh dan	
Mikur hatin	
Rast hatin	
Limêj kirin	
Nas kirin	

2. Lêker + navdêr, rengdêr an hoker

Anîn cih
Çûn ava
Dan pey
Ketin pey
Kirin der

Di laperandina (kişandina) teşeyên erînî û neyînî de ya tê laperandine lêker bi xwe ye, perçeyên dinê yên wekî navdêr, rengdêr an hoker nayên laperandinê. Di rastnivîsîna lêkerên hevedudanî de gava lêker bin hêmanên lêkerê ji hevûdu cihê, gava navdêr bin pêkve têne nivîsîn. Herwekî:

Lêker	navdêr
Av dan	avdan
Rast hatin	rasthatin

BIWÊJÊN (TABÎRÊN) LÊKERÎ *(locution verbales)*

Biwêjên lêkerî ji hêmaneke lêkerî çi xwerû an hevedudanî û ji çend hêmanên dinê yên nelêkerî pêk tên. Ev hêman wekî pêşdaçek (préposition), paşdaçek (postposition); pronav, rengdêr an jî navdêr in.

ji lêkerên tabîrî çend numûne:

Biwêja lêkerî	Navdêr
Bin av bûn	binavbûn
Li hev ketin	lihevketin
Bi hev ketin	bihevketin
Li ber xwe ketin	liberxweketin
Hatin ser xwe	
Lê geriyan	lêgerîn
Bi rê ketin	birêketin
Ji hev danîn	
Li ber .....dan	
Dev jê berdan	
Dest pê kirin	
Baweriya xwe (pê) kirin	
Bala xwe dan	
Ji bîr rakirin	
Berê xwe dan	
Dnîn ber hev	

JI KLASÎKÊN KURDÎ

F erhengoka D îwana Cegerxwîn

- I -

Amadekar : Khosrow ABDOLLAHÎ

Di çerçewa bernameya xebata li ser afirandinên klasîkên kurdî em di vê hejmara **Kurmancî** *de ferhengokeke* **Dîwana Cegerxwîn** *belav dikin. Ev ferhengok li ser bingehê Dîwana yekem hatiye pêk anîn. Eslê peyvên ku ne xwerû kurmancî ne di nav kevanekê de hatiye nîsan dan :*

A

Abidar *(f.)* avdar, bi av, pirr bi av; zebeş abidar e; bi av e.
Aheng miqam, melodî
An *(f.)* ew, ewa
Ap mam
Arezû *(f.)* daxwaz, xwezî
Asitan *(f.)* erd, cîh
Ateş *(f.)* agir
Ateşîn *(f.)* agirîn, pirr ji agir
Avanî avahî
Awaz deng, awazê bilûrê:dengê bilûrê
Ayîn rêç, dîn; ayînê Kurdan yê berê zerdeştî bû.

B

Bad ba; bayê havînan pirr gurr nîne.
Badegîr *(f.)* meygir
Balafir firoke, teyare
Barî Xwedê, Barî Teala, *(e.)* xwedêyê mezin
Bazîn bezîn
Başok épervier *(fr.)*
Bedgo (bed gotin), pîsî-bêj, dev-pîs
Bedxwaz xêrnexwaz, pîsîxwaz
Bêgan bêgane: biyanî
Behîv badem *(f.)*, amande *(fr.)*
Behmen 1) navê yekemîn Şahê bine-mala keyaniyan, 2) navê firişteyekê ye di dînê zerdeştî de.
Behram 1) navê serdarekî pirr bi nav û deng ê zemanê Hormozê Çaharan şahê Sasaniyan e. 2) navê stêrkekê ye 3) navê firişteyekê ye di dînê zerdeştî de.
Benc beng, giyayê bengê
Bende kole,
Ber hasil, ber birin serî: hasil kirin
Ber kevir; di ser me de ber dibarin: di ser me kevir dibarin
Berbadî çûn berbad bûn, ji dest çûn
Berberî îxtîlaf, duberekî
Beyaban, biyaban çol
Beşt kêran
Bêmirês bê mirûz, bê sikûm
Bênîn bîn kirin, gulê bibênin : gulê bîn bikin
Bêserî bê xwendan, bê serok û bê rehber
Bêş 1) bac: filan kes hate bêş kirin : bac ji wî hate stendin, 2) maliyat, filan kesê bêşa xwe daye : filan kesê maliyata xwe daye.
Bi hezar rengî bi hezar awayî
Bihuşt bêhişt, cinnet *(e.)*
Bijarte élite *(fr.)*

(e.) : erebî ; *(f.)* : farisî ; *(fr.)* : fransizî ; *(t.)* : tirkî

Bil xeynî, ji bil we: ji xeynî we
Bin-den şeraba binê kûp, den: kûp
Bosîn maç kirin

C

Cam *(f.)* **qedeh** *(e.)* piyana mey vexwarinê ye.
Canbazî can fida kirin, can gorî kirin
Cejne-rojî cejna rojîtiyê, cejna remezanê
Ceng şer
Cengebazî şer û oxilme, şerê bi deng û feng
Ceres *(e.)* zengil
Cewcam *(e.)* zarok
Cewdik meşkeke piçûk e ji bo avê
Cihangîr cihangir
Cihok, ciw coya avê
Ciwanmêr comerd, camêr
Coş *(f.)* kel, av coş hatî : av keliyayî

Ç

Çal bîr, çala avê, çala genim
Çalak jîr, jêhatî
Çeleng jêhatî, jîr
Çendan hewqas, ew çendan rê çû heya westiya: ew hewqasî rê çû...
Çeng *(f.)* harp, haletekî mûsiqiyê ye
Çengal, **çengel** çetel
Çeşm *(f.)* çav
Çikûs dest girtî, mirovekî çekûs : mirovekî dest girtî: dest nevekirî
Çirax *(f.)* çira
Çogan çel, hol

D

Daberizîn êriş kirin, hemle kirin
Dafik kemîn, ew kete dafikê : ew kete kemînê
Dahî *(e.)* pirr jîr, jêhatî
Dehen *(f.)* dev
Dewa *(f.)* derman
Deşnam *(f.)* cinêw, çêr, deşnam dayîn, cinêw dayîn
Dilawer mêrxas
Dilxurt bi tehemûl
Difr, difre xurûr
Dixan *(e.)* dûkel
Diyar *(e.)* cîh, war
Dîbace *(f.)* pêşgotin
Dîdar dîtin
Dîden *(f.)* dîtin
Direfş *(f.)* ala
Dot keç; dotmam : keçmam
Duzex dojeh : doje : cihennem
Dûd *(f.)* dû, dûkel

E

Ebrû - qezeh birû kevan
Ebrû birû
Ehremen, **ehrîmen** Xwedê yê nebaşî û pîsiyê
Ehûramezda Xwedê yê başiyê û qenciyê
Ejder 1) marekî mezinî efsaneyî ye ku agir ji devê wî derdiket,
Em ev, eva
Emro îro
Enguşt *(f.)* tilî
Engûr *(f.)* tirî
Enîroj eniya wê wekî rojê
Erdeşêr, Erdeşîr yekemîn Şahê Xanedana Sasaniyan
Erjen navê yekek ji pirtûkên Manî ê pêxember e ku wênekeşekî bi nav û deng bû jî.
Erqem *(e.)* çîn, neqş
Erx co, kanal
Evor heywanê nêçîrê, gibier *(fr.)*
Eyran Îran, navê îranê yê kewn

F

Fehetkar fedîkar, şermezar
Felat rizgarî
Ferfûr porselen
Ferzîn wezîr e di leyistoka Şetrencê de
Fexregah *(e.)* cîhê ku mirov pê fexrê dike
Feryad *(f.)* qîrîn
Firengî ewropayî
Firing Ewrûpa
Fixan *(f.)* qîrîn
Fort pesn; fortan di xwe dan: pesnê xwe dan; vantardise *(fr.)*

G

Geda parsek
Gedek kurr
Gerdenxwar stûxwar
Gerdûn asiman, kainat *(e.)*
Gerdûş 1) geran: ew çûye gerdûşê: çûye geranê, 2) zivirîn, asiman di gerdûşê de ye: di zivirînê de ye.
Germesûk qumaşê kêm qîmet, kincir
Gêş ref, komik
Girbêj bêjinga bi qulên girtir
Guft gotin, axavtin
Guftego *(s.)* diyalog
Guhreş Kûroş *(f.)*, Şahekî bi nav û deng ji xanedana Hexamenişî ku di 559-530 pêş mîladê li Îranê hukum kiriye Cyrus le Grand *(fr.)*
Gulşen gulzar
Guzar geşt û seyran

H

Heçî darekî du çiqile (Y) ku dixin serê werîs de
Hemdem heval
Hemnişîn *(f.)* hemdem
Hêl, hêle nêçîra bi grûpî; battue *(fr.)*

J

Jan êş, derd

K

Kamiran *(f.)* xweşbext
Kaxik vazoya kulîlkan, pôt *(fr.)* aux fleurs, vase *(fr.)*
Kaşo darê gogê
Kerkere nezan, têgihîştî
Kelax îskelet, squelette *(fr.)*
Kelbeş kerbeş
Keleş rêbirr, eşqiya
Kelxot bê didan, kesekî ku didanên wî ketine
Kenişt *(f.)* dêra cihûyan, sînagog
Kepez cîhê bi gir û girik
Kerx westiyayî, bê hêz, ji hêz ketî
Key keybir, kêreke mezin
Kêşim bejn û bal
Kiçik piçûk
Kîrgo kêroşk
Kopal gurz
Kuca *(f.)* kuder, kîjan der
Kulek yê ku dikule
Kûp û bel bandêva çiyê; pic de montagne *(fr.)*

L

Lacerem *(e.)* bi neçarî
Laf pesnê xwe dan, fort
Lakin *(e.)* lê
Leb *(f.)* lêv
Lebaleb *(f.)* tijî, limlimî
Lem'an *(e.)* pêt, alav
Lîs ciyê ku çûk û teyr xwe lê datînin; perchoire *(fr.)*

M

Mader *(f.)* dê, dayik
Mah *(f.)* hîv
Mahweş *(f.)* mah - hîv, weş wekî, mahweş wek hîvê
Manend *(f.)* wekî
Marmij 1) yê ku jehra mar dimije, 2)kesê bê wijdan kedxurî dike, xelkê dişêlîne.
Matem *(f.)* şîn, reş, matem girtin, reş girtin
Max kêran, 1) traverse, poutre (f.r), 2) ode
Medhoş, medhûş *(f.)* bê hiş ketî, ji xwe ve çûyî, medhoş bûn: ji xwe ve çûyîn
Mend kas bûn, ji hêz ketin
Merdane bi mêrxasî, bi camêrî
Merdî camêrî
Mersef sinî
Mestane *(f.)* bi serxwoşî

Meyger kesê ku di meyxanê de meyê di gerîne, saqî
Meyza kirin mêze kirin, nêrîn
Mêlak kezeb (kezev)
Mijde *(f.)* mizgînî
Mirdal mirdar
Mirdû *(s.)* mirî
Miskar kaniya ava madenî
Mitêl, mitûl lihêf
Mîtan mîntan, kiras
Moxil cureyek bêjingê
Murx *(f.)* mirîşk, teyr, murxê bazî, teyrê bazî
Muxbeçe zarokên ku di zemanê berê de di meyxanan de meygirî dikirin.
Mûdî şûm, bedyûm

N

Nagah *(f.)* nişkave
Nagehan *(f.)* nişkave
Namidar *(f.)* navdar, bi nav û deng
Naqos *(e.)* zengil
Nasazî nesazî
Nasufte *(f.)* qul nekirî
Naşor perçeyê ji rîsê zirav
Nebîrbir kure-fem
Nemerd bêbext, ne camêr
Nepax pifik an tifik a hesinkeran, soufflet *(fr.)*,
Nermî musamaba, tolerance *(fr.)*
Nêrdewan derence, pêlekan
Nêrîz cureke xencer
Nihan nihên, veşartî
Nijdevan rêbirr, rêgir
Nik cem, ba, nik min: cem min, ba; min
Nuxwurî, nûxwirî zaroyê yekemîn

P

Paketeb' *(k+e.)* pak+teb': paqij tînet
Pare *(f.)* pirtî, pare pare bûn, pirtî pirtî bûn
Pargon, pargûn coyeke piçûk e ku li dora kon, çadir an her tiştekî din vedidin, ji bo ku ava baranê neçe hindur.
Parsek kesê ku parsê dike
Parsîw parsû
Paye derece, paya mamostatiyê
Pehlewan mirovekî pirr xurt û bi qewat
Perwane, pervane *(f.)* minminîk, pepûle, pirpirok
Perwa tirs; bê perwa: bê tirs, bê minet
Pesendîde *(f.)* baş, bijartî
Peyam *(f.)* mesaj, wilam
Peyk *(f.)* qasid
Pêlek demek, qasek
Pêrgî berve çûn; ez çûbûm pêrgîya wî: ez ber wî ve çûbûm.
Pêtazî pêxas
Pêyxam *(f.)* mesaj
Pêşrew pêşeng
Pişkoj hebin, bendê ku davêjin serê sing û bi wî kon girêdidin
Polad pola
Pûtxane cîhê pûtan

Q

Qad meydan, cih, erd
Qadûk beroşeke piçûk
Qed û qamet *(e.)* bejn û bal
Qend şekir
Qeraş aşvan
Qerij qirêj, gemar
Qerpal 1) cilên kevn û ji hev ketî, 2) li ser hev û din de kombûn û kevnare bûn
Qerqef surahî, cama şerabê
Qewî *(e.)* xurt, qewîn
Qews û qezeh *(e.)* keskesor
Qirak qijika reş
Qunbere, Qurix stêrkeke ku durust di nîveka havînê de der dikeve û pirr jî bi şemal e.
Qutb *(e.)* serok, ji hemûyan mezintir

R

Rastgo rastbêj
Raz *(f.)* sirr
Reftar *(f.)* tevger, helwest
Reg reh, bê reg: bê reh
Rencber, rêncber zehmetkêş, emekdar
Rewa cayiz
Rêberî rehberî
Ritbe *(e.)* derece, paye
Rîp fêl, hîle
Robar çem
Rojcebîn *(k+e.)* enî ya wê wekî rojê ye
Rux *(f.)* rû
Ruxsar *(f.)* rû, sûret
Rûmah *(f.)* rûyê wê wekî hîvê ye
Rûnpêj tawe, miqilik, rûnbirêşk
Rûro, rûroj ruyê wê wekî kilora rojê ye
Rûsiyahî *(f.)* rûreşî

S

Sade hêsan, hêsayî, besît
Sahibqiran *(e.)* hukumdarê mezin
Sehergahan *(f.)* bi wextê serê sibê
Sehrebaz sêrbaz, cadûbaz
Senc strî yên dara sincê
Seng *(f.)* kevir
Serenguşt *(f.)* serê tiliyê
Serheng *(f.)* mîralay; colonél *(fr.)*
Sersal û nûroj newroz
Serdar serok; généralissime *(fr.)*
Serşok cîhê ku mirov têde serê xwe dişo, banyo *(fr.)*
Seza şerm, e'yb, nebaş, ji bo we pirr seza ye: ji bo we pirr şerm e
Sêwî êtîm, belengaz, bêxwedan
Siyehgûnpoş *(f.)* wekî reş li xwe kirî
Sifirne sîvander
Sikke *(e.)* polik
Siyah *(f.)* reş
Siyahçerd *(f.)* reşolekî
Sîma *(f.)* rû, sûret
Sîwak *(e.)* miswaka erebî ku hecî ji hecê tînin û pê didanên xwe paqij dikin
Stêle beradayî
Surşirîn dilrevîn
Suxen *(f.)* peyv, axavtin
Sûxte *(f.)* şewitî (ji derdan)

Ş

Şadî şahî
Şanî dan nîşan dan
Şax *(s.)* çiya
Şeb *(f.)* şev
Şebnem *(f.)* xunav
Şecaet *(e.)* dilêrî, mêrxasî
Şek derb, şekek lê da, derbek lê da
Şekeramîz *(f.)* şekirdar
Şel şil, nexweşiya şilbûnê
Şekerxend *(f.)* şekir ken
Şewişîn muwazena xwe winda kirin, perdre l'équilibre *(fr.)*
Şewq û tereb *(e.)* şahî û xweşî
Şext şexte, perçe perçe bûn
Şeyda *(f.)* bê tewat, evîndar
Şeyl *(e.)* hal û hereket
Şêrîn dengê kewê nêr gava ku dixwîne
Şêt *(s.)* dîn; şêt bûn: dîn bûn
Şikêr kevirên gir ên li ser hev di çiyan de

T

Tar tarî
Tazî *(f.)* ereb
Taçîk tacîk, faris
Tebeqe *(e.)* qat
Tebîb *(e.)* doxtor, bijîşk
Teblîx *(e.)* reklam, nasandin
Telebkar *(e.+k.)* deynxwaz
Temezî sermala rengîn a ku keç û jin li dora kofiya xwe dialînin an dialandin
Ten beden, laşê mirov
Tenha tenê, bi tenê
Terbûş *(e.)* şaşik
Terş heywanên kedî kirî
Terx bê qusûr, bê 'eyb
Tewizîn têk çûn
Text û pa hukum, seltenet
Teylesan *(e.)* 1) şaşika dora kumê melan, 2) xirx
Têrmal zengîn, dewlemend
Tifaq *(e.)* hevgirtin, yekîtî
Tiral tembel
Tîx *(f.)* keybir, teraşa (cilêta) ku mirov pê rihê xwe diteraşe

Tog bêheya, effrontée *(fr.)*
Tol jina daw ne paqij, jina doxîn sist
Tor û tey tim û tim
Torîk çeqel; chacal *(fr.)*
Tûre, torre *(e.)* bisk, serê biskan

V

Vebestin careke din girêdan
Vejîn, vejiyan vejiyandin, careke din zindî bûn an zindî kirin
Vewestan rawestan
Vîn evîn

W

Waris *(e.)* mîratxwer
Wer eger, heke

X

Xak ax; xaka Kurdistan: axa Kurdistan
Xaltîk xatî, xûşka dayika mirov
Xame *(f.)* qelem, pênûs
Xan û sera koşk û qesr
Xap xapîn, fêl
Xedeng tûreke rast û dirêj ku ji dara gezê dihate çêkirin
Xerîdar *(f.)* muşterî, kiriyar
Xeste *(f.)* 1) nexweş, 2) westiyayî
Xezan *(f.)* payîz
Xeşm *(f.)* hêrs, pertî; brutalité *(fr.)*
Xişt zeng, şîşa ku serê wê tûj e
Xol xwelî
Xubar, Ẍ**ubar** *(f.)* toz
Xuda Xwedê
Xumpare *(f.)* mêrkuj; meurtier *(fr.)*
Xurd *(f.)* xwarin
Xurşîd *(f.)* tav, hetav
Xwedan Xwedî, xweyî, sahib
Xweser 1) otoriter (fr.), despot *(fr.)* 2) otonom
Xweserî 1) otorîtarîzm,despotîzm *(fr.)*, 2) otonomî *(f.)*
Xweşnewaz *(f.)* xweş aheng

Ẍ

Ẍ**ed-dar** *(e.)* zordar, stemkar
Ẍ**emhilgir** *(e.+k.)* kesekî ku xema kesên din dixwe an dikişine
Ẍ**emze** *(e.)* 1) bijang, 2) naz û tîz
Ẍ**emzerim** *(e.+k.)* bijangrim, bijang wekî rimê
Ẍ**erîq** *(e.)* xeniqî
Ẍ**ezeb** *(e.)* hêrs, bela
Ẍ**unce,** Ẍ**unçe** *(f.)* bişkoja gulê

Y

Yadigar *(f.)* diyarî
Yar heval, dost
Yekser hemû, pêkve, têkre
Yeksû *(f.)* 1)yekalî, 2) wekhev
Yexma, yexma *(f.)* talan, yexma kirin, talan kirin
Yexsîr dîl, êsîr
Yezd Gurd şahek ji şahên xanedana Sasaniyan
Yezdan xwedê di dînê Mezdayî de

Z

Zaẍ *(f.)* qijika reş
Zehr *(e.)* gul
Zehr *(f.)* jehr, jar
Zendî zindî, zindû, jîndar
Zinnar *(e.)* kemerbend
Zingar jeng
Zuhd *(e.)* xwe parêziya dînî

Ji pirsgirêkên rêzimanî
Raweya neyînî

Amadekar : Reşo ZÎLAN

Di zaravayê kurmancî de raweya neyînî ya perçeyên axaftinê yên wek bernav, rengdêr, hoker, daçek, navdêr, gihanek, baneşan û hwd bi alîkariya pirtika neyînî ya ne-yê têne çêkirin. Di rewşên holê de pirtika ne-yê serbixwe ye, cihê û bi tena serê xwe têtе nivîsîn. Di raweya neyînîyê de pirtika ne-yê her tim têtе pêşiya parçeya axaftinê ya ku divê bêtе neyînî kirin. Bo nimûne:

Raweya erînî	**Raweya neyînî**
Yê ku ew gotiye, ez im.	Yê ku ew gotiye, ne ez im
Av sar e.	Av ne sar e.
Ma tu sibehî diçî gund?	Ne sibehî, lê dusibehî.
Ev diyariya ji bo min e?	Na, ew ne ji bo te ye.
Ew zeviya han zeviya Dara ye.	Ew zevî ne zeviya Dara ye.
Zîzê weke te kej e.	Zîzê ne weke min, lê weke Fodilê kej e.
Lo, lo!	Ne lo lo, lê lê!

Awarte: Di hin devokên kurmancî de, di rex vî awayê han yê jorîn de, awayekî din yê raweya neyinî jî heye. Heçî ew rawe ye, herwekî hin zaravayên din yên kurdî, bi alîkariya nînê ve têtе çêkirin. Ev gelek caran yan hema bi dû rengdêr, hoker, daçek, navdêr, gihanek, baneşan û hwd re têt yan jî diçe dawiya hevokê. Herwekî pirtika ne-yê, nîne jî peyveke serbixwe ye û cihê û bi tena serê xwe têtе nivîsîn. Bo nimûne:

Lîloz ew nîne.
Av sar nîne.
Ew zevî zeviya Dara nîne.
Lo lo nîne, lêlê ye!
Na, ew ji bo te nîne.
Rojbûna min sibehî nîne, dusibehî ye.
Ew bi şekir nîne.

Lê herwekî emê piştre jî çêl bikin, nîne bi xwe raweya neyînî ya hebûnê ye, ango: nînbûn, tunebûn. Ji lewre jî ew li gor bernavan têtе tewandin.

Neyîniya bi vî awayî, hem di zimanê axaftinê û hem jî bi teybetî di zimanê nivîsandinê de hin tevlihevî û aloziyan tîne pêş. Bo nimûne, heke Kurmancek ji hêla bakurê Kurdistanê bibêje «Konê min nîne.» dê Kurmancek ji hêla Botan, Toriyan, Behdînan û hwd welê têbigihê, ku ew dibêje «Min kon nîne.» ango «Konê min tune ye.».

Ji ber vê têkilhevî û aloziyê, divê em hewil bidin da ku bi kêmanî di zimanê nivîsandinê de vê forma han ya neyîniyê nehêtе bi kar anîn.

RAWEYA NEYÎNÎ YA LÊKERA «BÛN»ê

A. Dema niha

Herwekî ku li jorê jî diyar dibe, pirtika neyînî ya ne-yê her tim têtе pêşiya perçeyên axaftinê yên têvel. Ew her dîsan serbixwe ye. Di hevokan de,

cihê û bi tena serê xwe ye û wilo jî tête nivisîn. Ew li gor bernavan nahête tewandin. Lê herwekî ku li jêrê jî dixuyê, guhartoya devokî her tim li gor bernavan tête tewandin. Di pêkhatineke weha de êdî ew rola lêkereke neyînîkiri dilîze. Wek:

1. Li gor qaideya **bêdeng** - d**engdar** - **bêdeng** (B+D+B):

Raweya erînî	**Raweya neyînî**	**Guhartoya devokî**
Ez cotkar im.	Ez ne cotkar im.	Ez cotkar nînim.
Tu şagirt î.	Tu ne şagirt î.	Tu şagirt nînî.
Ew gavan e.	Ew ne gavan e.	Ew gavan nîne.
Em Kurd in.	Em ne Kurd in.	Em Kurd nînin.
Hûn sazbend in.	Hûn ne sazbend in.	Hûn sazbend nînin.
Ew çûk in.	Ew ne çûk in.	Ew çûk nînin.

2. Li gor qaîdeya **dengdar** - **bêdeng** - **dengdar** (D+B+D):

Ez gundî me.	Ez ne gundî me.	Ez gundî nînim.
Tu bajarî yî.	Tu ne bajarî yî.	Tu bajarî nînî.
Ew rovî ye.	Ew ne rovî ye.	Ew rovî nîne.
Em zane ne.	Em ne zane ne.	Em zane nînin.
Hûn akincî ne.	Hûn ne akincî ne.	Hûn akincî nînin.
Ew çiyayî ne.	Ew ne çiyayî ne.	Ew çiyayî nînin.

Carina hin kes, gava ku forma guhartoya devokî bi kar tînin, wê lêkera tewandî ji hev vediqetînin û wek lêkereke hevedudanî, cihê dinivîsin. Bo nimûne:

1. Li gor qaîdeya **B+D+B**	2. Li gor qeîdeya **D+B+D**
Ez cotkar nîn im.	Ez gundî nîn im.
Tu şagirt nîn î.	Tu bajarî nîn î.
Ew gavan nîn e.	Ew rovî nîn e.
Em Kurd nîn in.	Em zane nîn in.
Hûn sazbend nîn in.	Hûn akincî nîn in.
Ew çûk nîn in.	Ew çiyayî nîn in.

Heçî pirtika *im*, *î*, *e*, û *in* e, mirov dizane ew tewangên lêkera *bûn*-ê ne. Lê heçî pirtika *nîn* e, wek xuya ye, rola pirtika neyînîyê dilîze. Lê bele herwekî ku jê jî darî çav dibe, di guhartoya devokî ya neyînîyê de qaîdeya «D+B+D» derbas nabe. Ango lêkera *bûn*-ê li gor dengdarê berî xwe, yê ku di hevokê de, pêwîstî tewandinê nabe. Ji ber ku nîne bi bêdeng dest pê dike, tewanga lêkera bûnê jî, her li gor qaîdeya «B+D+B»-yê dimîne.

Eşkere ye, ku nîne ji «nebûn»ê têt. Ji nebûnê re, di hin devokên kurmancî de, dibêjin nînbûn... Her çi be, heke ev forma han carina ji ber neçariyê bête bi kar anîn jî, divê pirtika nîn-ê bi lêkera bûn-ê ve bête nivîsîn.

DI DEMÊN LÊKERAN DE RASTNIVÎSÎNA NEYÎNIYÊ

B. Dema pêş

Raweya erînî	**Raweya neyînî**	**Guhartoya devokî**
Ez ê bibim.	Ez ê nebim.	Ez ê nînbim.
Tu ê bibî.	Tu ê nebî.	Tu ê nînbî.
Ew ê bibe.	Ew ê nebe.	Ew ê nînbe.
Em ê bibin.	Em ê nebin.	Em ê nînbîn.
Hûn ê bibin.	Hûn ê nebin.	Hûn ê nînbin.
Ew ê bibin.	Ew ê nebin.	Ew ê nebin.

Li vir, pirsa sereke ya ku ji aliyê rastnivîsînê de derdikeve pêşiya me, ew e: aya em ê pirtika NE-yê, wek li jorê, di gel lêkerê, pêkve binivîsîn? Yan divê em wê, wek li jêrê, cihê û bi tena serê xwe binivîsin? Ango:

Ez ê ne bim.
Tu ê ne bî.
Ew ê ne be.
Em ê ne bin.
Hûn ê ne bin.
Ew ê ne bin.

Têbînî: Herçendî ji aliyê pêkhatina zimanê kurdî de cihê nivîsandina vê pirtikê rastir be jî, ku piraniya zimanên hindoewrûpî welê dinivîsin, di pêk ve nivîsandinê de feyde bêtir e. Sûd û feydeya herî mezin, bê guman ya pedagojîk e. Pêkve nivîsandina pirtika neyînîyê hem di nivîsandin û xwandin, hem di bilêvkirin û hem jî di hînkirinê de hêsanî kû gengaziyên gelekî mezin derdixîne.

C. Dema boriya berdest

Raweya erînî	**Raweya neyînî**
Ez dibûm	nedibûm
Tu dibûyî	nedibûyî
Ew dibû	nedibû
Em/Hûn/Ew dibûn	nedibûn

D. Dema boriya têdeyî

Ez bûm	nebûm
Tu bûyî	nebûyî
Ew bû	nebû
Em/Hûn/Ew bûn	nebûn

E. Dema boriya çîrokî

Ez bûbûm	nebûbûm
Tu bûbûyî	nebûbûyî
Ew bûbû	nebûbû
Em/Hûn/Ew bûbûn	nebûbûn

F. Dema boriya dûdar/sade

Ez bûme	nebûme
Tu bûyî	nebûyî
Ew bûye	nebûye
Em/Hûn/Ew bûne	nebûne

G. a) Reweya hekînî: Dema borî I

Ez bûma	nebûma
Tu bûya(yî)	nebûya(yî)
Ew bûya	nebûya
Em/Hûn/Ew bûna	nebûna

G. b) Dema borî II

Ez ê bibûma	ê nebûma
Tu ê bibûya(yî)	ênebibûya(yî)
Ew ê bibûya	ê nebibûya
Em/Hûn/Ew bibûna	ê nebibûna

H. a) Raweya bilanî: Boriya berdest.

Ez bûbiwam	ne bûbiwam
Tu bûbiwa	ne bûbiwa
Ew bûbiwa	nebûbiwa
Em/Hûn/Ew bûbiwan	nebûbiwan

H. b) Dema niha û pêş I

Ez bibim	nebim
Tu bibî	nebî
Ew bibe	nebe
Em/Hûn/Ew bibin	nebin

H. c) Dema niha û pêş II

Ku ez bim	nebim
Ku tu bî	nebî
Ku ew be	nebe
Ku em/Hûn/Ew bin	nebin

1. Raweya fermanî

a) Yekhejmar	
Bibe! (be!)	nebe !
	mebe !
b) Pirhejmar	
Bibin! (bin!)	nebin !
	mebin !

Têbînî: Di zaravayê kurmancî de du cure raweya fermanî hene. Yek ji wan bi alîkariya pirtika me-yê têtе çêkirin, ya din jî bi alîkariya pirtika ne-yê. Ferqa di navbera wan de ev e: «ME» her tim ferman e û fermaneke miso-ger e. Lê di ne-yê de tawsiye heye. Mixa bin, ku îro li ba hin Kurmancan me bi temamî asîmîle bûye û di şûna wê de bi tenê ne û forma bi wê têtе çêkirin, maye.

LÊKERA «HEBÛN»-Ê

A. Dema niha

Raweya erînî	Raweya neyînî	Lêkera alternatîv
Min heye	min nîne	... min tune
Te heye	te nîne	... te tune
Wî/Wê heye	wî/wê nîne	... wî/wê tune
Me/We/Wan heye	me/we/wan nîne	... me/we/wan tune

B. Dema pêş

Min dê hebe	min dê nînbe	... min dê tune be
Te dê hebe	te dê nînbe	... te dê tune be

C. Dema boriya têdayî

Min hebû	min nebû	... min tune bû
Te hebû	te nebû	... te tune bû

D. Dema boriya çîrokî

Min hebû	min nebû	... min tune bû
Te hebû	te nebû	... te tune bû

E. Dema boriya dûdar

Min hebûye	min nebûye	... min tune bûye
Te hebûye	te nebûye	... te tune ye

F. a) Raweya hekînî; dema borî I

Min hebiwa	min nebiwa	... min tune bûya
Te hebiwa	te nebiwa	... te tune bûya

F. b) Dema borî II

Min dê hebiwa	min dê nebiwa	... min dê tune bûya
Te dê hebiwa	te dê nebiwa	... te de tune bûya

G. a) Raweya bilanî; boriya berdest

Min hebe	min nînbe	... tune be
Te hebe	te nînbe	... tune be

G. b) Dema niha

Min hebe	min nînbe	... min tune be
Te hebe	te nînbe	... te tune be

H. Raweya fermanî

Hebe!	Mebe!
Hebin!	Mebin!

L Ê K E R A «H E Y Î N»Ê

A. Dema niha

Raweya erînî	Raweya neyînî
Ez heme	tune me
Tu heyî	tune yî
Ew heye	tune ye
Em/Hûn/Ew hene	tune ne

B. Dema boriya têdayî

Ez hebûm	tune bûm
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebû	tune bû
Em/Hûn/Ew hebûn	tune bûn

C. Dema boriya dûdar

Ez hebûme	tune bûme
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebûye	tune bûye
Em/Hûn/Ew hebûne	tune bûne

D. Boriya çîrokî

Ez hebûm	tune bûm
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebû	tune bû
Em/Hûn/Ew hebûn	tune bûn

E. Dema pêş

Ez dê hebim	dê tune bim
Tu dê hebî	dê tune bî
Ew dê hebe	dê tune be
Em/Hûn/Ew hebin	dê tune bin

F. a) Reweya hekînî; dema borî I

Ez hebûma	tune bûma
Tu hebûyayî	tune bûyayî
Ew hebûya	tune bûya
Em/Hûn/Ew hebûna	tune bûna

F. b) Dema borî II

Ez dê hebûma	dê tune bûma
Tu dê hebûyayî	dê tune bûyayî
Ew dê hebûya	dê tune bûya
Em/Hûn/Ew hebûna	dê tune bûna

G. a) Raweya bilanî; Boriya berdest

Ez hebûbiwam	tune biwam
Tu hebûbiwa	tune biwa
Ew hebûbiwa	tune biwa
Em/Hûn/Ew hebûbiwan	tune biwan

G. b) Raweya bilanî; Dema niha û pêş

Ez hebim	tune bim
Tu hebî	tune bî
Ew hebe	tune be
Em/Hûn/Ew hebin	tune bin

G. c) Dema niha û pêş II

Ku ez hebim	ku ez tune bim
Ku tu hebî	ku tu tune bî
Ku ew hebe	ku ew tune be
Ku em/hûn/ew hebin	ku em/hûn/ew/ tune bin

H. Raweya fermanî

Hebe!	mebe!
Hebin!	mebin!

RAWEYA NEYÎNÎ YA LÊKERAN

A. Dema niha

Da ku mirov lêkereke ku li gor dema niha hatiye tewandin bike raweya neyînî, divê mirov pirtika di ku pirtika dema niha ya lêkeran e, hilde. Di şûna wê de pirtika neyînî ya na-yê, ku lêker bi bêdengekê dest pê bike, yan jî bi tenê n -yê, ku lêker bi dengdara «a»-yê dest pê bike, bi lêkerê ve binivîse. Bo nimûne:

Lêker	Raweya erînî	Raweya neyînî	Raweya Fermanî Neyînî
Kirin	Ez dikim	nakim	
	Tu dikî	nakî	meke!, neke!
	Ew dike	nake	
	Em/Hûn/Ew	dikin nakin	mekin!, nekin!
Nivîsîn	dinivîse	nanivîse	menivîse!, nenivîse!
Sûtin	disû	nasû	mesû!, nesû!
Jiyan/Jîn	dijî	najî	mejî!, nejî!
Barîn	dibare	nabare	mebare!, nebare!
Qajîn	diqaje	naqaje	meqaje!, neqaje!
Xwarin	dixwe	naxwe	mexwe!, nexwe!
Alastin	dialêse	nalêse	mealêse!, nealêse!
Eşîn	diêşe	naêşe	meêşe!, neêşe!
Iskîn	diîske	naîske	meîske!, neîske!
Orîn	diore	naore	meore!, neore!
Ûrîn	diûre	naûre	meûre!, neûre!
Enirîn	dienire	naenire	meenire!, neenire

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ

Dil şikandin	dil dişkêne	dil naşkêne	dil meşkêne!, dil neşkêne!
Lê xistin	lê dixe	lê naxe	lê mexe!, lê nexe!
Pê şêwirîn	pê dişêwire	pê naşêwire	pê meşêwire!, pê neşêwire!
Jê rijandin	jê dirije	jê narije	jê merije!, jê nerije!
Tê dan	tê dide	tê nade	tê mede!, tê nede!
Vexwarin	vedixwe	venaxwe	vemexwe!, venexwe!
Dadan	dadide	danade	damede!, danede!
Raxistin	radixe	ranaxe	ramexe!,ranexe!
Derketin	derdikeve	dernakeve	dermekeve!, dernekeve!
Wergirtin	werdigire	wernagire	wermegire!, wernegire!
Hilavêtin	hildiavêje	hilnavêje	hilmeavêje!, hilneavêje!

Hin ji Kurmancan, raweya neyînî ya lêkerên bi pêşpirtikên wek bi «ra-, ve-, der-, hil-» û hwd ve hevedudanî ne lê di tewangê de ji hev nahêne veqetandin, her yekser pirtika na-yê bi serê lêkerê ve dinivîsin. Bi vî rengî raweya neyîniyê çê dikin. bo nimûne:

vexwarin	navexwe
raxistin	naraxe
wergirtin	nawergire

Lêkerên wek «karîn» û «zanîn»-ê bi pirtika ni-yê têne neyînî kirin. Wek;

Zanîn	dizane	nizane	mezane, nezane!
Karîn	dikare	nikare	

B. Dema pêş

Raweya neyînî, di gişt demên pêş yên hemû lêkeran de (karîn û zanîn ne têde), her bi alîkariya pirtika «NE»-yê têne çêkirin. Wek;

Lêker	Dem	
Çûn	ez ê	neçim
		neçûma
		neçûbim

C. Dema borî

Hemû lêker, lêkera zanîn û karîn ne têde, di gişt demên borî de bi alîkariya pirtika ne-yê têne neyînî kirin. Bo nimûne;

Kirin	min	nekir
		nedikir
		nekiriye
		nekiribû

TERMÊN HIQÛQÎ

Amadekar : Musa KAVAL

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilizî*
Kes	şahıs	personne	person
Kesane	şahsî	personnel	personal
Kesî	şahıs	personnel	personal
Kesahî	şahsiyet	personnalité	personality
Netewe	ulus	nation	nation
Neteweyî	ulusal	national	national
Neteweyîtî	ulusallık, millilik	carectère national	nationhood
Neteweperwer	ulussever, ulusçu	nationaliste, qui aime sa nation	nationalist
Neteweparêz	ulusçu, milliyetçi	nationaliste, qui défend sa nation	nationalist -
Neteweparêzî	ulusçuluk, milliyetçilik	nationalisme	nationalism
Neteweperest	koyu ulusçu, şöven milliyetçi	chauvin	chauvinistic
Navneteweyî	uluslararası,	international	international
Gelemper	genel	général	general
Bi gelemperî	genellikle, genel olmak	généralement	generally
Gişti	kamu	public	public
Gişti	genel	général	general
Civat	toplum	société	society
Civatî, civakî	toplumsal	social	social
Exlaq, sinc	ahlak	morale, ethique	ethics
Seredan	görüşme	visite	visit
Danberhevî	karşılaştırma	comparaison	comparaison
Dan ber hev	karşılaştırmak	comparer	to compare
Bi dananberhevî	karşılaştırmak	comparé	compared
Peyketin	takib	poursuite	pursuit, prosecution
Dad	adalet	justice	justice
Dadî, qeza	adlî, tûzel	judiciaire	judicial
Hiqûq	hukuk	droit	law
Hiqûqî	hukuksal	juridique	juridical
Qanûn	kanun	loi	law
Hiqûqê neteweyî	ulusal hukuk	droit national	national law
Hiqûqê navneteweyî	uluslararası hukuk	droit international	international law
Hiqûqê gişti	kamu hukuku	droit public	public law
Hiqûqê danberhevî	karşılaşktırmalı hukuk	droit comparé	compared law

hejmar 6 zivistan 1990

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Anatomiya mirov

(dumahîka hejmara 5)

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*înglilizî*
1 - 29 QERQÛDE, SKELET	**ISKELET**	**SQUELETTE**	**SKELETON**
1. kilox	kafatası	crâne	skul
2 - 5 Stûna piştê	bel kemiği	colonne vertébrale, épine dorsale	vertabral column spinal column
movik	omur	vertèbre	vertebra
geh, girêçik	eklem	jointure	joint
2. movikên stû : 7 lib in, ji tevahiya wan re stûkurk tê gotin.	boyun omurları	vertèbres cervicales	cervical vertebra
3.movikên piştê : 7 lib in.	sırt omurları	vertèbres dorsales	dorsal vertebra
4. movikên mazmazkê		vertèbres lombaires	lumbar vertebra
hestiyê kortîxê	sağrı kemiği	sacrum	sacrum
5. kilêjî, hestiyê boçikê	kuyruk kemiği	coccyx	coccyx
6 -7 kembera mil		ceinture scapulaire	shoulder gridle
6. pirika mil	köprücük kemiği	clavicule	clavicle
7. bêrok, pîl	kürek kemiği	omoplate	shoulder blade
8 - 11 sebeta sîng, qefesa sîng, rikeha sîng	göğüs	thorax	thorax
8. depê sîng	göğüs kemiği	sternum	breastbone
9. parsû	kaburga	côte	true rib
10. zirparsû, parsûyên kurt	serbest kaburgalar	côtes flotantes	false ribs
11. kirkirka parsûyê	kaburga kıkırdağı	cartilage costal	costal cartilage
12 - 14 mil, pî, bask, çeng	kol	bras	upper arm
12. lûla pazû	üst kol lülesi	humérus	humerus
13. lûlezenda zirav	döner kemik	radius	radius
14. lûlezenda stûr	dirsek kemiği	cubitus	ulna
15 - 17 dest	el	main	hand
15. hestiyên bazinê (qevdika) dest	bilek kemikleri	carpe	carpus
16. şeyê dest	tarak kemikleri	métacarpe	metacarpal bone
17. hestiyên tiliyan	parmak kemikleri	phalanges du doigt	phalanx
18 - 21 legen, kodik	leğen, havsala	bassin	pelvis
18. hestiyê qorikê, hestiyê kemaxê	kalça kemiği	os iliaque	ilium, hip bone
19. hestiyê qûnê	verek, iskiyon	ischion	ischium
20. hestiyê rûv	kasık kemiği	pubis	pubis
21. hestiyê kortîxê	sağrı kemiği	sacrum	sacrum
22-25. ling	bacak	jambe	leg
22. hestiyê ran, hestiyê hêtê	uyruk kemiği	fémur	femur, high bone

Civîna Stockholmê


Civîna şeşemîn a li ser zaravê kurmancî li Xwendegeha bilind a Biskops Arnö, nêzî bajarê Stokholmê, roja 12ê teşrînê dest pê kir û heya 18ê teşrînê dom kir.

Hevalên ku di vê civînê de beşdar bûn ev bûn: Rojen Barnas (Diyarbekir), Lutfî Baksî (Xerza), Mahmûd Baksî (Xerza), Cemal Batu (Mêrdîn), Xelîl Dihokî (Dihok), Mûsa Kaval (Hekarî), Hazim Kiliç (Hekarî), Kendal Nezan (Diyarbekir), Huner Salim (Akrê), Mehmed Uzun (Swêrek), Reşo Zîlan (Agirî).


Civîn vê carê jî li ser peyvên hiqûqî û yên anatomiya mirov xebitî. Paşê Hazim Kiliç rapora xwe li ser termên ku di çandiniyê de tên bi kar anîn pêşkêş kir. Beşdar bi firehî li ser van peyvan rawestiyan.


Ewê civîna bihara 1990an giraniya xwe bide termînolojiya edebî û kurmanciya nivîskî ya *Hawar* û *Roja Nû*.

KURMANCÎ



23. serçok, serjinû, keşka çokê, çortanok, kasika çokê, kodika çokê	diz kapağı	rotule	patella, kneecap
24. lûlaqa zirav	kamış kemiği	péroné	fibula, splint bone
25. lûlaqa stûr, gîtik, hestiyê birçî	kaval kemiği	tibia	tibia, shin bone
26-29. pê	ayak	pied	foot
26. hestiyên bazinê pê	ayak bileği kemikleri	tarse	tarsus
27. hestiyê paniyê	topuk kemiği	calcanéum	calcaneum, heelbone
28. hestiyên şeyê pê	ayak tarağı kemikleri	métatarse	metatarsus
29. hestiyên pêçiyan	ayak parmağı kemikleri	phalange de l'orteil	phalange
52-63. PÊ	**AYAK**	**PIED**	**FOOT**
pêçî	ayak parmağı	orteil	toe
52. pêçiya beranê, pêçiya mezin	ayak baş parmağı	gros orteil	big toe
53. pêçiya dirêj	orta ayak parmağı	deuxieme orteil	second toe
54. pêçiya navîn		troisième orteil	third toe
55. pêçiya babelîçkê		quatrième orteil	fourth toe
56. pêçiya qilîçkê	küçük ayak parmağı	petit orteil	little toe
57. neynûka pêçiyê	ayak parmağı tırnağı	ongle de l'orteil	toenail
58. girêka pê		éminence de l'articulation	ball of the foot
59. gûzika derve		malléle externe	lateral malleolus
60. gûzika hundir		malléle interne	medial malleolus
61. piştpê	ayak sırtı	dos de pied	dorsum of the foot
62. hevêsa pê, zengiya pê, kefa pê	ayak tabanı	plante de pied	sole of the foot
63. panî	topuk	talon	heel
64-83. DEST	**EL**	**MAIN**	**HAND**
64. tiliya mezin, tiliya beranê	baş parmak	pouce	thumb
65. tiliya nîşandanê	işaret parmağı	ilindex	index finger
66. tiliya navîn, tiliya dirêj	ortak parmak	majeur	middle finger
67. babelîçk, tiliya gustîlkê	yüzük parmağı	annulaire	ring finger
68. qilîçk, tiliya biçûk	küçük parmak	auriculaire	little finger
69.		bord radial de la main	radial side of the hand
70. teniştа dest		bord cubital de la main	ulnar side of the hand
71. hevêsa dest, kefa dest	el ayası	paume	palm of the hand
72-74. xêzikên dest	el çizgileri	lignes de la main	lines of the hand
75. gurçika dest, nermika dest		éminence thénar	ball of the thumb
76. qevdika dest, bazinê dest		poignet	wrist
77. movikên tiliyan		phalange	phaan
78. gûpika tiliyê		pulpe de la phalangette	finger pad
79. sertilî	parmak ucu	bout de doigt	fingertip
80. neynûk	tırnak	ongle	nail
81. spîka neynûkê		lunule	lunule of the nail
82. girêkên dest		noeuds de l'articulation	knuckles
83. piştdest	el sırtı	dos de la main	back of the hand





Termên Çandinî

Amadekar : HazimKILIÇ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
nn. (navê nêr)	eril isim	masculin	masculine
nm. (navê mê)	dişil isim	féminin	feminine
çandin	tarım, ziraat	agriculture	agriculture
çandinî	tarımsal, ziraatsal	agraire, agricole	agrarian, agricultural
ber	ürün	produit	product, fruct
ber hilanîn	ürün almak, ürün kaldırmak	récolter	to harvest
erd, *nm.*	toprak, mülk, arazi	terre, terrain	earth, ground
ax, *nm.*	toprak	sol	soil
hêşinahî, şinkatî, *nn.*	yeşillik, nebat	légume	vegetable
xwelî, *nm.*	kül, toz	poussière, cendre	dust, ask
hêman, *nm.*	unsur, eleman	élément	element
xîz, sîlik, sêlax, rîk, *nm.*	kum	sable	sand
xireber, xîçik, *nm.*	çakıl	gravier	gravel
gil, kîlte, *nm.*	kil	argile	clay
kils, kişil, *nm.*	kireç	chaux	lime
gêç, cixs, cils, cis, *nm.*	alçı	gypse	gypsum, plaster stone
humus, *nm.*	umus	humus	humus
axa bi xîz	kumlu toprak	sol sablonneux	sandy soil
axa bi kîlte	killi toprak	sol argileux	clayey soil
axa bi kils	kireçli toprak	sol calcaire	chalky soil
kêlan, cot kirin, erd ajotin	toprak sürmek	labourer	to plough, to plow, to till
kêlangeh, *nm.*	sürüme ayrılmış toprak	terre de labourage	plowing land
kolan (bikole!)	toprağı kirizma etmek, kazmak	creuser, bêcher	to dig, to turn over (earth)
tov kirin	tohum ekmek	ensemencer, semer	to sow, to seed
mangêr, *nn.*	tırmık, kültivatör	herse	harrow
mangêr kirin	tırmık çekmek	herser, biner	to harrow
binkol, tivrik, *nn.*	çapa	houe, hoyan	hoe, mattock
binkol kirin, tevrik kirin	çapalamak	houer	to hoe
şene, *nn.*	tırmık	râteau	rake
şene kirin	tırmıklamak	enfouir au râteau,	to rake râteler
serav, *nm.*	ilk sulama	premier arrosage d'un jardin	first watering of a garden
serav kirin	ilk sulamak	arroser pour la première fois un jardin	to water for the first time a garden
tov, toxim, *nn.*	tohum	graine, semence	seed
zibil, peyn, *nn.*	gübre	engrais, fumier	manure, dung, fertilizer
ziblê xwezayî, ziblê heywanan	doğal gübre	fumier, engrais naturel	dung, manure
ziblê kîmyayî	kimyasal gübre	engrais chimique	chemical fertilizer
avezibil	gübre şerbeti	engrais liquide, purin	liquid manure
giyazibil	ot gübresi	engrais végétal	vegetal manure
zilq, çirt, zîrç	kuş gübresi	fiente d'oiseaux et de vollaille	droppings of birds
ziblê sar	sığır gübresi	fumier de bovins	cattle dung
ziblê germ	at, eşek, gübresi	fumier de cheval, de mule	horse and donkey dung
pişkil, pişkul , *nn.*	koyun, keçi dışkısı	crotte, crottin	droppings of sheep
rêx, rîx, *nm.*	büyük baş hayvan gübresi	bouse	cow dung, cowpat

Bêr û Mer

Bêr li aliyê rojava û bakur, **mer** li aliyê Hekarê ji bona alatê kolanê tête gotin ku tirkiya wê *"kürek"* e. **Mer** li aliyê rojava û bakur, metirke li aliyê Hekarê ji bona alavê binkolanê tête gotin ku tirkiya wê *"bel, belküreği"* ye.

Çend peyvên din

Di civînê de li ser navên hin giyayên din jî hate axaftin, lê mixabin me nikarî van navan wergerînin zimanên biyanî. Heke ji xwendevanên *Kurmancî* hin kes bi tirkî, erebî, farisî, îngilîzî, fransîzî an rûsiya van navan bizanibin, bira ji kerema xwe re em agahdar bikin.

tûsî,*nm* : giyayek e, li biharê hêşîn dibe, bejna wê qasî du bihustan e, rengê wê morê vekirî ye, pelên wê hûrik û bi dirrî ne, qaçilê wê diqeşêrin û wekî çerez tê xwarin.

baxoxe, *nm* : giyayek ji malbata kerenga ye, serê wê bi pel e, berên wê girover in û wekî pelên wê bi dirrî ne; berên wê tên xwarin, ew bi xwe jî tê qeşartin û xwarin.

bendik, *nm*: giyayek avî ye, biharê wekî tûzikê li ber devê kanî an çeman hêşîn dibe, tama wê nêzî ya bexdenûsê ye.

kûzrek, *nm* : giyayek e, di gulanê de hêşîn dibe û qasî mehekê dijî, pelên wê ji çar pelikan pêk tên, qirna wê di rûn û hêkan de diqewirînin û dixwin.

pêmirîşk, *nm* : giyayek e demî ye, pelên wê wekî piyê mirîşkê ne, qirna wê dikelînin û dixwin.

sping, *nm* : giyayek e, pelên wê zirav û dirêj in û bi xavî wekî çerez tên xwarin, ew bi xwe wekî nîvesêvek e û bi şîr e.

xenclîsk, *nm* : giyayek e, sêvika wê ya binaxê qasî gûzekê ye, rengê sêvikê qehweyî yê tarî ye.

kesil, kospil, fişqî, *nm*	at, eşek, katır gübresi	fiente de cheval, de mule et d'âne	droppings of horse, donkey, etc
ziblê tevlihev, ziblê têkel	karışık gübre	engrais mélangé	mixed dung
giyajeng, *nm*	yabani ot, alınması gereken otlar	mauvaise herbe	weed
ka, *nm*	saman	paille	straw
tenî, *nm*	kurum	suie	soot
herî, celb, *nm*	çamur	boue	mud, slush
bermayî, *nm*	artık	reste, résidu	remaining, residium
ziblê madenî	madeni gübre	engrais minéral	mineral fertilizer
AVDAN	**SULAMA**	**ARROSAGE**	**WATERING IRRIGATION**
derav, qetek,*nm*	su tevzi kanalları, tevzi ağzı	points de distribution de l'eau	water supply points
awayên avdanê	sulama türleri	procédés d'arrosage	watering forms
reşandin (bireşîne!)	serperek sulamak	arroser	to water
awayê deravî	tüm arazi parçalarının enlemesine birden sulanması	arrosage en largeur de toutes les parcelles	watering in breadth all parcels of land
xewnandin, *nm*	dinlendirici sulama, gece sulaması	arrosage de nuit	night watering
destedêr kirin	çabuk sulama	arroser rapidement	to water quickly
avdêr, *n.*	sulamacı	arroseur, arroseuse	sprinkler
KANIYÊN AVDANÊ	**SULAMA KAYNAKLARI**	**SOURCES D'ARROSSAGE**	**WATERING SOURCES**
çem, rûbar, *nm*	dere, ırmak, nehir	ruisseau, rivière, fleuve	stream, river
co, *nm*., cok, *nm.*	kanal, ark	canal	channel
kêfte, lîç, *nm.*	gölet	réservoir d'eau, pièce d'eau, étang	pond
ger, *nm.*	akarsudaki göl kısmı	eaux stagnantes d'une rivière	stagnant waters a river
bîr, *nm.*	kuyu	puits	well
bincan	akarsu üzerinde yapılan sed vasıtasıyla su yükseltilerek araziye su verilmesi	irrigation à partir d'une écluse	irrigation from a look
AMÛRET, ALAV, HACET, ALETÊN ÇANDINÎ	**TARIM ARAÇLARI**	**INSTRUMENTS ARATOIRES**	**AGRICULTURAL INSTRUMENTS, TOOLS**
dirûn (bidirû!),	tahıl ve ot biçmek	moissonner	to harvest
çinîn (biçine !)	biçmek, devşirmek, toplamak	cueillir	to gather, to pick, to pluck
çandin (biçîne!)	ekmek, dikmek	semer, cultiver, planter	to seed, to cultivate, to raise, to grow
gêre, *nm*., xarman, *nm.*	harman dövme	battage de céréales	threshing of corn
daweşandin (daweşîne !)	silkmek, silkelemek	secouer	to shake
dirûngeh,	biçim alanı	aire de moisson	harvest area
bêder kirin, bênder kirin	harmanlamak	battre (les céréales)	to thresh
bêder, coxîn, *nm.*	harman yeri	aire de battage	threshing-floor
cot, *nm.*	karasaban	charrue	plough
cot kirin	çift sürmek	labourer	to plough
hevcar, *nm.*	karasaban gövdesi	le bâti de la charrue	plough frame
nîr, *nm.*	boyunduruk	joug	yoke
gêsin, gîsin, *nm*	saban demiri	soc	ploughshare
mahlû, *nm.*	tırmık, tapan	râteau	rake
mangêr, *nm.*	disk, diskaro		
kotan, *nm.*	pulluk	brabant	all-metal wheel plough
parxêl, *nm.*	öküz, atla toprak üzerinde çekilen kızak	traîneau de transport,	transportation sledge, schlitte timber sledge, dray
makîna dirûnê	biçer makinası	moissonneuse-batteuse	harvester, reaping machine
makina dirûn û gêrê	biçer-döğer makinası	moissonneuse-	combine (harvester)
mîbzer, makîna tovreşanê, *nm.*	tohum ekme makinası	semeuse	drill (for sowing)
patos, *nm.*	döğme makinası	batteuse	thresher, threshing machine
moşene, kam, gam, *nm.*	döğen	batteuse à traction animale	thresher
cercere, cencere, *nm.*	silindir tekerlekli ve döğme makinası silindirleri balta ağızlı	batteuse à roues cylindriques	cylindrical wheel thresher
cendere	pres makinası, sıkıştırma makinası	presse, presse à comprimer	press, pressing machine
AMÛRETÊN GIYA KIŞANDINÊ	**OT TAŞIMA ARAÇLARI**	**MOYENS DE TRANSPORT DU FOIN, TRAÎNEAU**	**HAY TRANSPORTATION MEANS**
garte, *nm.*	kızak	véhicule que l'on traîne sur la neige	sledge, sleigh
qol, *nm.*	kızaksız, yalnız halat üzerinde yapılan ot çekimi	transport du foin sur des câbles	cable transportation of hay

ereba ga	kağnı	char à beufs	oxen cart
dadan (dade!)	1) kaymak, 2) konmak	1) glisser 2) se poser, se percher	1) to slip 2) to settle, to perch
tehisîn, (bitehese!)	gayrı ihtiyari kaymak	glisser involontairement	to slip unintentionally
tehesandin, (bitehesîne!)	kaydırmak	faire glisser	to slide
şemitîn (bişemite!)	kaymak	glisser	to slip
şemitandin (bişemitîne!)	kaydırmak	faire glisser	so slide
xirxal, *nm.*	teker	roue	wheel
firxûn, *nm.*	bir tür at arabası,	charrette à cheval	horse cart
bêr, mer, *nm.*	kürek	pelle	shovel
mer, metirke, *nm.*	bel, belküreği	bêche	spade
tevir, *nm.*	kazma, biri kesici, ağızlı kazma diğeri kazıcı çift	pioche à deux pointes	mathock
tevrik, *nn.*	çapa	houe	hoe
kulling, *nn.*	1) inşaat ve taş çıkarma kazması, 2) manivella,murc	1) pioche, rivelaine, pic à deux pointes 2) manivelle, levier	1) mathock, pickaxe 2) crank, lever
tirmix, *nm.*	tırmık	râteau	rake
melhêb, *nm.*	yaba	fourche	fork, hayfork
meqes, *nm.*	makas	ciseaux	scissors
şeyê dest	el tarağı	peigne	comb
birrek, *nm.,* mişar	bıçkı, destere	scie	saw
çakûç, *nn.*	çekiç	marteau	hammer
sindan, *nn.*	örs	enclume	anvil
das, *nm.*	orak	faucille	sickle
şalok, dasa paleyiyê	biçme orağı	faucille de moissonneur	harvester's sickle
dasa daran	dehre	serpe	billhook
kêlindî, qirim, *nm.,* tirpan	tırpan	faux	scythe
kêlindîkêş, *nn.,* tirpankêş	tırpancı	faucheur	reaper, mower
kêr, *nm.*	bıçak	couteau	knife
kêrik, *nm.*	çakı	couteau de poche	pocket knife
zevî, *nm.*	tarla	champ	field
lat, *nm.*	küçük tarla	portion de champ, petit champ	small field
berxwêr, şeqlîşa, *nm.*	büyük tarla	domaine agricole, latifundium	domain, estate
bax, *nn.*	ağaç bahçesi	verger	orchard
baxçe, *nn.*	sebze, meyve bahçesi	jardin	garden
bostan, bîstan, *nn.*	sebze tarlası yada bahçesi	potager	kitchen garden
parêz, werz, *nn.*	kavun, karpuz tarlası	champ de pastèques et de melons	melon, watermelon field
rez, *nn.*	bağ	vignoble	vineyard
malik, mişar, *nn.*	tarh	rangée d'un jardin	row of a garden
kertik, *nm.*	çeltik evleği	rangée d'une rizière	row, line of a rice field
kerdî, latik, *nm.*	bahçe, bostan evleği	parcelle d'un champ ou d'un jardin	parcel of a field or garden
tixûb, *nn.*	sınır, hudud	frontière	border, boundary
mişkane, *nm.*	rehin, ipotek	gage, hypothèque	mortgage
zeviya xwe bi mişkane dayin	tarlasını hipoteğe vermek	hypothéquer son champ	to mortgage a field
pişkane, *nm.*	müşterek hisseli mülk	propriété indivise, collective	undivided, collective land
nîvekarî, *nm.*	ortakçılık	métayage	sharecropping
givande, *nm.*	topraktan tarla sınırı	tallus de remblai	slope, embankment
hewd, *nn.*	fide tarhı, fidelik	pépinière	seed bed
axesor, *nm.*	kırmızı toprak	terre rouge	red soil
axereş, *nm.*	kara toprak	terre noire	black soil
axeşîn, *nm.*	gri toprak	terre grise	grey soil
kîlte, *nm.*	killi toprak	sol argileux	clayey soil
berespî, *nn.*	kireç taşı	pierre à chaux	clayey stone
tevş, *nn.*	küçük, yassı, sivri ağızlı taş	galet	pebble
helan, *nn.*	yassı, tabaka tabaka oluşmuş taş	dalle	flagstone
reşe, *nn.*	korkuluk	épouvantail	scarecrow
heska hirçê	kepçe şeklindeki korkuluk	épouvantail en forme de louche	bugbear
dexil, tene, *nn.*	tahıl	céréales	cereal, corn
genim, *nn.*	buğday	blé	wheat

şilêl, çexdar, *nn.*	çavdar	seigle	rye
ceh, *nn.*	arpa	orge	barley
garis, *nn.*	darı	millet	millet
genimşamî, gilgil, lazût, *nn.*	mısır	maïs	maize, Indian corn
şûv, şov, *nm.*	nadas	jachère	fallow
adan, *nm.*	besin, gıda	aliment, substance nutritive	food, nutriment
bi adan	besleyici	nutritif	nutritive, nourishing
aşêv kirin, adê kirin (ade)	yabani otlardan ayıklamak	sarcler	to weed(garden), to clean (a field)
fasûlî, lobî, *nn.* (ji latinî phaseolus)	fasulya	haricot	bean
maş, *nn.*	Hint fasulyesi	haricot d'Inde	Indian bean
polik, bezelî, *nn.*	bezelye	petit pois	garden pea
birinc, riz, *nn.*	pirinc	riz	rice
kulind, kulindir, *nn.*	kabak	courge	marrow
dolmik, kulindterk, *nn.*	dolmalık kabak	courgette	courgette
bamye, *nn.*	bamya(y)	gombo	gombo
tirozî, kilyar, ecûr, *nn.*	acur	concombre russe	Russian cucumber
gulberojk, *nm.*	ayçiçeği	tournesol	sunflower
xas, xes, kahû, *nn.*	marul	laitue	lettuce
silk, *nn.*	pancar	bette, poirée	beet
şêlim, *nn.*	şalgam	betterave	beetroot
giyadermank, *nn.*	hekimlikte kullanılan otlar	herbes médicinales	medicinal herbs
qorîngan	kırmızı çiçekli yonca	trèfle rouge	red clover
ketezer	sarı çiçekli yonca türü	trèfle jaune	yellow clover
zil, qeram, *nn.*	kamış	roseau	reed
D A R	**AĞAÇLAR**	**ARBRES**	**TREES**
pejnandin(bipejne!)	budamak	élaguer, émonder	to prune, to trim
kezaxtin(bikezêxe!)	bağ budamak	tailler la vigne	to dress vine
pejik, *nn.*	küçük ve ince dal parçası	branche, brindille	twig, sprig, brushwood
spîndar, hewr, *nm.*	kavak	peuplier	poplar
pelg, *nm.*	titrek kavak	peuplier tremble	aspen
bî, *nm.*	söğüt	saule	willow
şengebî, şorebî, bîşeng	salkım söğüt	saule pleureur	weeping willow
benav	diş budak	frêne	ask (tree, timber)
berû	meşe palamudu	gland	acorn
darberû	meşe ağacı	chêne	oak
mazî	mazı	noix de Galle	oak apple
darmazî	mazı ağacı	varieté de chêne	variety of oak
kevot	akça ağaç	érable	maple
evris, qaç	ardıç	genévrier	juniper
çinar	çınar	platane	plane tree
DARÊN MEYWE	**YEMİŞ AĞAÇLARI**	**ARBRES FRUITIERS**	**FRUIT TREES**
zirişk, qermox, *nm.*	diken üzümü	épine vinette	barberry
dirik, dirîmok, dendûreşk, *nm.*	böğürtlen	mûron	blackberry
şîlank, *nm.*	kuş burnu	églantier	wild rose
findeq, *nm.*	fındık	noisette	hazelnut
gûz, *nm.*	ceviz	noix	walnut
xurme, qesp, *nm.*	hurma	datte	date
gul	gül	rose	rose
sosin	zambak	lys, iris	lily
DAR, nm	**AĞAÇ**	**ARBRE**	**TREE**
reh, *nm.*	kök	racine	root
rîşe, *nm.*	kökçük, ince kök teli	radicelle	radicel, rootlet
qurm, *nm.*	ağaç gövdesi	tronc	trunk
ta, *nm.*	dal	ramification, branche	branch, ramification
şax, *nm.*	küçük dal	rameau	small branch, twig
çeq, çiqil, *nm.*	ince dal	brindille	twig, sprig
ajfiliz, aj	filiz	pousse	sprout
patrome, lûl	aşı	greffe	graft, scion
patrome kirin	ağaç aşılamak	greffer	to graft
goyin, *nm.*	nöbet, sıra	garde, surveillance	guard
goyinger	nöbetçi	gardien, veilleur	keeper, watchmen

TERMÊN HIQÛQÎ

Amadekar : Musa KAVAL

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîz
çavkanî	kaynak	source	source
çavkaniyên	hukukun	les sources	the sources
bêjeya guhêrbar, f.	değişken sözcük	mot variable	inflectional word
bêjeya neguhêrbar, f.	değişmez, değişken olmayan sözcük	mot invariable	unvariable, uninflectional word
bêjeya sade	yalın sözcük	mot simple	simple word
bêjeya hevedudanî	bileşik sözcük	mot composé	compound word
pêşdanî, f.	önek	préfixe	prefix
paşdanî, f.	ardek	suffixe	suffix
eyletbêje, f.	sözcük topluluğu	famille de mots	words family
serbixwe	bağımsız	indépendant	independent
serbixweyî	bağımsızlık	indépendance	independence
piçûkker	küçültücü	diminutif	diminutive
erînî	olumluluk	affirmative	affirmative
neyînî, f.	olumsuzluk	négation, négative	negative
hevedudanî, f.	bileşik	composé	compound
hevmane, f.	eşanlamlı	synonyme	synonymous
hevdeng, m.	eşsesli	homonyme	homonymous
dijmane	karşıt anlamlı	antonyme	antonymous
devkî	sözlü	oral	oral
nivîskî	yazılı	écrit	in writing
nimûne	örnek	exemple	example

rêziman	gramer	grammaire	grammar
rêzimana kurdî	Kürtçe grameri	grammaire kurde	Kurdish grammar
navdêr, m.	isim (grammer)	substantif	noun, substantive
nav, m.	isim	nom	name
serenav, m.	özel isim	nom propre	proper noun
hevenav, m.	cins isim	nom commun	common noun
komenav, m.	nom collectif	topluluk ismi	collective noun
navê hevedudanî, m.	bileşik isim	nom composé	compound noun
jimar	sayı	nombre	number
jimarnav, m.	sayı adı	numéral	numberal
tekane, m.	tekil	singulier	singular
pirane, m.	çoğul	pluriel	plural
zayend, f.	cins	genre	gender
mê, f.	dişil	féminin	feminine
nêr, m.	eril	masculin	masculine
nêtar, f.	nötr	neutre	neuter
nêtari, f.	nötrlük	neutralité	neutrality
rastnivîsîn, f.	imla	orthographe	orthography
spehînivîsîn, f.	güzel yazı yazma sanatı	calligraphie	calligraphy
tof, f.	grup, küme	groupe	group
awa, m.	hal, durum	cas	case
tewandin, f. tewang, f.	büküm	déclinaison	declension
tewandin (bitewîne !)	bükümlemek	décliner	to decline
kes, m.	şahıs	personne	person
kesê yekemîn	birinci şahıs	première personne	first person
kesê duwemîn, m.	ikinci şahıs	deuxième personne	second person
kesê sêyemîn, m.	üçüncü şahıs	troisième personne	third person
rengdêr, f.	sıfat	adjectif	adjective
rengdêra çawahîn, f.	niteleme sıffatı	adjectif qualificatif	qualifing adjective
rengdêra nîşandanê, f.	işaret sıfafı	adjectif démonstratif	demonstrative adjective
rengdêrra jimarîn, f.	sayı sıfatı	adjectif numéral	numeral adjective
rengdêra pirsiyarkî, f.	soru sıfatı	adjectif interrogatif	interrogative adjective
pronav, m.	zamir	pronom	pronoun
pronavê kesîn, m.	şahıs zamiri	pronom personnel	personal pronoun
pronavê pirsiyarkî, m.	işaret zamiri	pronom interrogatif	interrogative pronoun

---

* Di xebatên xwe yên rêzimanî de Mîr K. A. Bedir Xan *dengdar* ji bo *bêdeng* ango bîseda ya farisî [(t) : sessiz, (f) : consonne] bi kar aniye û ji bo *sedadar* a farisî [(t) ünlü, (f) voyelle] jî *dengdêr,* dixebitîne. Ji ber pêşî li tevliheviya navbera *dengdar/dengdêr* bê girtin û ji bo bikarin van mefhuman bi awayekî sadetir bi zarokên kurd bidin hîn kirin, Civîna ziman termên jorîn helbijart.

JI KLASÎKÊN KURDÎ

F erhengoka D îwana C egerxwîn

-II-

Amadekar : Khosrow ABDOLLAHÎ

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilizî*
kulah: kum	külah	bonnet	cap, bonnet
raborî	geçmiş, mazı	passé	past
şax: çiya	dağ	montagne	mountain
diyar: bilindahî	yükseklik	hauteur	height
fexfexe: xwe nepixandin	övünme	pavanement, fanfaronade	strutting about, bragging

devlok: kesê ku dev davêje her kesî	ısırıcı, herkese dil uzatan	qui agresse tout le monde	aggressive towards everyone
lewleb: destikê meşkê: çerxa felekê	felek çarkı	roue de la Fortune	fate
çikûs: tima	cimri	avare	miserly, stingy
mehder: şefaet	şefaat	clémence	clemency, leniency
şebnem: xunav	şebnem	rosée	dew
rekeh: qefes	kafes	cage	cage
qelêr: qilêr, qirêj	kir	saleté, crasse	dirt, filth
lehî: lêwî, laser, sêlav	sel	torrent	torrent
pereng: 1) hevrîşimê pir sor ê ku dibiriqe, 2) bizot	1) kızıl ipek 2) köz	1) soie rouge 2) braise	1) red silk 2) embers
pêkve: bihevre, hemî	birlikte	ensemble	together
kepen: qeyd û zincîr, lele, toq û zincîra giran ku dixin stûyê mehkûman	mahkumların boynuna takılan ağır zincir	chaîne lourde portée au cou par des condamnés	heavy chain put around the neck of prisoners
kortal	uçurum, dipsiz derinlik	abîme	chasm, abyss
xurd, par	pay	lot, part	share
saw: tirsa mezin	dehşet	frayeur, terreur	fright, terror
reş û peş	korkuluk	épouvantail	scarecrow
reş û peş kirin, çav tirsandin	ürkütmek	brandir l'épouvantail	to scare
serpêl: heqîr, bêxîret	ürkek, haksız-lıkları kabul eden, hakir	indigne, vil	vile, infamous
gerdûn: kaînat	evren	univers	universe
xar: kelem	diken	épine	thorn
lewçe: çenebaz	geveze	bavard	talkative
tolaz: jinbaz, çavlider	hovarda	coureur, libertin	womanizer, woman-chaser, libertine
zugurt: 1) bê jin 2) bê mal û bê dirav, bê çare, reben, rahib stembar : yê ku	1) bekar 2) parasız 3) rahib	1) célibataire 2) sans fortune 3) moine	1) bachelor 2) penyless 3) monk
stem û zilm dikşîne	mazlum	opprimé, persécuté	oppressed, persecuted
paçîk: perçeyekî nerm ê piçûk, potik	bez parçası	pièce de toile, de tissu	piece of material, of cloth
şerîpan bûn :	savaşmak	se battre	to figth
bejî : yabanî, ne avî	yabani, sussuz	sauvage (plante)	wild, savage
sîm : zîv	gümüş	argent	silver
dasî : parsûyên masiyan	kılçık	arête d'un poisson	fishbone
noq	dalma	plonger, plongée	dive, diving
noq bûn	dalmak	plonger	to dive
noqar	dalgıç	plongeur	diver
qulebaz : fêlbaz, fenek	üçkağıtçı	intrigant	schemer
jêder : çavkanî	memba	source, origine	source, origin
gerd : mezin, giregir	büyük, eşraf	grand, notable	notable, impressive
tore : edeb, terbiye	terbiye	education	education
bengîn : bi evîna	aşık, tutkulu	amoureux	enamored, passionate lover

kesekî dîn bûn		passionné	
bengînî	tutku	passion	passion
mihrecan	festival,	festival	festival
wefd, *nm*	heyet, delegasyon	délégation	delegation
merbend :	ayaklara vurulan	chaîne mise	ankle chain
qeyda ling	zincir	aux pieds	
qaçûr, qemçûr	hayvan vergisi	impôt prélevé sur le bétail	tax levied on livestock
hêtûn: kûreya kilsê an hesinkeran	demirci ocağı	forge (de forgeron)	blacksmith's forge

— péhlevan: ji gotina îranî pehle, şehir, bajar tê, pehlevan kesê ku bajar diparast, ku mêr û mêrxas bû, jê re digotin. şeraba kamiranî: şeraba bexteweriyê, şeraba ku mirov dighîne miradê xwe
— li hember hev bûn: şerê hev kirin
— bej : erdê bê av, reşahî
— şût : 1) kone, fenek 2) rût, tazî

F erhengok

Reşo ZÎLAN

Kovara kurdî ya bi navê ***Stêr***ê, di navbera salên 1943 - 1945-an de, wek paşkoya (servehî) salane ya rojnameya ***Roja Nû***, li Beyrûtê hatiye çap kirin. Herwekî têtе zanîn, rojnameya ***Roja Nû***, rojnameyeke hefteyî bû û di navbera salên 1943-1946-an de li Beyrûtê dihate weşandin. 73 hejmarên rojnameya ***Roja Nû*** ronahî dîtine. Xwediyê hem ***Roja Nû*** û hem jî ***Stêr***-ê mamostayê payebilind û zaneyê nemir rehmetî Mîr Dr. Kamiran Alî Bedirxan bû.

Li ser hev 3 hejmarên ***Stêr***-ê derketine. Hejmara 1-an di 6.12.1943-yan de, hejmara 2-yan di 28.2.1944-an de û hejmara 3-yan jî di 22.10.1945-an de hatine weşandin. Hemû hejmar di yek mezinahiyê de, ango di formata A3-ê (297x420 mm) de û 4 rûpel in. Kovar bi xwe wênedar e û wêneyên wê reş û spî ne.

Stêr bi xwe, bi kurdiya zaravayê kurmancî ye û herwekî diyar e, bi kurmanciyeke bilind, edebî, spehî û bedew hatiye nitirandin. Heçî mijarên kovarê ne, mijarên giştî û gelemperî ne. Tevî ku mijarên giştî beşeke girîng ya kovarê pêk tînin, tê de nivîsarên zargotinî û edebî jî ne kêm in.

Ferhengoka jêrîn, ferhengokeke pir piçûk ya peyvên nû, yan jî peyvên jibîrçûyî, windabûyî, nadir û kêmpeydabûyî ne. Ji bilî vê, me peyvên ku ji aliyê rastnivîsîna zaravayê kurmancî de girîngiyekê berpêş dikin jî êxistine ferhengokê. Me li beramber peyvên holê bi tenê «*Rastnivîsîn!*» daniye û bi vî awayî xwastiye bala xwendevanan bikişînin.

Mirarî: mirwarî, durr, lû'lû'; kevirekî rengsedef û giranbiha ye. (t) *inci* (f) *perle* (e) *pearl*
Çarnikar: çarkenar, çarmedor, çaralî, çarhêl, çarhawêl, çarrex
Kû der: *rastnivîsîn!*
(Bi şewq û) **bîn**: (bi şewq û) bînîn
Şanî dan: nîşan dan, nimandin, raber kirin
Pêş kirin: nîşan dan, nimandin, raber kirin
Pevregirêdayî: yekker, yekpare, bihevregirêdayî
(Ev mezinên) **he**: (ev mezinên) han
Sermiyan: = semyan: serek
Dirêjî (neyaran) **bike**: êrişî (neyaran) bike
(Bi hêvî û) **niyaz**: (bi hêvî û) lava
Bi hafa (yekî ketin): bi diyarî (yekî ketin)
Nazenîn: nazdar
Şaristan: 1. welat 2. bajar, şar, şehr
Derêxistin: derxistin
Bend: meqale
Nivîsevan: nivîser, kesê xwedî jêhatin û qabiliyet ku dikare bend yan jî pirtûkan binivîse. Heçî peyva «nivîskar» e, ne bi vê maneyê ye. Ew bi maneya kesê ku şol û karê wî nivîsandin e, bi karê nivîsînê ve bilî dibe, ango sekreter yên ku di nivîsgeh û buroyekê de kar dikin.
Sername: sernivîs, navê bendê
Xebatker: kedkar
Xwe kar kirin: xwe amade kirin
(Çek û) **posat**: (çek û) techîzat
Qirên: şer, pevçûn

Gerandin: bi rê ve birin, îdare kirin
Berberî: şer û neyarî
Bergeh: 1. dîmen, menzere 2. horîzont, aso, ûfiq 3. perspektîv 4. menzîl, mesafe
Gerew: barimte, rehîne
Kûrahî: *rastnivîsîn!*
Lê hûr nêrîn: lê hûr bûn, bi hûr û kûrahî li dabaşekê nihêrîn û ew ders kirin.
Pêşçavan kirin: nîşan dan, nimandin, raber kirin
Gerînende: serkar, mudir
Mirovdewlet: mirovên xwedî zanyariyên dewletbirêvebirinê
Çîrêdestî: berhema destên hunermendekî
Mermertiraş: kesê ku mermeran ditiraşe û jê tiştekî diafirîne
Nûve: îcad, tiştên nû hatine dîtin û îcad kirin
Nûvekar: mûcîd, kesê ku tiştekî nû îcad kiriye
Kûrerastî: rastî û heqîqetên kûr
Bilindtir: *rastnivîsîn!*
û h.w.d.: Û her wekî din, û hwd
Destnîgar: resam
Nîgarandin/nîgarîn: resim kirin
Qesirbend: koşkbend, kesê ku ji avakirina koşkan beşer dike
Avahîgeh: cîhê ku avahî lê hene
Zîz: hesas
Hişyar: *rastnivîsîn!*
Ev pênc sal in: *rastnivîsîn!*
Papor: Keştiyên ku bi buxarê dixebitin
Çelê erbîniyê: = çelê 'erbe'îniyê: çelê erebî, çelê giran
Perde vegirtin: perde kişandina di navbera du tiştan de
Xame: qelem
Daketin erdê: danîn erdê (ji bo çûk û balafiran)
Mamoste: dersdar, mu'elim
Hevalbend: mutefîq
Pereyên xwe: *rastnivîsîn!*
Niha: *rastnivîsîn!*
Dot: keç
Lewitîn: pîs bûn
Xwe bera avê da: xwe berda avê, xwe avêt avê
Qîrker: telal. *«Agir ket mala qîrker, kesî bawer nekir».*
Arî: Xweliya şewitî. *«Ariya ber tifika xwe nadim birinca xelkê».*
Topên balafirşikên: ew celeb çek e ku mirov pê şerê balafiran dike û wan dide erdê.
Pertaw: = pertew, perto: tîrêj
Hawîr: komek kesên ku bi eynî pirs û babetê ve mijûl dibin.
Çandinî: ziraet
Devî: devîçirk, tûm, kem, kurs,darkolik, teraş, dirî, hejik, pûte
Ber pê diçû: ber bi wî diçû
Weşînek: weşandina bernameyekê bi riya radyo yan jî televîzyonê
Civangeh: cîhê ku mirov civanê dide hev û hevûdu lê dibîne, cîhê civanê, cîhê randevûyê, cîhê hevûdu dîtinê
Serhoste: hosteyê ku serektiya hosteyan dike û serekê wan e.
Hostekar: hoste
Bihingeh: cîhê ku mirov xwe lê vedihesîne û îstirehet dike.
Dagerîn: vegerîn
Şikênandin: şikinandin, şehandin, şeh kirin
Nesaxî: nexweşî
Pengav: cîhê ku av tê de pengiviye
Xarê mîhan: keriyê mîhan
Boşê dewan: keriyê hêştiran, keriyê deveyan
Nijdeyê hespan: keriyê hespan
Berxurdar: pardar, behredar
Hatinên erdê: dahatên erdê.

F E R H E N G O K A

Memê Alan

Amadekar : Mehmed UZUN

kurdî	*tirkî*	*fransızî*	*îngilîzî*
mifte, kilît	anahtar	clé	key
bergîr, hespe baran	beygir	cheval de trait, cheval de labour	packhorse
xezîne, defîne, gencîne	hazine	trésor	treasure
sûk, çarşî, bazar	çarşı, bazar	marché	market
havîngeh	yazlık konut	résidence d'été, lieu d'estivage	summer residence, holiday resort cattle's summering area
mîrasxwar, mîratxwir	mirasçı	héritier	heir
haşer û maşer : roja qiyametê	kıyamet günü	jour du Jugement Dernier	Last Judgement Day

xulîn : dengê avê	su sesi	murmure de l'eau	murmur
delîlê heyiriyan : rêberê bêçareyan	çaresizlerin rehberi	guide des infortunés	guide of the wretched
dehiye : qurban	kurban	sacrifice, victime	sacrifice, victim
hermet : xanim	hanım	dame	lady
tenbî : qewîtî	tembih	recommandation, avertissement	recommendation warning
şalûl	baştankara	mésange	tit (mouse)
qonax : menzîl	mesafe, konak	étape, relais	stop, stopping place
kokim : kal	yaşlı	vieux, vieillard	old
galegot : şayia	söylenti	rumeur	rumour
kuriyê behre : caniyê kûvî yê behrê	denizaltı	hippocampe	hippocampus
serac : kesê ku zînan çêdike	saraç	sellier	saddler
çîn : neqş	nakış işleme	broderie, ornement	embroidery, ornament
şewla rojê : tîrêja roja	güneş ışını	rayon de soleil	ray
lîwan : hesinê gemê	gem	mors	bit
lewend : bedew û bi bejn û bal	yakışıklı	beau, élancé, de belle allure	beautiful, slender, good-looking
perwaz : fir	uçuş, uçma	vol	flight
wexm : bîhna nexweş, wexmê miriyan	kötü koku, ölü kokusu	odeur de putréfaction, puanteur	stink, stench
çêlikê şêran : têjikê şêran	aslan yavrusu	lionceau	lion cub
stêle : musteheq, layiq	layık	digne	worthy of, deserving
avaker	imar eden, mimar	batisseur	builder
ferş : teht	döşeme taşı	dalle de pierre	stone slab
simsimî	benekli	tacheté, tavelé	spotted, dotted, speckled, packmarked
mêrkuj	katil	assassin	assassin, murderer
navkêl	bel	reins	kidneys
gûş, goşe	köşe	coin, angle	corner
sergewer : malmezin, torin	asilzade	noble	noble
hênijîn	uyuklamak	somnoler, s'assoupir	to doze, to snooze, to feel drowsy
perwa : tirs	korku	peur	fear
bêperwa	korkusuz	intrépide, preux	intrepid, valiant
dilketî	aşık	amoureux	in love, person in love
kir, kirin	eylem	acte, action	act, action
tem	niyet, arzu	désir, intention	desire, wish, intention
tem kirin	niyet etmek, arzu etmek	désirer, avoir l'intention de	to desire, to wish, to intend to
lezgîn	çevik	agile, leste, alerte	agile, nimble, alert
binanî ; devê tûjê şûr	kılıcın keskin ağzı	le fil de l'épée	the edge of the sword
qonç : boçik	potinin çekilen uzantısı	la tige de la botte	boot's let
pêda pêda : berebere,peyderpey	peyderpey, giderek	petit à petit,progresivement	little by little, progressively
eylo	kartal	aigle	eagle
çilka baranê : dilopa baranê	yağmur damlası	goute de pluie	rain's drop
şapik	pantalon	pantalon	trousers, pants
gengaz : hêsan	kolay	facile	easy
rivên : rivîn, pêtî	alev	flamme	flame
şadimanî, şahî	sevinç, şenlik	joie, liesse, fête	joy, jubilation, celebration
kok : xeml, xweçêkirin	süsleme	toilette, maquillage	toilet, make-up
xwe kok kirin	süslenmek, güzelleşmek	se faire beau, se maquiller	to get spruced, to make-up
talaz : toz	toz	poussière, détritus	dust, rubbish, refuse
berger : kesê ku li ber digere	rica eden, yalvaran	suppliant	supplicant
reml, fal	fal	bonne aventure	fortune
remldar: kesê ku remlê davêje	falcı	diseur de bonne aventure	fortune-teller
keviya avê : kenarê avê	su kenarı, sahil	le bord de l'eau	water's edge

avan	yardakçı	courtisan, flagorneur	flatterer, fawner
serdilk	aziz, sevgili	favorite, chérie	favorite, beloved, cherished
girgîn	azgın, öfkeli	furieux, emporté	furious, hot-tempered
liyan	zayıf, acılı	faible, meurtri	weak, wounded
bodek, ehmeq	budala	idiot, stupide	idiot, stupid
gurr : gef û gurr	tehdîd	menace	menace, threat
gef û gurr dan	tehdit etmek	menacer	to threaten
ebeboz : pêxwas	lumpen	voyou	hoodlum, hooligan
ababelek : fesad	fesatçı	intrigant	scheming
hêl : qewet, hêz	güç	force, puissance	strength, power
bi hêl, bi qewet	güçlü	puissant, fort	powerful, strong
ji hêl ketin	bitkin düşmek	être à bout de force	to be exhausted, to be at the end of one's tether
mehfûr	halı	tapis	carpet
pêrçenk : şevşevok	yarasa	chauve-souris	bat
hişmetkar : heyran	hayran	admiratif	admiring
hişmetkar mayin	hayran kalmak	être admiratif, admirer	to admire
bêtar: gelek zêde, felaket	fazla, haddinden fazla	excessivement, terriblement	excessively, terribly
meqet : mînder	minder	coussin	cushion
kelîşo : cilşo	çamaşırcı	laveuse, femme qui fait la lessive	washerwoman
mihrîvanî : dilovanî	şefkat, muhabet	tendresse, affection, clémence	tenderness, affection, clemency
bijî	yele	crinière	mane
bijiyê şêran	aslan yelesi	crinière du lion	lion's mane
mekarî : dek, fêl	hile	ruse, intrigue	guile, trickery
tiling : dêl	kancık	chienne (insulte)	bitch
dûşk : diş	baldiz	belle-sœur	sister in law
dimik : serê nikil	gaga ucu	le bout du bec	tip of beak
xewle	tenha	isolé, à part, aparté	aside
xewle kirn	özel görüşmek	faire un aparté	to have a private talk
meterîs : sîper, çeper, kozik	siper	tranchée	trench
lek	10.000	10.000	10,000
derbest, çardar	sedye	brancard	stretcher, shaft
kuşim	alay	moquerie	mockery
li kesekî kuşim kirin	biriyle alay etmek	se moquer de quelqu'un	to make fun of s.o.
seypisan : kuçikbav	köpekoğlu	fils de chienne	son of a bitch
pabûsî : pê maç kirin	ayak öpme	baisser le pied	to kiss the feet
pêlepaş : berepaş	geri geri gitmek	à reculons	backwards
lehîzvan, lîstikvan	oyuncu	joueur	player
şetrenc : kişik	satranc	échec	chess
segman : nîşangirê baş	nişancı	bon tireur	good shot
peya, peyar	piyon	pion (échecs)	pawn
kiş	mat	échec et mat	checkmate

hufefuf : dengê pelan
çîrkeçîrk : dengê ben û şirîtan
gulabdîn : xemla zerîn a ku bi şiklê gul de hatine neqşandin
berbejn : nivişta ku bi dirêjahiya xwe qasî bejna kesê ku dixwazin ji nezerê biparêzin, li serê ayet ten nivîsîn, dipêçin dikin nav hicabeke ji şima û paşiyê dixin stûye xwe.
merbend: hesinê li lingekî hespê dixin û bi singekî ve girêdidin
qeyd : hesinê ku pe herdu lingen hespê bi hev re girê didin.
tûk û gulmit : qaçil û girêk (ê darekî)
serhevde : pozdaxî, eyba kesekî ku dikarin bidin rûyê merivek wî
berkiş : di şetrencê de derba berê kişê
ferzîn : di şetrencê de wezîr

hejmar 10 zivistan 1992

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

mirîşk

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
nikil, nikul, gepik, gulpik	gaga	bec	beak
berkurk, dengik, qelpeçîçik	kursak	jabot	crop
kofî	hotoz	crête	crest
hûrik	taşlık	gésier	gizzard
bask, çeng per	kanat	aile	wing
hêt	bud	cuisse	leg, thigh
çîp	bacak	jambe, mollet	leg,calf
naperûşk	tırmık, pençe	griffe	claw
perik, sîx	telmek	penne	large feather
pûrt	tüy	duvet	down
elok, şamî, elo-elo, hulî, cilûx, eloşîş	hindi	dinde	turkey
kevok	güvercin	colombe, pigeon	dove, pigeon
lîs lûs	tünek	perchoir	roost
lîsin	tünemek	se percher	to perch
borangeh	guvercinlik	pigeonnier, colombier	pigeon house, dovecot
hêlîn	yuva	nid	nest
çêlik	yeni doğan guvercin yavrusu	nouveau-né d'un pigeon	new born of pigeon
ferx	genç güvercin	pigeonneau	young pigeon
kox, lîs pînik, holik	kümes	basse-cour	farm yard, poultry
motik	fol	œuf à couver	egg for brooding, nets egg
pûngal	folluk	pondoir	
çêlik, çêçik	civciv	poussin	chick
cûcik	civciv	poussin	chick
çêt, şelûvk	genç horoz	coquelet	cockerel
varik	piliç	poulet, poulette	chicken
mifi,sk	tavuk	poule	hen
dîk dîkil kele,sêr	horoz	coq	cock, rooster
mirîşka avî	su tavuğu	poule d'eau	moorhen
mirîşka kurk	kuluçka tavuk	couveuse	sitter, brooder
qaz	kaz	oie	goose
werdek, miravî	ördek	canard	duck

mê	nêr
cûcik	cûcik
varik	çêt, şelûvk
mirîşk , tûtik	dîk, dîkil, keleşêr.

Civîna payîza 1991an

Civîna dehemîn a li ser zimanê kurdî, zaravayê kurmancî, ji 20 ta 26ê meha çiriyê, li Swêdê, li xwendegeha bilind a Biskops Arnöyê civiya. Civîn giraniya xebatên xwe da ser lêgerîna termên rêzimanî, hiqûqî û coxrafî. Lênerîna peyvên klasîkên kurdî, ku timî di bernameya civînên ziman de ye, vê carê bi ferhengokên *Sirr-ul-Mahşer* a Feqî Reşîdê Hekarî, *Dîwana Duwem* a Cegerxwîn, kovarên *Ronahî* û *Roja Nû* dom kir. Beşdarên civînê li ser hin peyvên kêmnas ên jiyana rojane jî xebitîn. Em encamên van xebatan di vê hejmarê de tevî sûretek mirîşkê, ku di hejmara berê de baş derneketibû, belav dikin.

Hevalên ku beşdarî civîna payîza 1991an bûn ev in: Khosrow Abdollahî (Selmas), Mahmûd Baksî (Xerza), Rojen Barnas (Diyarbekir), Lufti Baski (Xerza), Muzaffer Begzade (Şikakan), Huseyin Kurdo (Amûd), Hemîd Kiliçaslan* (Mêrdîn), Kendal Nezan (Diyarbakir), Zinar Soran (Mêrdîn), Mehmed Uzun (Siwêrek), Veysi Zeydanlî (Bedlîs), Reşo Zîlan (Agirî), Zeynelabidîn Zinar (Batman) û Elî Şer (Wan).

* *Kek Hemîd Kiliçaslan di civîna biharê de amade bû, anvê wî bi xeletî di hejmara berê de hatiye ji bîr kirin.*

Heywanên nav malê

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN


1 - Kevok:

cîh: lûs, lîs, borangeh, hêlîn

zêdebûn: hêkan dikin, ji sê hêkan du çêlik çêdibin. teqrîben her meh kurk dikevin.

çêlik: (t) güvercin yavrusu, (f) nouveau-né d'un pigenneau

ferx: (t) genç güvercin, (f) pigeonneau, (e) young pigeon



kevok: (t) güvercin, (f) pigeon, colombe, (e) dove, pigeon
rengê wan: birdikî, reş, şîn, sipî, sor, kewik, kevok li gora rengê xe tê bi nav kirin.
kevoka kedî: mê
kevok: nêr, yan jî kevokê nêr.

2- Mirîşk, Tûtik:
cîh: lûs, kox, pînik, holik
zêdebûn: hêkan dikin, salê du caran *diqerimin.* qurp, qup, kurk, dikevin.
motik: hêka di pînê de dimîne û mirîşk li ser dilûsin, hêk dikin.
pûngal (t) folluk (f) pondoir.
çêlik/çêçik: sê hefte, 21 rojî li ser hêkên xwe diqerimin.
varik: çêlika ku êdî xuya ye nêr e.
ferx/fêrik: fêrxikê dîkan.
mirîşk/sere: dîk, keleşêr.
rengê wan: sor, sipî, reş, birdikî, kewik.
şiklê wan: bi kofî, bi derpê, geraze, qoqo.

3- Elok, Şamî, Elo-Elo, Hulî, Çûlix, Eloşîş:
cîh: pîna taybetî, li ser bana dilîsin.
nêr: dîkê şamiya
zêdebûn: wek mirîşka salê du caran diqerimin.
xîlik: zêdegoştê di ser nikilê wan re ye
rengê wan: her wekî mirîşkan li gora rengê xwe tên bi nav kirin. 4 heftan li ser hêkê xwe diqerimin.

4- Qaz-Werdek:
cîh: di koxên xaniyan de kurk dikevin
zêdebûn: hêkan dikin. 4 heftan li ser hêkan dimînin.
rengê wan: reş û sipî ne. Wek mirîşk û elokan perikê wan bi qîmet in.

5- Se, Seg, Kûçik:
cîh: sergo, berderî, vedikevî, nav deyên ûş (mixiltên), kadîn.
zêdebûn: diteliqin.
mê: dêl, dêlik, dêlese
nêr: seg, se
cewrik: (t) it yavrusu, (f) chiot, (e) puppy,
a mê tê teleb an bi ba ye.
ê nêr li ser dêlikê çavsorî dibe.

6- Tajî (jên nêçîrê)**:** (slugî)
kûçik+tajî: toltajî ye.
bocîk: (t) fino köpeği, (f) caniche, (e) poodle
seyê şivanan: (t) çoban köpeği (f) chien de berger, (e) sheepdog

7- Pisîk:
cîh: şirîkê malê ye. Ser/bin kulînê, kadîn, nav nivîna, ber tifikê û ber sobê ye.
zêdebûn: dizê, zayîn.
çêlik: pisîkê nêr û pisîka me.
xwarina wan: goşt, hestî, mast û şir.
di meha sibat û adarê de gonê wan e.
têjî (t) kedi yavrusu, (f) chaton
hatin gonan: (f) être en chaleur
nirnewr bû: (f) être en rut


8- Kergo, Kîroşk:
cîh: kun, qul
zêdebûn: dizên, çêlikan tûnin.
xwarin: gîha, heşinayî, gizêr, ceh, genim.
gon dixwin wek pisîka. Her meh çêlikan tûnin.
rengê wan: sor, sipî, reş û belek û cûn in.
Goştê kîroşkan tê xwarin.
Ji çêlikên kîroşkan re hin kes *xirnik* dibêjin.


Lawirên kedî

nav	bankirin	qewirandin	werkî din
mirîşk	tû tû, tû tû	kiş, kiş	qirte qirt
dîk	elo, elo, elo,	kiş elo	wîtiwît
kêroşk	wek banga berxa		cîztecîzt
kew			qebeqeb
kûçik	kûçî, kûçî, kûtî, kûtî	tîdî dî dî	nûzenûz
ker	tişî tşî, tşo	ço, mîrat, ço ço	zirezir
dahşik	kurr, kurr		
çêlek	te'e, te'e çêlê, piçê piçê	hohê çêlê	orîn, borîn
hesp	tivrş	dah, deh	hîre hîr

DENGÊ LAWIRWÊN KEDÎ

mirîşk	qirte qurit, qîje qij	qîjîn
kew	qeb û qeb, pirte pirt	xwendin
kurk	qurp e qurp, sîr e şir	qurpîn
kûçik	dereyi	reyîn
ker	dizirî, zirte zirt	zirîn
hesp	di şîhî, herte hirt	şehîn
kiroşk	dikin çîzîn, çiztecizt	





Termên coxrafî

Amadekar Elîşêr

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
34 - devera çiyayî	dağlık yöre	moyenne montagne	mountainous area
35 - serê gir	dağ tepesi	dôme montagneux	rounded mountain top
36 - pişta çiyê, gaz, milê çiyê	sırt	crête (de montagne)	mountain ridge (ridge)
37 - berpala çiyê	dağ yamacı	versant	mountain slope
38 - kaniya çiyê, çavik	dağ, yapaç pınar	source à flanc de coteau	hillside spring
39 -47- devera çiyayê bilind	yüksek dağ yöresi	région de haute montagne	high-mountain region
39- zencireçiya	sıradağ	chaîne de montagnes, massif	mountain range, massif
40 - sertar, kop, gupika çiyê, qot	doruk	pic,cîme	summit (peak, top of mountain)
41 - sermilk	sırt	épaulement rocheux	shoulder
42 - zîn	eyer, semer	selle	saddle
43 - ruyê zinar	kayalık cephe	paroi raide, abrupte	rock face (steep face)
44 - tîşik, şûştek	dere, derecik	couloir	gully
45 - şikêr	moloz, yığıntı, döküntü	talus d'éboulis	talus (scree, detritus)
46 - şiverê	patika	sentier muletier	bridle path
47 - gewn, zixur	dağ geçiti, boğaz	défilé (col)	pass (col)
48 - 56 qeşahî	buzul	glacier	glacial ice, glacier
48 - raxa qeşahiyê	buzul yatağı	névé	firn field (firn basin, nevé)
49 - dola qeşahiyê	buzul deresi, buzul vadisi	glacier de vallée	valley glacier
50- qelîştek	yarık	crevasse de glacier	crevasse
51 - çaviya qeşahiyê	buzul deresi gözü	arche (porte) de glacier	glacier snout
52 - ava qeşatiyê	buzul akıntısı, buzul deresi	torrent glaciaire	subglacial stream
53 - pangorê kêlekê	yan buzul taşı	moraine latérale	lateral moraine
54 - pangorê navîn	orta buzul taşı	moraine médiale	medial moraine
55 - pangorê dawîn	son buzul taşı	moraine terminale	end moraine
56 - tehtê qeşahiyê	buzul masası	table de glacier	glacier table

PEYVÊN ADET Û RUSÛMATÊ EL EKRAD

Mela Mahmud Beyazîdî

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
zome	oba	camp, campement	camp, encampment
salixdan	tanımlamak, tarif etmek, izah etmek	décrire, expliquer	to describe, to explain
hêşî	çadır alanı	aire, superficie d'une tente plantée	surface covered by a pitched tent
qerewal	gözcü, nobet, karavil	garde, sentinelle,	watchman, sentry
lixab	gem	mors	bit
konstûn (stûnkon)	çadır direği	pilier d'une tente	pillar of a tent
kêzm	direk, kazık	pieu, pal, piquet	peg, stake, picket
rim	mizrak	lance	spear, lance
berayik, pêşkoçî	öncü	avant-garde	vanguard
koç, malên barkiri	1) yüklenmiş eşya 2) göç	1) chargement 2) déménagement, migration	1) load 2) removal, migration
dilan	halay		
stranên li ser miriyan	ağıt	élégie	elegy
daleqandin, hilawestin, dilawêsîn	asmak	suspendre	to hang up, to suspend
kotek, darok, dara şînê	yas ağacı	arbre de deuil	mourning tree
xeft: konê piçûk ê şînan	yas çadırı	tente servant de chapelle ardente	tent used as chapel of rest
laçik	baş örtüsü	foulard	scarf
xoşnûd: razî	memnun	satisfait, content	satisfied, happy
kumreşî	kıskançlık	jalousie	jealousy
bedgomanî, şewm (şom), bê oxir	ugursuz	qui porte malheur	ominous, who brings misfortune
şû, mêr	erkek, koca	mari	husband
şû kirin, mêr kirin	evlenmek (kız için)	se marier (pour une fille)	to get married (for a girl)
çeper, kozika şer	siper	tranchée	trench
şeşxane, cureyek tifingê	bir atışlı tüfek	fusil à un seul coup	single-barrelled rifle
şemal	parlaklık, şevk	éclat, lustre, luminosité	radiance, shine, brilliance, brightness
keskesor	gök kuşağı	arc-en-ciel	rainbow
serxure	uğursuz	de mauvais augure, néfaste	ominous, harmful
rewend	göçebe	nomade	nomad
dexes	çekemeyen, kıskanç	envieux	envious
hêwişandin	esirgemek, tasaruf etmek	épargner	to spare
tizê tifingé	eski tüfeklerde fitil	mèche des anciens fusils	wick of antique rifles
kirêt, qirêt	kirli	sale	dirty
erşet: hissa jinê	mirasda kadının payı	la part de la femme dans l'héritage de ses parents	woman's share of her parents' inheritance
qeleqend, keleqend	şeker parçası	morceau de sucre	lump of sugar
tevipayi, tevepayî	ortaklaşa	en comrnun	in common
bérîte	kadın ve erkeklerin karşılıklı oynadıkları oyun	danse où hommes et femmes chantent alternativement	dance during which men and women sing in turn
tencik,beroş	tencere	casserole	pan, saucepan
dellak: sunetker	sünetçi	celui qui pratique la circoncision	circuncisioner
xonçe	düğün ve sünetlerde gönderilen hediye	présent offert à l'occasion des fêtes de mariage ou de circoncision	present given at weddnig or circoncision celebrations
xîmenişîn	çadırda yaşayan, göçebe	habitant la tente, nomade	nomad, living in tents
destexane, sifre	sofra	couvert, table	table
argûn	şömine	cheminée	hearth
pilte	fitil	mèche	wick
zîp, çarşema reş	kara çarşamba	'mercredi noir'. demier mercredi de février	"black Wednesday", last Wednesday in February
şkeva: nanê bé hêvirtirş	mayasız ekmek	pain azyme	unleavened bread
zadika hêksorê	paskalya, çöreği	Pâques	Easter
bişkaftin	çözmek, açmak, sökmek	dénouer, délier, ouvrir, défaire	to untie, to undo
pispor	uzman	expert	expert


revî	at sürüsü	troupeau de chevaux	herd of horses
gele	ceylan sürüsü	harde, harpail (de cerfs, de gazelles)	herd (of stags, of gazelles)
solger, solbend, koşkar, pînedir	ayakkabıcı	cordonnier	shoemaker
serqeda	belalı	belliqueux, querelleur	bellicose, quarrelsome
conî	dibek	mortier	mortar
şûrker	kılıç imalatçısı	fabricant de sabre, d'épée	swordsmaker
hesinger	demirci	forgeron	smith, blacksmith
nikol	pişmanlık	repenti	repentant
cinaq	lades	os de clavicule chez les oiseaux, fourchette	wishbone
selem	peşin parayla veresiye mal almak	achat à terme payé plusieurs mois d'avance	forward purchase
erebi bazar	bir şeyi ölçmeden, tartmadan satınalma usülü	achhat d'une mardhandise sans la peser ou la mesurer, sur la base d'une évaluation approximative	paid several months in advance purchase of goods without weighing or measuring them, on estimation
rimbaz	mızrakçı	lancier, lanceur	lancer, thrower rifle shooting
tivingendazî	atıcılık	tir au fusil	a kind of Kurdish flat cake
kade, kuliçeyê mezin	bir nevi çörek	sorte de galette kurde	wild animal
dirinde	yırtıcı hayvan	fauve	hare
kerguh, kiroşk	tavşan	lièvre	good swordsman
şûrengiv	iyi kılıç kullanan	bon épéiste	a woman's personal dowry
şekêrt, şikarte	kadına ait özel mülk	dot ou dotation personnelle de la femme	recluse, cloistered
perdenişin, pişt perde	perde ardında oturan, namuslu	recluse (femme)	reconciliation
pêvketin, lihevhatin	anlaşma, barışma	réconciliation	witch
cazû, piresêr	cadı	sorcière	sorcerer
cezewî	cadı işi	sorcier	plea, entreaty
lavahî, li ber gerin	yalvarma, yakarma	supplication	willy-milly
çarneçar, bivê nevê	ister istemez, zorunlu olarak	nolens volens, bon gré, mal gré	vengeance
tol	intikam	vengeance	peasant
goran, gundî	reaya, köylü	paysan	rebel
serkeş	asi	rebelle	who loves the easy life
hêsayî perwer kemin	rahatını seven	qui aime la vie facile	ambush, trap
heşare, neçarge	tuzak	embuscade, piège	1) to card 2) to light a fire with a flint 3) to build (a wall)
jenîn	1) yapağı taramak 2) çakmaktaşıyla ateş yakmak 3) (duvar) inşa etmek	1) carder (f), 2) faire du feu avec un silex, 3) bâtir (un mur)	
olam, suxre	angarya	corvée	chore
tenefê çadiran, benê çadiran	çadırı bağlama ipi	cordage d'une tente	ropes, rigging of a tent
pêşmal	sundurma	appentis	lean-to
mîwek, bişkote	düğme	bouton	button
xurek, xwarin	yiyecek	nourriture	food
pêsûs	lamba	lampe à huile	oil-lamp
giska ezeban	düğünde bekarların damat ailesinden aldıkları hediye ya da kefaret	amende ou cadeau que la famille du marié doit offrir aux célibatres	fine or present given by bridegroom's family to the bachelors
	misafirlere söyletilen türkü	chanson que l'invité doit chanter pour inaugurer la veillée	song sung by guest to inaugurate the evening gathering
gisk, curm	kefaret, ceza	amende, expiation	fine, expiation, atonement
gerelawêj: bi dor stran gotin	sırayla türkü söylemek	chanter à tour de rôle, dans une assemblée	to sing in turns at a gathering
hol	top	balle	ball
pîldar, falavêj	falcı	diseuse de bonne aventure, voyante	fortune-teller
kevirî	dag tırmanıcısı	alpiniste	mountaineer, climber

beranberdan serî: destpêka zayîna pez

çiraxê şêx: endamê şêx ê ku salê carekê dewarek ji mala şêx re dive, dikeve ber benê wî.

nistî: tilsimşkênandinî, mifta tilsimê. Nistiya tayê mirîşkeke reş e.

KON



Amadekar: Muzaffer BEGZADE

***Kon** ji mûyê bizinan û kulka deva tête çêkirin. Ji bona çêkirina kona, berê mû şe dikin û paşê jî dirêsin. Piştî hînga tevnê diraçînin û her car **ta** yan **tejeke** kon çêdikin. Van tejan bi hev û din ve didirûn û bi vî awayî kon çê dibe. Piçûkî û mezinahiya kon bi hejmara tej an hejmara stûnan ve girêdayî ye: wekî konê 24 tejî an konê 6 stûnî. **Koçer** bi çît û perdan navberê didine kon û bi vî awayî cihê rûniştina mêr, jin, û mêvanan û herweha cihê xwarin çêkirinê ji hev û din têne cuda kirin. Rengê kon bi timî reş e û her ji ber wê yekê jî jê re dibêjin **Reşmal**.*

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
berjen,kutek	destek, istinat diregi	appui,support, étai	support, prop, stay
çit	çit	clôture, claie	hurdle, fence
doşik	seki	banquette en terre battue ou en pierre	mud or stone bench
hêşî, kêleka kon	kurulan çadırın yanı	côté d'une tente plantée	side of a pitched tent
kefî; benê pehn ê hûnnandi	yassı ve geniş urgan	bande tissée en laine servant à fixer le bât ou attacher une charge	woollen woven strip used to fix the pack or to fasten a load
kemend	kement	lasso, noeud coulant	lasso, slip-knot, running knot
kon: reşmal	çadır	tente	tent
kon vedan	çadır kurmak	planter une tente	to pitch a tent
mêkut,merkut	tokmak	maillet	mallet
mû	kıl	poils	hair
raçandin	dokumak	tisser	to weave
reşmal	karaçadır	tente noire	black tent
rist,çasir	çadırın altından geçip onu kazıklara bağlayan urgan	corde en poils de chèvre qui passe en-dessous de la toile de la tente et la fixe au piquet	rape made of goat's hair passing under the tent's canvas and tying it to the stake
fi,si	saçak	frange	fringe
serhêşî; singê	çadırın bağlandığı	un des quatre pieux principaux	one of the four main
kêleki yê kon	kenar kazığı	où l'on attache les cordages d'une tente	poles to which the tent's ropes are tied
sing	kazık	piquet, pieu	peg, stake, picket
serrît	çadırın üstünden geçirilip uçmasını önlemek için kazıklara bağlanan urgan	corde en poile de chèvre passant au-dessus de la toile de la tente, fixée au piquet, empêchant la tente de s'envoler	rope made of goat's hair passing over the tent's canvas and tied to the stake, preventing the tent from flying away
stûnkon	çadır direği	pilier, mât d'une tente	stake, pole of a tent
tej, ta, takon	tek en kilim	tissu en poils de chèvre large d'environ 50cm	goatskin fabric approx. 50 cm wide
tevn	dokuma dezgahı	métier à tisser	weaving loom
war	yer, yurt, kamping	lieu, place, camp, campement	camp, camping ground
zome	oba	groupement ou village de tentes nomades	group or village of nomads' tents
zozan	yayla	alpage, are de transhumance d'été	mountain pasture, ground summer pasture
şûnwar	yurtluk	emplacement d'un camp, territoire de campement	encampment, camp

bêrî, bêrivan, werîs, zom, tendûr, têr, sêl, hebin,-şirît, hêşi, çewal,
cihor, cil, obe, pêkuledan, perde, kuledan
kulîn-kulûn-stêr.

TERMÊN HIQÛQÎ

(III)

Amadekar : Veysi ZEYDANLÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
dadgeh	mahkeme	tribunal, cour	tribunal, court
avûkat, parêzer	avukat	avocat	lawyer
girte	tutanak	procès verbal	minutes
girtenivîs	zabit katibi	greffier	clerk (of the corut)
doz	dava	cause, procès	case, lawsuit
dozdar	davacı	demandeur, plaingant	plaintiff
dozlêkirî	davalı	défendeur	défendant
gilî	şikayet	plainte	complaint
gilî kirin	şikayet etmek	porter plainte	to lodge a complaint
gilîkir	şikayetçi	plaignant	plaintiff
tawan	suç, cürüm	crime, délit	crime, offence
tawan kirin	suç işlemek	commettre un crime	to commit a crime, a felony
tawanbar	suç işleyen, suç faili	auteur d'un crime	perpetrator of a crime
tawanbar	suçlu	coupable	guilty
tawanbarî	suçluluk	culpabilité	guilt
tawanbar kirin	suçlamak, itham etmek	accuser, imputer	to accuse, to impute
tawanbarkirî	suçlanan	accusé, prévenu	accused, defendant
tawanbarker	suçlayan	accusateur	prosecutor, accuser
tawankar	mücrim	criminel	criminal
tawankarî	kriminalite	criminalité	criminality
tawannasî	kriminoloji	criminologie	criminology
gumanbar	şüpheli	suspect	suspicious, suspect
çewtî	kabahat	infraction, délit infraction	offence, breach of the law
cezayê zindanê	hapis cezası	peine de réclusion, de prison	prison sentence
cezayê diravî	para cezası	amende	fine
cezayê mirinê	ölüm cezası	peine de mort	death penalty
cezayê giran	ağır ceza	peine lourde	heavy penalty
cezayê sivik	hafif ceza	peine légère	light penalty
cezayê sermedî	müebed hapis	réclusion à perpétuité	life sentence

JI KLASÎKÊN KURDÎ

Ferhengoka Dîwana Cegerxwîn

-III-

Amadekar. Khosrow ABDOLLAHÎ

bêdar: nedar	yoksul, fakir	pauvre, indigent, miséreux	poor, indigent, destitute, needy
celew: cilav	dizgin	bride, rêne	bridle, rein
col: tevlihev	karışık, heterojen	mélangé, hétérogène	mixed, heterogenous
gulşen	güllük, gülbahçesi	roseraie	rose garden
hawil	takat, güç	force	strength
heriftin	tahrip etmek, yıkmak	détruire, dévaster	to destroy, to devastate
kate	sürgün	rejeton, rejet	shoot, offshoot
kixme	cepken	une sorte de dolman	a sort of dolman
naxir: garan	sığır sürüsü	troupeau de bovins	herd of cattle
perav	sahil	rive, rivage	shore, bank
pêwan: panêr	nöbetçi	gardien, sentinelle	guardian, watchman, sentry
qefa	doğal sığınak	abri naturel	natural shelter
qulebazî: fêlbazî	dalavere	intrigue, tromperie, tricherie	plot, scheme, trick, cheating
raser: fêz	yukarı, üst	le haut, la partie haute, supérieure	top, upper part
reşbend: dafik	kuş tuzağı	piège à oiseaux	bird-trap
sersem: sergêj	sersem	étourdi	heedless, thoughtless
tirabêlk: axa hûrbûyî	ince toz	poussière fine	fine dust
xugî	haraç	tribut	tribute
şayeste	layık	digne de	worthy of
şesar: seşderb	altı atışlı	revolver à six coups	six- chambered revolver

Termên rêzimanî

(II)

Rojen BARNAS

Li ser *"terrnên rêzimanî"* ya kurmancî xebatên destpêkî û ciddî yên Mîr Celadet û Kamuran Bedirxan Beg in. Kurmanciya termên rêzimanî ya Mîr Celadet Beg di *Hawar*ê de, yên Mîr Kamuran Beg jî di pirtûkên wî yên ji bo hînkirina zimanê kurdî du car û bi rengek ji hev cihê hatine weşandin. Di vê xebata xwe ya li ser termên rêzimanî ya kurmancî de -ku besa pêşi di jimareya 9. a *Kurmanciyê* de derket - me wek liste; lîsteya termên di *Grammaire Kurde Dialecte kurdmanjî* ya Mîr Celadet Bedir-Xan û Roger Lescot çarçewe, û wek navlêkirin (kurmanciya terman) jî xebata Mîr Celadet û Mîr Kamuran bingeh, da ber xwe. Ji ber ku ne lîsteya termên ji xebata Mîr Celadet Beg û ne jî yên Mîr Kamuran Beg bersîva hewcedariya lîsteya di *"Grammaire Kurde"* de didan, pêwist bû ku em li xebata di vi warî de kirî zêde bikin. Yê diduyan jı sedem ev e, ku di gelek cihan de navlêkirinên terman ên Mîr Celadet û Mîr Kamuran, heta yên Mîr Kamuran ên berê û yên paşiyê li hevûdu nanihêrin û ev dibin sedemê geremolî û tevlîheviyê.

Herwekî :

(f) **comparatif**:
© kemper, kemperandin,
u pêşhevanî *an* bêtirker,

(f) **adjectifs numéraux cardinaux**:
© rengdêrên jmarîn ên bingehîn,
u rengdêrên jmarda,

(f) **adjectifs numéraux ordinaux**:
© rengdêrên jmarîn ên rêzin,
u rengdêrên rêzda,

(f) **adjectifs possessifs**
© rengdêrên xwemalîn,
¶ rengdêrên destdaniyê,
u rengdêrên destdaniyê *an* wxedıtiyê,

(f) **adverbe**:
© hoker,
¶ hoker, rengpîşe,

(f) **adverbes de manière**:
¶ rengpîşeya awahî,

(f) **terminaison**:
© dûpaş (n),
u dawîne,

(f) **radical**:
© rayek,
¶ hîm,

(f) **transitif**:
© gerguhêz,
u sergerandî,

(f) **intransitif**:
© negerguhêz,
u pêgerandî,

(f) **conjugaison du verbe**:
¶ lapêrîn
u kesandin.

Di navlêkirinên bi kurmancî yên termên rêzimanî de rêçka me ev e:

1. Ji navên heyî yên ji aliyê Mîr Celadet û Mîr Kamuran Beg ve dayî yên ku li hevûdu dinihêrin û ji aliyê jê famkirinê ve ne şolî ne tevlîhev in, wan her wisa qebûlkirin û bikaranîn.

2. Ji navlêkirinên wan ên ku li hevûdu nanihêrin; ya di maneyê de rasttir û di bilêvkirinê de siviktir, hibijartin.

3. Ji navlêkirinên kesên din ên di vî warî de xebatên ciddî kirine îstifade kirin.

4. Tevî van her sê riyan jî, ku ji bo termeke rêzimanî ya pêwist kurmanciya yekê peyder nebe, an jî ew navlêkirina bi kurmancî ya heyî li gora maneya termê ne bi cih be; wê gavê li gora mentiqa maneya termê, navekî kurmancî yê nû lê danîn e.

Maneyên nîşanekên ku li jorê hatine bikaranin:

© —> Celadet Bedirxan, ji *Hawar*ê
¶ —> Kamuran Bedirxan, *Nivîsa Min*
u —> Kamuran Bedirxan, ji *Rêzana Zmanê Kurdî*

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
fonetîk	fonetik	phonétique	phonetics
dengdar	ünlü, sesli	voyelle	vowel
bilind	yüksek	haute	high
navincî	orta	moyenne	middle
nizim	alçak	basse	low
nizima pêşderkî	alçak ön çıkış	antérieure basse	front low
bilinda navderkî	karma yüksek	mixte haute	mixed high
bilinda pêşderkî	art çıkışlı yüksek	postérieure haute	back high
lêvkî	dudaksı	labiale	labial
diranî	dişseller	dentale	dental
pêşesmandevî	öndamaksılar	prépalatale	prepalatal
esmandevi û qirikî	damaksılar ve gırtlaksılar	palatales	palatal
girtiya hişk	ötümsüz kapantılı	occlusive sourde	voiceless occlusive
girtiya nerm	ötümlü kapantılı	occlusive sonore	voiced occlusive
fîzeka hişk	ötümsüz sızıcı	spirante sourde	voiceless spirant
fîzeka nerm	ötümlü sızıcı	spirante sonore	voiced spirant
girtiya difinî	genizsel kapantılı	occlusive nasale	nasal occlusive
dulêviya domdar	sürekli ötümlü	bilabiale	continuous
a nerm	çift dudaksıl	continue sonore	voiced bilabial
herikiya lerzokî	titreşimli akıcı	liquide vibrante	vibrant liquid
herikiya rexkî	akıcı yan ünsüz	liquide latérale	lateral liquid
nîvdengdar	yarı ünlü	semi-voyelle	semi-vowel
paşesmandevî	artdamaksıl	postpalatable	postpalatal
domdara nerm	ötümlü sürekli	continue sonore	voiced continuous
domdara hişk	ötümsüz sürekli	continue sourde	voiceless continuous
nîvgirtiya bi xişîn	hışıltılı yan kapantılı	semi-occlusive chuintante	hissing semi- occlusive
rastîhevhatina dengdaran	kesinti	hiatus	break
cotbûn	ikileşme	gémination	gemination
cîguherîn	göçüşme	métathèse	metathesis
tewandina awayan	durum bükünleri	flexion de cas	inflexion of the cases
têbinî	açıklama, (dikkat, dipnot, uyarma)	note, remarque	footnote, remark
cotebêje	sözcüklerde eşleme	couple de mots	pair of words
morfolojî	morfoloji	morphologie	morphology
pronavê vegerok	dönüşlü şahıs zamiri	pronom personel réfléchi	reflexive pronoun
pronavê xweyitiyê	iyelik (mülkiyet) zamiri	pronom possessif	possessive pronoun
pronavê hevdûtiyê	işdeş zamir	pronom réciproque	reciprocal pronoun
pronavê peywendiyê	ilgi zamiri	pronom relatif	relative pronoun
biwêja pronavî	zamirsel deyim	locution pronominale	pronominal phrase
pronavên kurtkirî	kısaltılmış zamirler	pronom abrégé neutre	abbreviated pronoun

(Dûmahîk heye)

Ferhengoka RONAHÎ

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
kişwer	yurt, ülke	pays	country
xebat	çalışma	travail	work
destegah	tezgah imalathane	comptoir,atelier	counter, workshop
hinerwer	yetenekli	talentueux	gifted
wargeh	mevzi	position	(mil) position
kêlîk	biraz (sonra)	tout à l'heure	soon
noqar	denizaltı	sous-marin	submarine
wêne	photo	photographie	photography
tangşikên	tanksavar	anti-char	anti-tank
pisporê eskerî	askeri uzman	expert militaire	military expert
nemaze	özellikle	en particulier	especially, in particular
qad	meydan	place	place
kozik	tabya, pusu	etranchement	entrenchment
tavil,tafil	hemen, derhal	tout de suite	at once,immediately
çeper, senger	siper	tranchée	trench
asêgeh	müstahkem mevki, istihkam	fortification	fortification
firsend, kês, keys	fırsat	occasion, opportunité	opportunity
xwîndar	kanlı	sanguin, saignant	sanguine, beeding
hêman	öğe	élément	element
nêz a (ji nêza)	açlık(tan)	faim	hunger
posat	muhimat	munition	ammunition
teba	mahluk	créature	creature
xeriqandin	batırmak	couler	to sink, to send to the bottom
singik	örgü şişi	aiguille à tricoter	knitting needle
bender	liman	port	port,harbour
hûrmûr	(ıvır zıvır), zaruri ihtiyaç	affaires, effets	things, clothes
şewender, silq	şeker pancarı	betterave à sucre	beet, sugar beet
beristan	kara	terre, terre ferme	land, terra firma
stol	filo	flotte	fleet
cenkeştî	savaş gemisi	navire de guerre	war ship
nimînende	temsilci, delege	représentant, délégué	representative, delegate
têkber	eşya	objet,article	item
têkberên malê	ev eşyası	articles ménagers	household requisites
ristin	eğirmek	filer	to spin
awartin	dıştalamak, istisna tutmak	exclure, faire exception	to exclude, to make an exception
ayende	gelecek	futur	future
nifş	kuşak, nesil	génération	generation
zêringer	kuyumcu	orfèvre	goldsmith
ristik	kolye	collier, chaîne	necklace
gon, reng, gûn	reng	couleur	colour
kuçe	sokak	rue	street
hilweşîn	yıkım	effondrement	collapse, falling-down
qels	güçsüz, zayıf	faible	weak

cewdik	su tulumu	outre à eau	water skin
balafirşikên	uçaksavar	(arme) anti-aérienne	anti-aircraft
behredar	ortak	associé, actionnaire	associate, shareholder
parêv, biryan	tandır kebabı	tandoori	tandoori
kezixandin	budamak	tailler,élaguer	to prune, to lop off
awarte	istisna	exception	exception
guhêzbar	seyyar	ambulant	itinerant
durû	iki yüzlü riyakar	hypocrite	hypocritical
pesn	övgü	louange	praise
ciwanmer	centilmen,yiğit	gentilhomme	gentleman
bêbextî	kaleşlik, ihanet	trahison	betrayal
nemerdî	kancıklık, alçaklık	lâcheté, bassesse	cowardice, lowness
lezbot	sürat motoru	hors-bord, vedette	speed boat
biserhatî	sergüzeşt	aventure	adventure
tihnî	susama	soif	thirst
tamdar	lezzetli, lezziz	savoureux, succulent	tasty, succulent
bej	kara	terre	land
peresto	ilah, çok sevilen	idole	idol
rûmet	değer	valeur	value
bêperwa	korkusuz	sans crainte	without fear
sergewaz	devlet büyüğü, önder	chef, chef d'Etat	chief, Head of State
tekûz	sağlam, muntazam	solide, robuste	solid, sturdy, strong
girav	ada	île	island, isle
dêwendam	devasa	gigantesque	gigantic
berevan	savunmacı	défenseur	defender
nûjen	modern	moderne	modern
nîvro	güney	Sud	South
kaçanî	kap-kaçak, mutfak eşyası	vaisselle	crockery
rawir	av hayvanı	gibier	game
nîvro-rohilat	güneydoğu	Sud-Est	South-East
tirtire	kocaman	énorme	huge, enormous
berhewa kirin	havaya uçurmak	faire sauter, faire exploser	to blow up, to explode
nûçe	haber	nouvelle	news
xweser	bağımsız, müstakil	indépendant	independent
barkêş	yük gemisi	transporteur	carrier
payitext	başkent	capitale	capital(city)
tov	tohum	grainesemence	seed
bênefs	pisboğaz	gourmand, glouton	greedy, gluttonous
bênefsî	pisboğazlık	goinfrerie	piggery, guzzling
bêhemdî	gayri ihtiyari	involontairement	unvoluntarily, unintentionally
bi nav kirin	adlandırmak	nommer	to name
hindav	yön istikamet	direction	way,direction
sewgirandin, misoger kirin	garantilemek, garanti etmek	assurer, garantir	to insure, to assure
zirekpûş	zırhlı	blindé	armoured
pola	çelik	acier	steel
stûr	kalın	épais	thick
mîr	emir, sultan	émir	emir
pismîr	şehzade, prens	prince	prince
zikmakî	doğuştan	congénital	congenital
çêkirox	yapay, imal eden	créateur, fabricant	maker, manufacturer
bêhemta	eşsiz	sans égal, unique	unequalled, unique
zirav	safra	bile	bile

F e r h e n g o k a

Sirr ul-Mahşera Feqî Reşidê Hekarî

Amadekar: Zeynalabidîn ZINAR

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
aşîkar	açık	clair, évident	clear, evident
bêrî	günahsız, masum	innocent	innocent
bist: şîşika pehn	geniş şiş	brochette plate	flat skewer
çikandin	dikmek	planter	to plant
dasîtan	destan	épopée	epos, epic
derbend	geçit	défilé, col, goulet	defile, gorge, pass, gully
dîbac	dallı çiçekli bir çeşit ipekli kumaş	tissu précieux en soie à motifs floraux	precious silk fabric with floral design
ecûzpîr	cadı	sorcière	witch
encam	sonuç, netice	résultat, conclusion	result, conclusion
etles	atlas	satin	satin
genc	hazine	trésor	treasure
kesirîn	üzülmek	se tourmenter, avoir de la peine	to fret, to be anxious to worry, to grieve
kêşan	tartı, tartma	mesure, pesée	measure, measurement, weighing
mas	kaşağı	étrille	currycomb
tîmar kirin, mehez kirin	kaşağılamak	étriller	to curry a horse
pêkve	beraber, birlikte	ensemble	together
perwaz	uçuş, uçma	vol, envol	flight, taking flight
penah, star	sığınak	abri, refuge	shelter, refuge
pîşe	meslek	métier	trade, profession
qetran, qîr	katran	goudron	tar
serteser, seranser	baştanbaşa	d'un bout à l'autre, entièrement	from beginning to end, entièrement all the way, entirely
serxweş	sarhoş	ivre	drunk
tengezar, bêçare	çaresiz	désespéré, sans remède	desperate, beyond remedy
umîd	umut	espoir	hope
xeşm	hışm, öfke	fureur, colère	fury, rage, anger
xendan, kenok	güleç	souriant	smiling
yexma, talan	yağma	pillage	looting
yekayek, yekoyek, yek bi yek	birer birer, teker teker	un à un	one by one

hejmar 11 havîn 1992

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)


Civîna bihara 1992an


Civîna yanzdehemîn a li ser zimanê kurdî, zaravayê kurmancî, ji 12 ta 18 ê meha nîsanê li Swedê, li Xwendegeha bilind a Biskops Arnöyê civiya. Civîn giraniya xebatên xwe da ser lêgerîna termên leşkerî, rêzimanî û hiqûqî. Lênêrîna peyvên klasîkên kurdî, ku timî di bernameya civînên ziman de ye, bi ferhengokên *Mirsad-ul Eftal* a Şêx Mihemedê Kerbela û kovarên *Ronahî* û *Hawar*ê dom kir. Di warên peyvên jiyana rojane de, vê carê beşdarên civînê li ser navên cil û bergan û ên amanên nav malê xebitîn. Em encamên van xebatan di vê hejmara *Kurmancî* da belav dikin.

Hevalên ku beşdarî civîna bihara 1992 an bûn ev in : Khosrow Abdollahî (Selmas), Mahmûd Baksi (Xerza), Rojen Barnas (Diyarbekir), Lutfî Baksi (Xerza), Muzafer Begzade (Şikakan), Mihemed Siddîq Îmamî (Behdînan), Hemîd Kılıçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Siwêrek), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Mêrdîn), Mehmed Tanrıkulu (Diyarbekir), Mehmed Uzun (Siwêrek), Zinarê Xamo (Wêranşar), Veysî Zeydanlî (Bedlîs), Reşo Zîlan (Agirî), Zeynelabidîn Zinar (Batman) û Elî Şêr (Wan).

Amadekar: Muzaffer BEGZADE

CIL Û BERG





fîstan*, dêre, taqî

1 - beden
2 - daw
3 - mil
4 - beden
5 - devmilk
6 - kurîşk
7 - kobe
8 - porik
9 - derdaw, dawdêl
10- belaçik bendik
11 - pêsîr
12 - kurîşk, qirme
13 - sermil

* *Jê re li navçeya Behdînan û Hekarê fîstan dibêjin. Peyva fîstan ji spanî* **fustan** *(cureyek qumaş) tê. Li nav koçeran û li aliyê Serhedê ji vî kirasê serê bervekirî re* **dêre**, *li hin navçeyên din jî* **taqî** *dibêjin. Li piraniya navçeyên Kurdistanê fîstan bi mana kirasê ser bi kar tînin.*


14 - **kofî**
15 - bercênîk, qotik
16 - rêzik
17 - dênik, darkofî, tasa kofiyê
18 - qutik, êlek
19 - kiras
20 - xiftan
21 - derpê
22 - serkiras
23 - zendik, milik
24 - binkiras
25 - pêşgîr
26 - pêlaw, sol
27 - gore
28 - lepik, destgorik
29 - şimik



























cilên jinan	kadın giysileri	vêtements féminins	women's clothes
cil, kinc, berg, çek	elbise, giysi	vêtement, habit	clothe
cil li xwe kirin	giyinmek	s'habiller, se vêtir	to get dressed
qutik, êlek	yelek	gilet	waistcoat
kiras, qutik	entari, gömlek	chemise, tunique	loose
serkiras: kirasê ser	üst gömlek	chemise de dessus	outershirt
zendik, milik	kolluk	manchette	cuff, oversleeve


binkiras	iç gömlek	sous-vêtement	women's undershirt with sleeves
meleqof : binkirasê bê mil	askılı iç gömlek	sous-vêtement féminin sans manches avec des manches	women's undershirt without sleeves
derpê	don	culotte, caleçon	knickers, underpants
havilkiras	kadın donu	culotte de femme	women's underpants
çît, temezî, çarik,	genç kadınların	variétés de foulards et	varieties of young
Gor bi dest neketiyo!
Gor bi gor be (bî)!
Gor li te teng be!
Gorbigor geryayo!
Gorbigor herî!
Gorî buyo!
Gulîkurê!
Guliyê te birijin!
Guliyê te kurr be!
Gulla berbanga sibê li te keve!
Gulla serê sibê li te keve (lê keto)!
Gunê te reş be!
Gur tê keve nav pezê te!
Guran xwaro!
Gurê har bi te bigre!
Gurgê reş te bixwetin!

H
Ha tu bi reş bî!
Herî înşellah venegerî!
Hes tu bi jana zirav bikevî!
Heş û reş can bedenê te werbin!
Hêtereş hêta te bigre!
Hêtereş te bigre!
Hewî bê ser te!
Hey bîbigên te darijin ber pên te!
Hey girfiringî li te bên û neynok tinebin tu xwe pê bixrînî!
Hey koremar li binê belga guhên te ve bidit!
Hey mala te xera be!
Hey perqitiyo!
Hey qet têr nexwî!
Hey qet û weselên te vewerin!
Hey topa Xwedê lê keto!
Hey tu bi şîn biyo!
Hey tu qulinca tirkî girtî!
Hey Xwedê dîn û îman ji te sitandiyo!
Hirça gurgemêr li rasta te bêt!
Hûn ber lêmiştê (lehiyê) bikevin!
Hustiyê te ber te de bimîne!

Î
Înşellah nemêr bî!
Înşellah ser zînî nebirqî!
Înşellah sitûyê te bişkê!
Înşellah topa Mustefa li te bikevit!
Înşellah tu herî venegerî!
Înşellah tu jehriyê bikevî!
Înşellah tu têr nexwî!

J
Jahrî!
Jan te bigre!
Janazirav bi te de were!

Janazirav te bigre!
Jeniya marê kor bixwî!
Ji babê xwe, Rebî kes jê nemîne!
Ji gewriya te neçe xwarê!
Jî kurto!
Ji mêraniyê bikevî înşellah!
Jin bê ser te!
Jina te bimre!
Jiyê te bi san û keran bimînit!
Jiyê te bibit jiyê heliz û gorizê!

K
Kalîna pez li ber deriyê te neyê!
Kambax be!
Kebaniya te bimre!
Kefreşiya mirinê te bigirit!
Kerafî!
Kerrafî be!
Kerrafiya mêrê mirinê!
Kerrafiyê bixwe!
Kerr biyo!
Kerrê te li kwirê te bi hesili! (bi qelibe)
Kevir kuçik li serê te be!
Kevir û ber te de were!
Kevir û koçik li te bibare!
Kevrê te bi ser kevran nemîne înşellah!
Kezeb piritî!
Kezeb reş!
Kezeb xwê biyo!
Kezeba te bişewitit!
Kezeba te bikele!
Kezeba te devê te de bê xwarê!
Kezeba te parî parî be!
Kezeba te were xwerê!
Kezeba xwe reş neke!
Kezebşewitiyo! Kezebperitiyo!
Kezîkurê!
Kilîta li deriyê te bikeve!
Kirmên duvî bidin laşê te!
Kitig di kuçka te de bizên!
Koçik nan destê negre!
Koçkê te bê agir be! (Yanî: tu bê jin bimînî)
Koda gerê bi dest de nekevit!
Kok lê bibire
Koka we biqele (biqelike)!
Koka we vemire!
Konê te ji nav konan bê hilanîn!
Korahî di çavên te bikevit!
Kordunde çûyî!
Koremar bi te vede!
Korocax bî!
Kotîbîn bikeve mala bave te!
Kuçikê har bi te bigre!
Kul bikeve mala te!
Kul û mirin!
Kula Helebê bikeve mala babê te!
Kula Helebê di mala te bikeve!
Kula Helebê li te keve!
Kula reş ser mala te de bêt!
Kula salê li te bikeve!
Kulê biro!
Kulî di zadê te bikeve!
Kund li deriyê te bixwîne!
Kund li ser xaniyê we deyne!
Kundê kor li deriyê te bixwîne!
Kundê kor li şûn û warê te bixwîne!
Kunêra reş li singê te hato!
Kurê helekê!
Kurê te bimre!
Kureder!
Kurm û kêz di laşê te bikevin!
Kurr û kem bî!

L
Laşê te çêtî çêtî be!
Lawo, tu pitkê pola re derkevî!
Lê şerab be!
Lê pîroz nebe!
Le'netiyo!
Li te bi jehr be!
Li te bi xwîna xinzîr be!
Li te bibe keratî!
Li te goştê xinzîr be!
Li te heram be!
Li te jehra maran be!
Li te kul û derd be!
Li te ne helal be!
Li te negivire!
Li te xwîna xinzîrê be!
Lingê te bişkê!
Lingê te yê paşiyê negihe pêşiyê!

M
Mala babê te wisan xera bitin, bite berkê kinifan!
Mala babê te xera be, stûn tunebe xwe ber bigre!
Mala here ber mîrata!
Mala te biçit ser malê!
Mala te heft mîrate geryayo!
Mala te ji nav malan bê hilanîn!
Mala te li heft mîratan geryayo!
Mala te ne ava!
Mala te ne ava, mervantî ne heqê te!
Mala te xera be!
Mala xera be kêl li ser kêlê nemîne!
Malê te bibe belayê serê te!
Malşewitiyo!
Malkambaxo!
Malkavil buyî!
Malwêrano!
Malxerabo!
Malxupano!
Mar û mişk di malê keto!
Marê kor bi te ve bide!
Marê reş bi te ve bide!
Ma şale (înşellah) bi kuştineke neşûştî herî!
Ma şalê (înşellah) kirasê reş li te be!
Ma şalê (înşellah) tu di nava alemê susret bî!
Ma şalê (înşellah) tu gullakî herî!
Ma şalê (înşellah) tu herî darbesta te were!
Ma şalê (înşellah) tu rahêlî bi çi bibe ax!
Ma şalê (înşellah) tu yekî sibê, yekî nîvro, yekî êvarê hilînî!
Me helewiya te xwaro!
Mefil mewace (nexweşiya zikêşê) te bigre!
Mejî di poz re hato!
Mejî di qirrikê keto!
Mejîreşî li te bikevit!
Mejiyê te di pozê te re were! Mejî poz re hato!
Mêlakê te devê te de bê!
Mele negihe ser te!
Mêrê te bimre!
Meyt li erdê mayo!
Meytê te hilê! Meyt hilato!
Meytê te li erdê bimîne! Meyt li erdê mayo!
Meytê te xwerê teyr û tuyan be!
Mezin nebî!
Mezin nebiyo!
Mezinê mezela buyo!
Milê te bişkê!
Min helewiya te xwaro!
Min ji te xêr nediyo!
Miradê te bi axê bibe!
Miradê te di qirika te de bimîne!
Mîratbuyî!
Mîratxur tunebuyo!
Mirazê te çavê te de bimîne!
Mirazê te di qirika te de bimîne!
Mirazê te mirazê gulka (navê pincarek e) biharê be!
Mirin di çava keto!
Mirna te hebit lê veşartina te tinebit!
Moran serê te de barê!
Moran serê te de bê!
Mû tişkê te ve neyê!

N
Nanê ceh destê te nekeve!
Nanê rojê destê te nekeve!
Nanê te bi sêlê ve nemîne! (Yanî: jina te bimre)
Nanê te li ser sêhlê bisojit!
Navê te ji dinyê hilê!
Navê te nav navan nekeve (nehîlê)!
Ne li vê dinyê ne li wê dinyê têrxwarina te tunebe!
Neke der!
Nemêr bî înşellah (ma şalê)!
Neviyê xwe nebînî!
Nexweşiya koçkan bi te bigre!
Neynûk (nênûk) tunebe tu xwe pê bixurînî!

O
Ocax bi te ve bide!
Ocaxa te bitefe (vemire)!
Ocaxa te ji kok de vemire!
Ocaxa te kambax be!
Ocaxa te kor be!
Omrê te bibe omrê helizê hezîranê!
Oranî bi çava da hato!
Oxira te li hev neyê!
Oxira te ne ya xêrê be!
Oxira te nîvê rê be, bextê te jî bextê sê (koçik) be!
Oxira te oxira xêrê nebe!
Oxra te nehatin ve be!
Oxra te nîvê rê be!
Oxra te ya Qulo (qubo) be!

P
Pê te bişkê!
Pençeşêr li keçka dilê te bikevit!
Pençeşêr li te bikeve!
Pepûk û kondok di mala babê te de bixwînit!
Pêxember xenîbê te be!
Pi reş heşê!
Pişreşî li te bikevit!
Pişta te bişkê!
Pîlê te xilhin!
Pîlên te bixelin!
Pora te kur be!
Porkurê!

V
Qelihiyo!
Qesifiyo!
Qirr bikeve nav we!
Qulê serad û bijîngê di canê te de çêbe!
Qur'an bi te ve bide!
Quriderê bixwî!
Qurmiçiyo!
Qurregisin bigrî!
Quzilqurt bixwe!
Quzulqurt!
Quzulqurtê bixwî!

R
Razan hebe rabûn tunebe!
Rebbî, tu kûr (kor) bibî ber destê min bikevî!
Rebbî, cî û war bi destê te nekeve!
Rebî, ava reş bi çavê wî bê!
Rebî, jê ketê pê ketê!
Rebî, marê kor bi te ve bide, porê serê te tev biweşîne!
Rebî, tu herî û venegerî!
Rêncareş bikevit nav hestî û weselên te!
Rêya te bibit rêya nehatinverê!
Rîşa xerab di te'd derkeve!
Riya rast pêşiya te nekeve!
Rûviyên te li dest û pên te bialin!
Rûyê te reş be!

S
Sepelîska (seperîska) san (koçkan) te bigirit!
Sewtik sar be (bî)!
Sewta te bê birîn!
Sitohê te bişkê!
Stoyê te bişkê tasê te bineqise!

Ş
Şalê tu bipelçiqî!
Şape li ser te de bê!
Şêl û şehtî bî!
Şelqitiyo!
Şeple li te keve!
Şer û pevçûn ji ber deryê te neçe!
Şewitiyo!
Şîn li mala te keve!
Şîn û girî li mala te ranebe!
Şîn û girî para te be!
Şîrê min ji te ra heram be!
Şîrê min li te ne helal be!

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
© INSTITUT KURDE DE PARIS
106, rue La Fayette, 75010 Paris - France
Directeur de la publication
Reşo ZÎLAN
Réalisation
S. ILITCH & M. HASSAN

hejmar 22 zivistan 1998

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan
Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Biskops Arnöyê ya 22emîn

Civîna 22emîn ya *Kurmancî* li Biskops Arnöyê (Swêdê) di navbera 26.10 - 1.11 1997an de çêbû. Di vê civînê de kesên beşdar li ser nexweşiyên heywanan, zimanê zarokan, îdyomên kurdî, hin termên hiqûqî û aborî, devoka Qerejdaxê û ferhengoka *Hawar*ê xebitîn.

Di vê civînê de Xosrow Abdullahî (Selmas), Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Lutfî Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbekir), Salim Çeliker (Diyarbekir), Michael Chyet (Waşington), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Selam Nouman (Qamîşlok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Kendal Nezan Diyarbekir), Zinar Soran (Dêrik), Veysi Zeydanli (Bidlîs) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên cîvînê di vê hejmara *Kurmancî* de tên belav kirin.

Nexweşiyên heywanan

Amadekar : Rojan HAZIM

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
nexweşî, nesaxî; nisaxî	hastalık	maladie	disease, sickness, illness
werar	belirti, alamet	symptôme, indication, signe	symptom, sign, indication
agir, alek, diryan	kuş palazı	diphtérie, croup	diphteria
cedew, (m) : piştkuliya bi kêm û elem a dewarên bar	yük hayvanlarının sırtında oluşan bere	inflammation purulente du dos des bêtes de somme due au frottement du bât	purulent boil on animal's back,due to irritation by loads carried on the back
cedew girtin	yara, bere kaplamak	être couvert de purulences	
peqik, pêlqik, avlik	deri ya da ciltte oluşan su kabarcığı	ampoule, hydropisie	blister
kifte, şeqdan, simrizî	tırnak hastalığı	grive (zool.)	softening of horse's hoof, thrush
kabik, kabçûyî		crampe	cramp
kam, debax, devkulî	hayvanlarda ağız iltihaplanması, ülseri	ulcération buccale, infection des animaux	animals' mouth ulceration
qolinc, zikêşî	kulunç	colique, crampe	colic, cramp
qesel, seqav, seqew	çatlama, soluksuzlaş-maktan ölme	mort d'essoufflement (pour un cheval	(horse's) death from breathlessness (shortness of breath)
piştî beza bilez avê nede hespî, ew dê seqavî bibe	hızlı koşudan sonra ata su verme, zatürye olur	après cette course rapide n'abreuve pas le cheval, il va attraper une pneumonie	after this fast ride don't give the horse any water, or he'll catch pneumonia
bi zoliyan	fazla yüklenmekten ürkmüş, yük taşımaktan kaçmak	cheval ou mule traumatisé par des fardeaux lourds et qui refuse d'être chargé	horse or mule traumatized by being overloaded with heavy burdens, who refuses to be loaded down
pêsatî	at zatüryesi	pneumonie chevaline	pneumonia (horse's)
xurîk	hayvanlarda çicek hastalığı	clavelée, variole du mouton et des vaches	sheep pox, cowpox
xurî	çiçek hastalığı	variole	small pox, variola
guhanreşî, guhanok	meme iltihabı	mammite, mastite	mastitis
guhanokî bûyîn, bi guhanokê ketin	meme iltihabına bulaşmak	être atteint de mammite	to get mastitis
tebek, şebek	şap hastalığı	fièvre aphteuse	foot-and mouth disease of cattle
marik, mûmark	tenya	ténia, cénure	taenia
şîlav, firşik	şirden	caillette	rennet stomach, abomasum
bawêşe, bawêşî, baêşe	meme romatizması	rhumatisme des mamelles	rhumatisme of the udders
pêşûkî, pêkî, gurî	uyuz	gale	scab, mange
kotî	cüzzamlı	lépreux	leprous
ketew, kedew	cilt sakağısı	morve cutanée, farcin	skin glanders
kêtav	sakağı, ruam	morve	glanders
mêlak, teşenek	bronşit	bronchite	bronchitis
zerik, nexweşiya germê : di dawiya biharê destpêka havînê peyda dibe	sarılık	ictère, jaunisse	icterus, jaundice
ta	sıtma	paludisme, malaria	malaria
pezê tawî	sıtmalı koyun	mouton atteint de malaria	sheep suffering from malaria
axûzî, axorî : nexweşiyeke ku ji zêde xwê xwarinê tê	fazla tuz yemekten doğan bir hastalık	maladie causée par une consommation excessive de sel	illness caused by overeating
kepenek	kepenek	maladie du foie des moutons	liver disease of sheep
harî	kuduz	rage	rabies
qotik : nexweşiya ku pez pê nişkeva dimire		tremblante, maladie tremblante des moutons	scapie
gêjî	sersem, seremlik	vertige	staggers
jarî, jehrî	1) zehirlenme, 2) mide fesadı	1) empoisonnement, 2) indigestion	1) poisoning, 2) indigestion, sick from overeating
kûnêr, kînor	kan çıbanı	abcès	boil, blood boil
nikilşîn, nikleşîn	tavuk kolerası	choléra des poules	chicken cholera
(mirîşk) bi nikilşînê ketin	tavuk kolerasına tutulmak	être atteint de choléra (poules)	to suffer from chicken cholera
sebenisk, sebînisk, sebînisî : nexweşiya seyan e, ku heke kurî an jî boçikê jê bikin, xelas dibe	köpek hastalığı	une maladie de chiens	disease of dogs
yeman : kînoreke xedar e, li ser milan derdikeve, tu çareya wê nîne	hayvanların omuzların da oluşan çaresiz yara	plaie incurable qui apparaît sur les épaules des animaux	uncurable boil on an animal's shoulder
yeman derxistin	«yeman» a tutulmak	être atteint de «yeman»	to suffer from "yeman"
birîna reş	şarbon hastalığı	charbon, anthracose	anthrax
kêlik, nûnik, neynok, firnik			
nûnikî bûyîn, firnikî bûyîn			

Devoka Qerejdaxê

(VI)

Amadekar : Mahmûd LEWENDÎ

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
moz; mozezebeş	eşek arısı	frelon	hornet
mozqirtik, zirqîtik	sarı renkte yaban arısı	guêpe	wasp
guhê xwe mûç kirin	kullaklarını dikmek, kabartmak	dresser les oreilles	to prick up one's ears
xwe mûç kirin	dikilmek	se dresser	to hold oneself erect
mûmar	dolama	panaris	whitlow
mwîrî, mûrî, morî, mûr, mûrîstang, morîstank, gêre, gêrgere, gerîk, gêrgêrîk	karınca	fourmi	ant
mwîrîstan, mûristan, morîstan	karınca yuvası	fourmilière	formicary, ant's nest, ant hill
neçel	çatal, yaba vs. parmağı	fourchon, dent	prong (of a fork, etc)
neçê	iyi olmayan, kötü	incorrect, mauvais	incorrect, bad
neçê kirin	iyi yapmamak	mal agir, se comporter mal	to misbehave
neçêyî, nêçêtî	kötülük	incorrection	incorrectness
nermijandin	yumuşatmak, katılığını gidermek	mariner	to marinade, to marinate
nermijî	yumuşamış	ramoli, mariné	marinated
nermojnakî, nermojekî, wekî nermijî, nermoşkî	yumuşağımsı	douillet, mou	gentle, soft, tendre
nermik	meme	lobe	lobe
nermika guh	kulak memesi	lobe de l'oreille	ear lobe
nermika qêf, nermika serî, şilîka serîn, şillik	bıngıldak	fontanelle	fontanel
nesax	esen olmayan, hasta	souffrant, malade	sick, ill, unwell
newêrek	korkak	lâche, poltron	coward
nêm, kêm	irin, cerahet	pus	pus
nêm girtin	irin toplamak	suppurer	to suppurate
nişmî	titiz, itinalı, temiz	soigné, très propre,	tidy, careful, very clean and neat groomed (appearance)
jinek nişmî	itinalı bir kadın	une femme soignée	a tidy, careful, groomed woman
nixilîn : bê hal ketin, bê taqet ketin	halden düşmek	être épuisé, très affaibli, à genoux	to be worn out, very weak, exhausted
nixilandin : anîn xwar	devirmek, yere atmak	abattre	to knock down, to throw down, to overthrow
niyêr : nêr	eril	masculin, mâle	male, masculine
niyêrmo : nêremê, nêrûmê, nêrebwîk	hünsa, erdişi	hermaphrodite	hermaphrodite
nizar, dibûr	güneş görmeyen yer	ubac	sunless slope
beroşk	güneşlik, güneş alan yer	adret	sunny slope
nîçik : gillik, çillik, zîlik	klitoris	clitoris	clitoris
no	hırçın, sert, huysuz	qui a un mauvais caractère, méchant	ill-tempered, bad-tempered, naughty
noşîcan be	1) afiyet olsun, 2) sıhhatler olsun	que cela te (vous) fasse du bien (se dit à une personne qui mange, qui boit, qui sort du bain, etc.)	may it do you good (said to person eating, drinking or coming from bath, shaving)
nokbec : nokbejî, noka bejî	yabani nohut	pois-chiche sauvage	wild chickpea, wild garbanzo bean
noman : nêreker	eşşek (eril)	âne mâle	donkey, jackass
nuhmalî, nûmalî	yeni ev kurmuş olan kimse	personne qui vient de fonder un foyer, une famille	one who has recently established a household (newly wed)
nuka : noke, nika	şimdi	présent, maintenant	now
nûtik	yavşak (bit yavrusu)	larve de poux	nit (of louse)
rişk	sirke (bit yumurtası)	lente	nit (of louse egg)
pak, paqij	temiz	propre	clean
pak kirin	temizlemek	nettoyer	to clean
palik : kurtan	semer	bât	packsaddle
palûke, m	küçük fabrika	manufacture, petite fabrique	small factory
pang : xirbê ser vekirî	üstü açık harabe	ruines d'une maison où on cultive un potager	ruins of a building inside of which a vegetable garden is planted
pap	posa	lie	dregs
papûr, m	şose, cadde	chaussée, route	road, thoroughfare
pardax : texsîr	esirgeme, taksir	épargne, protection	saving, protection
pardax kirin	esirgemek	épargner	to save
parzin	süzme bezi	gaze à filtrer le lait	filtering cloth, strainer
parzinandin, parzandin, dakirin	sütü süzmek	filtrer le lait	to filter (milk)
paşpêkî, paşpê, paşîpê, paş û pêş, bere paş, paşopê	tersine	à contresens, à rebours	in the opposite direction
paşpêkî li kerê siwar bûn	eşeğe tersyüz binmek	monter l'âne à contre sens	to rode the dankey sitting backwards
takêş : pêlawên ku an tenê yên piyê rast an yên piyê çep bin; solên takêş : her du fer jî ên piyekî ne; herdu çep in an herdu ên çepê ne	ikisi de sağ yada sol ayağa uyan ayakkabı çifti	paire de chaussures consitant de deux pieds droit ou de pieds gauche	a pair of shoes consisting of two left-foot or two right-foot shoes
vajî, berevajî	ters yüzlü	à l'envers	inside out
paşpaşkî, berepaşkî	gerisin geri	à reculons, en arrière	reverse backwards
payin	beklemek	attendre	to wait
pelandin	el yordamıyla yoklamak	tatônner	to grope around
pelepûçî : viçî vala	saçma sapan, abuksabuk, boş, anlamsız	absurde, incongru, incohérent	nonsense, absurdity
gotinên pelpûçî	abuksabuk sözler	paroles absurdes, creuses, sornettes, absurdités	nonsense, rubbish meaningless speach
pelikîn	gözü korkmak	être intimidé	to be intimidated
xwe pelikîn	büzülmek	se recroqueviller, se faire petit	to shrivel up, shrink
pêlkut	yarım yamalak	à moitié fait, incomplet	only half done, interrupted in the middle
karê xwe pêlkut kirin	işini yarım yamalak yapmak	faire son travail à moitié, bâcler son travail	to botch (up) (work), to do sth. perfunctorily
pelkutkî	baştan savma	bâclé	slapdash
karê pelkutkî	baştan savma iş	travail bâclé	a botched (up) (piece of work)
pelok, pelûr, pilor	bulamaç	bouillie	thick soup made with flour, butter and sugar
perpitîn, pelpitîn	debelenmek	palpiter	to palpitate, to quiver
pêrgî, pêrgînî, pêşî	ön	au-devant	front, foremost
çûn pêrgiya yekî	birini karşılamak	aller au-devant de quelqu'un	to go meet; to welcome
pêxwarinî	katık	en-cas, casse-croûte	snack
pijgûrî, bişkûrî, pişkur	ayak üstü işlerde çalışan çocuk	enfant qui effectue les menus travaux domestiques	child who performs small tasks
pil pil, pilepil	dırıltı	grognement	grumbling, snarling
pincîk, pîjik	tırnak kenarında çıkan sert deri parçası	excroissance formée autour d'un ongle	callus
pirpar, parpar	semizotu	pourpier	purslane
peritandin	(kumaş, et, vs için) lime lime olmak, dağılmak	se désagréger	to distingtegrate, come apart

Zimanê zarokan

Amadekar : Reşo ZÎLAN

kurdî zimanê zarokan : zarê zarokan	tirkî çocuk dili	fransizî langage enfantin	îngilîzî baby talk
aba, bab, baba, babba, babo, babbo, bav, bavo, eba, ebo, yabo	baba	papa	dad, daddy
be ! : gava ku dixwazin zarokan bi henekî veciniçinin yan jî bitirsînin vê dibêjin.	çocukları şakayla ürkütmek için söylenir	interjection pour faire plaisamment peur à un(e) enfant	an interjection like saying «boo» to excite an infant
bebê : ji bo gazîkirina zarokên keçînî dibêjin.	kız bebeği çağırma formu	forme vocative pour appeler une bébé	vocative form for calling a baby girl
bebî : 1) bebek, bebe, bebik ; 2) bûkik	bebek	1) bébé ; 2) poupée	1) baby, 2) doll
bebo : ji bo gazîkirina zarokên kurînî dibêjin.	Erkek bebeği çağırma formu	forme vocative pour appeler un bébé	vocative form for calling a baby boy
bilo, pilo : cûcik, bilik	çük	zizi	pee pee
biok, biho, bi'ok : 1) bihuk, kurm û kurmik, 2) heywan	(çocuk dilinde) böcek	bebette (insecte), bestiole	bug (insect)
bive, pive, biv, çiz : tehlûke, xeter	tehlikelidir	c'est dangereux, attention bobo!	it's dangerous, careful boo boo!
bive bûn, pive bûn : (bi) tehlûke bûn, (bi) xeter bûn	tehlikeli olmak	être dangereux	to be dangerous
bu' : gava ku dixwazin zarokan bi heywanekî bitirsînin vê dibêjin	çocukları bir hayvanla korkutmak için söylenir	hou, se dit pour faire peur aux enfants avec une bête (loup)	ooooh, interjection used to frighten a child as if a wolf was coming
cîcî kirin : xweşik kirin, xemilandin xwe cîcî kirin : xwe xweşik kirin	cicilenmek, süslenmek	se faire beau (belle)	to make oneself pretty
cîcî bike! : xweşik bike!, bixemilîne!	cicilen	fais-toi beau (belle)	make yourself pretty
cîcî bûn : xweşik bûn, xemilîn	cici olmak	être mignon	to be cute
cîcî : xweşik, rindik, bedew, ciwan, law, spehî, xasek	cici	beau, mignon	pretty, cute
cîrceq : babûtanî, zirnezîq, tingilafistan, tingilafistî. Li hin deveran, gava ku zarokan li babûtaniyê siwar dikin, dibêjin : "cîrceqê sabûnreqê".	tahterevallı	balance	teeter - totter
cûcê, tûtû : mirişk	tavuk	poulet	chicken
ça'ço, çe'ço, çehço : çav	göz	oeil	eye
çeç, çeçik, çeço, deço, pepik, tet, tetê, teto : dest. Li hin deveran, gava ku bavek destvala ji bajêr vegere malê, ji zarokan re vê dibêjin : "pepikan l´hev xe babo hat, ker firot û destvala hat".	el	main (menotte)	little hand
çîk, çîq, çî', dîq : gava ku bi zarokan re dilîzin bi maneya "min tu dîtî" vê dibêjin û dom dikin : "çîk, baqle baçîk!".	seni gördüm	coucou !	peek-a-boo !
çîkçîk : çûk, çivîk	kuş	oiseau	bird
çiço : memik, çiçik	meme	nénés (téton)	nipples
çik çik, eçê eçê ! : ji bo ku zarok li ser piyan rawestin vê peyvê dibêjin.	Bebeklerin ayakta durmaları için söylenir	se dit aux bébés pour qu'ils se tiennent debout	«upsy-daisey» expression to encourage babies to stand up
çiz kirin : 1) dax kirin, 2) şewitandin, sotandin	yakmak	brûler	to burn
çiz bûn : 1) dax bûn, 2) şewitîn, sotin	yanmak	être brûlé	to be burnt
çiz : 1) xeter, tehlûke, 2) germahî, agir, ar, şewat	1) tehlike, 2) ateş, yakıcı	1) danger, 2) feu, brûlant	1) danger, 2) fire, burning
çoço : ker	eşek	hi han (âne)	donkey
çûçî kirin, çûç kirin, çûçê kirin, tot kirin, tûtî kirin : rûniştin	oturmak	s'asseoir	to sit down
çûçî bike !, çûç bike !, çûçê bike !, tûtî bike !, tot bike ! : rûne !	otur	asseids-toi!	sit down !
çûçî, çûç, çûçê, tûtî, tot : rûniştin	otur	assis	sit
çum çum kirin : 1) serê xwe şûştin, 2) ketin avê, ajnê kirin	1) yıkanmak, 2) yüzmek	1) se laver, 2) nager	1) to wash oneself, 2) to swim
da, dada, eda, dado, dadê, inê (ji tirkî) : dê, dayik	anne	maman	mum, mummy; mom mommy
dehdeh : hesp	at	dada (cheval)	horsey
dirrin dirrin : makîne	makina	machine, appareil	machine, apparatus
dûdê : pez	koyun	mouton	sheep
e e e ! : ji bo ku zarok razên vê dibêjin	çoçukları uyutmak için söylenir	dodo !	«bed-y-bye», night-night
ehe kirin : kuxîn	öksürmek	tousser	to cough
etê : 1) et, xwîşka mezin, li hin deveran ji bo dê jî dibêjin, 2) xwîşkê, hekê, hakê !	abla, bazı yörelerde anne için de söylenir	grande soeur, soeur aînée, dans certaines régions se dit aussi pour la mère	elder sister, big sister
ex kirin : 1) ji devê xwe derxistin, 2) tif (tû) kirin	ağzından çıkarmak, tükürmek	cracher, baver	to spit up, drool
'e, 'e'e, e'e, 'ek, 'ey : 1) pîs, 2) gû	1) pis, kötü, 2) bok	1) pas beau (mauvais, vilain), 2) caca	nasty, dirty, é) caca
'e bike !, e'ê bike !, 'e'e ! e'ê !, 'ek ! : gû bike	kaka et	fais caca	go caca, go poo poo
'e bûn, e'ê bûn, 'ek bûn, 'ey, 'ehê : pîs bûn, lewitîn	pislenmek, altını kirletmek	se mouiller	wet oneself
'e kirin, 'e'e kirin, e'ê kirin, 'ek kirin, 'eke : pîsiya xwe kirin, destava xwe ya mezin kirin, gû kirin	sıçmak	faire caca	to go caca, to go poo poo
'eç bike !, 'eç !, 'eçî !, 'eç'eç ! : lê bide !	vur	frappe, cogne	hit, strike, to hit asainst something
'eç kirin, 'eçî kirin, 'içê kirin, 'eçê kirin, 'eçe kirin, kûta kirin, qutî kirin: lê dan, lê xistin, kutan, qutan	dövmek, vurmak	battre, frapper	to hit, to slap
'em kirin, 'emî kirin, 'epî kirin, hem kirin, 'epo kirin, 'epo : xwarin	yemek	miam (manger)	yum-yum (to eat)
'em bike !, 'em !, 'emî bike !, 'emî !, epî bike !, 'epî !, 'epo bike !, 'epo !, 'epo bixwe !, hem bike!, hem ! : bixwe !	ye !	mange !	eat !
'em, 'emî, 'epî, 'epo, hem, hepo : xwarin, xurek	mama	nourriture, miam-miam	food, yum-yum
'ew'ew, 'ewo, 'ew'ew, kûçî, kûço, hepo, wowo, vûve, kûço : se(g), kûçik, kûtî, kûto	köpek	toutou (chien)	doggie, puppy
fi kirin, fû kirin, pû kirin: 1) pif kirin, 2) bi pifê sarkirina xwarinê	üflemek, üfleyerek soğutmak	souffler	to blow
fin: difin, poz, bêfil, kepû, lût	burun	nez	nose
fofo : ji bo xwarinên wek savar û birinc dibêjin	çocuk dilinde pilav	riz, pilaf	rice, pilaf
girgirok, dardarok: 'ereboka bi sê toterîkan ya ji bo fêrkirina birêveçûna zarokan	çocuklara yürümeyi öğretmekte kullanılan üç tekerlikli araba	voiturette à 3 roues pour apprendre aux enfants à marcher (bébé trotte)	3 wheel apparatus to teach infants to walk, «baby walker»
gize kirin : gez kirin, kit kirin	ısırmak	mordre	to bite
gize bike !, gize!, gez !	ısır !	mords !	bite !
gix : ji bo ku zarok bikenin vê dibêjin	gül !	guili-guili, se dit en chatouillant un bébé pour le faire rire	giddy-giddy, said while tickling a baby to make him/her giggle
gixkan bike ! : bikene !	gül !	risette (rire) !	smile ! (giggle)
goço : goşt	et	viande	meat
goganî : ji bo ku zarok serê xwe kil bikin vê dibêjin	başını sağa sola sallamak	hocher de la tête	to shake, to nod one's head
hadê, heydê ! : de em herin !	haydi	vas-y, allons-y	go on, lets go
hêjanî : ji bo hejandina zarokan dibêjin	çoçukları sallamak için söylenir	l'action de bercer un enfant dans un berceau	the rocking an infant in a cradle
hêzok : hembêz, himêz, hemêzok	koyun, bağır	sein, giron	breast
heçî berê, gula zerê : ji bo ku zarok werin ba mezinan ew vê dibêjin û yê ku pêşî têt şekir didinê.			
hela hela ! : de rabe were !	gel bakalım !	viens ici !	come here !
hopanî : ji bo hopkirina zarokan dibêjin			
hozanî, zozanî : ji listika ku mezin xwe li ser piştê dirêj dikin û herdu pêyên xwe didin ber zikê zarokan û wan li ser zik radikin			

hewayê dibêjin. Li hin deverên din jê re hozanî jî tête gotin.			
ime, mem : 1) tî, têhnî, 2) ma tu tî yî ? / ez tî me, 3) av dayîna zarokan, av xwastin	su	wa wa, boire (eau)	wa wa, to drink (water)
kaka : ji bo tiştên wek şekir, şekirok û çikolate dibêjin	bonbon, çukulata gibi tatlı şeyler	bonbon	sweets, candy
keka, keko, kek : birayê mezin. Li hin deveran ji bo bav jî dibêjin.	Abi, ağabey	grand-frère, frère aîné	elder brother, big brother
kidê : kara bizinê, kar, karik. ji bo bizinan jî tête gotin.	kuzu	caprin, chevreau	kid
kite kite : gava ku zarok dikuxin mezin destê xwe li pişta wan dixin û vê gotinê dibêjin. Ango : helal helal !, para te para te !	çocuk öksürdüğünde büyükler sırtlarına vurup söyledikleri söz	formule dite par les adultes lorsqu'un enfant tousse	comment by adults to children when they cough
kix kirin : pîs kirin, kirêt kirin	kirletmek	salir, souiller	to dirty
kix bûn : pîs bûn, kirêt bûn	kirlenmek	se salir	to get dirty
kix, kîx, be' : pîs, kirêt	kıh, pis, kötü	caca (sale, vilain)	dirty, nasty, caca
kûk ! : ji bo ku zarok li mirovî binihêre vê dibêjin	baksana	coucou	peek-a-boo
lalî kirin, ahê kirin, ela kirin, elak kirin, îdî kirin, lele kirin, lala kirin, lolo kirin, lolî kirin, tatê kirin, hahê (hayê) kirin, nenî kirin, nînî kirin, ule kirin : razan, raketin, nivistin, ramedan, xew kirin	uyumak	faire dodo	to go bed-y-bye, night-night
lalî, ela, elak, îdî, lele, lala, lolo, lolî, tatê, hahê (hayê), ahê, nenî, nînî, ule : xew	uyku	dodo	to take a nap
lorik : sawa, dergûş	beşik	berceau	craddle
lûlû kirin, çizê kirin, bel kirin, bil kirin : mîz kirin, mîztin, destava xwe ya piçûk kirin, pij kirin	çişini yapmak	faire pipi	to wee-wee (b.b), to go pee pee
lûlû bike !, lûlû !, çizê bike ! bilo bilo !, belo belo ! : mîz bike !	çiş !	fais pipi !	wee-wee ! (b.b), go pee pee
lûlû, çizê : mîz, destava piçûk, pêşav	çiş	pipi	wee-wee, pee pee
maç maç, pû'pû' : 1) dengê maç kirin û maç jê standinê ye, 2) maç, paç, ramûsan	öpücük	bisou	kiss
mamo : mam, ap	amca	tonton	uncle
me'ik : berx	oğlak	agneau	lamb
me'e, me'me' : pez, mîh	koyun	mouton	sheep
memî : xwarin, xurek	mama, yemek	nourriture pour enfant	baby food
même, memo, mîmî : mêjok, memik : 1) mêjok, memik, 2) memik, çiçik 3) li hin deveran ji bo avê jî dibêjin	1) emzik 2) meme	1) tétine 2) sein, téton	1) pacifier 2) nipple
mi'o, te'te', çêlê : çêlek, çêl, manga	inek	vache	cow
na na na ! : ji bo ku zarokan aş bikin vê dibêjin	çocukları yatıştırmak için söylemir	se dit pour apaiser les enfants	said to appease children «shh-shh»
nanî, nene : nan	ekmek	pain	bread
naynay kirin, nîna kirin : dîl kirin, govend girtin, reqisîn, dans kirin	oynatmak	faire danser	to make someone dance
naynay bike !, naynay !, nîna bike !, nîna !, : dîl bike !	oyna !	danse !	dance !
nono : kinc û cilên nû	yeni elbise	vêtement neuf	new clothes
papîk : tiştên ku dixin pêyên zarokan	çocukların ayaklarına giydirilen	chausson	baby slippers
papol : solên (pêlavên) zarokan	çocuk ayakkabısı	chaussure d'enfant	baby shoes
pepe : nan. Lin hin deveran ji bo ku zarok xwarina xwe bixwe vê peyvê dibêjin	1) ekmek, 2) ye !	1) pain, 2) mange !	1) breat, 2) eat !
pepo, papo, pepê, pêtik, pep : pê. Li hindek deveran pepo ji bo nan jî dibêjin	ayak	pied	foot
piçê, tixo, 'olik : golik	dana	veau	calf
pifo, pifok, fifok, fifo : xwarina germ	sıcak yemek	repas chaud	hot meal
pişo : pisîk, pişîk, kitik	kedi	minou, miaou (chat)	pussy (cat)
pitê ! : bebeka keçînî. Ji bo gazîkirina bebeka keçînî jî dibêjin.	dişil bebek	bébé (de sexe féminin)	baby girl
pitik : zaroka piçûk, dergûş	bebek	bébé, nouveau-né	baby
pito : bebekê kurînî. Ji bo gazîkirina bebekê kurînî jî dibêjin.	eril bebek	bébé (mâle)	baby boy
pixk ! : ji bo ku zarokan bi henekî bitirsînin vê dibêjin		hop là !	
qoço, tek lolo !: gava ku dixwazin bi zarokan re qoç bilîzin vê dibêjin	toslama	donner un coup de tête	to butt (with the head), billy buck
qulopanî, qulopinc : navê lîstika teqle avêtinê ye	takla	culbute	somersault
şoşo kirin, soşî kirin, şoşî kirin : sûştin	yıkamak	laver	to wash
taytay kirin, dardar kirin, tena (tinê) kirin, westê kirin : li ser pêyan sekinîn	ikı ayak üstünde durabilmek	se tenir debout	to keep oneself up
taytay bike !, taytay !, tay ! dardar bike !, dardar !, westê bike !, westê !, tena (tinê) bike !, tena (tinê) ! Li hin deveran, gava ku mezin dixwazin zarok li ser pêyan rawestin, dibêjin : "tinê tinê, bejna dinê": li ser pêyan bisekine !	bebeklerin ayakta durmaları için söylenir	debout ! (se dit pour les bébés qui commencent à se tenir debout)	stand-up ! (expression to encourage babies to start standing upsy-daisy
tetik : lepik, destkêş, destgork	eldiven	gant	glove
tîtî, tîtîk, çîçî, tîtik : lîstok	oyuncak	joujou, jouet	toy
tîq ! : ji bo ku zarok bikenin vê dibêjin	gül bana, gülsene !	fais risette	smile, give me a smile
toto : qûn	kıç, popo	fesse	bottom, butt
ufe bûn: germ bûn	sıcak olmak	être chaud	to be hot
ufe : germ e !	sıcak	chaud	hot
uve bûn: sar bûn	soğuk olmak	être froid	to be cold
uvvv : sar e !	uv !, soğuk !	froid	cold
wişik, pişik pişik: gava ku dixwazin zarok bikenin tiliya xwe li lêvan didin û vê dibêjin	haydi gül !	fais risette !	give me a smile !
xitik, xeto : bebeka keçînî	dişil bebek	bébé féminin	baby girl
xûçê, xwekê !: 1) xwîşk, 2) xwîşkê!	bacı	frangine, petite soeur	little sister
navên gehînekên biserpêyan ketina zarokan	**çocukların ayakta durabilme evreleri**	**étapes d'évolution des enfants jusqu'à ce qu'ils se tiennent debout**	**stages of babyhood until they stand**
1 - qûnçûçkî, qûnçûçî, liqûnrûniştin, li ser qûnê rûniştin di vê gehînekê de zarok 5 - 6 mehî ne û êdî dikarin li ser qûna xwe rûnin.	kıç üstü oturabilmek (5-6 aylık çocuk)	se tenir en position assise (vers 5,5 - 6 mois)	to sit up (about 5,5-6 months)
2 - qûnkişk, qûnxişk gava ku zarok dikarin xwe li ser qûna xwe bixişînin û herin.	kiç üstü ilerleme	se traîner sur les fesses	to scoot on one's backside
3 - zikkişk, zikxişk, xuşîn di vê gehînekê de zarok dikarin xwe li ser zikê xwe bixişînin û herin.	yüz üstü sürüklenerek ilerleme	avancer en rampant à plat ventre	to crawl on one's stomach
4 - çarlepîk, çarlepk, çarpîk, çaplûk, çepelî gava ku zarok dikarin bi çarlepkî bi rê ve herin.	emekleme	marcher à quatre pattes	to crawl on all-fours
5 - taytay, tenatena, tenêtenê, westêwestê, dadar gava ku zarok nû dikarin li ser pêyan bisekinin.	ayakta durabilmek	pouvoir se tenir debout	to stand upright (erect)
6 - gavavêtin gehîneka ku zarok êdî dikare gav biavêje.	yürümeye başlamak, adım atmak	faire les premiers pas	to take one's first steps, to toddle
7 - kostekqetandin, bendikqetandin zarok êdî dikare xweş bi rêve here. ji bo vê jî bendekî (kostek) piçekî xav bi herdu pêçiyên mezin yên zarok ve girê didin û dihêlin ku ev bi rêveçûnê wî bendî biqetîne.	ipini koparmak, kendi başına yürüyebilmek	il est devenu autonome pour marcher	he can walk by himself, on his own toddler

Îdyomên kurdî

(IV)

Amadekar : Mustafa AYDOĞAN
Hemîd KILIÇASLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
bi çar çavan girîn, bi xwe de pûkîn	iki gözü iki çeşme ağlamak, gereksiz yere sürekli yakınmak, şikayet edinmeyi alışkanlık edinmek	se plaindre à tout propos, à tort	to complain about everything for no reason
bi der û ro de çûyin : bi ser de barîn, rijîn, (Xwedê dayê, tê de digevize)	çok zengin olmak, mal içinde yüzmek	être très riche, nager dans l'opulence	to be very rich rolling in wealth (rolling in money)
bi dê û bav kirin ; cî bi cî kirin	yerli yerine oturtmak, kanıtlamak	étayer solidement	to prove, establish
bi korayî (nezanî) ketin nav	körü körüne bir işe girmek	s'engager aveuglement	to undertake blindy
bi ser çavên xwe de mîstin : xelk ji xwe dûr xistin; pê re bazar nebûn	itici olmak, kimseyle anlaşamamak	repousser, éloigner les gens; être impossible à s'entendre avec	to be repelling people, to be repulsive
bi ser kodika tije girîn	tok karna, varlığa rağmen ağlamak, yakınmak	pleurnicher, se lamenter sans manquer de rien	to lament while lacking nothing to snivel, to whine
bi şilfa... xwe ketin	çabasız zahmetsiz servet sahibi olmak	faire fortune sans efforts (grâce à un mariage, etc.)	to make a fortune without effort (eg by marriage)
bila kumê me li ser keçeliya me be, bila serê gurrî di bin kum de be...	külahımız kelimizi örtsün, kırılan kol yen içinde kalsın	que le chapeau cache bien notre crâne chauve ; lavons en famille notre linge sale	let's wash our dirty linen in private
bilind firîn	yüksek uçmak	avoir des prétentions excessives, irréalistes	to have excessive (unrealistic) expectations
bilind firîn û nizm ketin	yüksek uçup alçak düşmek, umduğunu bulamamak	prétendre voler haut et tomber bas	pride comes before a fall
bilind kuxîn	büyüklük iddiasında olmak	prétendre jouer dans la cour des grands	to give oneself airs
bilûra (li) ber guhê gê (gayî) ye : wekî ji dîwêr re bêjî, deng nabe xwe û bi ya xwe dike	bildiğini okumak, kulak asmamak	jouer de la flûte pour un boeuf (qui n'entend pas la musique); parler en vain, parler à un mur	talking to brick a wall, to speak in vain
bin cil (berr) kirin	hasıraltı etmek, sümen altı etmek	laisser sans réponse une demande, mettre sous le boisseau	to shelve a matter, to leave unanswered (requests)
bin şil bûyîn	ayıplı, kusurlu olmak, gizli aybı olmak	avoir des casseroles, avoir des choses à cacher	to have something to hide
binguh (belegoşk) germ kirin: lê xistin	kulaklarını okşamak, tokat vurmak	donner une gifle	to slap, smack
bin xwe dagirtin	altını doldurmak, yükünü tutmak, köşeyi dönmek	faire fortune	to get rich
bin çengê wî germ kirin	kurşunlamak	fusiller	to shoot
bin filitî ye, bin avêtî ye, goşt daye pisîkê	kızlıktan düşmüş	elle est déflorée	she was deflowered, lost her virginity
binfilitî	savurgan, dipsiz kuyu	prodigue	profligate, spendthrift
bi nan û perçeyekî li ber gerîn	dünden razı olmak, işe teşne olmak	être tout prêt pour ; ne pas demander mieux	to be eager to do it, to be chafing at the bit
beqa nekirin, av negihiştin ser, av bi ser de nexwarin ; di cîh de mirin	düşüp anında ölmek	tomber raide	to drop dead
bê bintar	asılsız, esassız	sans fondement	without any basis, baseless, bottomles
ba di ber de nare /naçe	dört dörtlüktür, eksizsiz ve mazbuttır	c'est du béton, impeccable, travail parfait	watertight, solid, impeccable, flawless, perfect
bask (perr) tune pê bifire, ji kêfa piyê wî/ wê erd nagire	sevincinden uçmak	fou de joie, sur un nuage	ecstatic, on cloud nine
benê xwe qetandin	ipini koparmak	rompre ses attaches	to sever ties (with family, morale)
brayê xwarinê	iyi gün dostu	ami des beaux jours	fair weather friend
birê bûkê, serê biskê	imtiyazlı, torpilli	privilégié, favorisé, qui a la part belle	priviledged, favoured
bi erdê de çûyîn, ketin binê erdê	utançtan yerin dibine girmek	passer sous terre (de honte)	to hide one's head in shame
kerê yekî ajotin	birinin ardından konuşmak, dedikodusunu yapmak	médire, dire du mal de quelqu'un	to slander, talk behind someone's back
bi şûnîkan bi şûna yekî ketin	giyabında birine öfkelenmek, söylenmek	maugréer, pester contre quelqu'un (en son absence)	to curse, nun doun s.o. (in his/her absence)
bizmarê tiştekî danîn (xistin) avê	ipe un sermek, aldatarak oyalamak	avancer des prétextes creux, inconsistants, renvoyer aux calendes grecques	to make vain excuses, to put sth off indefinitely
bi yekî ve bûn benîşt	birine sakız gibi yapışmak, peşini bırakmamak	être collant, importun, importuner	to importune, to dog s.o., to stick to s.o. like glue
çêleka ser pirê : her kesê ku tê karê xwe pê dike	her gelenin işini gördüğü kişi	bonne à tout faire, personne utilisée par tout le monde	jack-of-all-trades
çêleka zer, çêleka nîsê	kendi sütüyle dolu bakraçı tekmeleyip döken inek; emeklerini boşa harcıyan	la vache qui renverse par un coup de pied le seau rempli de son lait, personne qui après avoir fait du bon travail détruit les fruits de son travail	s.o. who does a good work then turns around and destroys the fruits of his labor
bû doza Ereba, hilka Erebê, bû mesela gayê Kanika	yılan hikayesine dönüştü	histoire interminable, problème insoluble	a long-winded story, something that never ends
bû wek şêxê pê li bizota dike, filfil (îsot) ketiye qûnê	paniğe kapılmak, çok acele etmek	être sur le feu, se précipiter	to panic, to rush
bû noka li kevir : ji hev belav bûn	çil yavrusu gibi dağılmak	se disperser aux quatre coins du monde	to be scattered to the four corners of the world (globe)
bû dizê sola (çovê) xwe	pabucunun hırsızı olmak, haklı iken haksız duruma düşmek	(litt.) Devenir le voleur de ses propres chaussures; se trouver en position de coupable alors qu'on a raison	to be considered at fault when one is actually (in the) right, (litt.) "to steal one's own shoes"
bû kurkê qetyayî ; ne bi kuştin tê ne bi hiştin : bûye cil kete mil	ne atılır ne satılır	quelqu'un ou quelquechose dont on ne sait que faire, qu'on ne peut ni jeter ni garder	a person or thing that one doesn't know what to do with, should one keep it or get rid of it ?
canê yekî kirin (wekî) serrad	birini ateşli silah ile delik deşik etmek	cribler quelqu'un de balles	to riddle s.o. with bullets

canê yekî xirt xirt kirin, kert kert kirin : dan ber kêran	birini bıçak ya da hançerle delik deşik etmek	cribler quelqu'un de coups de couteau ou de poignard	to stab s.o. over with a dagger or a knife, to stab in the back
caw cawê te, meqes meqesa te ye; caw cawê te ye;	köy senin harman senin ; at ata biçirrîne : heta dikarî derewan bike bildiğin kadar	(litt.) La toile est tienne, les ciseaux sont tiens ; tu peux la couper à ta guise ; se dit de quelqu'un qui ment avec exagération, sans retenue	litt. "the cloth is yours, the scissors are yours : cut the cloth as much as you like" ; said of an incorrigible (inveterate) liar
cemeda ser dilê xwe helandin ; dilê xwe rihet kirin	emeline ulaşmak	assouvir sa soif, sa vengeance	to satisfy, assuage, quench (thirst revenge)
cewdikê xwe vala kirin	kurdunu dökmek (cinsel)	tirer un coup (sexuel)	to have a quickie (sexual encounter)
cewdikê wî tije bûye	kurtlanmış (cinsel)	il est en rut	he is on rut, horny
cicokî ketin rê : peyatî û destvala bi rê ketin	yaya ve eliboş (silahsız) yola koyulmak	se mettre en route à pied et sans armes	to set out on a trip.. on foot and unarmed
cîhê lê dimîze giha lê şîn nabe : pirr no ye	o kadar hırçın ve belalı ki işediği yerde ot bitmez	il est tellement belliqueux et dur que là où il pisse l'herbe ne pousse pas	the grass does not grow where he urinates, he is very tough
bê dev û şîpan e	patavatsız	impertinent, irréfléchi	who talks at random and thoughtlessly, tactless, one who talks off the top of his head
cila wî bê berwêr e : doq e	lafını bilmez, nerde ne diyeceğini bilmez	il parle à tort et à travers ; il est impertinent	he talks a lot of nonsense, he knows no limits (in speaking)
cilka (berka) xwe ji avê derxistin : ji heqê xwe hatin	kendi kendine yetmek, idare etmek	se débrouiller, s'en tirer	to extricate oneself (from difficulties), to manage, to be self-sufficient, to get by
cilkirina gê piştî baranê	iş işten geçtikten sonra davranmak	(litt.) revêtir le boeuf après la pluie ; agir trop tard	to act too late when it's all over, to close a stable door after the horse has bolted
cilka bênamûsiyê kişandiye serê xwe; cilik kişandiye serê xwe ; kumê bênamûsiyê daye serê xwe	rezilliği kabullenmek, hakkında söylenenleri duymamazlıktan gelmek	se résigner à l'opprobre ; ne pas agir contre l'infamie	to resign o.s. to disgrace (infamy), to do nothing to counteract a scandal
cineta bi minet : qenciya bi minet	başa kakılan iyilik	faire du bien à quelqu'un et le lui rappeler sans cesse	not to let s.o. forget that you've done them a favor
cinikên (cinên) wî hatine dorê ; cinik hatinê	deliliği tutmak	retrouver ses vieux démons	to revert to an earlier state of insanity to have a relapse
curma ser cîrana ye	ceremesini başkasına ödetmek /çektirmek	faire payer à autrui ses fautes	to mahe others pay for one's own faults

Ferhengoka *Hawarê*

(IV)

Amadekar : Zinar SORAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
rêvîn, rêving	kirli	sale	dirty
hevêrk : herêm	bölge, mıntıka	district	district
zergoz : bi latînî *Carya fraxinifolio*			
bizo, bizî	kara ağaç	orme	(wych) elm
tanî kirin	çitlemek	entourer de haies	to hedge
tanî : ji darên berû, spindar û mazûyan çê dibe; bi heriyê diseyînin dikin çît			
çît	çit	haie	hedge, fence
olî : xaniyê du qatî, binê wê gom e, serê wê menzeleke mezin a pêşvekirî ye	iki katlı köy evi, altı ahır, üstü oturulacak ev	maison à deux étages dont le premier sert d'étable	two story house whose first floor is used as stable
navko : xaniyê yek qatî	tek katlı ev	maison sans étage	one story house
jûvan : poşman, peşîman	pişman	qui a du regret	regretful, sorry, remorseful
rejû, reşû, rejî	kömür	charbon	charcoal
avdiz : di kelehan de riya dizî ya ku tê de dikarin avê bînin	kalelerde suyun getirtildiği gizli yol	aqueduc secret d'une forteresse	secret water conduit (of a fortress)
direh : garisê spî	ak darı	millet	millet
fetandin, fetihandin	ekilmemiş bir araziyi ziraate hazırlamak	défricher une terre et la rendre cultivable	to bring land into cultivation
bêrm	krater gölü	lac de cratère, lac de montagne	crater mountain lake, small mountain lake
şkev : qabek ji dar çêkirî	tahtadan kap	boîte ou récipient en bois	wooden box or vessel
wişk, werşeq, weşek	vaşak	lynx	lynx
qwîz, kûze	sansar	putois	Martes foina, polecat, skunk
kurîbeşk : kurebeşk	porsuk	blaireau	badger
heftar : keftar	sırtlan	hyène	hyena
sîxur	köstebek	taupe	mole
segavî	kunduz	loutre	otter
marmarîşok, gumgumok, balîfrezk, şemşemotik	kertenkele cinsleri	variété de lézards	types of lizard
sêvil, sêvelok, xilt, koremişk	tarla faresi	rat des champs	field mouse
zof, sarmar, şermar, bijmar, jarmar	kırkayak, çiyan	mille-pattes	centipede
tîrmar, tîremar	ok yılanı	couleuvre à collier	grass snake
hişkeber, dîwarê hişkeber	harçsız (duvar, bent)	(mur, muret) construit par empilement des pierres sans ciment	stone wall built without cement duy-stone wall
bereste, berheste, kevirheste	çakmak taşı	pierre à briquet	flint-stone
pandî : panêr	bekçi, nöbetçi	gardien, garde	guard, sentry
pandîgeh	gözetleme ya da nöbet yeri	poste de garde	sentry box, cabin
bazgûrî, başkûrî, berzûrî	yakarma	supplication	supplication
xwe bazgûrî, başkûrî, berzûrî Xwedê kirin	Tanrıya yakarmak	supplier le Seigneur	to implore, to beg the Lord
qelaçe : çeper	küçük kale	fortin	small fort
hêreker	şahit, tanık	témoin	witness
tinawir : xwedan tîn	canlı, diri	vivant	alive, living
lêvok, lêpok	eğlendirici	amuseur, comique	entertainer, comedian
lêvokî kirin	eğlendirmek	amuser	to entertain, to amuse
pîşekar	1) kahya, 2) teşrifatcı, sunucu	1) intendant, 2) présentateur	1) factor, manager (of estate), 2) presenter, introducer (of pers.)

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
© **INSTITUT KURDE DE PARIS**
106, rue La Fayette, 75010 Paris - France
Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN**
Réalisation : **S. ILITCH & M. HASSAN**

hejmar 23 payîz 1998

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan
Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Biskops Arnöyê ya 23yemîn

5-11 nîsan 1998

Civîna 23emîn ya *Kurmancî* li Biskops Arnöyê (Swêdê) di navbera 5 û 11ê nîsana 1998 de çêbû. Di vê civînê de kesên beşdar li ser termên aborî, îdyomên kurdî, nifrînên kurdî, devoka Qerejdaxê, nexweşiyên heywanan, endamên laş û îdyomên jê çêdibin û ferhengoka *Hawarê* xebitîn.

Di vê civînê de Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Lutfî Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbekir), Michael Chyet (Waşîngton), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Selam Nûman (Cizîr), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Şucaî (Şikak), Newzad Şukrî (Dihok), Têmûrê Xelîl (Rewan), Memo Yetkin (Semsûr), Veysî Zeydanli (Bidlîs) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên cîvînê di vê hejmara *Kurmancî* de tên belav kirin.

Devoka Qerejdaxê

(VII)

Amadekar : Mahmûd LEWENDÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
pişo pişo kirin	yatıştırmak, küçük tavizlerle idare etmek	caresser dans le sens du poil, apaiser to appease, to ease	to stay on the right side of sb.,
pişrûng, pişrûk	1) tam yoğrulmamış hamur, çamur vb, 2) küçük ekmek kırıntısı, buğday unu 3) un, su ve tuzu karıştırıp hafif pişiril ve oğlaklara verilen bir yemek	1) farine, glaise etc. insuffisamment pétrie, 2) fine miette, 3) mélange de en farine, d'eau et de sel légèrement cuit donné en pâture aux agneaux	1) insufficiently kneaded flour, clay, 2) mixture of flour, water and salt, shightly cooked and given to lambs
pitik	bebek	bébé	baby
pizirik, pirzik, pizrik, pirzûk	küçük çoban, sivilce	bouton, pustule	pimple, pustule
kwînêr, kînor, kunêr	kan çıbanı	abcès	abcess
pizirîn : ji hev çûn (ji bo qumaş)	aşırı kullanılmaktan çözülmek, dağılmak	être élimé, s'élimer	to wear thin, to come apart (for a well-worm fabric)
pî	kol	bras	arm
pîj : şîşika gora, singik, sixrik	şiş, çorap şişi	aiguille à tricoter	knitting needle
pînc, pîç, bêjî	piç	bâtard	bastard
pingalî	yataklık etme, suçluyu koruma, barındırma işi	recel de malfaiteur	concealment of a criminal
pingalî kirin	yataklık etmek, suçluyu barındırmak	receler un malfaiteur	to conceal (a criminal)
pîqut, pîkin, hîçikkurt	yarım kol gömlek, yelek ve benzeri	manches courtes (chemise, gilet, etc.)	short sleeves (shirt, etc.)
pîr'abotk : pîrhevok, pîrabok	bebekleri kaçıran, insanları aldatıp beraberlerinde götüren efsanevi yaşlı kadın	mégères ou mauvais génies mythiques qui enlèvent des bébés, qui séduisent des gens et les emmènent chez eux, dont on peut se protéger par une aiguille ou un objet en fer	shrews or mythical evil spirits who kidnap babies, seduce people and take them to their home, against whom one can protect o.s. with a needle or iron object
pîrût	çıplak kollu	qui a les bras nus	bare armed
pîspîsk, fîrfîrk	düdük	sifflet	whistle
pîşo	1) yanık bez kokusu, 2) kav	1) odeur de chiffon brûlé, 2) amadou	1) smell of burnt wool, 2) tinder
pîvazok	soğan yahnisi	ragoût d'oignon	onion stew
karî, kardî	dana ayağı	arum, pied-de-veau	calf's-foot, arum
pizpizêk, pirpizêk	kardelen	perce-neige	snowdrop
pîvong, pîvok	çiğdem ?	scille	spring squill
polat : pola	çelik	acier	steel
pozşimk, xizêm	hızma	ornement en or incrusté dans la narine d'une femme	woman's golden nostril ornament
post kirin, kevil kirin : bi kêrê guran		derisini yüzmek	écorcher un animal to skin (animal)

Termên hiqûqî

Amadekar : Veysi ZEYDANLI

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
serwerî	hakimiyet, egemenlik	souveraineté	sovereignty
serwer	hakim, egemen	souverain	sovereign
serdest	başat, ağır basan, hakim, üstün	dominant	dominant
serdestî	başatlık, ağır basma, üstünlük	domination, dominance	domination, dominance
karîn	iktidar	pouvoir	power
karîna siyasî	siyasi iktidar	pouvoir politique	political power
qanûn danîn	yasamak, kanun çıkarmak	légiférer	to legislate
qanûn danîn	yasama	législation	legislation
karîna qanûndanînê	yasama gücü	pouvoir législatif	legislative power
qanûndanêr	kanun koyan, yasa koyan	législateur	lawmaker
birêvebirin	yürütme	exécutif	executive
karîna birêvebirinê	yürütme gücü	pouvoir exécutif	executive power
dengdana pêbaweriyê	güven oylaması	vote de confiance	vote of confidence
desthilat	yetki	autorité	authority
deshilatdar	yetkili	responsable, qui a le pouvoir, l'autorité	who has the authority, responsible competent
ziyan	hasar, zarar	dommage, perte	damage, harm, loss
bêziyan	zararsız	inoffensif	harmless
ziyandîtî	mutazarar, zarara uğramış	lésé, qui a subi des dommages	injured, who suffers loss or damage
ziyankar, ziyanker	zarar verici, zararlı, zarara neden olan	nuisible, dommageable, préjudiciable	harmful, detrimental prejudicial
ziyanok	zarar verici	nuisible	harmful
kurmikên ziyanokî	zarar verici haşareler	insectes nuisibles	harmful insects

Peyvên kêmnas

Amadekar : Michael CHYET

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
serşivan	çobanbaşı	berger en chef	chief shepherd
şivan	çoban	berger, pâtre	shepherd
dûajo, dûşivan	yardımcı çoban, çoban yamağı	aide-berger	assistant shepherd
ajorî	sürüyü bir yerden bir yere götürme, sürme	déplacement d'un troupeau sur une longue distance	dispacement of a herd for a long trip
avrû, avrî	yiyecek, içecek artığı	restes de nourriture ou de boisson	remains of food or drink
bihitandin : hetikandin	rezil etmek	déshonorer, flétrir, couvrir de honte	
motk	fol	nichée	nest egg
caxî	meclis, cemaat	assemblée, réunion	meeting, assembly
civat û caxî : civat û cemaet, kesê civat û caxiyan : ehlî cemaet	ehli meclis	personne présentable, digne d'assister à une assemblée de village ou de notables	person honourable admissible to a village assembly
çemçemok, pelşimok, pirçimok, şevşevok,	yarasa şevrevînk, perçemek	chauve-souris	bat
dûş, tûş : rêz	sıra, hiza	ligne, rang	line, rank
di dûşa hev de	aynı hizada	sur la même ligne, dans le même rang	
erhede	herhalde	en tous cas	in any case
givande, kivande	uçurum, yüksek yer vs. kenarı	bord (d'un précipice, d'une hauteur, etc.) bordure, berge	bank, embankment
gosirmet : xerîb, ecêb	acayip, tuhaf	étrange, étonnant, bizarre	strange, amazing, odd
guşme : deste	deste, küme	groupe, escouade	bunch, squad, band
hewdik : hewda biçûk	çanak	écuelle, bol	wooden bowl
heşyenk	barınak, sığınak	abri, refuge	shelter, refuge
kemberok, petîşok	ebu cehil karpuzu	coloquinte	colocynth, bitter apple
qereqûçk : qilîçk, qilîçek, qilîcan	serçe parmağı	auriculaire, petit doigt	little finger, pinkie
qerf û qûçik	alay, dalga	moquerie	mockery
tu qerf û qûçikê xwe bi min dikî	benimle alay ediyorsun	tu te moques de moi	you're making fun of me
qerimîn	yorgunluk hareketsizlik yada soğuktan uyuşmak	s'engourdir (de froid, de fatigue ou d'immobilisme)	to go numb, to become numb (with cold or fatigue
tevizîn : tezink girtin	kan dolaşımı yetersizliğinden uyuşmak	avoir des fourmis	to have pins and needles (in one's legs), one's legs have gone asleep
qerisîn	donmak	geler	to freeze
qertanoz	aşırı kartlaşmış olan hayvan veya insan	vieillerie, (personne ou bête), vieille peau, très âgée	old age
qertîş	kabuk, pul	écaille	scale (on skin)
qertîş girtin	kabuk bağlamak, pul bağlamak, pul pul olmak	être couvert d'écailles	to be covered with scales
qeşab : mehes, qeşaw	kaşağı	étrille	currycomb
qeşab kirin : mehes kirin	kaşağılamak	étriller	to curry
qetoberk, qetobeto : ben, werîs gava ku ji hev dikevin	lime lime olmuş ip yada urgan	corde usée, dont les brins se défont	frayed rope
qeyntirme	kantara, köprü, bina vb. kemeri	cintre (en architecture)	curve (architecture), arched (building)
qiçik : qeçik, pitik, bebik	bebek	bébé	baby
çîq: reşêle, reşçêle	kar kuşu	bruant des neiges	snow-bunting
qijik	karga; kimi yörelerde de saksağan	corbeau; dans certaines régions pie	crow; in some areas magpie
qijilandin : kelandina rûn, qijirandin	yağı kızartmak	faire bouillir le beurre, l'huile	to sizzle (butter, oil)
di rûnê xwe de qijilîn (qijirîn)	kendi yağında kızarmak	(litt.) cuire dans du beurre bouillant : ne pas tenir en place; s'agiter sans cesse	to be on hot bricks
qij qij : qijiqîn	kızaran yağın çıkardığı ses	bruit produit par l'huile bouillante	sound of sizzling oil
qilêrî : qirêjî	kirli, pasaklı	sale, crasseux, malpropre	dirty, filthy
qilêrî kirin	kirletmek	salir, souiller	to dirty, to make dirty, to soil
qilop : qop, qot ; tiliya qop ; destê qop	kesik kol, el ya da parmak	bras, main ou doigt coupé ou handicapé, handicapé (de membres supérieurs)	missing a hand, arm, or finger crippled (in arms or hands)
kût	ayağından sakat	handicapé de membres inférieurs	crippled, (in the legs)
qoto : leng	topal	boiteux	lame, crippled
kulek	aksayan	qui boite, boiteux	lame
kulekî bûn : licimîn, lingirîn, kulîn	aksamak	boiter	to limp
binmilk	omuz değneği	béquille	crutch
qilopanî, qilope, qilopinçk	takla	culbute, cabriole	summersalt
xwe qilopanî kirin: qilopinçk vedan	takla atmak	faire une culbute	to turn a summersalt
qilopilo : kilopilo	dalavere, hile	escroquerie, fraude, filouterie	swindling, fraud, swindle, trickery, cheating
qilopilo kirin	dalavere çevirmek	escroquer, frauder, intriguer	to swindle (cheat); to plot, to intrigue
qilûz : milik : qiloz, kubik, qopik, qor, xûr	kambur	bosse	hump, hunch-back
qilûz bûn : xûz bûn	kamburlaşmak, eğilmek	devenir bossu; se courber	to be(come) hunchbacked/ humpbacked
xwe qilûz kirin : xwe xûz kirin	kamburvari eğilmek	se recourber, se recroqueviller	to stoop, bend down
qerax, qirax, kêlek rex	kıyı, kenar	bord, côté	side, bank, edge
qirniyewî : pirniyewî, mirnawî, nirênewk	çiftleşme zamanındaki kedi	(chat) en chaleur	(cat) on heat
gamboxe : gembole, boxeyê pisîk	1) damızlık kedi, 2) azgın erkek	1) chat étalon; 2) mâle en rut, qui a le démon de midi	1) stud (of cats), 2) horny male
qirpandin	çatırdatmak	craquer	to split, to crack (noise)
pisîka qirniyewî, pirniyewî, mirnawî	çiftleşme zamanındaki kedi	chat en chaleur	cat on heat
bola kitikan	kedilerin çiftleşme zamanı	période d'accouplement des chats	rutting season for cats
qirqilîn : qilqilîn	kaynamak, yerinde duramamak,	bouillir d'impatience; être très agité	to be impatient, agitated
qiseçort : peyvçors	sözleri kaba ve kırıcı (kimse)	grossier, brutal, abrupt	rude, brutal, abrupt, coarse
qise kirin : axaftin, peyivîn, şitexîlîn	konuşmak	parler	speak, talk
qîçik	turuncu (renk)	(couleur) orange	orange (colour)
gevez	bordo (renk)	bordeaux, grenat	dark red, burgundy red,
qîq : kesê zirav û stûdirêj	ince ve uzunboylu	qui est grand(e) de taille et a un cou long	tall and long-necked
qitqitî kirin	paramparça etmek, hurdahaş etmek	briser en morceaux (bois, os)	to smash to pieces/ smithereens (wood, bones)
qoçandin	yeni doğmuş, kuzu ve oğlağın insan eliyle emzirilmesi	faire boire, allaiter un agneau	to nurse, give milk to a newborn lamb
xwe qoçî ser hev kirin	hastalık yada halsizlikten büzülmek	se recroqueviller	to be doubled over in pain
qolinc	kürek kemikleri arasındaki kaslar ve bundan doğan sancı	muscles situés entre les omoplates	muscles between the shoulder blades
qotik : boçik, doçik, seroke, binik, quncik	izmarit	mégot	cigarette butt
qurp : kurt, qup	kuluçka	couveuse	brooding hen
qurp ketin; kurk ketin; bi qup ketin	kuluçkaya yatmak	couver	to sit on eggs, hatch (of hen)
qupik : mirîşka qupê	kuluçka tavuk	poule couveuse	hatching hen
qurûtî avê bûyîn: qurî avê bûyîn, quruyî (qurusî) avê bûyîn	yere eğilip ellerini kullanmaksızın ağızla su içmek	boire de l'eau d'une source directement par la bouche sans se servir de ses mains ou d'un récipient	to drink water from a spring by lying on the ground and putting one's lips to the water (without using hands)

qurût ! qurusî !	hayvanları sulatmak için çıkarılan ses	interjection utilisée pour inciter les bêtes à boire	interjection for urging animals to drink
racanî yekî bûyîn : bela xwe di yekî dan	birine belasını sürmek; birinin üzerine gitmek	chercher querelle à quelqu'un ; s'en prendre à quelqu'un	to pick a fight with s.o.
xwe ragirtin	kendine hakim olmak; kendini tutmak dayanmak, tahamül etmek	se maîtriser ; se retenir ; résister	to control o.s., hold back, resist : be patient
xweragir : kesê bi tehemul	tahamülü kişi	personne patiente, patient	patient, (unhurried)
rejik : rijik, rejî, rejû (goşt şewitî bû rejik)	bir şeyin aşırı yanıp kömür-olması	carbonisé, calciné	burned to a crisp; charred
xwe lê rakişandin	1) birini vurmaya kalkışmak; 2) bir işe kalkışmak, yeltenmek	1) se ruer à l'assaut de quelqu'un ; se dresser pour battre quelqu'un; 2) tenter d'entreprendre qqch	1) to lash out a t s.o., attempt to have at s.o. attempt to beat s.o. up; 2) to strive to do sth. beyond one's power or means
rejî : rejû	kömür	charbon	coal
rejiya daran	odun kömürü	charbon de bois	charcoal
rejiya axê	maden kömürü	charbon de terre, houille	coal
qîjot : qijît	yanık, aşırı yanmış	brûlé	burnt
rentele, remtele	kafadan kontak, kavgacı	voyou, bagarreur, cinglé	hooligan, thug, crazy
repandin	gelişigüzel dövmek	rouer de coups	to beat s.o. up
req û rût : riqîrût	bomboş	complètement vide, dénudé	quite empty, bare as a bone
maleke req û rût	bomboş bir ev	une maison complètement vide	a completely empty house,
rêj kirin : rêç kirin	kazıyarak temizlemek, süpürmek	curer	to clean out
rijî, rij : bê rûn	yağsız, yavan	(plat) sans beurre, sans matière grasse	dry plain food (without fat or butter)
çivir, çevir : têrrûn	yağlı, çok yağlı	(plat) très gras	very greasy, oily (food)
birinca rijî	yavan pilav	riz cuit sans beurre	plain rice (without fat)
penêrê çivir	yağlı peynir	fromage riche en matière grasse	full fat cheese
rino : şeyê darînî yê tevnan	ağaçtan dokuma tarağı	peigne en bois du métier à tisser	weaver's wooden comb
rîko, rîtek	altını pisleten	merdeux	shitty (one who shits in his pants)
rîsî, rêsî	kurutularak burulan kışlık ot, burma	botte de foin tressée et séchée pour le fourrage du bétail en hiver	bunches/bales of dried grass/hay used for animal fodder
xorim, n.f.	ot balyası	meule de foin	bale (bundle) of hay
kwînêr, kînêr, kunêr	kan çıbanı	abcès, furoncle	boil, abcess
kul	1) yara, iltihap; 2) elem, dert	1) plaie, infection; 2) souffrance	1) wound, infection; 2) suffering, pain
kul bûn	iltihap bağlamak	s'infecter	to be infected
kewandin	yarayı yakmak	cautériser	to cauterize
pirzik : pizrik, pizik, pizirik	çıban	furoncle, pustule, bouton	pustule, pimple, boil
riş	cilt ülseri	ulcère de peau	skin ulcer

rîsî : rist, gilwaz	kuru yiyecek dizisi, et yada sebzelerin ipe dizilerek kurutulup kışa saklanması	collier de viande ou de légumes enfilés et séchés pour l'hiver	strings of dried food stored for winter consumption
meşlûr : şaran, benî, kome, orcix, sincix	cevizli, bademli sucuk	friandise faite en trempant dans la bouillie du raisiné un collier de cerneaux enfilés	confection of nuts strung and dipped in boiled grapes juice
gewlaz	kurutulmuş çiçek, soğan, sarımsak vb dizisi	guirlande de fleurs, d'ail, etc.	garland of flowers, string of onions, garlic, etc.
xilxal : xirxal	ipe geçirelerek kurutulan ceviz dizisi	collier de noix enfilées et séchées	string of dried nuts
şikinandin	taramak	peigner	to comb
porê xwe şikinandin	saçını taramak	peigner ses cheveux	to comb one's hair

Ferhengoka Hawarê

Amadekar : Zinar SORAN

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**ingilîzî**
evraz, hevraz	yokuş, rampa	montée, pente ascendante, rampe	ascent, upward slope
serevraz, serhevraz	yokuş yukarı	ascendant, montant	uphill
nişûv, nişîv	iniş	descente, pente descendante	descent, downward slope
sernişûv, sernişîv	aşağı	descendant	downhill
hilketin	çıkmak	monter, v.i.	to go up
daketin	inmek	descendre	to come down, to descend
hilkişandin	çıkarmak, yükseltmek	monter, v.t.	to climb
berJor	yukarı	vers le haut	up, upwards
berjêr	aşağı	vers le bas, descendant	down, downwards
kaş	1) yokuş, yamaç, 2) dik yokuş ya da iniş	1) pente ascendante; 2) pente raide	1) upward slope of hill; steep slope
serberjor	yukarı doğru	en montant, montant	upward
serberjêr	aşağı doğru	en descendant, en descente, descendant	downward
sênc, sinc, sincik	iğde	laurier-rose	oleander
ziving	meskun mağara	grotte servant d'habitation	cave used for dwelling
guliçek, guliçek, kuliçek	çadır sütunlarının tepesine yerleştirilen dört deliklerinden urgan geçirilip çadırı tesbit etmeye yarayan tahta parçası	pièce de bois comportant quatre orifices placés au sommet du piquet d'une tente ; les cordes passant par les orifices permettent de fixer la tente.	a piece of wood with four holes in it, placed at the top of a tentpole; the ropes passing through the holes serve to steady the tent
perispan	çadır yaması	pièce de raccommodage de la toile d'une tente	patch on a tent
vehesîn : bîhn vedan	dinlenmek	se reposer	to rest
vehesîn, vehesan	dinlenme, istirahat	repos	rest
rojên vehesînê	dinlenme günleri	jours de repos	rest days
por kirin	dökmek, yığmak	verser, jeter	to pour, to throw
ferwar	hüküm, emir	ordre, décret, firman	order, decree, firman
rikeh : qefes	kafes	cage	cage
vîziqîn, vîzikîn, pijiqîn, pijikîn	fışkırmak	jaillir	to jet, to gush out
viz, vizik	fışkırma	jaillissement	gushing out
vizik, zîrok, teqal	topaç	toupie	top (spinning top)
daylan, dalyan, talyan	dalyan (Italyan'dan türemiş)	bien bâti(e), qui a de belles formes	well built, husky, hefty
kelebest, berbest,	sahildeki taşlık alan	plage de galets	pebbly bank or pebbly beach
berebest : lêva çem a golan	ırmak ya da göl kenarı	bord de rivière ou de lac	lake or river bank
xwîsî, xûzî, qir, qiravî	kırağı	givre, gelée blanche	(hoar) frost
xwîsî ketin	kırağı düşmek	givrer, être couvert de givre	to frost over
xwîsîgirtî, xûzîgirtî, qirgirtî	kırağı tutmuş, kırağılı	givré, couvert de givre	rimy, covered with hoarfrost, frost-covered
dinbaşk : mêşevank, mêşîldan	arı kovanlarının konulduğu kulübe	cabane ou hutte abritant des ruches	beehive

(Qediya)

Hin şaşiyên rêzimanî

Amadekar : Michael L. CHYET

Mezintirîn pirsgirêk ev e : wergêrandinên rastewxo ji zimanekî biyanî - nemaze ji tirkî :

1) Türkçe de, bir konunun üzerinde **durulur**, ama Kürtçe de öyle değil :

- "Di van çavkanîyan de, ji der çûyîna wê ya Konstantinopolê, li ser qehremanîya wê jî **tê sekinîn**".

- Bi zimanê kurdî, lêkerên derbaznebûyî (întransîtîf) qet nabine tebatî (pasîf). Divêt ku mirov bêje : "Di van çavkanîyan de, ji der çûyîna wê ya Konstantînopolê, li ser qehremanîya wê jî **disekinin**".

- "Bi qasî ku ji berhemê **tê têgihiştin**, serpêhatî û bûyerên berhemê li 'Bakurê Sûriyê' derbas dibin... Ji bo ku berhem bi zehf alî **bê têgihiştin**, divê mirov hinekî li ser struktur (avahî) û uslûba ku di prosesa hûnandina berhemê de hatiye bi kar anîn, raweste... Bi qasî ku ji metnê çîrokê **tê têgihiştin**, amanca nivîskarî ew e ku bi alîkariya vê çîrokê jiyana civata 'Bakura Sûriyê' ya ser û bînî hevkirî bi pirr alî..."

- Lêkera **têgihiştin** jî lêkereke derbaznebûyî (întransîtîf) ye — bi gotineke din, ev lêkera hanê nabe pasîf (tebatî) — li ser hindê ra ku bi tirkî "anlaşıldığı gibi" çêdibe. Lê belê, sînonîmek heye ku derbazbûyî (transîtîf) ye: **fêm kirin**. Mirov dikare bêje "Bi qasî ku ji berhemê **tê fêm kirin**" — lê belê, eger em lêkera têgihiştin bi kar bînin, divêt ku em wisa bêjin : "Bi qasî ku em ji berhemê têdigihin..." yan jî "Bi qasî ku mirov/meriv ji berhemê têdigihe..."

2) Türkçe de, **bu - şu - o** hallere göre değişmiyor: bu ev - bu ev**i** - bu ev**ler** -bu evler**in**, amma Kürtçe de öyle değil — **ev** û **ew** têne tewandin, hem li gora zayendê û hem jî li gora hejmarê (yekejmar / pirejmar) :

- "Cardin her wî ew gotara mezin a bi navê 'Kardux û Welatê Karduxan' belav kirîye ku bi dirêjî cî daye **ew gotarên** ku Ksenefon ên di sala... di derheqê Karduxan de nivîsandiye" — ya rast wisa ye : "... bi dirêjî cî daye wan gotarên ku..."

- "**ji bilî ev tiştên** ku me behsa wan kirin..." — ya rast wisa ye : "Ji bilî wan tiştên ku..."

- "**Herweha, tevî ev serfirazî û xweşiyên** nû ez dîsan vegerim welatê xwe." — ya rast wisa ye : "tevi **van** serfirazî û xweşiyên nû" (MUm, 12)

3) Bi kurmancî, dema borî ya lêkerên derbazbûyî (transîtîf) divêt li gora sîstema ergatîf bête saz kirin :

Ez te dibînim li dema niho dibe **Min tu dîtî** di dema borî

(**Min te* dît li hin deveran tête gotin, lê bo zimanê nivîskî yê standart cihê qebûl kirinê nîne).

Li bin tesîr û bandora zimanên biyanî, Kurmancî ji e'sla xwe dûr dikeve. Binihêrin: Margreet Dorleijn. *The Decay of Ergativity in Kurmanci : Language Internal or Contact Induced ?* (Tilburg : Tilburg University Press, 1996), 183 p.

Mînakên xelet bikaranîna ergatîf :

a) "Rojên ku tên bibîranîn an jî pîrozkirin ew in ku ... rûpelek di deftera dîrokê de **veqetandine** ji xwe re" — ya rast ev e : rûpelek **veqetand**

b) "Dewletê heta niha tu rê nemane ku **neceribandiye** ji bo vemirandina têkoşîna gelê Kurd" — ya rast ev e : rê (ku pirejmar e — nemane) **neceribandîne**.

c) "Te vî zimanî ji ku derê **anî**?" — ya rast ev e : Te ev ziman ji ku derê **anî**? Di dema niho de emê wisa bêjin : "Tu vî zimanî ji ku derê **tînî**?", lê di dema borî de, **tu** dibe **te**, û her wisa vî zimanî dibe ev ziman.

d) "Yekemîn kovara kurdî... hersê rûpelên hejmarên xwe yên yekemîn bi wêneyên navdarên kurd **xemilandiye**" — ya rast ev e : hersê rûpelên hejmarên xwe yên yekemîn... **xemilandîne**.

e) "Jinên van malbatên xizan û belengaz li bajarê (...) gelekî perîşanî **kişandine**" — ya rast ev e : jinên van malbatên xizan... perîşanî **kişandiye**.

Di hemî van mînakan da, divêt ku lêkera derbazbûyî (transitif) bi awayekî rêzimanî (grammatikal) digel objekta rastewxo (direct object - nesne) rêk bikeve -nek digel subjekt (özne).

Tewandina nav û cihnavan (pronovan) bi ergatîfê ve girêdayî ye.

şekil A	**şekil B**
cihnav	
ez	min
tu	te
ew *(nêr - yekejmar)*	wî
em	me
hûn	(he) we - hingo
ew *(pirrejmar)*	wan
nav	
(nêr - yekejmar)	
şivan	şivên (şivanî)
gundî	gundî (gundîyî)
dev	dêv (devî)
(pirrejmar)	
şivan	şivanan
gundî	gundîyan
dev	devan
(mê - yekjmar)	
jin	jinê
kitêb	kitêbê
pencere	pencerê (pencereyê)
(pirrejmar)	
jin	jinan
kitêb	kitêban
pencere	pencer(ey)an

Çend peyvên kêmnas ji milê Hekariya

Amadekar : Michael CHYET

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
biyanî	yabancı	étranger	foreigner
xuyanî	yakın akraba	proche parent	close relative
ew ne biyanî ye, xuyanî ye	yabancı değil, ailedendir, akrabadır	il n'est pas étranger, il est de la famille	he's not a stranger he's one of the family
lêzim : merivê dûr	uzak akraba	parent éloigné	remote relative
xizim : xinamî	eş yakınları, hısım	parent par alliance	relation by marriage
sexbêrî	güz kulak olma	surveillance	supervision, taking care
sexbêrî kirin	göz kulak olmak	veiller, surveiller ; prendre soin de	to take care of
sexbêr	göz kulak olan	qui veille à, qui prend soin de	who takes care of
perixandin	ovmak, okşamak	caresser, masser	to caress
avneh : ewle	kendine güvenen, kendinden emin	sûr de lui	self confident
avnehî: ewlehî	emin	sûr de lui	self confident
lê bisteh bûn	alışmak, yakınlaşmak	se familiariser, devenir familier	to familiarize ; to become familier
pîxameta : ji ber, di pîxameta yekî de : ji ber yekî	yüzünden	à cause de	because of
piştrastî	güven	confiance	confidence
behbîr	umursamaz	insouciant, indifférent	carefree
behbîrî kirin	umursamazlık etmek	se montrer indifférent, ne pas prêter attention	to be indifferent ; not to pay attention

Termên komputerê

Amadekar : Bahrûz ŞUCCAI

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
bîr	hafıza, bellek	mémoire	memory
dîsket	disket	disquette	diskette
karta grafîkê	grafik kartı	carte graphique	graphic card
karta sereke	esas kart	carte mère	mother board
mişk	fare	souris	mouse
karta deng	ses kartı	carte son	sound card

Nûyitî :

Kurmancî hejmarên 1 - 20 tevî ferhengoka wan a kurdî-tirkî-fransizî-îngilîzî û endeksên tirkî, fransizî û îngilizî. 440 rûpel.

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE

© INSTITUT KURDE DE PARIS

106, rue La Fayette, 75010 Paris - France
www.institutkurde.org
Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN**
Réalisation : **S. ILITCH & M. HASSAN**

hejmar 25 Payîz 1999

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev niviîsî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Biskops Arnöyê ya 25an

Civîna 25emîn ya ***Kurmancî*** li Biskops Arnöyê (Swêd) di navbera rojên 27ê adar û 3yê nîsan 1999 de çêbû.

Di vê civînê de kesên beşdar li ser termên îdyomên kurdî, bergûz an şel û şepik li Bahdînan, devoka Qerejdaxê, dû'a û temennî, cureyên endamên laşê mirovan û îdyomên jê çêkirî, termên komputerê û li ser termên matematîkê xebitîn.

Di vê civînê de Xosro Abdullahî (Selmas), Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Lutfî Baksî (Xerzan), Husên Binavî (Berwarîbala), Michael Chyet (Waşington), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Selam Nûman (Cizîr), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Şucaî (Kotol), Newzad Şukrî (Dihok) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên cîvînê di vê hejmara ***Kurmancî*** de tên belav kirin.

Termên matematîkê

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN
Behroz ŞUCAÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
parvekirin	bölme	division	division
parve kirin	bölmek	diviser	to divide
parvek: nîşana parvekirinê	bölü işareti	signe de division	sign of division
20 ÷ 4 = 5 (bîst parvek çar wekhev e pênc	yirmi bölü dört eşittir beş	vingt divisé par quatre égale cinq	twenty divided by four equals five
çil û pêncan li nehan parve bike	kırk beşi dokuza böl	divisez quarante-cinq par neuf	divide fourty-five by nine
parveker	bölen	diviseur	divisor
berma	kalan	reste	remainder
parînek	bölüm	quotient	quotient
berpar	bölünen	dividende	dividend
kom kirin	toplamak	additionner	to add
komkirin	toplama	addition	addition
4 + 5 = 9 çar û pênc dikin neh an çar zêdêk pênc wekehev e neh	dört ile beş eder dokuz dört artı beş eder dokuz	quatre et cinq font neuf quatre plus cinq égalent neuf	four plus five equals nine
jê derxistin	çıkarmak	soustraire	to substract
jêderxistin	çıkarma	soustraction	substraction
7 - 3 = 4 heft kêm sê dike çar heft kêmek sê wekhev e çar	yedi eksi üç eder dört yada yedi eksi üç eşittir dört	sept moins trois font quatre ou sept moins trois égalent quatre	seven minus three equals four
carandin, v.t.	çarpmak	multiplier	to multiply
carandin	çarpma	multiplication	multiplication
3 x 5 = 15, sê cara pênc dike panzde an wekev e panzde	üç çarpı beş ya da üç kere beş eder on beş	trois fois cinq font quinze ou égalent quinze	three times five equals fifteen
zarek: nîşana carandine : x (.)	çarpma işareti	signe de multiplication	multiplication sign
encam	sonuç, netice	résultat	result
komînek	toplam	somme	sum
goşe	açı	angle	angle
goşeya çik li hin navçeyan goşe nêr e goşeyê çik tê gotin	dik açı	angle droit	right angle
goşeya teng	dar açı	angle aigu	acute angle
goşeya fireh	geniş açı	angle obtus	obtuse angle
goşeya derve	dış açı	angle externe	external angle
goşeya hundir	iç açı	angle intérieur	internal angle
goşeyçik	dik açılı	à angle droit	right angled
goşeteng	dar açılı	à angle aigu	acute angled
goşefireh	geniş açılı	à angle obtus	obtuse angled
sêgoşe	üçgen	triangle	triangle
çargoşe	dörtgen	rectangle	rectangle
sêgoşeya goşeçik	dikaçılı üçgen	triangle à angle droit	right angled triangle
sêgoşeya goşefireh	geniş açılı üçgen	triangle à angle large	obtuse angled triangle
sêgoşeya goşeteng	dar açılı üçgen	triangle à angle aigu	acute angled triangle
binke	taban	base	base
bilindahî	yükseklik	hauteur	height
duhevsan	iki kenarı, aynı olan	isocèle	isosceles
sêgoşeya duhevsan	ikizkenar üçgen	triangle isocèle	isosceles triangle
sêgoşeya hevsan	eşkenar üçgen	triangle équilatéral	equilateral triangle
çarçik	kare	carré	square

Termên komputerê

Amadekar : Behroz ŞUCAÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
dîsk	diśk	disque	disc
reqdîsk		disque dur	hard disc
reqalav		matériel, hardware	hardware
nermalav		logiciel	software
emraz		outil	tool
çaper	yazıcı	imprimante	printer

Îdyomên kurdî

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN
Mistefa AYDOĞAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
dil bijîn	canı çekmek, canı istemek	avoir envie de qn ou qch	to feel like doing/eating sthg
dilbijok	şip sevdi, obur	gourmand, volage	glutton(ous)
dil (jê) çûyîn, dil borîn, dil ji bîr çûyîn, dil xelîn, dil xewirîn, ji xwe ve çûn, xerbilîn	içi geçmek, bayılmak	perdre connaissance; tomber dans les pommes; s'évanouir	to faint, lose consciousness
dil ketin, dildar bûn, aşiq bûn	aşık olmak; gönlü düşmek, gönül vermek	tomber amoureux	to fall in love
dilkevir, dilkafir, dilreq	acımasız, taş yürekli	qui a un coeur de pierre; impitoyable	hard-hearted, merciless
dil rabûn, dil li hev ketin	midesi bulanmak; yüreği ağzına gelmek	avoir la nausée; avoir un haut-le-coeur	to feel nauseous, sick
dilê min lê da, niqutî dilê min; sêwirî dilê min; kete dilê min	içime doğdu, kalbime damladı	j'ai eu le pressentiment	to sense, have a feeling, suspect
ya dilê yekî xwendin, dilê yekî xwendin	birinin içini okumak; duygu ve düşüncelerini sezmek	lire les pensées de qn	to read someone's thoughts
dilnazik, diltenik, dilkeçik	duyarlı, hasas, yufka yürekli	sensible, qui a le coeur tendre	sensitive, tender hearted
dilzîz	alıngan	susceptible	easily offended
dilê xwe xist cih	merakını gidermek, emin olmak	s'assurer; satisfaire sa curiosité	to make certain; to satisfy one's curiosity
dilê min nabije halê te,	seni imrenmiyorvın	je ne t'envie pas	I don't envy you
dilê min naçe xwarinê	canım yemek istmiyor	je n'ai pas envie de manger	I don't feel like eating
dil berdan	göz koymak, gönül vermek	convoiter	to covet
dil jê çûn	kendinden geçmek, bayılmak	perdre connaissance; tomber dans les pommes	to lose conscience, faint
dil ji bîr çûyîn, dilborîn, dilbuhurîn,	bayılmak, kendinden geçmek	s'évanouir	to faint
dil teqîn	kahretmek kızdırmak, oyuna getirmek	agacer, énerver, fâcher	to irritate, annoy, anger
dil qutufîn	çok korkmak	être effrayé, avoir une peur bleue	to be afraid, to be terrified
dil jê man an mayîn, dil jê şkestin	birine kırılmak, alınmak, gücenmek	être en froid avec qn; être fâché contre qn	to be cool with s.o.; to be cross with s.o.
dilbipirç	acımasız, içten hesaplı, sürekli intikam kini olan	impitoyable, rancunier	pitiless, vindictive
dil sekinîn	şoke olmak	être sous le choc; avoir le coeur qui s'arrête	to be suffering from shock
dil (lê) şehitîn: lê bi guman ketin	şüphelenmek	avoir des soupçons	to be suspicious
dil hilneanîn: dilê wî hilnîne	tahammül edememek	ne pas supporter	can't stand, can't bear
dilê yekî qurufî: dilê min jê qusiya	birinden çekinmek uzak durmak, (yaptığı hatalardan dolayı)	se tenir distant de qn, être réservé envers qn	to keep one's distance from s.o., to be reserved towards s.o.
bi dil bûn	aşık olmak, gönül vermek	être amoureux	to be in love
dilê wî li devê wî ket	tiksinmek (bunaltı geçirmek) bulantı geçirmek	il a eu la nausée, il a eu un haut le coeur	he was sick, nauseated
dil lê vebûn	barışık olmak, dargınlıktan vazgeçmek	se réconcilier, ne plus être fâché	to be reconciled with s.o.
dilmirî	duygusuz	insensible, sans coeur (litt. qui a le coeur mort)	insensitive, heartless
dilfireh	mert, geniş kalplı, gönlünde herkese yer olan	généreux, qui a un gros coeur	generous, big-hearted
diltengî: ne bi dilê... bûn, diltengiyê ji mêvanan dike	birine karşı isteksiz olmak davranmak	à contre-coeur	unwillingly, grudgingly
dilsoz	temiz kalpli, sözünün eri	sincère	sincere
dilhilûk, kezebhilûk	aşırı düşkün, özellikle anaların çocuklara duyduğu aşırı ilgi: sevgi	qui est trop affectueux notamment pour une mère qui couve trop sa progéniture	over-fond, said of mothers who over-protect their children
dilreş	nefret duyan	qui déteste (litt. qui a le coeur noir)	s.o. who detests, black-hearted
dilreşî (dilê min jê reş bûye)	nefret etmek	détester	to detest
dilmezin: xwe li tiştên mezin rakişandin	büyük işlere girişen	qui voit grand, qui entreprend de grandes actions	visionary
dilxurt	tahamulkar	qui supporte, qui a le coeur dur (litt. qui a le coeur robuste)	s.o. who has broad shoulders, (litt. strong-hearted)
dilşewitî	yüreği yanık, duyarlı	très insensible, écorché vif (litt. qui a le coeur brûlé	over-sensitive, thin skinned
dilşewat	yüreğı yanan, yakınlarına bağlı	qui a le coeur sensible, qui se soucie des autres	soft hearted, concerned for other
dilê xwe rehet kirin	amacına ulaşmak, gönlünü rahat etmek	combler ses désirs, assouvir	satisfy desires
dilê xwe lê rehet kirin	hıncını almak, doyasıya dövmek, istediği gibi ıslatmak	régler son compte à qn, lui donner une bonne leçon	settle accounts with s.o.; settle s.o.'s hash
dil birîn kirin/êşandin	yüreğini yaralamak/ incitmek	briser le coeur de qn, peiner qn	break s.o.'s heart
dilsarî	hafif dargınlık	froissement, fâcherie	coolness, ill feeling
dilsar	hafif dargın, gücenmiş	froissé, en froid	offended, hurt
dilsar bûn	hafif gücenmek, soğumak	être froissé, indisposé	to be offended
dilxwaz	1) taraftar; 2) gönüllü	qui a de la sympathie, sympathisant	sympathetic (to s.o.)
bêdilî	isteksizlik	manque de volonté	unwilling
bêdil	isteksiz	qui n'en veut pas, non disposé	not to want s.th., to be indisposed
bêdiliya yekî kirin	birin kırmak istediğini yerini getirmemek	ne pas répondre aux souhaits de qn	not to answer to s.o.'s hopes, to go against s.o.'s wishes
ji dil nehatin	içinden gelmemek	n'avoir pas le coeur à	not have the heart to...
dil şewitîn	yüreği yanmak	se faire du souci, avoir de la peine	to be worried about
dil peritîn	yüreği parça parça olmak / parçalanmak	avoir le coeur brisé, en lambeaux	to have a broken heart
ebabelek: fesad	fesat, nifak çıkaran, felaket tellale	intrigant, marchand de malheur	intriguer, trouble maker
ecûrê tehl e: eskerî ecûrê tehl e: mecbûrî ye; bixwazî nexwazî ev e; bivê nevê	başka tercihi yok; zorunludur	on n'a pas le choix, c'est obligatoire (litt. amer comme du concombre russe)	you have no choice, it's compulsory willy nilly
bûn serê saza(n): bûn benîştê devê xelkê	dillere düşmek	frayer la chronique	to become the talk of the town
ji beroşê derketin: ji devê gur filitîn	ölümden kıl payı kurtulmak	échapper de peu à la mort	to be saved by the skin of one's teeth; to narrowly escape death
emrê sîvanokê (gangilokê) ye: 'emrkurt e	çok kısa ömürlüdür	il a une existence éphémère (comme une plante printanière)	short-lived
ev hevîr gelek avê hiltîne; ev hevîr dê gelek avê hilîne	bu hamur daha çok su kaldırır	(litt. ce pétrin absorbera encore beaucoup d'eau); ce conflit va encore s'aggraver; on n'en est qu'au début de ce conflit	this is only beginning (of a very long conflict); this trouble will get worse
ez çi dibêjim, bilûra (tembûra) min çi dibêje	dam üstünde saksağan vur beline kazmanyı	(litt. je dis une chose, ma flûte [ou guitare] en dit une autre); tenir des propos décousus, incohérents, passer du coq à l'âne	incoherent; contradictory
ez hêka (madenê) wî nas dikim: ez zanim çi mal e	ne mal olduğunu biliyorum	(litt. je sais de quel oeuf il sort); je sais ce qu'il vaut	I know what he's worth, I know where he came from
felek (dinya/dewran) li serê wî geriya: serî lê geriya	feleği şaştı	(litt. la roue de la fortune s'est retournée contre lui), il est victime de l'infortune; son monde s'est effondré	out of luck, abandoned by fate
fisgenî, genfisk, genfisî	içten pazarlıklı, sinsi	sournois; calculateur	sneaky, underhanded
fitrê yekî xweş kirin; deftera wî dan hev	hesabını görmek; defterini dürmek	régler son compte	to settle accounts with s.o.
filîma (filîmê) wî şewitî; fêşkên wî eşkere bûn; dawa wî ji ser çû	ipliği pazara çıktı	son jeu a été dévoilé; ses intrigues sont révélées	to be unmasked (of a charlatan)
filîma yekî kişandin	birinin filimini çekmek; onu izleyip sonra taklitini yapmak	observer qn pour l'imiter; embobiner qn	to observe s.o., to imitate or trick them
filîm li serî çêkirin	başına oyun getirmek; entrika çevirmek	intriguer contre qn; se jouer	to plot against s.o.

gayê nav golikan: kesê ku bi hingûfên xwe re namîne; bêsewiye, nehêja	kalıbının adamı olmayan, değersiz, düzensiz	(litt. un boeuf parmi les veaux): qui fréquente des gens qui ne sont pas de son rang ou âge, léger mal assorti	s.o. who keeps company with people younger than him; a good for-nothing
gayê xemo, gayê şehbaz: bêkêr	işe yaramayan, beceriksiz, değersiz	incapable, inapte, vaurien	inept, incompetent, worthless (person)
genimê şûvan: di dawiyê de ew ê ji heqê xwe tê der	işini becerebilen; sonuçta hakkından gelebilir	à la fin il trouve son compte; il se tire d'affaire	he gets out of a mess
gêrik tê de ye; xwer (xur) tê de ye	yerinde duramıyor	qui a la bougeotte; qui ne tient pas en place	s.o. who cannot stand still, s.o. with ants in his pants, restless
girara gavanan: xwarina tevlihev	(dilenci çanağı gibi) karmakarışık	très mélangé (comme la bouillie des bergers)	all mixed up (like a shepherd's stew)
girêka xwe bi piştxistin; girêya xwe piştheçikê xistin; eba lê quripandin	işini kurtarmak; işini bitirdikten sonra başkalarını düşünmemek	oublier les autres dès qu'on n'a plus besoin d'eux	to be a fairweather friend; to forget others as soon as one no longer needs them
golikê beş; gayê beş	göze batan, saklanamayan	(litt. connu comme un veau bariolé); loup blanc	prominent, sticking out (like a sore thumb)
golikê ber gelek makan; berxê ber du makan	çok yerden yararlanan, çok sahibi olan	qui mange à tous les rateliers, qui a beaucoup de protecteurs	all's grist to his mill; s.o. who feeds at every-ones expense
golikterqîn	iş bozan, oyun bozan	trouble-fête	spoil-sport
çûn ber golikan; bûn golikvan	bir işte, yarışmada ya da toplumda sonuncu olmak	(litt. aller garder les veaux); être la lanterne rouge	to bring up the rear
gotina wî (wê) pere dike	nüfuzu var; sözü para ediyor	il a du poids; sa parole pèse lourd	he carries weight; what he says goes
gû belav kirin; vala peyivîn; pûç ketin	boş yere konuşmak, bok dağıtmak	parler en vain, compter pour de la merde	to bullshit
guh livîn	kulakları oynamak	avoir des oreilles qui bougent, être très éveillé, malin	extremely aware, vigilant
guhan kirin: keç an jina ku mêran dixwaze	(bir kız ya da kadın için) arzu etmek	(litt. faire bouger ses mamelles); désirer un mâle (pour une femme)	to desire (a man — said of a woman) a man hunter (said of a woman)
guhdîk: guh biqul, guh bikun	kulağı delik, olup bitenlerin çabuk farkına varan	qui saisit vite; qui a une bonne oreille	quick on the uptake; one who catches on quickly
guhê xwe bel kirin; guhê xwe veçinîn	kulak kesilmek, pür dikkat dinlemek	dresser les oreilles	to prick up one's ears
guhên xwe li hev dixe	bir şeylere hazırlanıyor	il prépare ou manigance qch des signes	to be hatching a plot (secretly)
gunikreş, reşgunik	çetin ceviz, daşakli	qui a des couilles (litt. qui a des couilles noires i.e. dures	someone who is not afraid of being rebuffed; gutsy
gurçika wî bez girtiye	soğuğa dayanan üşümeyen böbreği yağ, bağlamış	qui résiste au froid; (litt. qui a des reins gras)	someone who can withstand the cold

Devoka Qerejdaxê

(9)

Amadekar : Mahmûd LEWENDÎ

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
rişk	bit yumurtası	lentes	nit, louse egg
rojin: rojîn, kulek; kulînk	1) baca; 2) dam penceresi	1) cheminée; 2) fenêtre pratiquée dans le toit	1) chimney, smokehole; 2) skylight
ro kirin	dökmek, boşaltmak	verser	to spill, empty out
Romî/rom : (eskerê romî, eskerê romê, bextê romê, roma reş)	Türk	anciennement Turc ottoman, Turc	Turk
ron: rohn, ruhn, rehn, hevîr ron hatiye	sıvı, cıvık, açık, ince hamur, cıvık/ sulu olmuş	liquide, fluide, clair	liquid, fluid, clear
ron bûn	sıvılaşmak	être liquide, fluide, clair	to be(come) liquid, fluid, clear
ron hatin : hevîr ron hatiye	sıvı olmak	être liquide (pour le pétrin, etc.)	to be too fluid (of dough)
ruhber: benderuh	canlı	vivant, être vivant	alive, living
ruhistîn	Azrail	(litt. celui qui prend l'âme); l'archange Gabriel (Azrail)	the arch-angel Azrael (Gabriel), taker of souls
rûçikandin: rûqiçandin	yolmak	dépouiller	to pluck (a bird's feathers)
rûçikîn	yolunmak	se dépouiller; être dépouillé	to be plucked
rû girtin: rû stendin	yüz bulmak, şımarmak	être gâté	to be spoilt (by kind treatment), to be emboldened
rû dayîn	yüz vermek	gâter qn	to spoil s.o.
rûşuştî: rûçir	yüzsüz, saygısız	effronté	impertinent, importunate, rude, disrespectful
sak: gedek	manda yavrusu	bufflon nouveau-né	buffalo calf
sam	iğrenç kötü koku	pestilentiel	stench, foul smell
bayê samê	sam yeli	vent pestilentiel	foul wind
sarî barî: al û bal	abuk sabuk, ileri geri	propos décousu, incohérent	incoherent, inconsistent
saw : sehm	dehşet, terör	frayeur, terreur	terror, fright
saw bi ser ketin	ürkmek, korkmak, terorize olmak	être effrayé, terrorisé	to be frightened, terrified
sawa xwe şikandin, sawa xwe girtin	korkusunu yenmek	dépasser sa frayeur	to conquer one's fear
saw girtin	ürkmek, terörize olmak	prendre peur, s'effrayer	to be terrified, to be frightened
sawgirtî	ürkmüş, terörize olmuş	effrayé, terrorisé	terrified, frightened
saxtî	1) yoklama; 2) ziyaret	1) fouille, inspection; 2) visite	1) inspection, search; 2) visit
saxtî kirin, sah (seh) kirin, sax kirin; li ser rê polîsan em saxtî kirin; Remo nexweş bû em çûn saxtiya wî	1) yoklamak; 2) ziyaret etmek; polisler yolda bizi aradı; Remo hastaydı onu ziyarete gittik	1) fouiller, inspecter; 2) visiter, rendre visite; sur la route les policiers nous ont fouillés; Remo étant malade, nous sommes allés lui rendre visite	1) to inspect, search; 2) to visit; on the way, the police searched us; Remo was sick, we went to visit him
semitîn, simitîn, lûç bûn	derinin soyulması, yüzülmesi	s'écorcher	to graze oneself
serqûnç: serqûç, qûç, bi serî	taşarcasına dolu	rempli jusqu'au point de déborder	filled to overflowing
serrax: serlihêf	yorganın üstüne örtülen carcim v.s. gibi örtüler	couvre-lit, tissu ou couverture qu'on met sur la couette	cloth cover for a quilt, bed spread
ser û pê: kelle paça	kelle paça	pieds et tête de mouton (en cuisine)	sheep's trotters (as dish)
sewsî, sewisî, gêj, hewaserî, şeplepêketî	sersem, başı dönen, aklı havada	étourdi, qui a la tête en l'air, dérangé, fofol	absent minded, scatterbrained, dizzy, deranged
sewsî bûn; hewaser bûn	sersemleşmek, başı dönmek	être étourdi, avoir la tête en l'air, être fofol être dérangé	to be dizzy; to become silly, to be absent minded
sewsî kirin, hewaser kirin, şeple pê xistin	sersemletmek, başını, döndertmek	étourdir, faire tourner la tête	to stun, dazzle
sihorîk, sivorî, simore, sivore, sihor, pilûr	sincap	écureuil	squirrel
sêwan	iri çadır kazığı	pal	(pale) large tent stake, stake
li sêwanan xistin	kazığa vurmak	empaler	to impale
sing	kazık	pieu	tent stake
singol, singilk, singot, siqilk, singik	küçük kazık	petit pieu	small tent stake
singodewran	süngü savaşı	combat à armes blanches, à coups de baillonettes	to fight with knives or bayonets
swîravk, sûravk, şoravk, xwêrav	salamura	saumure	brine for pickling
sîrkut	sarmısak döveceği	pilon à ail	garlic press
sîsalk, sîslok, sîsalka gurî, sîsark, sisyark, simsiyark, sîsalek, sîsaleh, sîsyarok	akbaba	vautour	vulture
(ji **sîs** *albîno* [*blanc*], **serî** [*tête*] **sîserk** *qui a la tête blanche*)	akbaba	vautour	albino, (white), (head), white-haired
sorsork	düğün evinin damına asılan ve düğün evini belirten kırmızı bez parçası	fanion rouge hissé sur le toit de la maison du marié pour marquer le lieu du mariage	red cloth hung from roof of house where wedding is being held to mark the house for wedding guests
sût, sûtal, sûtik, sutar, beredayî, sakûl	başıboş, ipsiz sapsız	vaurien, va-nu-pieds	good-for nothing, free loader
sûyîna kulavan, sûyîn, sûn, hesûn, hisûn, sûtin	1) keçeyi ayakla sıkıştırmak; 2) bilemek, kesici aletleri bilemek	1) compresser le tapis en feutre; 2) aiguiser (couteau, sabre)	1) to press a felt carpet; 2) to hone/whet/sharpen (knife or sword)
şayîş, fikare, jêpelikandin	çekinme	hésitation, appréhension	hesitation, apprehension

çelitîn	çizilmek, hafif yararlanmak	s'égratigner	to be wounded slightly, get scratched
çelitandin	çizmek, hafif yaralamak	égratiner	to wound slightly, scratch
kevil kirin: guran, post kirin	derisini yüzmek	dépouiller, écorcher	to peel, skin
zelitandin: rût kirin, tazî (rûs) kirin	soymak, yüzmek	dépouiller, mettre à nu	to skin, flay, strip
serapîra: serapîra doza mêra dike	bunca yaştan sonra	sur le tard; à un âge avancé	late in life
sercil	istenen kızın babasına olurunu aldıktan sonra sunulan hediye	présent offert au père d'une jeune fille après qu'il ait consenti au mariage	gift given to the prospective bride's father after obtaining his consent for marriage
serdeng: pezê sernerm, milahim	uysal koyun	mouton docile, obéissant	docile, obedient (sheep)
serkul; kersil; pîsiya keran	eşek dışkısı	crotte d'âne	donkey manure
bişkul, pişkil, kuşbil; kospil, pîsiya pez, bizin, xezal û heştiran	koyun, keçi, deve dışkısı	crotte de mouton, chèvre	sheep or goat feces (in little balls)
ters, teskul, fişqî, posil	at dışkısı, fışkı	crotte de cheval	horse manure
rêx: pîsiya ga û mangan	tinet tersi	bouse	cow manure, dung
şayîşan ji yekî kirin, jê pelikandin, jê fikare kirin, xwe jê kirin	birinden çekinmek	appréhender qn, craindre qn	to keep one's distance from s.o.
şeb	şap	alun	alum
şekirok, baxoxe, serteşîk, (lat. echinops sphaerocephalus)	geniş yuvarlak başlı bir diken türü	variété de chardon	a variety of thistle
pirpirok, pirpirk	yabani hindiba	pissenlit	dandelion
şale, şêl, xeşe	sırtıyla taşınan sap, ekin	charge de bottes d'épis	load of sheaves of corn
şemedan, cilşema	muşamba	toile cirée; cire	wax cloth; wax, oil cloth, tarpaulin
beng, benc	benc	jusquiame, herbe aux poules	henbane
şemitokî, şimitokî, tehisokî, terişokî, şiqitokî	kaygan	glissant	slippery
şemitîn; terişîn, xurişîn, şiqitîn	kaymak	glisser	to slip, slide
şepelî, şapûşêl, şape	sağanak yağmuru	averse	cloudburst, downpour
şeplor, lûr, lîr, bafilok	sıcaktan, soğuktan ya da bazı yemeklerden meydana gelen kaşıntılı bir cilt alerjisi	allergie cutanée à la suite d'un excès de froid, de chaleur ou de certains aliments	rash resulting from heat, cold, or as a reaction to eating certain foods
şeşek, şeşik	Ramazan bayramından sonra tutulan altı günlük oruç	un jeûne de six jours observé après la fête du Ramadan	6 day fast observed after Ramadan
şevaro, şevûroj	gece gündüz	jour et nuit, sans discontinuité	round the clock
şeqşeqî kirin	bacaklarını birbirinden ayırmak	écarter les jambes (d'une bête)	to pull apart the legs (of an animal), todraw and quarter

Du'a û niyaz

Amadekar : Elîşêr

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
amîn!	amin!	Amen!	Amen!
aqibeta wî serê te!	darısı başına!		the same to you
bereketa Ibrahîm Xelîl tê de be!	İbrahim Halil'in bereketi içinde olsun!	que la prospérité d'Abraham y soit!	may Abraham's blessing be on it
bereketa Xwedê bikeve mala te!	Allahın bereketi evinde olsun!	que la prospérité de Dieu soit dans ta maison	may God's blessing be on your house
bereketa Xwedê bikevê!/ bereketa Xwedê lê be!	Allahın bereketi içinde olsun!	que la prospérité de Dieu soit là-dedans!	may God's blessing reach him
berxwedar bî!	berhudar ol!	(litt que cela te profite bien!) que Dieu te bénisse!	God bless you!
bextê te spî be!	bahtın açık olsun	que la fortune te soit favorable!	may good fortune be with you!
bi pê û par be! (piranî gava ku bûkan tînin ji xezûr û xwesûyan re tên gotin)	gelini getirdikten sonra kayın peder ve kaynanaya söylenir: ayağı uğurlu olsun, berket getirsin!	se dit aux beaux-parents de la mariée: que sa venue apporte bonheur et prospérité à votre famille	said to bride-groom's parents of their new daughter-in-law: may her feet bring prosperity!
bila bi dê û bab mezin be!/ bi dê û bav mezin bibe!	analı babalı büyüsün!	se dit lors de la naissance d'un enfant: qu'il grandisse entouré de ses parents!	at the birth of child: may s/he grow up with both parents!
bila ciyê te bibe behişt (cennet)!/ behiştî bî!/ bila cennetmekan be!/ bila behişt behra te be!	mekanın cennet olsun!	que ton séjour soit le paradis	may you end up in heaven/ paradise!
bila li te bibe goşt û xwîn!/ bi goşt û xwîn be!	yemekten sonra söylenir: canına afiyet! (canına kan ve et olsun!)	se dit après un repas: que cela te profite bien (litt. que cela devienne sang et chair); assimile-le bien!	after a meal: may it become flesh and blood, may it be nourishing for you!
bila 'emrê min li ber emrê te bigere!/ bikeve!/ bila Xwedê 'emrê min li ser 'emrê te zêde bike!	ömrüm sana ömür olsun!	que ma vie s'ajoute à la tienne!	may my years be added to yours!
bila li te bigivire!	yarasın, helalı hoş olsun!	que cela te profite bien!	may you derive benefit/nourishment from it (of food)
bila bi hev re pîr û kal bin! / bi hevre (pêkve) pîr û kal bibin!	aynı yastıkta yaşlanasınız!	se dit aux nouveaux mariés: que vous vieillissiez ensemble!	may yougrow old together!
bila perr û baskên Xwedê li ser be!/ bila sitara Xwedê li ser be!	Allahın kanatları üzeride olsun; Allah seni korusun	que Dieu te prenne sous ses ailes!; que Dieu te protège!	may God take you under his wings, may God protect you
bi silametî rabî!	selametle kalkasın!	remets-toi vite!	a speedy recovery!
bi xêr be!	hayırlı olsun!	que cela te porte du bien!	may this do you good
bila Xwedê bi ber du'ayên salihan bixe!/ bila Xwedê li ser du'ayên salihan bixe!	Allah seni salihlerin duasına versin!	que Dieu te fasse bénéficier des prières des dévots!	may God make you benefit from the prayers of the pious
bila Xwedê şifayê xêrê bide!	Allah hayırlı şifalar versin	que Dieu accorde une guérison bénéfique!	may God grant a good cure
bila Xwedê û Pêxember bên hawara we! / şêx 'Evdulqadir Geylanî li hawara te bêt!	Allah ve Peygamber imdadına gelsın	que Dieu et le Prophète viennent à ton secours!	may God and the Prophet come to your aid
çavê Xwedê li te be!/ di bin çavdêriya Xwedê de bî!	Allah seni korusun!	que Dieu veille sur toi!	may God's eye be on you!
dengê te xweş!	(türkü söyleyene söylenır): sesin hoş olsın; ağzına sağlık!	se dit pour une personne qui chante: que ta voix vive, soit belle!	said to someone singing: may your voice be pleasant!
dengê te li dinê be!	sesin dünyada kalıcı olsun	que ta voix reste au monde!	may your voice be permanent in the world!
derdê te li canê min bikeve!	derdin canıma değsin	que je prenne sur moi ton mal!	may your illness fall on me
derek te pê neêşe!	(yemekte) bir yerine dokunmasın!	se dit à qn qui mange ou boit: que cela ne t'indispose pas!	said of s.o. eating and drinking: may this not do you harm
destê şêx Ebdulqadir li pişta te be! (pêxember/ şêx û meşayîqan/ ocaxa mala şêx)	şeyh Abdulkadir (Geylani)'nin (peygamber/ şeyhlerin/ eli sırtında olsun, yardımı olsun!	que le cheikh Abdulkadir Geylani (fondateur de la confrérie Qadiriya) vienne à ton aide	may Sheikh Abdulqadir Geylani (founder of the Qadiriyah sect) come to your aid
destê te sax be! /destê te xweş be!/ destê te ter û hêşîn be!/ destê te zêrîn be!	yemekten sonra ev sahibesine denir: ellerine sağlık; ellerin var olsun!	se dit après le repas à la maîtresse de maison: que tes mains vivent!	may your hands live (be moist and green) said to the hostess after a meal
di dilovaniya Xwedê de be!	Allahin rehmetine kavuşsun!	qu'il jouisse de la miséricorde de Dieu!	may he enjoy God's mercy
di nav xêr û şahiyê de be!	şen ve esen ol!	soit dans la joie et le bien! (se dit aux nouveaux mariés)	may you live joyful and prosperous (said to newly-wed)
deweta we li ser xêrê be! di nav xêr û şahiyê de be!	düğününüz hayırlı olsun!	que votre fête soit bénie	may your wedding be blessed!
emrê te dirêj be!	ömrün uzun olsun!	que ta vie soit longue	may your life be long!
emr dirêj bî!	uzun ömürlü olsun!	que tu aies une longue vie!	may you have a long life!
evên kevin, hezarî nûh/ bi xêr û xweşî biqetînî!/ hezaran bidirîni (biqetînî)!	yeni bir elbise giyene denir: bunu eskit, bin tane yenisini de; (giysi için) bin tanesini eskitesin	se dit à la personne qui porte un vêtement neuf: use bien celui-ci et mille autres vêtements neufs	said to someone wearing new clothes: wear this one out and (may you have) a thousand new ones
ez çawan ji te xweş im, bila Xwedê jî wisan ji te xweş be!	senden nekadar razı isem Allah da seni o kadar razı etsin!	que Dieu soit content de toi autant que je suis content de toi	may God be as pleased with you as I am
ez goriya te bim, ez nezrê te bim, ez qurbana te bim!/ ez bibim tesediqa serê te!/ ez dora serê te bigerim!	kurbanın olayım!	que je sois sacrifié(e) pour toi	may I be a sacrifice for you!
ez derdê te nebînim!	derdini görmeyeyim	que je ne voie pas ta mort! que je ne te survive pas	may I never see your death!

ez kêmaniya te nebînim!	eksikliğini görmeyeyım	que je ne souffre pas de ton absence (mort)	may I not suffer your loss!
gora te tijî nûr be!	kabrin nur dolsun!	que ta tombe soit remplie de lumière!	may your grave be full of light!
gora wî fireh be!/ gorfireh be!	kabri geniş olsun!	que sa tombe soit vaste	may your grave be great!
goşt pê bigivire!	güçlü kuvvetli olsun!		may s/he flourish!
her hebe! /daîmî be!/ tim hebe!/	daimi olsun; var olsun!	se dit après un repas ou après avoir reçu un don: qu'il y en ait toujours!	said after a meal or after receiving a gift: may it always be so!
her têr û tijî be!	(sofra) bol olsun!	que ta table soit pleine et bien garnie!	may your table be well spead!
hezar salî bî!	bin yıl yaşa!	que tu vives mille ans!	may you live a thousand years!
hûn li ser balgiyekî pîr û kal bin!	yeni evlilere söylenir: aynı yastılıta yaşlanın!	se dit aux nouveaux mariés: que vous vieillissiez ensemble (ayant la tête sur le même traversin)	said to newlyweds: may you grow old together! (on the same pillow)
kevir li ber piyên te nekevin!	yola çıkana söylenir: ayağın taşa takılmasın! yolun açık olsun!	se dit à qn qui part en voyage: que tes pieds ne rencontrent pas d'obstacle (litt. pierres): bon voyage!	said of someone going on a trip: may no stones (obstacles) get in the way of your feet!
kevirê ku li ber lingê te bikeve, bila li çavê min bikeve!	ayağına takılan taş gözüme takılsın!	(litt. que la pierre qui fait obstacle à ton pied me tombe sur les yeux!)	may the stones in your way fall on my eyes!
li ser xêrê be! /li te xweş bît!			may it be for the best!
mala te ava be! / mala te ava!/ malî ava!	evin müreffeh olsun; sağ ol!	(litt. que ta maison soit prospère); merci!	may your home prosper, thank you!
mala te ava, tijî bûk û zava!	evin müreffeh olsun, gelin ve güveği dolsun!	(litt. que ta maison soit prospère); qu'elle s'emplisse de nouveaux mariés!	may your house prosper and be full of newlyweds!
mala te ava Xwedê kurê te bike zava!	evin müreffeh olsun, oğlum güvey olsun!	(litt. que ta maison soit prospère, que ton fils prenne femme)!	may your house prosper and your son take a wife
malê ji te hezar malî!/ ji vê malê hezar mal çêbe!	bu evden bin ev türesin!	que cette maison produise mille autres	may 1,000 households come from yours
mandî nebî!/ qewet be! Xwedê qewetê bide!	kolay gelsin, yorulmayasın!	se dit à qn qui travaille: ne soit pas fatigué que Dieu te donne des forces!	said to s.o. working: don't tire your self, may God strengthen you
me kêm kir bila Xwedê zêde bike!	yemekten sonra söylenir biz azalttık Allah çoğaltsın; Allah yerini doldursun!	se dit après un repas: nous avons diminué (votre richesse) que Dieu la multiplie	said after a meal: we've taken from it, may God increase it
min gerdena te azad kir Xwedê jî azad bike!	seni azat ettim, Allah da azat etsin!	je te fais grâce que Dieu t'accorde grâces aussi!	I grant you mercy, may God grant you it too
mirada te hasil be!/ Xwedê a dilê te bi cih bîne!/ Xwedê li gor dilê te bide te!	Allah gönlüne göre versin!	que Dieu t'en donne selon ton coeur que tu vives longtemps	may God give you what you wish for
mûyê spî li çoga te kevin!	dizlerinde ak tüy bitsin, çok yaşayasın!	jusqu'à ce que les poils de tes genoux blanchissent!	till the hairs on your knees go white
noşîcan be!/ sihet be!	bir şey içene söylenir: afiyet olsun; sıhhatler olsun!	se dit à qn qui boit: que cela te profite, bonne santé!	said to someone drinking: to your health
oxira te oxira xêrê be!/ vegera (oxira) te ya xêrê bît!	uğurlar olsun; uğrun hayırlı olsun!	se dit à qn qui part en voyage: (litt. que ton augure soit heureux); bon vent, bon voyage	said to someone going on a trip: good luck
pîroz û mibarek (bimbarek) be!	mübarek olsun!	(litt. que cela te soit béni); mes compliments (pour qn qui porte un nouveau vêtement ou de nouvelles chaussures)	said to someone wearing new clothes or shoes: may it be blessed
qelema te şên û geş be!	yazana denir: kalemin şen ya da var olsun!	se dit à un écrivain: que ta plume soit prospère! ou épanouie!	said to someone writing: may your pen prosper
rehma Xwedê lê be!/ rehma Xwedê li dê û babê te be! rehmeta Xwedê lê be (bit)!	Allah rahmet eylesin!/ anana babana rahmet!	que Dieu soit clément avec toi!; avec ta mère et ton père	may God be merciful to you; to your parents
rehma Xwedê li miriyên haziran!	Allahın rahmeti hazırların ölüleri üzerine olsun!	que la miséricorde de Dieu soit sur les mânes des morts des présents!	may God have mercy on the ancestors of those present
serderiya te zêr be!	eşiğin altın olsun	que le linteau de ta porte soit en or! que ta maison soit prospère!	may the lintel of your gate be of gold; may your house prosper!
siheta te xweş be!	sağol, sağolsın	bonne santé à toi, bravo!	good health!
siya Xwedê li ser te be!	Allahin gölgesı üzerinde olsun	que l'ombre de Dieu soit sur toi!; que Dieu te protège!	may God's shadow be upon you; may God protect you!
sofra we daîmî be!	sofranız daimî olsun!	que votre table soit éternelle (se dit après un repas)	(said after a meal) may your table always be set
taya te bi mirina min be!	sen sıtma olma, ben öleyim	que je meure plutôt que de te voir pris de fièvre!	may I die rather than see you taken by fever!
tu bi mirazê xwe şa bibî!, tu bi mirada xwe bikevî!	muradına eresin!	que tes voeux soient exaucés! (se dit aux femmes, aux jeunes mariés)	may you attain your desire, may your wishes be granted (said to newly weds and young people)
tu bi xêr û silametî biqetînî!	güle güle eskitesin!	se dit à qn qui porte un nouvel habit ou de nouvelles chaussures: use (le/les) dans la joie!	said to someone wearing new clothes or shoes) wear it out in good health, weart it well
tu bibî hezar salî!	bin yıl yaşa!	que tu vives mille ans!	may you live 1,000 years
tu hezar cejnan bibînî!		que tu connaisses mille autres fêtes!	may you enjoy a thousand more festivities
tu kêmaniyê (kêmasiyê) nebînî!	hiç eksikliğin olmasın!	que rien ne te manque!	may you lack nothing
tu li herdu dinyan (cîhanan) jî rûspî bî!, tu dîn û dinya rûspî bî!	iki dünyada da yüzün ak olsun!	que ta tête soit haute! (que tu sois honoré/e) dans les deux mondes!	may you be honoured in this world and in the next
tu nekî Xwedê bide te!	sen yapmadan Allah versin!	que Dieu te donne même lorsque tu ne fais rien!	may God give you (sthg) even if you have done nothing (to deserve it)
tu nemirî!	ölmeyesin, yaşa!	puisses-tu ne pas mourrir!	may you not die
tu rahêjî axê di destê te de bibe zêr!	tuttuğun toprak elinde altına dönüşsun!	que la terre que tu prends dans la main devienne or!	may the dirt you pick up turn to gold in your hands
tu, tu kul û derdan nebînî!	dert görmeyesin!	que tu ne souffres d'aucun mal	may you suffer no grief!
tu xêrandar bî!/ di nav xêrê de bî! tu xêrdar bî!/ tu xwedanê xêran bî!	hayırdar ol, hayırlar gör	que tu sois entouré du bien! que tu ne connaisses que le bien!	may all around you be good!
xoceyê Xizir bi te re be!/ destê xocê Xizir li pişta te be! Xidir nebî alîkarê te be!/ Xizir pêxember li gel te bît!	Hıdır İlyas yardımcın olsun!	que le prophète Elie te vienne en aide!	may Khidr (the prophet Elijah) be with you
Xwedê 'emrê te dirêj bike!	Allah uzun ömürler versin!	que Dieu t'accorde longue vie!	may God grant you long life
Xwedê bedena te şên bike! (piranî ji bûkan re tê gotin)	geline söylenir: Allah bedenini şenlendirsin! (çocuk versin)	se dit à la jeune mariée: que Dieu rende ton corps fertile! (épanoui); que tu puisses avoir une descendance nombreuse!	said to a new bride: may God make your body fertile; may you have many offspring
Xwedê bêtifaqiyê neke nava we!	Allah aranıza nifak sokmasın!	que Dieu vous protège de la discorde! (division)	may God protect you from disagreements
Xwedê bigihîne ruhê miriyan! Xwedê bigihîne ber destê miriyan!	Allah ölülerin ruhuna kavuştursun! (sadaka dağıtana ya da ölü yemeği verene söylenir)	se dit à ceux qui font une aumône: que Dieu en fasse bénéficier les âmes de vos morts!	may God (accept) the soul of the dead
Xwedê deriyê xêrê li te veke!	Allah sana hayır kapısını açsın!	que Dieu t'ouvre la porte du bien!	may God open for you the gate of goodness
Xwedê şên û qedîm bike!	misafir kalınan evden ayrılırken söylenir: eviniz şen ve kadim olsun!	se dit lorsqu'on quitte une maison où on a passé quelque temps: que ta maison soit vivante et durable! (antique)	may God give you strength and prosperity!
Xwedê li halê te binêre!	Allah haline acısın yardımcın olsun!	que Dieu voie ton état! (et y remédie), se dit à qn qui est malade ou en détresse	may God see your condition! (and cure it) said to someone who is ill
Xwedê îmana te kamil bike!	Allah imanını kamil etsin!	que Dieu t'accorde une foi complète!	may God make your faith perfect!
Xwedê îmanê bide te!	Allah sana iman versin!	que Dieu t'accorde la foi	may God give you faith!
Xwedê ji dê û babê te razî be! Xwedê ji te razî be!	Allah annenden babandan, (ya da senden) razı olsun!	que Dieu soit content de tes parents (de toi)	may God be pleased with your parents (you)!
Xwedê kesî bêpişt neke!	Allah kimseyi desteksiz (arkasız) bırakmasın!	que Dieu ne laisse quiconque sans soutien	may God leave no one without support!
Xwedê kesî bêxwedî (bèxweyî an bêkes) nehêle! Xwedê kesekî bêxwedî neke!/ Xwedê kesî bêkes neke!	Allah kimseyi sahipsiz bırakmasın!	que Dieu ne laisse personne sans protecteur	may God leave nobody unprotected!
Xwedê kurekî bide te!	Allah sana bir erkek çocuğu versin!	que Dieu te donne un fils	may God give you a son!
Xwedê mala te ava bike!	Allah evini müreffeh kılsın!	que Dieu rende ta maison prospère	may God make your household prosper!
Xwedê me ji belayên hîn mezintir bisitirîne!	Allah bizi daha büyük belalardan korusun!	que Dieu nous protège de plus grands malheurs	may God protect us from worse calamities!
Xwedê me li ber du'ayê te bixe!	Allah bizi hayır duandan mahrum etmesin!	que Dieu ne nous prive pas de tes prières	may God not deprive us of your blessings/ prayers!
bila serê te sax be!	başın sağ olsun!	se dit aux proches d'un défunt: (litt. que ta tête vive); longue vie à toi!	said to the family of s.o. who has died: may your head live; (may you have a long life)

Xwedê dengê te bibihîze!	Allah sesini duysun, dileklerini yerine getirsin!	que Dieu t'entende! (se dit à qn qui exprime de bons voeux)	from your mouth to God's ear, may God hear your wish!
Xwedê min nezrê te bike! Xwedê min je te re bike nezir! Xwedê min qurbana te bike!	Allah beni sana kurban etsin!	que Dieu fasse que je sois sacrifié pour toi (pour que tu restes en vie)	may God sacrifice me instead of you (so that you remain alive)
Xwedê mirazê (miradê) dilê te bike!	Allah muradını yerine getirsin!	que Dieu exauce tes voeux (se dit surtout à des jeunes gens pour leur souhaiter un mariage selon leur voeux)	may God make your wishes come true (may God grant your wishes)
Xwedê nivînên xêrê bide te!	hasta yatağında olana denir: tanrı yatağını hayırlı kılsın!	(litt. que Dieu t'accorde un lit de bien!); se dit à un malade: prompt rétablissement!	may God give you a bed of goodness, healing, said to s.o. ill (i.e. speedy recovery)
Xwedê quwetê bide te	Allah kolaylık versin, kolay gelsin!	que Dieu te donne de la force!	may God give you strength
Xwedê selametiyê (selametiya xêrê) bide!	Allah (sana) selametler versin!	que Dieu t'accorde le salut	may God save/protect you (may God keep you safe)
Xwedê te bi dewraneke mezin bighîne!	Allah seni yüce makamlara ulaştırsın!	que Dieu te fasse accéder à un rang élevé	may God elevate your station
Xwedê te bihêle!	Allah seni korusun!	que Dieu te garde	may God keep you among the living, protect you
Xwedê te bixefirîne!	Allah seni bağışlasın!	que Dieu te pardonne (tes péchés)	may God forgive you
Xwedê te ji gunehan efû bike! Xwedê gunehên te efû bike!	Allah günahlarını afetsin!	que Dieu pardonne tes péchés	may God forgive your sins
Xwedê te ji qeza û belayan biparêze!	Allah seni kaza ve belalardan korusun!	que Dieu te protège des accidents et malheurs	may God protect you from adversity
Xwedê te li (ji) ser serê zarokên te kêm neke!	Allah seni çocuklarının başından eksik etmesin!	que Dieu fasse que tes enfants ne soient pas privés de toi	may God not deprive your children of your company
Xwedê te ji qudûmê dest û lingan neke! (an kesî) nexe nav dest û piyan	Allah seni el ayak altında bırakmasın!	que Dieu ne te prive pas de l'usage de tes mains et pieds	may God not deprive you of the use of your hands and feet
Xwedê we bi hev şa bike!	Allah sizi mesut etsin!	que Dieu vous rende heureux (se dit aux mariés)	may God make you happy together
Xwedê we bisitirîne!	Allah sizi korusın!	que Dieu vous protège	may God protect you
Xwedê yekî (yeke) bi dilê te bide te!	Allah sana gönlüne göre birini versin!	que Dieu t'accorde qn selon ton coeur	may God give you a mate who is pleasing to you
Xwedê yeka te bike deh!/ Xwedê yeka te bike didu!	Allah bir verdiğini on etsin!	que Dieu décuple tes richesses!	may God increase your wealth
Xwedê bab û birayê te bihêle!	Allah babanı ve kardeşlerini korusun!	que Dieu garde ton père et tes frères!	may God preserve your father and brothers!
Xwedê bi rehma xwe şa bike!	Allah rahmetiyle şad etsin!	se dit aux proches d'un défunt: que Dieu le réjouisse par sa clémence!	said to the family of one who has died: may God's mercy rejoice him!
Xwedê bîhna we fireh bike (ket)!	Allah sabırlar versin!	que Dieu vous accorde de la patience!	may God grant you patience!
Xwedê bike kefaretê gunehan!	Allah günahlara bedel saysın!	se dit à un malade: que Dieu compte tes souffrances comme répentance de tes péchés!	said to s.o. sick: may God count your pain as repentence for your sins!
Xwedê çira wî ji tune de vêxe!	Allah çırasını yoktan yaksın!	que Dieu éclaire (allume) sa lanterne	may God light his (her) lantern!
Xwedê çu meraqa di dilê te de nehêle!	Allah gönlünde hiçbir gam bırakmasın!	que Dieu ne laisse nul souci dans ton coeur!	may God free your heart from worries!
Xwedê dengê te bibihîze (sehbike)!	Allah sesini duysun!	que Dieu t'entende!	may God hear you!
Xwedê derd û bela neke nesîbê te!	Allah sana dert ve bela nasib etmesin!	que Dieu t'épargne souffrances et calamités!	may God spare you from pain & calamity!
Xwedê derê tifaqan (qeza û belayan) bigre!	Allah bela kapısını kapatsın!	que Dieu ferme la porte des calamités!	may God close the door on calamity!
Xwedê destê rastê muhtacê destê çepê neke!	Allah sağ eli sol ele muhtac etmesin!	que Dieu fasse que la main droite n'ait pas besoin de la main gauche!	may God ensure that your right hand has no need of your left!
Xwedê dilê te şahî biket!	Allah gönlünü şad eylesin!	que Dieu réjouisse ton coeur!	may God rejoice your heart!
Xwedê dilê te xweş bikit!	Allah gönlünü hoş etsin!	que Dieu rende ton coeur heureux!	may God make your heart happy!
Xwedê gerdena te azad bike!	Allah seni azat eylesin!	que Dieu te rende libre (ou qu'il affranchisse)!	may God free (liberate) you!
Xwedê guh li dengê te bît!	Allah sesin duysun (kulak versin)!	que Dieu prête l'oreille à ta voix!	may God lend an ear to your voice!
Xwedê li halê te binêre!	Allah haline baksın!	que Dieu veille sur toi! (litt. sur ton état)	may God watch over you!
Xwedê hewe biparêzit!	Allah sizi korusun!	que Dieu te protège!	may God protect you!
Xwedê ji dîn û îmanê bêpar neke!	Allah dinden ve imandan mahrum etmesin!	que Dieu ne nous prive pas de la religion et de la foi!	may God not deprive us of our religion and faith!
Xwedê ji qeza û belayan bisitirîne! / Xwedê me ji bela û afatan sitar biket! / Xwedê me sitar biket! Xwedê qeza û belayan ji ber derê we dûr xîne! Xwedê te ji bela û afatan sitar biket!	Allah kaza ve beladan korusun!	que Dieu (te) protège des accidents et des calamités	may God protect (you) from accidents and calamities!
Xwedê we şermezar neke!	Allah sizi utandırmasın!		
Xwedê zarokên te ji te re bihêle!	Allah (çocuğunu) sana bağışlasın!	que Dieu garde (tes enfants) pour toi!	may God preserve your children!
Xwedê kêmaniya dengê te neke!	Allah sesini eksiltmesin!	que Dieu ne nous prive pas de ta voix! (litt. ne fasse pas manquer ta voix)	may God not deprive us of your voice!
Xwedê kêmaniya te nede! Xwedê kêmaniya te neke!	Allah seni eksik etmesin!	que Dieu ne nous prive pas de toi!	may God not deprive us of you!
Xwedê kesî li xwe neheyîrîne!	Allah kimseyi darda bırakmasın!	que Dieu ne laisse personne dans l'adversité!	may God leave no one in adversity!
Xwedê li halê te were hewarê!	Allah imdadına yetişsin!	que Dieu vienne à ton secours!	may God come to your aid!
Xwedê me bide bi xêra te!	Allah bizi hayrına versin!	que Dieu nous fasse profiter de tes bienfaits!	may God allow us to enjoy your good deeds!
Xwedê me nede şermê!	Allah bizi utandırmasın!	que Dieu nous épargne la honte!	may God spare us from shame!
Xwedê min bi goriya te ke!/ Xwedê min bi qurbana te ke! Xwedê min li dora serê te bigerîne!/ Xwedê min li dora te bigerîne!	Allah beni sana kurban etsin!/ kurbanın olayım!	que Dieu me sacrifie pour toi (ou à ta place)!	may God sacrifice me in your place!
Xwedê miradê miradxwazan hasil bike yê me jî pê (ve) re! Xwedê mirazê xwedanmirazan hasil bike yê me jî tê de!	Allah herkesi muradına kavuştursun bizi de onlarla!	que Dieu exauce les voeux de chacun et les nôtre aussi !	may God grant the wishes off all and ours too!
Xwedê mirazê dilê te bike! / Xwedê mirazê dilê te hasil bike!	Allah muradına kavuştursun!	que Dieu exauce les voeux de ton coeur!	may God grants your heart's wishes!
Xwedê mirinê nede!	Allah ölüm göstermesin!	que Dieu nous épargne de la mort!	may God spare us from death!
Xwedê mirov ji nezera çavan bisitirîne!	Allah insanı nazardan korusun!	que Dieu nous protège du mauvais oeil!	may God protect us from the evil eye!
Xwedê mirov neke benîştê devê xelkê!	Allah insanı elalemin ağzına sakız yapmasın!	que Dieu fasse que l'on ne devienne pas de la gomme à mâcher dans la bouche des autres!	may God ensure that we do not become chewing gum in the mouths of others!
Xwedê mirov nexe ser zar û zimanan!	Allah insanı dillere düşürmesin!		
Xwedê neyne serê tu kesî!	Allah kimsenın başına getirmesin!	Dieu fasse que personne ne connaisse pareille chose!	may God prevent that from happening to any one!
Xwedê nûra çavê te kêm neke!	Allah gözünün nurunu eksiltmesin!	que Dieu ne réduise pas la lumière de tes yeux!	may God not lessen the light of your eyes!
Xwedê qeyda wî veke!	Allah bağlarını çözsün!	que Dieu le libère de ses fers!	may God release him from his schakles!
Xwedê quwetê bide we!	Allah size güç versin!	que Dieu vous accorde de la force!	may God give you strength! more power to you!
Xwedê me rojekê jî bê te nehêle!	sensiz bir gün kalmayalım!	Dieu fasse que l'on ne reste pas un jour sans toi!	may not a day pass without you!
Xwedê sebrê bidet we!	Allah size sabırlar versin!	que Dieu vous donne de la patience!	may God grant you patience!
Xwedê serê 'eyalê me bihêlit!	Allah aile reisimizi korusun!	que Dieu garde le chef de notre famille!	may God preserve the head of our familly!
Xwedê serî li we negerîne!	tanrı başınzı dara çokmasın!	que Dieu vous épargne l'adversité!	
Xwedê silametiyê bide te!	Allah sana selamet versin!	que Dieu t'accorde le salut!	may God grant you health!
Xwedê te 'efu bike!	Allah seni afetsin!	que Dieu te pardonne!	may God forgire you!
Xwedê te bê war neke!	Allah seni ocaksız bırakmasın !	que Dieu ne te laisse pas sans succession! (litt. sans foyer)	may God note leave you childless!
Xwedê te bigihîne dewraneke mezin!	Allah seni ulu dara sokmasın!	que Dieu te fasse accéder à de hautes responsabilités!	
Xwedê te hewce nekit!	Allah seni muhtac etmesin!	que Dieu ne te laisse pas dans le besoin!	may God save you from need!
Xwedê te ji dest û piyan neke! Xwedê te ji qudûman neke! Xwedê te ji qudûm de nexîne! Xwedê te ji qedem nehêlît!	Allah seni ellerinden kollarından mahrum etmesin!	que Dieu ne prive pas de tes membres!	may God not deprive you of hands or feet!
Xwedê te ji nav zarokên te nebet!	Allah seni çocuklarından koparmasın !	que Dieu ne t'enlève pas à tes enfants!	may God not separate you from your children!
Xwedê te ji axa kolemîşkan bisitirîne!	Allah seni görünmeyen belalardan saklasın!	que Dieu te garde des calamités invisibles!	
Xwedê te muhtacê namerdan neke!	Allah seni namerde muhtaç etmesin !	Dieu que t'aies pas besoin des salauds!	may God protect you from scoundrels!
Xwedê û pêxember bi te re bin!	Allah ve Peygamber seninle olsun	que Dieu et le Prophète soit avec toi!	may God and the Prophet be with you!
Xwedê wan bi hev re pîr û kal bike! Xwedê we bi hev re kal û pîr bike!	Allah onları birlikte yaşlandırsın !	que Dieu les fasses vieillir ensemble!	may God see that they reach old age together!
Xwedê we bi hev şa bike!	Allah sizi birlikte mutlu etsin!	Dieu fasse que vous ayez la joie ensemble!	may God bring you together!

Xwedê we ji ber hev nexe!	Allah birliğinizi bozmasın!	que Dieu ne rompe pas votre entente!	may God keep you together!
Xwedê xêra te binivîsit!	Allah hayrına yazsın (saysın)	que Dieu inscrive ton bien fait!	may God inscribe your good deeds!
Xwedê xêra wî qebûl bike!	Allah bayrını kabul etsin	que Dieu accepte son bienfait!	may God accept his good deeds!
Xwedê ya dilê te bi cî bîne!	Allah gönlündekini yerine getirsin	que Dieu accomplisse le voeu de ton coeur! (litt. ce que tu as dans le coeur)	may God bring your wish to pass!
Xwedê yekîtiya hewe xerab neket!	Allah birliğinizi bozmasın !	que Dieu ne rompe pas votre union!	may God preserve your unity!
Xwedê zêde bike!	Allah artırsın !	que Dieu le démultiplie!	may God increase it!
Xwedê, tu, me û hemî ummeta Mihemmed ji şefa'eta xwe kêm nekî!	Allahım, bizi şefaetinden eksik etme !	ô Dieu ne nous nous prive pas de la clémence!	may God not deprive us of his mercy!
Xweşî be!	sihhatler olsun!	bonne santé!, bon bain!	
Ya şahê Neqşebend!	ey Nakşebendi şahı!	ô Seigneur des Naqchébendin!	o King of Naqshbendis
Ya Rebî şikir ji te re!/ şikir ji Xwedê re!	ya Rab, sana şükürler olsun !	grâce à toi, ô Dieu!	thank God/ the Lord!
Ya Rebî tu me muhtacî kesî nekî!	ya Rab bizi, kimseye muhtaç etme !	ô Dieu, fasse que nous n'ayons pas besoin d'autrui!	o Lord, may we not need the help of others!
Ya Rebî tu me ji nezera xerab bisitirînî!	ya Rab, bizi kem gözden esirge	ô Dieu, protège-nous du mauvais oil!	o Lord, protect we us from evil eye!
Ya Rebî tu me ji ya hayê me jê tune bisitirînî!	ya Rab, bizi bihaber olduğumsuzdan koru!	ô Dieu garde-nous de ce que nous ignorons!	o Lord, protect us from the unknown!
Ya Rebî tu me kêmî kesî nekî!	ya Rab, bizi kimseden eksik etmeyesin!	ô Dieu, fasse que nous ne soyons pas moins que quiconque!	o Lord, don't make us less than anonyme else!
Ya Rebî tu qenciyê ji dilê me kêm nekî!	ya Rab, iyilığı kalbimizden eksiltme!	ô Dieu fasse que nous manquons pas du bien dans notre coeur!	o Lord, don't decrease the goodness in my heart!
Zêdeya we bi dê û bab mezin be!	ziyadeniz çocuğunuz anne ve babasıyla büyüsün	que votre progéniture grandisse entouré de ses parents!	may you grow up with both parents!
Zehmeta te di avê de neçe!	zahmetin boşa gıtmesin	que les efforts ne restent pas vains! (litt. qu'ils n'aillent pas à vau-l'eau)	may your efforts not be wasted!

Cureyên endamên laşê mirovan û îdyomên jê çêkirî

Amadekar : Reşo ZÎLAN

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
DEST, lep	**el**	**main**	**hand**
destqerase: kesê ku destê wî pirr xurt e, bi qewet e	elleri çok güçlü kuvetli olan	qui a des mains puissantes	someone with strong, powerful, (quick hands)
desttopik, destgirover	elleri yuvarlak olan	qui a des mains rondes	plump handed
destqilotik, destê pir biçûk û girover	elleri küçük ve yuvarlak olan	qui a des mains menues et rondes	someone with small, plump hands
destkifte, destkutilkî, destkupişî	elleri köfte gibi kalın ve etli olan	qui a des mains très charnues en forme de boulettes	someone with thick, meaty hands
destmezin, destmilhêb, lepmezin, lepgir, destgir, lephirç	elleri fazla iri olan, ayı elli	qui a des grandes et grosses mains (comme un ours)	someone with huge, hands
destnermik, destpembû	elleri pamuk gibi yumuşak olan	qui a des mains douces	gentle handed
destgupik, destpatore	elsırtı kabarık olan	qui a le dos de la main bombé	someone the back of whose hand is puffy, lumpy
destkabrû	elleri nasırlı olan	qui a les mains calleuses	who has horny hands
destmelhem	çok yumuşak kadın elli	qui a des mains très douces et féminines	who has very soft and feminin hands
destşahîk	parlak ve kaygan elli	qui a des mains brillantes	who has shiny hands
destgurz, lepşêr	elleri oldukça iri ve darbesine kuvvetli	qui a des pattes de lion (des mains grosses et puissantes)	who has lions paws (large and powerful hands)
destgirê	eklemleri iri ve kaba el	qui a des grosses mains osseuses	who has bony hands
destqut	kısa boylu el	qui a des mains courtes	who has short hands
destqopik, destçopik	bükümlü sakat el	qui a des mains difformes	who has deformed hands
destkut	bileği dolgun iri ve şişman el	qui a des poignets et des mains bien charnus	who has fleshed hands en fists
destvaç	çarpık el	qui a des mains tordues	who has twisted hands
destpiçûk	elleri ince ve narin	qui a des mains menues et fines	who has small slender hands
destçoqal	elleri çarpık	qui a des mains tordues	who has twisted hands
destpûç, destkişyayî	eli felçli	qui a des mains paralysées	who has paralysed hands
destfireh	geniş elli	qui a les mains larges	who has wide hands
destgoc	el pamakları içe doğru çekik ya da eğık olan	qui a une main dont les doigts sont tordus ou courbés	who has a hand with twisted fingers
Îdyom			
destgirtî	cimri, hasis, eli sıkı	avare	miserly, avaricious, greedy, selfish
destgîran, desgirtî, dergistî	sözlü	engagé(e) pour le mariage	engaged to be married
destbixwîn	eli kanlı, katil	qui a les mains tachées de sang, assassin	someone with blood on his hands with blood-stained hands, a murderer
destgiran	eli ağır	1) lent; 2) qui a la main lourde	1) slow; 2) heavy-handed
destkurt	fakir, güçsüz	pauvre, sans influence, démuni	indigent, poor, powerless
destgîr	elinden tutan, yardımcı olan	secourable, qui vient en aide	helpful, coming to one's assistance
destsivik, destçapûk	eli hafif olan, çabuk iş gören	alerte, rapide, qui travaille vite	alert, quick
destşifa	eli şifalı olan	qui a des mains qui guérissent	who has healing hands
destbirr	dolandırıcı	escroc	trickster, dishonest, swindler
deskuj: heywanê ku bi destê kesekî hatiye ser jê kirin an awayê serjêkirinê	birinin eliyle kesilen hayvan ya da kesme işlemi	animal comestible égorgé par qn; action d'égorger un animal	butchering/slaughtering of an animal for the purpose of eating its meat
destbend	kelepçe	menottes	handcuffs
destbidest: hema di cih de, devbidest	hemen anında, vakit geçirmeden	sur le champ	immediately, on the spot
destbikar: kesê ku kar ji destê wî tê	elinden iş gelen, becerikli	habile (de ses mains), adroit, travailleur	handy, one who is good at fixing things
destbizav, destbizêv, desthel	eli çabuk, marifetli	alerte, habile	alert, skillful
destemoyî	ehlileştirilmiş, ehli	apprivoisé, domestiqué	tame, domesticated
desthişk	1) zalim; 2) cimri	1) qui a la main dure, despote; 2) avare	1) despotic; 2) miserly, selfish
destkarî: pêleyistin	tahrif, tahrif etme	altération, falsification, manipulation	alteration, manipulation, falsification
destkir (f.)	el işi	artisanat, travail fait à la main	handicraft
destkeft	kazanım	acquis, conquête	achievement, gain
destvekirî	eli açık, cömert	généreux, prodigue	generous
destpak, destpaqij	dürüst, eli temiz	honnête, fiable	honest, reliable
destnepak	dürüst olmayan	malhonnête, peu fiable	dishonest
destpîs	hırsız	voleur	thief, crook
destxwazî	kız isteme	demande de la main d'une fille	asking for a girl's hand in marriage
destfireh	ekonomik yönden darda olmayan, hali vakti yerinde, cömert	aisé, qui n'est pas en difficulté, généreux	well off, generous
destkeçik	elleri hiç iş yapmamış, eli sıcak sudan soğuk suya girmemiş	qui n'a pas travaillé de ses mains	who has never worked with his hands
destgod	sakar	manchot	one-armed
destmiç, destgirtî	cimri	avare	mean, miserly

destqapan	el yordamıyla ağırlığı doğru tahmin eden	qui a la main pour deviner le poids des choses	who is handy at guessing the weight of things
destteng	eli dar, ekonomikman sıkışık durumda olan	qui est dans la gêne, qui a peu de moyens	who is in trouble, hard up
destbelav	cömert	prodigue	lavish, prodigal
destvala	1) eli boş 2) işsiz 3) silahsız	1) qui a les mains vides; 2) chômeur; 3) désarmé, sans armes	1) empty handed; 2) unemployed 3) disarmed
destber	tutumlu	économe	economic
destbivir	darbesi ağır	qui a la main dure	hard fisted
destpûç	elinden birşey gelmez	incapable, bon à rien	incapable, good for nothing
destborî	hatırı sayılmak	qui a le bras long, qui a de l'influence	long armed (a lot of influence), with clout
destnetebitî	eli rahat durmayan	qui bouge sans arrêt, qui ne tient pas en place, qui a les mains baladeuses	fidgety, restless, has roving hands
DEV		**bouche**	**mouth**
devçewal, devcûhal, devtûrik	ağzı çok geniş ve yayvan olan	qui a une bouche trop large (comme un sac)	wide-mouthed (litt. sack-mouthed)
devmûç, devmiç	düzgün büzük ağız	bouche régulière et saillante	someone with a small, protruding mouth
devkovik, devtûtik	zurna ağızlı, huni ağızlı	qui a une bouche conique	who has a funnel-shaped mouth
devzotik	şişkin ve büzük dudaklı ağız	qui a des lèvres charnues et retroussées	someone with thick, (turned up) lips
devxwar	eğri ağızlı	qui a la bouche tordue	who has a crooked mouth
devkeftar	ağzı büyük ve biçimsiz olan	qui a une bouche large et laide (comme celle d'une hyène)	who has a wide and ugly mouth (like a hyena)
devmezin	iri ağızlı	qui a une grosse bouche	who has a big mouth
devpiçûk	küçük ağızlı	qui a une petite bouche	who has a small mouth
devbel	ağzı dışa doğru çıkık olan	qui a la bouche protubérante	who has a protruding mouth
devrût, devrûtik	bıyıksız	sans moustache (litt. qui a la bouche nue)	without mustashes, (litt. naked mouth)
devgur	'kurt' ağızlı	qui a une gueule de loup	who has a wolf's jaws
devkulpik	ağzı içe doğru büzük olan	qui a la bouche enfoncée vers l'intérieur	who has receding mouth
devşekal, devçadir	oldukça geniş ve yayvan agızlı	qui a la bouche très large et disgrâcieuse (comme une godasse)	who has a large clumsy mouth (like a boot)
devpizî	büzük ağızlı	qui a la bouche tordue	who has a twisted mouth
devkoxik	ağzı içeriye çekik olan	qui a la bouche en retrait	who has a receding mouth
devşikeft	ağzı aşırı büyük olan	qui a une grosse bouche caverneuse	who has a large cavernous mouth
devkewar	ağzı büyük olan	qui a une bouche volumineuse	who has a voluminous mouth
devtajî	'tazı' ağızlı	qui a une gueule de lévrier	who has greyhound's jaws
devqelişî	yırtık ağızlı	qui a la bouche "déchirée" (large)	wide-mouthed
devtûj, devtîj, devrêvî	tilki ağızlı	qui a la bouche saillante comme celle du renard	someone with a prominent mouth, like a fox
devjihev, devbeş	açık ağız	qui a la bouche bée, béat	wide, open mouthed
devşelte	yayvan ağızlı	qui a une bouche large	large-mouthed
devmeymûn	maymun ağızlı	qui a une bouche de singe	monkey-mouthed (with an apelike mouth)
devkasik, devkodik	"kase" ağızlı	qui a la bouche en forme de bol en net retrait du menton et du nez	who has a mouth recessed relative to nose and chin
devçarox	çarık ağızlı	qui a la bouche large et édentée	large and toothless mouth
devgilêz, devgirêz, devşil, devşêlav, devşorik	salyalı ağız	qui a la bouche baveuse	a dribbling mouth
devçermik	dudakları çok ince ağız	qui a des lèvres très fines, presque collées	who has thin, tight lips
devşûtikî	ağzı karpuz gibi öne çıkık olan	qui a la bouche en saillie, comme une pastèque	who has a mouth prominent as a water melon
İdyom			
bêdev	1) konuşkan olmayan; 2) kendisini savunamayan	qui a la bouche cousue, peu loquace	one whose lips are sealed
devmirî	konuşmaktan aciz olan	qui a la flemme de parler, qui peine à parler	s.o. who is taciturn
devbixwîn, devlixwîn	kan kokan, azgın	farouche, féroce	wild, fierce
devjihev, devvekirî	1) aval bakan; 2) doyum bilmeyen	1) béat; 2) insatiable	1) smug; 2) insatiable
devpîs, devlewitî, devgemarî, devkirêt, devxirab, devgenî	ağzı bozuk, küfürbaz	qui jure comme un charretier	who swears like a trooper
devnerm	mülahim ve kibar konuşan	qui parle avec douceur et courtoisie	who speaks softly and courteously
devnermik	tatlı konuşmasıyla aldatan	qui tient des propos doux pour tromper	who speaks softly and decentfully
devgirtî	aşzına sıkı, sır vermeyen	qui tient sa langue, qui ne trahit pas le secret	who holds his tongue, does not betray secrets
devbest: nivişta ku dev dide girê dan	kurt ya da kaynana ağzını bağlayan nuska	talisman pour boucler la bouche du loup ou de la belle-mère	talisman for shutting a wolff's mouth or a mother-in-law's
devbiken, devliken, devkenok	güleç	souriant	smiling
devtijî: halxweş	kimseye ihtiyacı olmayan, hali vakti yerinde olan	aisé	well off
devxweş, xweşmerdok	çok konuşup az iş yapan	qui parle bien mais agit peu	who speaks well but does nothing
devziwa	1) yiyecek şeyi olmayan; 2) doyumsuz	1) qui n'a pas à manger; 2) insatiable	1) he who has nothing to eat; 2) insatiable
devlok	başkalarına sataşan	qui a une langue de vipère	vituperous, he who attacks verbally
devmêşînî	mülahim, ağzından kötü laf çıkmayan	qui a un langage poli, docile	docile, softspoken
dudev	söyledikeri birbirini tutmayan, iki yüzlü	faux-cul	two-faced, insincere
devşûştî	inkarcı, yaptıklarını ya da yapılan iyilikleri inkar eden	qui ne reconnaît rien, ingrat	one who denies everything
devşayik	art niyetli güzel ve aldatan şeyler söyleyen	qui tient des propos agréables avec l'intention de tromper	one who says nice things with the intention of fooling or tricking
devberdayî, devsist	ağzında laf tutmayan, ağzı gevşek	indiscrect, qui ne tient pas sa langue	indiscrete, one who cannot hold his tongue
devçêr	ağzı bozuk, söğücü	grossier, qui ne cesse de jurer	foul-mouthed
devrût, devrûtik	merhametsiz, vicdansız	sans pitié, impitoyable	pitiless
devzirav	tüfek	fusil	gun, rifle
devbirsi, devbirçî	doymak bilmeyen	insatiable	insatiable
devrast, rastgo	yalan söylemeyen	honnête, qui ne ment pas	honest, who does not lie
devxwar	ağzından iyi söz çıkmayan	qui ne dit que des gros mots	foul-mouthed
DIRAN, didan		**dent**	**teeth**
diranmişk, didanmişk	küçük, seyrek ve sivri dişli	qui a des dents petites, espacées et aiguisées	one with tiny teeth (like a mouse)
diranfiq, diranqîç	dişlek	qui a des dents protubérantes	who has protruding teeth
dirankelox: kesê ku diranên wî xwar û xirab bin	dişleri eğri ve bozuk olan	qui a des dents pourries et courbées	one who has crooked, bad teeth
diranqîl, didankêlbe	köpek dişleri uzun olan	qui a des canines longues	someone with long canine teeth
diranxwar	eğik dişli	qui a des dents courbées	crooked-toothed
diranbirinc, diransedef, didanmirarî, diranmorî, diranmircan	inci dişli, dişleri muntazam ve beyaz olan	qui a des dents régulières et blanches comme un collier de perles (dents nacrées)	someone with perfect, white teeth, like a string of pearls
diranbeş	uzun yassı dişli	qui a des incisives longues et rondes	who has long, round incisives
diranferşik	geniş ve uzun dişli	qui a des incisives longues et larges	who has long wide incisives
diranker, didanfir	oldukça iri dişli	qui a des grosses dents (comme celles d'un âne)	who has a big teeth (like a donkey's)
dirankox, dirankurmî, diranrizyayî	çürük dişli	qui a des dents gâtées	who has rotten teeth
dirankurisî	dişleri aşınmış olan	qui a des dents érodées	who has worn down teeth
didankop	kesik dişli	qui a des dents espacées et courtes	someone whose teeth are widely spaced and short
diranfirk	seyrek dişli	qui a des dents espacées	someone with wide gaps between his teeth
didanşûrhe	alt ya da üst çenede üste bitişik dişli	qui a certaines dents superposées	someone who has some overlapping teeth
İdyom			
bêdiran	zararsız (kimseye zararı olmayan)	inoffensif, qui ne nuit à personne (litt. sans dent)	inoffensive, hornless (toothless)
ENÎ, nehtik	**alın**	**front**	**forehead**
enîkever, enîgewr	açık alınlı	qui a le front large et haut	someone with a wide, high forehead
enîbeş, beşo	alnı akıtmalı	qui a une touffe blanche sur le devant de la chevelure	someone with a patch of white hair, just above the forehead
enîding, enîgiç, enîdindoq, enîdoq, hêko, enîkutilk	alnı çıkık olan	qui a le front protubérant	one who has protruding forehead
enîteng, enîkurt	dar alınlı	qui a le front bas, peu dégagé	one who has a low, narrow forehead
enîfireh	geniş alınlı	qui a le front dégagé, large	one who has a wide forehead / brow

enîdeq, enîbideq	dövme alınlı	qui a le front tatoué	one with a tattoed forehead/brow
enîtebiqî, enîkort, enîkupiyayî	çökük alınlı	qui a le front concave	who has a concave forehead/brow
enîpirç	alnı kıllı	qui a le front vélu	who has a hairy forehead/brow
enîvekirî	alnı çok açık olan	qui a le front dégagé	who has a wide forehead/brow
enîgirê	alnı düşümlü (urlu) olan	qui a le front boursouflé	who has a swollen forehead/brow
enîçukul	yan tarafları çıkık alın	qui a le front en saillie sur les côtés	who has a bumps on the side of forehead/brow
enîtehtikî, enîtaht	açık ve öne eşik alın	qui a le front dégagé et plat (comme une dalle)	who has a brood flat forehead/brow (like a tile)
enîtirş, enîgirê	çatık kaşlı, çatık suratlı	renfrogné	sullen
Îdyom			
enîbeş	1) tanınan, bilinen 2) yaramaz, haylaz	1) connu, notable; 2) espiègle, vif	1) well know; 2) nischievous lively
enîvekirî	alnı açık	digne, qui a la tête haute	dignified
enîdoq	uğursuz	porte-malheur, de mauvais augure	goual, brings bad luck
enîhilmiştî	gurur duyan, göğsü kabaran	fier	proud
GERDEN	**gerden**	**cou**	**neck**
gerdenzirav	ince boyunlu	qui a le cou mince gracile	who has a slim, graceful neck
gerdenherîr, gerdenhilû	pürüzsüz kaygan boyun	qui a le cou soyeux, sans aspérité	who has a smooth, silky neck
gerdenxezal	'ceylan' boyunlu	qui a un cou de gazelle	who has a gazelle-like neck
gerdentenik	ince narin boyunlu	qui a le cou fin et délicat	who has a smalle, delicate neck
gerdenzer	güzel sarışın boyun	qui a le cou blond	who has a fair necked
gerdenspî	beyaz tenli boyun	qui a le cou blanc	who has a white neck
gerdenşor	çirkin boyun	qui a le cou laid	who has an ugly neck
gerdenbuhist	uzun boyunlu	qui a le cou long	who has a long neck
gerdengaz	boynu uzun ve uyumlu olan	qui a le cou long et gracieux	who has a long, graceful neck
gerdenqaz	kuğu gibi, kuğu boyunlu	qui a un cou de cygne	who has a swan-like
gerdenmorî, gerdenşûşe, gerdenbelor	inci gerdanlı, boynu pürüzsüz ve şefaf olan	qui a le cou sans défaut, translucide	who has a perfect neck
Îdyom			
gerdenaza	1) özgür, azat edilmiş; 2) masun	affranchi, innocenté	1) emancipated, freed; 2) acquitted
gerden aza kirin	1) azat etmek; 2) afetmek	1) affranchir; 2) pardonner	1) to emancipate, to free; 2) to forgive
gerdenxwar, stûxwar	boynu bükük	malheureux, indigent, miséreux	destitute, unhappy, sorrowful
GUH	**kulak**	**oreille**	**ear**
guhbel	dikik kulak	qui a des oreilles décollées	who has large, prominent ears
guhhesk, guhkovik, guhçoçik, guhmastêrk, guhheskû	kepçe kulaklı	qui a des oreilles en forme d'entonnoir	who has funnel shaped ears
guhkuş	ufak kepçe kulaklı	qui a des oreilles en forme de petit entonnoir	who has small funnel shaped ears
guhkevçî	küçük kepçe kulaklı	qui a des oreilles en forme de cuillère	who has spoon-shaped ears
guhkerr	küçücük kulaklı	qui a de toutes petites oreilles	who has very small ears
guhmûç, guhker	tavşan kulaklı	qui a de longues oreilles, des oreilles d'âne	who has long ears, donkey ears
guhşekal, guhşelte	iri geniş kulaklı	qui a de grosses et larges oreilles	who has big wide ears
guhpelîn	geniş yapışık kulaklı	qui a des oreilles larges et collées	who has large pinned back ears
guhkem, guhbirrî	kesik ya da eksik kulaklı	qui a une ou deux oreilles estropiée(s)	who has one or two ears cut off
guhpericî, guhpelişî, guhpelixî	ezik kulak	qui a des oreilles en partie plates	who has partially flat ears
guhçiçik	iri ve sarkık memeli kulak	qui a des oreilles ayant des lobes gros et pendants	who has large pendant lobes
guhloş, guhpehn	geniş yassı kulak	qui a des oreilles larges et rondes	who has wide, round ears
guhmezin	iri kulak	qui a de grandes oreilles	who has big ears
guhkerrînî, guhkerimî	hastalık sonucu çürük kulak	qui a des oreilles estropiées à la suite de maladies	who has ears crippled by illness
Îdyom			
guhgiran	ağır işiten, kulağı ağır olan	qui n'entend pas bien, malentendant	who is hard of hearing
guhqul, guhkun, biguh	kulağı delik, herşeyden çabuk haberi olan	vite, alerte, qui apprend très vite les nouvelles	alert, who is very quick in learning news
guhdirêj, guhker, guhrep	ahmak, eşek	stupide, âne, crétin	stupid, ass, idiot
guhdirêjî	ahmaklık, eşeklik	ânerie, idiotie	stupidity
guhdîk	çabuk duyan, kulağı kabarık	curieux, indiscret, qui prête l'oreille à tout	inquisitive
guhsivik, guhxweş	iyi duyan, kulağı duyarlı	qui a l'oreille fine	who is sharp hearing
guhbel	haber dolaştıran, muhbir	rapporteur, mouchard	squealer, informer
guhbelî	muhbirlik	mouchardage	squealing, sneaking, tattling
guhsist	kulak ardı eden, gevşek, ciddi olmayan	qui fait la sourde oreille, peu sérieux	who turns a deaf ear
guhsistî	gevşeklik, ciddiyetsizlik	manque de sérieux	irresponsible
guhfireh	umursamaz	indifférent, indolent	indolent, lazy
bêguh	1) kulaksız; 2) saşır		without, ears
guhkuş	başkalarını gizlice dinleyen	qui écoute les autres secrètement	who listens in to others
guhşor	kullakları düşmüş	qui a des oreilles rabattues, qui a dû rabattre ses prétentions	who has ears pinned back, who has had to climb down
GULÎ	**saç örgüsü**	**tresse**	**plait**
gulî	saç örgüsü, örük	tresse (de cheveux)	plait, lock (of hair)
gulîzer	sarışın örüklü	qui a des tresses blondes	who has blond plaits
gulîsor	kızıl örüklü	qui a des tresses rousses	who has red plaits
gulîreş	siyah örüklü	qui a des tresses noires	who has black plaits
gulîdirêj	uzun örüklü	qui a de longues tresses	who has ong plaits
gulîzirav	ince örüklü	qui a des tresses fines	who has thin plaits
gulîmar	ince ve uzun örüklü	qui a des tresses fines et longues	who has long, thin plaits
guliqalind	örükleri kalın örülmüş	qui a des tresses épaisses	who has thick plaits
gulîbirr, kezîkur, kezîbirr, gulîkur	sevdiği ya da saydığı bir erkeğin ölümü nedeniyle örüklerini kesen (kadın)	femme dont les tresses sont coupées en raison du deuil d'un proche	a women whose hair is cut short in mourning
gulîwerîs	örükleri organ gibi sık ve kalın örülmüş	qui a des nattes de cheveux tressées serrées et épaisses comme une grosse corde	whose hair is plaited tight like a thick rope
GÛZEK	**topuk kemiği**	**malléole**	**ankle**
gûzek, gûzik, gozek	topuk kemiği	malléole	ankle
gûzekpehn	topuk kemiği yassı olan	qui a des malléoles plates	flat ankles
guziktop	topuk kemişi top olan	qui a des malléoles rondes	round ankles
gûzikgoşt	topuk kemiği gömük olan	qui a des malléoles enfoncées	hollow ankles
GURÇIK		**reins**	**kidney**
Îdyom			
gurçikpola, çargurçikî, heftgurçikî	korkusuz yiğit erkek	homme preux, sans peur, très courageux	brave, fearless man
gurcikxirş	böbrekleri çürümüş, işlemeyen	qui a des reins hors d'usage (pourris)	who has non-functioning kidneys
xirş: pûç	çürük	creux	hollow
axaftina xirş	boş laf	parole creuse	hollow words
KEZÎ	**örük**	**tresse**	**plait**
kezîhûr, kezîzirav	ince örüklü	qui a des tresses fines	who has thin plaits
kezîkurt	kısa örüklü	qui a des tresses courtes	who has short plaits
kezîdirêj	uzun örüklü	qui a des tresses longues	who has long plaits
kezîgir	kalın örüklü	qui a des grosses tresses	who has thick plaits
kezîzer	sarışın örüklü	qui a des tresses blondes	who has blond plaits
kezîsor	kızıl örüklü	qui a des tresses rousses	who has red plaits
kezîreş	siyah örüklü	qui a des tresses noires	who has black plaits
kezîpehn	yassı ve gevşek örülmüş örük	qui a des tresses larges et liées avec souplesse	who has thick loose plaits
LÊV	**dudak**	**lèvre**	**lip**
lêvqelişî	dudağı ortadan yarık olan	qui a une lèvre fendue	who has split lips
lêvzirav	ince dudaklı	qui a des lèvres fines	who has thin delicate lips
lêvtenik, lêvnazik, lêvnarîn, lêvkaxezî	zarif dudaklı, narin dudaklı	qui a des lèvres mignonnes, délicates	who has thin lips
lêvqalind, lêvstûr	iri dudaklı	qui a de grosses lèvres	who has thick lips
lêvreş	kara dudaklı	qui a des lèvres noires	who has black lips

lêvsor	kırmızı dudaklı	qui a des lèvres naturellement rouges	who has naturally red lips
lêvdirêj	uzun dudaklı	qui a des lèvres longues	who has long lips
lêvşor, lêvdaliqî	sarkık dudaklı	qui a des lèvres pendantes	one who has drooping lips
lêvfaq, lêvkem	tavşan dudaklı	bec-de-lièvre	hare-lipped
lêvlerzok	titrek dudaklı	qui a des lèvres tremblantes	who has trembling lips
lêvkurt, lêvqut	dudaklarından biri daha kısa olan	qui a une lèvre plus courte que l'autre	one who has one lip shorter than the other
lêvlemtû, lêvlatan	zenci dudaklı, şişkin dudaklı	qui a des lèvres très grosses, négroÏdes	thick-lipped (like west Africans)
lêvqeşavî: ziwa û terikî	dudakları kuru ve çatlak olan	qui a des lèvres sèches et craquelées (gercées)	one who has dry and chapped lips
lêvziwa	kuru dudaklı	qui a des lèvres sèches	dry-lipped
lêvçimçimî	büğümlü dudak	qui a des lèvres ondulées	curved-lips
lêvgilor	kalın ve etli dudak	qui a des lèvres grosses et charnues	who has thick, meaty lips
lêvşilor, lêvter, lêvşil	ıslak dudaklı	qui a des lèvres humides	who has wet lips
lêvgilêz, lêvgilîsk	dudakları salyalı	qui a des lèvres qui bavent	who has dribbling lips
lêvterikî	çatlak dudaklı	qui a des lèvres fendues	who has split lips
lêvpehn	geniş dudaklı	qui a de larges lèvres	who has wide lips
lêvxwençe	gonca dudaklı	qui a des lèvres en forme de bouton de rose	who has rose bud lips
Îdyom			
lêvşekir, lêvşîrîn	şeker dudaklı	poésie: qui a des lèvres délicieuses	sweet-lipped, sugar-lipped (poetic)
lêvşor, lêvdaliqî	dudağını büzen, asık suratlı	qui fait la gueule	sulky lips

Bergûz an şel û şepik li Behdînan

Amadekar : Husên BINAVÎ

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
bergûz	tiftiften yapılan takım elbise	complet traditionnel kurde d'homme	traditional Kurdish men's costume
merez: mûyê çûran	tiftik	mohair	mohair
çûr	tiftik keçisi, Ankara keçisi	chèvre angora	Angora goat
hiriya serbisk	uzun telli, en iyi kaliteli yün	laine longue de première qualité	first grade long-fibre raw wool
binşe	düşük kaliteli, tarak artığı yün	laine de qualité médiocre, utilisée pour faire des cordes, etc.	medium grade long-fibre raw wool, used for rope making
şepik, şapik	geleneksel kürt erkek kıyafetinde ceket	veste du complet traditionnel kurde d'homme	jacket of traditional Kurdish men's costume
şel, şal	pantalon	pantalon traditionnel	traditional trousers
êlek	yelek	gilet traditionnel kurde	traditional Kurdish waist-coat
êşlek, îşlik	gömlek	chemise	shirt
şûtik: pişt, piştîne	bele bağlanan kumaştan erkek kemeri	ceinture de tissu pour homme	man's cummerbund
şal	el örgüsü bel bağı	ceinture tissée de femme	woven women's belt
dersok, cemedanî, kefî, axabanî, axbanî	kefiye	kéffieh, coiffure traditionnelle kurde	keffiah, traditional Kurdish head wear
kum, kulav	külah	bonnet d'homme en feutre	man's conical felt hat
saq	1) çorabın bacağı örten kısmı; 2) tozluk	1) partie supérieure de la chaussette; 2) guêtre	1) sock uppers 2) gaiters
reşik	yünden ve kırılan örülen çarık	sandale en laine et poils tissés pour l'hiver	winter sandals of woven wool and hair fibers
kalik	altı lastik olan çarık	chaussure primitive dont la semelle est en caouchouc ou en peau et le dessus en laine tissée	rough shoes with rubber or hide sole and woven woollen uppers
kalika xaveryî: kalika ku binê wê qumaş e: kêmkalîte ye	altı kumaştan olan düşük kaliteli çarık	"kalik" dont le bas est en tissu	low quality shoes with cloth uppers

bergûzê bekirbegî: textê wan spî ye, xêzêt (xîçêt) zirav yêt şîn û sor lê ne

bergûzê tiyaryanî: textê wan spî ye, xîçêt zirav yêt sorî lê ne

bergûzê badayî: xîç an malikêt pehn yêt spî û gewir lê ne

bergûzê reşaxayî: şelwarê wî mor (binefşî an xemir) e, yekreng e, şepikê bergûz badayî ye. Ji hemiyan bi qîmettir in

bergûzê piştpez: gewreke tarî û êkreng e (qehweyiya tarî)

bergûzê xezalî: gewreke vebûyî û êkreng e, wekî rengê xezalan (qehweyiya vekirî)

bergûzê keskoyî: textê wan kesk e û xîçên şîn lê ne; an textê wan şîn e û xîçên kesk lê ne

bergûzê kesnedîtî: textê wan mor e; moreke tarî ye, êkreng e. Li Hekariya kesnedîtî: textê wan kesk e, xîçêt wan binefşî, şîn, sor û zer in

kerranî: textê wan spî ye, xîçêt gewir lê ne xîçêt şîn di nav de ne

şernexî: neqşandî bi gelekreng in, spî û xêzêt reş di nav de ne

semayî: şînê vekirî ye

texte binefşî: êkreng û mor (binefşî) ye

sorcûn: hemî reng têne têkel kirin

qer: hemî ji hiriya reş e



Badayî



Piştpez




Kerranî



Xezalî



Semayî



Texte Binefşî

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
© INSTITUT KURDE DE PARIS
106, rue La Fayette, 75010 Paris - France
www.institutkurde.org
Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN**
Réalisation : **S. ILITCH & M. HASSAN**

LI ME BIBORIN !

Mixabin di hejmara 24an ya ***Kurmancî*** de çend şaşî çêbûne. Em pêdivî dibînin, ku wan çewtî û şaşiyan li jêrê bidin xuya kirin û rast kirin; Di gel vê serrastkirinê, bi dilekî xemgîn, ji hevalên xwe yên kar û herweha ji xwendevanên ***Kurmancî*** doza lêborînê dikin. Hêvîdar in, ku ew van kêmasiyên me bidin bin piyan.

Ev in ew şaşî:

1. Di navên beşdarên civînê de 2 nav, navên kek Veysî Zeydanli û kek Memo Yetkin, li lîsteyê hatine zêde kirin. Lê navê kek Xosro Abdullahî hatiye ji bîr kirin.
2. Di xebata ***Termên matematîkê*** de amadekar 2 kes bûn. Ji wan navê kek Behroz Şucaî nehatiye nivîsîn. Herweha navê kek Behroz di ***Termên komputerê*** de ji şaş hatiye nivîsin.
3. ***Çend peyvên kêmnas ji milê Hekariya*** ne ji aliyê kek Michael Chyet, lê ji aliyê kek Rojan Hazim ve hatibû amade kirin. Herwisan navê kek Rojan hem di lîsteya beşdaran de û hem jî wek amadekarê ***Termên rêzdariyê*** bi şaşî wek Rojen hatiye nivîsîn.

Kurmancî

hejmar 26 Payîz 1999

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Parîsê

Civîna 26emîn ya ***Kurmancî*** di navbera rojên 25-30/10 1999an de li Marly-le-Roi, nêzîkî Parîsê çêbû.

Beşdarên civînê li ser îdyomên kurdî, bergûz an şel û şepik li Bahdînan, devoka Qerejdaxê, xwarinên Serhedê, cureyên endamên laşê mirovan û îdyomên jê çêkirî, termên komputerê û li ser peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de xebitîn.

Di vê civînê de Husên Bênavî (Berwarîbala), Joyce Blau (Parîs), Michael Chayet (Waşington), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Selam Nûman (Qamişlo), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Şucaî (Kotol) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên cîvînê di vê hejmara ***Kurmancî*** de tên belav kirin.

Peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de

I. DI ZIMANÊ TIRKÎ DE

Amadekar : Reşo ZÎLAN
Behroz ŞUCAÎ

Zimanê kurdî, di nav zimanên hindoewropî de, ji koma zimanên îranî ye. Mebest ji zimanên îranî, binavkirina hemû zimanên xwîşk û bira yên ku di nav vê komê de ne. Ev kom ji van zimanên ku îro têne axaftin, wek: farsî, kurdî, belûçî, derî, tacikî, osetî, tatî, talişî, peştûyî û hwd pêk têt. Gava ku mirov dibêje zimanê îranî, ev nayê wê maneyê ku mebest farsî ye. Li bervajiyê vê, hemû ew ziman in, ku îro tên peyvîn yan jî berê dihatin axaftin lê niha mirî ne. Ango navê wê komê jê têtе qest kirin.

Di zimanê kurdî de peyv hene, ku bi tenê kurdî ne. Ango di nav gelên îranîziman de ew peyv bi tenê li ba kurdan hene. Wek peyvên ***kur, keç, zarok*** (=*zar, zaro, mindal*), ***reş, rondik*** (=*hêsir, stêr, histêrk, firmêsk*). Lê hin peyv jî hene, ku tevî ku di zimanê kurdî de hene, di hemû zimanên din yên îranî de jî hene, ku yan her bi `eynî rengî yan jî hinek caran piçekî cihê û bi aksaneke din têne bi lêv kirin. Wek ***dest, yek, bazar, gul, dûrbîn/ dûrebîn***.

Ji peyvên weha hevpişk re peyvên "*îranî*" têne gotin. Ji ber ku ew malên hemû gelên îranîziman in. Lê gava ku ji van gotinên îranî peyveke din li gor peyvsaziya kurdî hatibe afirandin, êdî ew peyveke kurdî ye. Wek dest gotineke îranî ye, lê heçî peyva destegul e, dibe kurdî. Ji ber ku di zimanên din yên îranî de peyveke bi vî rengî ku bi tenê peyveke hevedudanî be û di vê maneyê de bête bi kar anîn tune ye. Lê ew di şûna peyveke hevedudanî de, peyveke nehevedudanî ya bi îzafeyê çêkirî bi kar tînin. Herweha ev çend peyvên din in, ku li gor peyvsaziya kurdî ne :

serbîjêr (bi tenê peyva ***ser*** bi îranî)
bejinûbala (bi tenê peyva ***bala*** bi îranî)
dilketî (bi tenê peyva ***dil*** bi îranî)
nankor (bi tenê peyva ***nan*** bi îranî)
berşîr (bi tenê peyva ***şîr*** bi îranî)

Peyv jî hene ku ji zimanekî din yên îranî hatine û ketine kurdî, bêî ku bilêvkirina wan bête guhartin yan jî bi guhartineke piçûk, îro jî têne bi kar anîn. Wek: ***Nimayiş***, ku navdêreke lêkerî ye û ji lêkera ***nimûden*** ya farsî têt. Di kurdî de berginda vê lêkerê ***nimandin*** e û her bi maneya ***nîşandan*** û ***pêşkirinê*** de ye. Lê heçî peyva ***nimayiş*** *e*, di çend maneyan de têtе bi kar anîn. *1.* ***Xwepênîşandan***, ***nûtîng*** *2.* ***Di kurdiya soranî de her bi maneya pê**şraxistin, pênîşandan, n**îşandanê***. Herweha ***newzad***, ku ji peyvên ***now (new)*** û ***zad*** pêk hatiye. ***New/now*** ya farsî, bi kurdî ***nû*** û ***-zad*** ya farsî, bi kurdî ***–za***, ango ***nûza***. Lê eger em ji dêl ***newzad*** ya farsî bi kurdî peyva *nûza* bi kar bînin, dê maneyeke din jê derkeve. Kurd *nûza* ji bo zarokên ku nû ji diya xwe bûne û çend rojî ne, dibêjin. Lê peyva ***Newzad*** di kurdî de ji bo navê kuran têtе bi kar anîn û ne di vê maneya me gotî de. Heçî di farsî de ye, ev peyv ne wek nav lê belê bi tenê di maneya *nûza* de têtе bi kar anîn. Herweha wek peyvên din. ***Namzed, name, nimûne, newroz / newrûz (nûroj)*** û hwd.

Vêca gava ku em dibêjin filan bêje îranî ye yan jî kurdî ye, mebest jê ew e, ku me li jorê şerh û ronahî kiriye.

pate (inf), pate avêtin, pate dan	saygıyla, selam için eğilmek, selamlamak, eğilerek selamlamak	salut, révérence, saluer, se pencher respectueusement pour saluer, faire une révérence	to bow, to show reverence
neheqî	haksızlık	injustice	injustice
parî (n)	parça	morceau	piece
parîyek nan	bir parça ekmek	un morceau de pain	piece of bread
vêga; vê gavê	şimdi, şu an	maintenant	now
tevde	birlikte, beraber, topluca, hepsi	ensemble, tout	together
sûr; sûrh, şûrh	kale duvarı	rempart, muraille	rampart, wall
stil: stêl, tewle; tewlexane, tewle, stewl	tavla	étable	stable
pişţevala; pişţvala	giyinip kuşanmamış, silahsız	(personne) non équipée, sans armes	an unarmed persone
şilf:	bıçak, hançer, kılıç, mızrak gibi aletlerin demir kısmı	manche (métallique) de couteau, poignard, epée etc.	handle
henek; yarî	şaka, alay	blague, plaisanterie, moquerie	a joke, a jibe
laqirdî	şaka, lakırdı	blague, plaisanterie	a joke
stûkur	boyun yaka	encolure	neck, collar size
xan	han	auberge, caravansérail	inn
meyizandin : nêrîn, mêze kirin, nihêrîn, fekirin, se kirin, berê xwe dan, temaşa kirin	bakmak, seyretmek	regarder, observer	to look at, to observe
xatûn	hatun	dame	lady
file	hiristiyan	chrétien	christian
dêmgul	yanağı güllü, gül yanaklı	qui a des joues roses	rosy cheeked
tûzî	dilim	tranche, rondelle	slice
kehreban : karîban, kehrîbar	kehribar	1) ambre, ambre jaune ; 2) électricité	1) amber, yellow amber ; 2) electricity
şirrik (n)	1) pul ; 2) oluk, çörten	1) paillette ; 2) gouttière, chéneau	1) sequin; 2) gutter
şirrika avê	su oluğu	chéneau	channel
gulîbend: qeytanê guliyan	saç kordelesi	ruban servant à nouer les tresses	hair ribbon
zerbab: zêrbav	zerbaf	brocard	brocade, cloth of gold
heke: eger, ger	eğer	si	if
kêmayî	kusur, eksiklik	défaut, faute, manquement	error, defect
sik	çirkin, uygunsuz	laid, sordide	ugly, dirty
bertîlxur	rüşvet alan, rüşvetçi	corrompu	corrupt
bertîl dan	rüşvet vermek	corrompre, donner un pot de vin	to bribe
bêziman	zavallı, suskun	pauvre, privé de parole	poor, silenced
qewimîn	olmak, meydana gelmek	se produire, arriver	to happen
edilandin	1) süslemek ; 2) düzeltmek, onarmak	1) parer ; 2) arranger, refaire, réparer	1) to decorate, to dress; 2) to repair
bezîn, beziyan	koşmak	courir	to run
asêbûyî	asi, isyankar, başkaldırmış	rebelle, insurgé	rebel, insurgent
li ber hukûmetê asêbûyî	hükümete baş kaldırmış	rebelle au gouvernement	rebel against the government
bastêq	pestil	friandise faite de jus de raisin ou de mûre bouillis, épaissis à la farine appréciée en fines plaques	fruit pulp dried in thin layers on cloth
mewîj	kuru üzüm	raisin sec	raisin
nazdar	nazlı	coquette, maniérée	coquettish, affected
dehl	koru, koruluk	bois, bosquet	a wood, a grove
xavik, xavek	böğür	flanc	flank, side
xavika serî	bıngıldak	fontanelle	fontanelle

Fûtbol

Amadekar : Mistafa AYDOĞAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
fûtbol: topanê, gogeling	futbol	football	football, soccer
meydana lîstikê	oyun alanı	terrain de jeu	field of play, pitch, playing field
meydana fûtbolê	futbol sahası	terrain de football	football field
pîvanên meydana lîstikê	oyun alanı ölçüleri	mesures de terrain de jeu	measurements of playing field
dirêjîya meydana lîstikê	oyun alanı uzunluğu	longueur de terrain de jeu	playing field length
berê (berahîya) meydana lîstikê	oyun alanı genişliği	largeur de terrain de jeu	playing field width
gol	1) gol; 2) kale	1) but ; 2) cage	goal
golavêj, golker	golcü	tireur de but	kicker
xêza golê	kale çizgisi	ligne de but	goal line
stûn	yan direk	montant, poteau	upright post
kêran	üst direk	barre transversale	crossbar
devera golê	kale sahası	surface de but	goal area
deqa penaltiyê	penaltı noktası	point du coup de pied de réparation (point de penalty)	penalty mark
devera penaltiyê	penaltı sahası	surface de penalty, surface de réparation	penalty area
kevana penaltiyê	ceza yayı	arc de cercle du point de réparation	penalty arc
deqa nîvekê	başlangıç noktası/orta nokta	point central	centre mark, centre spot
çembera nîvekê	orta yuvarlak	cercle central, rond central	centre circle
xêza nîvekê	yarı saha çizgisi/orta saha çizgisi	ligne médiane	halfway line
nîvmeydan	yarı saha	moitié de terrain	halfway field, half of the field

xêzkenar	taç çizgisi	ligne de touche	touch line, sideline
goşe, korner	korner	coin, corner	corner
devera kornerê	korner alanı	coin de corner	corner arc
darê alaya goşeyê	köşe bayrağı direği	poteau de drapeau de coin, de corner	corner flagpost
alaya goşeyê	köşe bayrağı	drapeau de coin, drapeau de corner	corner flag
top, gog	top	ballon	ball
dadwer	hakem	arbitre	referee
dadwerê alîkar	yardımcı hakem	arbitre assistant	assistant referee
dadwerê çarem	dördüncü hakem	quatrième arbitre, arbitre remplaçant, quatrième officiel	fourth official
devera teknîkî	teknik alan	surface technique	technical area
serwêrê teknîkî	teknik direktör	directeur technique	technical manager
antrenor	antrenör	entraîneur	coach
lîstik, yarî	oyun	jeu	play
sîstema lîstikê	oyun sistemi	système de jeu	playing system, playing formation
dema lîstinê	oyun süresi	temps de jeu, durée de match	game duration
dirêjkirin	uzatma (ekstra zaman)	prolongation	extra time
dema lêzêdekirî	uzatma (kayıp zaman için)	temps additionnel	additional time, added time
destpêka lîstikê	oyunun başlaması	engagement, coup d'envoi	kick-off
lîstikvan, yarîker	oyuncu	joueur	player
fûtbollîz	futbol oyuncusu	footballeur, joueur de football	football player, soccer player
guhertina lîstikvanan	oyuncu değişikliği	changement de joueurs, remplacement	players' replacement, substitution
lîstikvanên cîgir	yedek oyuncular	joueurs remplaçants	players' substitutes
fûtbollîzê cîgir	yedek futbolcu	footballeur remplaçant, suppléant	football players' substitute

Paşgirên kurdî

-II-

Amadekar : Reşo ZÎLAN

-end / -yend : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji qurmên lêkeran navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: nav**end**, rev**end**, za**yend**, gov**end**

-ende / -inde : Bi vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji rengdêr û qurmên lêkeran navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: şerm**ende**, berf**ende**, gerîn**ende**, bal**inde**, fir**inde**, gaz**inde**, ay**inde**

-emenî : Navên koma tiştên ku ji bo mebestekê têne bi kar anîn nîşan dide.

Nimûne: sot**emenî**, xward**emenî**, teq**emenî**, sard**emenî**

-er / -yer : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji qurmên lêkeran navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: koç**er**, rax**er**, bû**yer**, parêz**er**, nivîs**er**, têkoş**er**, bîn**er**, firoş**er**

-eve : Paşgireke lêkerî ye û timî bi dawîya lêkerê ve tête girê dan û maneya "dîsan, careke din" dide lêkerê.

Nimûne: geran**eve**, ketin**eve**, çûn**eve**, dîtin**eve**, kirin**eve**

-ê : Ji bo forma bangkirina navdêrên bi zayenda mê ya yekhejmar e.

Nimûne: keç**ê**!, day**ê**!, et**ê**!, bûk**ê**!, gêj**ê**!, dîn**ê**!

-êr : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji qurmên lêkeran rengdêr yan navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: qul**êr**, dil**êr**, pan**êr**, werz**êr**

-ezar "bnr **" -zar** : Paşgira **–zar** bi maneya cih e, cihê lê çandina tiştekî ye. Tîpa "e"yê ji bo pevgirêdanê ye. Bi alîkarîya wê rengdêr yan jî navdêr tên çêkirin.

Nimûne: şerm**ezar**, teng**ezar**

-ewar : Bi vê paşgirê ji navdêrekê rengdêrek têtе afirandin û maneya "wekî, mîna, fena, şibhê" dide peyvê.

Nimûne: bend**ewar**, bext**ewar**

-ewarî / -warî : Bi alîkarîya vê paşgirê ji navdêr yan jî ji rengdêrekê navdêreke nû ya abstrakt têtе çêkirin .

Nimûne: kurd**ewarî**

-ewer : Bi vê paşgirê ji navdêrekê rengdêrek yan jî navdêreke nû têtе afirandin.

Nimûne: bîr**ewer**, bext**ewer**, can**ewer** /cinawir

-firoş : Ev paşgira ji lêkera "firotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê firotinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: gul**firoş**, zembîl**firoş**, xwe**firoş**, bela**firoş**, pirtî**firoş**

-gar : Ev paşgir maneya "kesê ku dike, kesê ku karekî tîne cih" dide peyvê.

Nimûne: pî**gar**, amoj**gar**, roj**gar** (ev paşgira di vê peyvê de bi wext re mane guhartîye).

Peyva rojgar di maneya "serdem, zeman, dewran, dewr"ê de ye.

-geh : Ev paşgir maneya "cih, dever, şûn, war" dide.

Nimûne: seyran**geh**, havîn**geh**, şar**geh**, bin**geh**, tav**geh**, çêre**geh**, ber**geh**, kêlan**geh**,

war**geh**, zanîn**geh**, çiv**geh**, hêwir**geh**

-gelan : Ev paşgir maneya "kom, piranî û pirhejmarî"yê dide peyvê.

Nimûne: xezûr**gelan**, xinamî**gelan**, moz**gelan**

-ger (I): Paşgira ji lêkera "gerîn / geriyan"ê ye û maneya kesê / tiştê ku bi karê gerînê radibe dide peyvê.

Nimûne: şev**ger**, ba**ger**, ban**ger**, şop**ger** / rêç**ger**, pey**ger**, temaşe**ger**, dad**ger**

-ger (II): Ev paşgira maneya "kesê ku bi wî karî radibe" dide peyvê û navê pêşeyekê nîşan dide.

Nimûne: hesin**ger**, zêrîn**ger** / zêr**ger**, kîmya**ger**

-gêr : Paşgira ji lêkera "gêrîn (gêran / gêrandin)"ê ye û maneya "kesê ku karê binavkirî digêrîne, dike" dide peyvê.

Nimûne: şoreş**gêr**, wergêr, mey**gêr**, govend**gêr**, çilin**gêr**, pîlan**gêr**, kar**gêr**, civat**gêr**, dolab**gêr**

-gez : Paşgira ji lêkera "gestin, gezîn, gez kirin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê gestinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: pel**gez**

-gihan : Paşgira ji lêkera "gihandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê gihandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: nûçe**gihan**

-gir : Paşgira ji lêkera "girtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê girtinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: masî**gir**, saw**gir**, alî**gir**, xû**gir**, ho**gir**, dil**gir**, mîrat**gir**, rexne**gir**, rê**gir**, pişt**gir**, mal**gir**

-gîr : Paşgira ji lêkera "girtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê girtinê radibe" dide peyvê. Li ser forma xwe ya kevn maye.

Nimûne: av**gîr**, pêş**gîr**, ber**gîr** (bar**gîr**, bergîl), kef**gîr**

-gîn : Ev paşgir maneya "tijî, tijî bi ... "ê dide peyvê.

Nimûne: lez**gîn**, xem**gîn**, miz**gîn**, xwaz**gîn**, şerm**gîn**, saw**gîn** / sehim**gîn,**

-go : Paşgira ji lêkera ”gotin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê gotinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: rast**go**, bilind**go**, xweş**go**

-gon / -gûn / -gwîn : Maneya ”reng” e.

Nimûne: av**gon** / ar**gûn**, ar**gon** / ar**gûn**, al**gon**, genim**gon** / Genim**gûn**, gul**gon**

-guhêz : Paşgira ji lêkera ”guhastin (neqil kirin)”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê guhaztinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: xeber**guhêz**, war**guhêz**, bar**guhêz**

-hêl : Paşgira ji lêkera ”hêlan (hilanîn, hiştin, terikandin, terkkirin)”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê hiştinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: cî**hêl**, war**hêl**, meydan**hêl**, jin**hêl**, mêr**hêl**, êl**hêl**, gund**hêl**, pez**hêl**, dê**hêl**, bav**hêl**, kur**hêl**, keç**hêl**

-hilgir : Paşgira ji lêkera ”hilgirtin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê hilgirtin û rakirinê radibe” dide peyvê.

Nimûne:bar**hilgir**

-hingêv : Paşgira ji lêkera ”hingaftin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê hingaftinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: şûr**hingêv**, rim**hingêv**, tîr**hingêv**, derb**hingêv**, dar**hingêv**

-hî /-yî : bnr > **-ahî**

-ik (I) : Pirtika ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnîşandanê ye.

Nimûne: keç**ik**, qîz**ik**, law**ik**, kur**ik**, pîr**ik**, jin**ik**, mêr**ik**, pit**ik**, bav**ik**, kal**ik**, reş**ik**, zer**ik**, sor**ik**, gewr**ik**, rind**ik**, xweş**ik**, cewr**ik**, qird**ik**, berx**ik**, kar**ik** /kehrik,

-ik (II) : Pirtika ji bo navên tişt, hacet û alavan e.

Nimûne: dev**ik**, dest**ik**, lep**ik**, berçav**ik**, ker**ik**, pif**ik**, pir**ik**, bêr**ik**, ber**ik**, pal**ik**, çoç**ik**, hest**ik**, gir**ik**, boç**ik**, elb**ik**, kinc**ik**, kox**ik**, sîr**ik**, qirş**ik**, ref**ik**, piz**ik**, rêç**ik**, şim**ik**, zend**ik**

-ik (III): Pirtika ji bo navên hin xwarinan e.

Nimûne: av**ik** / afik, tirş**ik**, dolm**ik**, lor**ik**, çolik, xilor**ik**, kilor**ik**, nan**ik**, pel**ik**

-ik (IV): Pirtika ji bo navên hin nexweşîyan e.

Nimûne: zer**ik**, sor**ik**, xur**ik**, kux**ik**, xeneqût**ik**, bûk**ik**, efn**ik**, kuf**ik**, kam**ik**

-ikî : Navdêrê abstrakt ya nexweşîyan e yan jî tişt û mirovê bi wê nexweşîyê ketîye.

Nimûne: zer**ikî**, efn**ikî**, vir**ikî**, kuf**ikî**, kam**ikî**, kas**ikî**

-il : Navê cihekî nîşan dide.

Nimûne: paş**il**, pêş**il**, zeng**il**, xwaz**il** (xwazî), paxil

-inc : sar**inc**, gaz**inc**

-incî : nav**incî**

-ing / -ng / -wing : Pirtika ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnîşandanê ye.

Nimûne: roj**ing**, ar**ing**, sor**ing**, xwey**ing**, poşî**ng**, rê**wing** / rêwingî, bira**ng**, çîya**ng**

-king : Pirtikeke cotpiçûkkirinê ye, tiştan du caran li ser hev piçûk dike. Ev pirtik jî her ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnîşandanê ye.

Nimûne: bira**king**, xwey**king**, day**king**

-ino / -no / -nino : Ji bo forma bangkirina zayenda hem mê û hem jî nêr ya piranîyê ye.

Nimûne: xortino! (xortno), keçino! (keçno), kurino! (kurno), gundîno! (gundînino)

-istan / -stan (I) : Bi maneya cih, dever û şûn e.

Nimûne: gor**istan**, gul**istan**, bo**stan** (bustan, bîstan), mûr**istan,** dar**istan**, çol**istan**, qûm**istan**, şar**istan** / şehr**istan**

-istan (II) : Bi maneya welat e.

Nimûne: Kurd**istan**, Afxan**istan**, Bulxar**istan**, Gurc**istan**

-istan (III) : Bi maneya dem û zeman e.

Nimûne: germ**istan** (havîn), ziv**istan**,

-işk / -îşk/ -oşk : germ**işk**, hevr**îşk**, kur**îşk**, nerm**oşk**

-î/-yî (I): Ev paşgira mensûbbûn û girêdana bi kom, eşîr, gel, netewe, ziman, zarava, devok, dîn yan jî mezhebekî nîşan dide.

Nimûne: samî, arî (aryanî), ertoşî, botî, milî, kurdî, erebî, almanî, kurmancî, lurî, alewî, êzîdî, beha**yî**, îslamî, henifî, şafi’î, caferî, isma’îlî, evangalî, lûterî

-î/-yî (II): Mensûbbûn û girêdana bi cih, dever, herêm, gund, bajar û welatekî nîşan dide.

Nimûne: deştî, çîya**yî**, gundî, bajarî, zozanî, serhedî, behdînî, diyarbekrî, wanî, mêrdînî, kurdistanî, îraqî, afrîka**yî**, asya**yî**. deverî

-î/-yî (III): Ji rengdêrekê navdêreke abstrakt (mucered) çêdike.

Nimûne: sorî, zerî, bozî, qencî, sarî, germî, çê**yî**, sistî. qelewî, reşî

-î/-yî (IV): Ji rengdêr yan jî ji navdêrekê navdêreke abstrakt çêdike.

Nimûne: camêrî, azadî, serbestî, tolazî, serxweşî, rastî, dostî, nezanî, paqijî

-î/-yî (V): Ji navê kar û pêşeyekê navdêreke abstrakt çêdike û mijûlahîyekê nîşan dide.

Nimûne: karkerî, zîvkerî, cotkarî, gulfiroşî, bikirrî, dengbêjî

-î/-yî (VI): Ji navdêrekê ku dem nîşan dide navdêreke nû ji bo peryodeke taybetî çêdike.

Nimûne: rojî, sêmehî, nîvsalî, hefte**yî**, havînî, payîzî, zivistanî.

-î (VII): Ji navdêran rengdêr çêdike.

Nimûne: avî, bejî, xwînî, bengî

-î (VIII): Ji rengdêran navdêrên konkret çêdike.

Nimûne: şilî, gêrmî, germî

-î (IX): Ji navdêran navdêrên nû yên di maneya alav û tiştekî ne çêdike.

Nimûne: baranî, destî, derî, pîştî, gulî

-î (X): Ji hokeran navdêr çêdike.

Nimûne: binî, serî, nîvî

-î/-yî (XI): Ji çi yan jî ji çi madenê çêbûna tiştekî nîşan dide.

Nimûne: hesinî, sifirî, pola**yî**, zîvî

-îfk : balî**fk**, gulî**fk**

-îk : xurî**k**, qidî**k**, xidxidî**k**

-în (I) : Ji çi yan jî ji çi madenê çêbûna tiştekî nîşan dide.

Nimûne: zêr**în**, zîv**în**, dar**în**, derew**în**, rast**în**

-în (II) : Ji navdêran rengdêr çêdike.

Nimûne: reng**în**, zeng**în**, belg**în**, ah**în**, gurg**în**, beng**în**, deng**în**, şerm**în**, nal**în**, dil**în**

-în (III) : Ji navdêran navdêreke nû çêdike.

Nimûne: berf**în**, tirş**în**, roj**în**

-în (IV) : Ev paşgir ji hokerekê hokereke nû çêdike.

Nimûne: pêş**în**, paş**în**, dawîn, jêrîn, jorîn, navîn,

-îne : Ji navdêran navdêreke nû çêdike.

Nimûne: çar**îne**, yek**îne**, pêş**îne**

-înî (I) : Ji çi yan jî ji çi madenê çêbûna tiştekî nîşan dide.

Nimûne: dar**înî**, zîv**înî**, zêr**înî**

-înî /-yînî : Ev paşgir ji navdêrekê navdêrên nû yên abstrakt çêdike.

Nimûne: kurd**înî**, pîr**înî**, dê**yînî**, bav**înî**, heval**înî**, dost**înî**, beng**înî**, mêr**înî**, kur**înî**, keç**înî**, bûk**înî**, law**înî**

-înok : Ev paşgir maneya ”kesê ku bi wî karî radibe, wî karî dike” dide peyva nû.

Nimûne: xap**înok**, çiv**înok**

-îş / -iş : Ev paşgir ji navdêran navdêreke nû çêdike û maneya ”karê ku tête kirin” dide peyva nû.

Nimûne: bexş**îş**, spar**iş**

-îtî /-yîtî : Ev paşgir ji navdêrekê navdêrên nû yên abstrakt çêdike.

Nimûne: ker**îtî**, bav**îtî**, gund**îtî**, mîr**îtî**, dê**yîtî**, se**yîtî**

-îtik : banger**îtik**

-îyan : Ji rengdêrekê navdêreke nû, ku di maneya cih û deverê de ye dide peyvê.

Nimûne: germ**îyan**

-jen (I): Ji lêkera ”jenîn, jendin”ê ya bi maneya lêdanê de ye. Wek paşgir maneya ”kesê yan jî tiştê ku karê lêdana wî tiştî dike” dide peyva nû.

Nimûne: kevan**jen**, av**jen**, ba**jen**, agir**jen**, liva**jen**, libû**jen**, keman**jen**

-jen (II): Ji lêkera ”jenîn”ê ya bi maneya ”dîwardanîn”ê de, wek paşgir ”kesê ku bi wî karî radibe” dide peyvê.

Nimûne: dîwar**jen**

-jimêr : Paşgira ji lêkera ”hejmartin”ê ye û maneya ”kesê / tiştê ku bi karê hejmartinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: demjimêr (alava ku demê dihejmêre, kronomêtre)

-k (I) : Pirtika ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnîşandanê ye.

Nimûne:qûtî**k**, pîr**k**, nêrî**k**, kanî**k**, çêlî**k**, kurî**k**, cênî**k**, cêwî**k**, sêwî**k**, kevçî**k**, co**k** /cihok,

-k (II) : Pirtika ji bo navên tişt, hacet û alavan e.

Nimûne:daralîn**k**, cerîf**k**, bermal**k**, binmil**k**

-ka : qestî**ka**, qazî**ka**, zû**ka**, xwezî**ka**, hêdî**ka**, dizî**ka**

-kanî / -(i)kantî : Bi alîkarîya vê paşgirê ji navdêrekê peyveke nû ku êdî hoker e, çêdibe û maneya “bi awayê... , bi tehrê...” dide peyvê.

Nimûne: keç**kanî** / keç**kantî** / keç**ikantî**, law**kanî** / law**kantî** / law**ikantî**, jin**kanî** / jin**kantî** / jin**ikantî**, mêr**kanî** / mêr**kantî** / mêr**ikantî-ke** : binke

-kî (I): Maneya ”wek, mîna, fena, şitî, şubhê” dide peyvê û wê dike hoker.

Nimûne: fileh**kî** (file**kî**), kurd**kî**, kurmanc**kî**, alman**kî**, ecem**kî**, ereb**kî**, mirtib**kî**, gundî**kî**, bajarî**kî**, axa**kî**, mêran**kî**, nivîs**kî**, dev**kî**, qeşmer**kî**, serser**kî**, qeşmer**kî**, hêk**kî**

-kî (II): Hokera dem û zemanan çêdike û maneya ”di dema (wexta)... de” dide peyvê.

Nimûne: nîvro**kî**, êvar**kî**, ‘esir**kî**

-kar : Ji gotina kar e û vê xeysetê dide maneya peyvê.

Nimûne: cot**kar**, xwende**kar**, koş**kar**, xebat**kar**, sexte**kar**, hîle**kar**, xizmet**kar**, gunehkar, minê**kar**, alî**kar** / arîkar, zîyan**kar**, rîya**kar**, nîve**kar**, sitem**kar**, zulm**kar**, derew**kar**

-karî : Ev paşgir ji navdêran navdêreke nû ya abstrakt diafirîne.

Nimûne: dest**karî**

-keft : Paşgira ji lêkera ”ketin / keftin”ê ye û maneya kesê / tiştê ku bi karê keftinê radibe dide peyvê. Lêkera “ketin”ê di devokên wek behdînî û hinekên botî de ne wek “ketin” lê wek awayê xwe yê kevn “keftin” tête gotin.

Nimûne: dest**keft**

-ker : Ev paşgir awayekî din ya paşgira “kar” e. Her bi maneya “kesê / tiştê ku bi wî karî radibe” dide peyva nû.

Nimûne: zîv**ker**, kar**ker**, zêr**ker**, xebat**ker**, hesin**ker**

-kil : Paşgira ji lêkera ”kilîn, (kilandin, kil kirin)”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê kilandinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: dew**kil**

-kir : Paşgira ji lêkera “kirin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê kilandinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: dest**kir**, mal**kir**, kar**kir**, şuxul**kir**

-kirr : Paşgira ji lêkera ”kirîn”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê kirînê radibe” dide peyvê.

Nimûne: bi**kirr**

-kêş (I): Paşgira ji lêkera ”kêşan / kişandin (kaş kirin)”a barekî ye û maneya “kesê ku bi wî kar û pêşeyî radibe” dide peyvê.

Nimûne: av**kêş**, bar**kêş**, kêlindî**kêş** (= tirpan**kêş**)

-kêş (II): Paşgira ji lêkera ”kêşan / kişandin”a tiştekî bi dûman e û maneya “kesê / tiştê ku bi karê kişandinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: afyon**kêş**, cigare**kêş**, qelûn**kêş**, tiryak**kêş**, hewa**kêş** / ba**kêş**, mîx**kêş**

-kêş (III): Paşgira ji lêkera ”kêşan / kişandin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku ji alîyê manewî ve xwe dide ber wî karî” dide peyvê.

Nimûne: cefa**kêş**, ser**kêş**, zîyan**kêş**, zehmet**kêş**, şûr**kêş**, dil**kêş**, bal**kêş**

-kêş (IV) : Paşgira ji lêkera ” kêşan / kişandin”ê ya ji bo wezinandinê ye û maneya “giranî”yê dide peyvê.

Nimûne: ta**kêş**

-koj : Paşgira ji lêkera ”kotin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê kotinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: hestî**koj**

-kuj : Paşgira ji lêkera ”kuştin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê kuştinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: mêr**kuj**, spî**kuj**, mêş**kuj**, agir**kuj**, dest**kuj**, bi**kuj**, xwe**kuj**, karwan**kuj**

-kut : Paşgira ji lêkera ”kutan / qutan”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê kutanê radibe” dide peyvê.

Nimûne: mîr**kut** /mê**kut** /mî**kut**, dan**kut**, sîr**kut**, ba**kut**, dar**kut**, ban**kut**

-ko : Ev paşgir carina ji bo xweşikkirinê û carina jî ji bo piçûkxistina kesan ya di dema rewşa gazîkirinê de tête bi kar anîn.

Nimûne: Hemed**ko**, Cemîl**ko**, Resûl**ko**, muxtar**ko**, malxirab**ko**, reben**ko**

-kok (I) : Ev paşgir ji bo piçûkxistin û sivikahîpêkirinê ye.

Nimûne: jin**kok**, mêr**kok**

-kok (II) : Ev paşgir ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînbûnê ye. Ji rengdêr yan jî navdêran rengdêrek tête çêkirin.

Nimûne: fedî**kok**, xweş**kok**, keç**kok**, reş**kok**

-kokî : Ji rengdêran rengdêreke nû tête çêkirin.

Nimûne: kevin**kokî**, pembe**kokî**, reş**kokî**, zer**kokî**, şîn**kokî**,

-kolî : Ji lêkera “kolîn, kolandin”ê ye û paşgira didwan “î” lê hatîye zêde kirin û maneya “kesê bi karê kolandinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: pê**kolî** (pî**kolî**)

-lok : Ev paşgira han heye ku ji lêkera “(dev) lê kirin”ê kurt bûbe.

Nimûne: dev**lok**

-mal : Paşgira ji lêkera ”malîn / maliştin”ê ye û maneya “kesê / tiştê ku bi karê malînê radibe” dide peyvê.

Nimûne: dest**mal**, pêşte**mal** / pêşmal

-man / **-iman**: Bi maneya ”cih” e. Di zimanê pehlewî de bi maneya ”xanî, sera” de bû.

Nimûne: nîşti**man**, xani**man**

-mend : Paşgirek e ku di maneya ”heyî, heye, xwedî” de ye. Tête dawîya navdêran.

Nimûne: dewle(t)**mend**, huner**mend**, bawer**mend**, aqil**mend** (eqilmend), şêwir**mend**, kar**mend**

-mêj / **-mij** : Paşgira ji lêkera ”mêtin, mêhtin / miştin”ê ye û maneya ”kesê / tiştê ku bi karê mêtinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: xwîn**mêj** (xwînmij), şîr**mêj** (şîrmij), mar**mêj** (marmij)

-nak : Paşgirek e ku maneya “bi, tijî, tijî bi, bi ... dagirtî” dide peyvê.

Nimûne: xem**nak**, xeter**nak**, derd**nak**, tirs**nak**

-nas (I) : Paşgira ji lêkera ”nasîn”ê ya bergindî “’ilm, zanist, zanîn”ê ye. Gava ku tête dawîya navdêran maneya “kesê ku bi wê zanistê mijûl dibe” dide peyvê.

Nimûne: ziman**nas**, stêr**nas**, dîrok**nas**, rojhilat**nas**, aborî**nas**

-nas (II) : Paşgira ji lêkera ”nasîn, (nas kirin)”ê ye û maneya “kesê ku bi karê naskirinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: xwedê**nas**, kêm**nas**, çav**nas**, rê**nas**

-nasî : Ev paşgira hevedudanî ye û ji paşgirên "-nas" û "-î"yê pêk hatîye. Wek di paşgira "-î"yê de jî hatîye behs kirin, bi alîkarîya vê navdêrên abstrakt têne çêkirin. Ji ber ku paşgira "**nasî"** xwedî taybetmendîya bi navkirina zanistan e, ango navê 'ilm û zanistekê bi me dide zanîn, çêtir e ku ev bi tena serê xwe li vir cih bigire. Bi vî awayî em bizanibin ku ev paşgir ji bo çêkirina navên zanistan e.

Nimûne: ziman**nasî**, stêr**nasî**, dîrok**nasî**, civat**nasî**, rojhilat**nasî**

-nêr : Paşgira ji lêkera "nihêrîn / nêrîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê nihêrînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: nexweş**nêr**, çav**nêr** (çavnihêr), zarok**nêr**

-nişîn : Paşgira ji lêkera "niştin, nişîn"ê ye û maneya "cihê ku ew kes lê rûniştîye" dide peyvê.

Nimûne: kurd**nişîn**, mîr**nişîn**, şah**nişîn**

-nivîs : Paşgira ji lêkera "nivîsîn / nivîsandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê nivîsînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: destnivîs, xweş**nivîs**, rast**nivîs**, çîrok**nivîs**, ser**nivîs**, reş**nivîs.**

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
Supplément du Bulletin de liaison et d'information
N° C.P. : 65913 A.S.

© INSTITUT KURDE DE PARIS
106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64
www.fikp.org
Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN,** *Réalisation :* **S. ILITCH & M. HASSAN**

hejmar 38 bihar 2006

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna bihara 2006an

Careke din delîveya kombûna civîna Kurmancî *li Dihokê, başûrê Kurdistanê, bi dest ket. Civîna me rojên di navbera 30/5 - 7/5 2006an de li dar ket.*

Di vê civînê de ev heval beşdar bûn:

Mustafa Aydogan (Mêrdîn), Rûken Bagdu-Keskîn (Stenbol), Lutfî Baksî (Xerzan), Ehmedê Dirihî (Çewlîg), Elîşêr (Wan), Samî Ergoşî (Barzan), Cewher F. Seîd (Hewlêr), Ebdulsetar Fettah (Dihok), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mahmûd Lewendî (Qerejdax), Enwer Mehemed Tahir (Hewlêr), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Selam Nûman (Qamşilo), Fadil Omer (Dihok), Cemal Onursal (Cizîr), Enwer Osman (Hewlêr), Edîb Polat (Amed), Zinar Soran (Dêrik), Behrûz Şucaî (Kotol), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agrî).

Ev cara didwan bû, ku me civîna xwe li parçe welatê xwe yê azad pêk anî. Bi dirêjahîya hefteyekê temam me li ser programeke giran kar kir. Xala herî girîng ya xebatê babeta navên gulûgîyayan yên hem zanistî û hem jî kurdî bû. Di vî warî de, bi sayeya kedeke yekcar mezin ya hevalên pispor ji başûr û bakurê Kurdistanê, me dikaribû em berhemeke berbiçav ji civînê derbixin.

Xalên din yên civînê, ji navên demûdezgehên dewletê û peyvên rojnamevanîyê pêk dihat. Piştî hîmdanîna dewleta federal li başûrê welat, çawan ku wê guhartineke nû di dîroka me kurdan de pêşde anî, wisan jî wê tesîra xwe li ser zimanê me kir. Hindek mefhûmên nû anîn û hindek delîveyên din dane ber pêşdeçûna zimanê kurdî.

Navên dezgehên dewletê û peyvên rojnamevanîyê du babetên girîng bûn ku divîya kar li ser bête kirin. Ev yek ji bo nêzîkkirina devoka kurmancîya bakur û behdînî jî xwedî girîngîyeke mezin bû.

Cihê serfirazîyê bû, ku ev civîna me rastî rojên yekbûn û hevgirtina herdu îdareyên Kurdistanê hatibû. Vê hikûmeta yekbûyî hêvî, hez û şewqeke bêhevta dixist dilê me hemûyan.

Bi dirêjahîya herdu hefteyên me li Kurdistanê, em bûn mêvanê hikûmetê. Vê hikûmeta yekbûyî em bi comerdîyeke kurdewarî hêwirandin û bi hêzên xwe yên ewlehîyê em hildan bin baskên xwe yên parastinê. Ji hîç xizmetekê dirixî nekir.

Em bi dilekî germ wê pîroz dikin û jê re xweşbextî û serkeftinê dixwazin. Herweha ji dil û can spasî vê mêvandarî û xizmetên pêşkêşkirî dikin.

Encamên xebata vê civînê di vê hejmara Kurmancî de tên belav kirin.

Flora Kurdistanê

Amadekar : Edîb POLAT

kurde	latînî	tirkî	fransizî	îngilîzî
adarok, gulalesûre, kurikmast	*Anemone coranaria*	taçlı kırlalesi, rüzgar çiçeği, gül lale	anémone couronnée, anémone de Caen	crown anemone
alal, hilale, mêlaq, lale, helal	*Tulipa*	lale	tulipe	tulip
baqilê gamêşan, şolgenîk, kuşne, baqilfisek	*Vicia sativa*	arpa fiği, buğday fiği, ekin fiği, (burçağın bir türü)	vesce commune	common vetch
baqilê xatûnî, kelîkê xatûnî, baqilxatûn	*Sativum saccharatum*	baklagillerden nazlı gelin	pois mangetout	sugar snap peas
baxox, angelok, kanêje	*Centaurea kurdica*	peygamber çiçeği	centaurée kurde	kurdish centaurea
behîva bejî, badema çiya, çaqale	*Prunus carduchorum*	yabani badem	variété d'amandier sauvage	species of wild almond-tree
bendika avî, vîzdorik (zaza)	*Cardamine hirsuta*	tüylü köpük otu	cardamine hérissée	hairy bittercress
bêwîjan, pûjang, gulikê maran	*Achillea millefolium*	adi civanperçemi	millefeuille, achillée	yarrow
beybûn, beybûna demanan, babûnc	*Matricaria chamomilla*	papatya	camomille	camomile
beybûna beyaran	*Matricaria sp.*	çayır papatyası	camomille des champs	corn camomile
binevş, binefş, wenewşe (zaza), gularengag	*Viola odorata*	kokulu menekşe	violette	violet
binevşa belek	*Viola tricolor*	alaca menekşe	pensée sauvage	wild pansy
birinc, riz	*Oryza sativa*	pirinç	riz décortiqué	rice
biyok, bih, bihok, bihî, bî	*Cydonia oblonga*	ayva	coing	quince
botav, batovk, nûjdar, bahtof, sûrinc	*Hypericum triquetrifolium*	kızılcık otu, kantaran	millepertuis	curled -leaf St John's wort
bûkik, bûkanî, bûk, bwîk, nîsanok, patpatok, patpatole, bûkûzava, gulenîsan, rêywek	*Papaver rhoea*	gelincik	coquelicot	common poppy
çarçar, şebraq	*Xanthium spinosum*	dikenli sıraca otu	lampourde épineuse	spiny cocklebur
çekem, dakone (zaza)	*Viscum album*	ökse otu	gui	mistletoe
çengê meryemê, sîklamen	*Cyclamen purpurescens*	siklamen, tavşan kulağı	cyclamen commun, cyclamen rouge-pourpre, marron de cochon	cyclamen
çevk, çexşûr (cûreyek heliz e)	*Ferula communis*	çakşır otu	férule commune	giant fennel
çîlek, tûya erdan, tûfrengî	*Fragaria vesca*	çilek	fraise	strawberry
çîm, giyareş	*Lolium temulentum*	delice	ivraie enivrante, herbe à couteaux	darnel ryegrass
colbenî, şolikê maran, baqilê maran, kelîmar	*Lathyrus tuberosus*	koşkoz	gesse tubéreuse, gland de terre	tuberous pea, sweet pea
çûng, pêmirîşk	*Ranunculus*	düğün çiçeği	renoncule	crowfoot
cux, bencerek (zaza)	*Digitaria*	çatal otu (dijitarya)	digitaire	common crabgrass, large crabgrass
darçîn	*Cinnanomum zeylanicum*	tarçın	cannelier de Ceylan, arbre à cannelle	cinnamon tree
dargerînk, daralînk, badar	*Hedera helix*	duvar sarmaşığı	lierre	ivy
darucan, şêrpûg	*Echinochloa crusgalli*	darıca otu	panic des marais, pied-de-coq	barnyard grass
dinêv, dimor	*Lolium temulentum*	delice	ivraie enivrante, herbe à couteaux	darnel ryegrass, tare
dirî, dirîmok, dirîreşk, dendûreşk, tûtirk	*Rubus*	böğürtlen	mûre sauvage	blackberry
dûvikê hespê, sipingê maran, singê maran, şitlê xezalan, tilîper, rûnîn (zaza), vaşbitrî (zaza)	*Equisetum arvense*	at kuyruğu	prêle des champs, queue-de-renard	horsetail, cattail, joint brass, bottle brush, shavegrass, horse pipe
dûvrovî	*Setaria faberii*	kirpi darı	sétaire géante, sétaire de faber	faber bristlegrass, giant foxtail, nodding foxtail

erpelan, pîrepind	*Scorzonera spp*	bir tür dağ çöveni	scorsonère	black salsifis
fasûlî, fasûlye, fasolî, fasla (zaza)	*Phaseolus vulgaris*	fasulye	haricot	bean
firêz (li hin deveran)	*Agropyron repens*	ayrık otu	chiendent	quackgrass
firêz, herêz, sînrek (zaza)	*Cynodon dactylon*	domuz ayrığı	chiendent, pied-de-poule, herbe des Bermudes	Bermuda grass
gêleqir	*Bellevalia*	dağ sümbülü	variété de jacinthe	species of hyacinth
gêlik	*Scilla kurdistanica*	yıldız sümbülü	variété de scille	species of scilla
genek, dargenek, pilxin (zaza)	*Datura stramonium*	şeytan elanası, boru çiçeği	datura, stramoine, pomme épineuse	datura, thorn apple, stramonium
genim	*Triticum*	buğday	blé	wheat, corn
genimê nan, genimê ardî (cureyên : genimê rûtik, genimê meksîkî)	*Triticum aestivum*	ekmeklik buğday	blé tendre, froment	wheat
genimê savar, genimê req (cureyên : genimê sorgul, genimê girover)	*Triticum durum*	sert buğday	blé dur	hard wheat, durum wheat
gêregiya, giyabawer, kokvaş	*Hordeum bulbosum (poaceae)*	duvar arpası, yabani arpa, yumrulu arpa	orge noueuse	bulbous barley
gezgezik, gezgezok, gezgezk, derzînk (zaza), geznik, gezgezing	*Urtica*	ısırgan otu	ortie	stinging nettle
gijok, rîxok	*Rhamnus kurdicus*	ak diken	nerprun, bourdaine	buckthorn
gilgilê stembolî, garîsê stembolî, genimşamî, lazût	*Zea mays*	mayıs	maïs	indian corn
giyabeng, xirebenk	*Hyoscyamus niger*	kara banotu, göztohumu	jusquiame noire, herbe aux poules	black henbane
giyagewrik, kifkedûpişk, giyadûpişk, vaşogewr (zaza)	*Heliotropium europaeum*	bamkul otu	héliotrope	heliotrope
giyagirêçk, sûrpencik, darê şivanan	*Polygonum*	çoban değneği	renouée	knotgrass
giyayê belalûkê	*Veronica spp*	yavşan otu	véronique	speedwell, veronica
guhbelok	*Phlomis grandiflora*	ayı kulağı	phlomis à grandes fleurs	phlomis grandiflora
guhmişk, gijnija rovî	*Anagallus avensis*	tarla fare kulağı	mouron rouge	scarlet pimpernel
gula bênijînê	*Arnica montana*	dağ arnikası	arnica des montagnes	mountain arnica
gula çavêşê, hemîşe bihar	*Calendula arvensis*	altmak, şamdan çiçeği, ayni sefa, portakal nergizi	souci des champs, gauchefer, souci sauvage	wild calengula, field marigold
gula hesretê, hanek (zaza)	*Crocus sativus*	safran	safran	saffron
gulengî, heşvil (zaza), savil (zaza), gulherçî	*Paeonia officinalis*	ayı gülü	pivoine	peony
gunikê beranan	*Polygonum convolvulus L.*	sarmaşık çoban değneği	renouée liseron	wild buckwheat, black bindweed
guriz, gelziwan (zaza), gurisk	*Anchusa officinalis*	tıbbi sığır dili	buglosse officinale	common bugloss
guriz, gelziwan, gûriz, gwîriz	*Myosotis arvensis*	unutma beni	myosotis des champs	field forget-me-not
gurk, gurgeh	*Orobanche*	canavarotu	orobanche	broomrape
gurnîkê mêşinan, gurnûka	*Arctium lappa*	dulavratotu	bardane, rhubarbe du diable	greater burdock
gurxenêq, kerxenêq	*Aconitum napellus*	kaplanboğan, kurtboğan	aconit napel, casque de Jupiter	monk's hood
gûriz, golmize, zimanê ga	*Anchusa azurea kurdica*	sığır dili	buglosse	bugloss
hêjîr, încire	*Ficus carica*	incir	figue	fig
helerge, lerge	*Angelica archangelica*	melik otu, angelica	angélique	angelica
helhelok, belalûk	*Prunus mahaleb*	mahlep, idrisağacı	faux merisier	mahaleb sherry
helîkek, giloka zer, gelûka zerde, helikok	*Erysimum kurdicum*		vélar, érysimum	wallflower
hêro	*Alcea kurdica*	hatmi çiçeği	rose trémière sauvage	wild hollyhock
hes	*Ornithogalum kurdicum*	yabani sümbül	variété d'ornithogale	ornithogalum
hevrist, hêvrist, wêrs, wers, hors	*Juniperus communis*	ardıç	genévrier commun	juniper
hêzeran, tûra kûrila (Kerkûk)	*Delphinium*	yabani kuşayağı	delphinium, pied d'alouette	delphinium
hinar, henare	*Punica granatum*	nar	grenade	pomegranate
hingivîn, mijmijok, vaşê mêşan (zaza)	*Lamium spp*	ballıbaba	lamier	dead nettle
îsotê cumo	*Physalis alkekengi*	güvey feneri, patlangaç	physalis, alkékenge, coqueret	physalis, winter cherry, cape gooseberry
îsota sor, bîbera sor	*Capsicum annum*	kırmızı sivri biber	piment	pepper, capsicum, chilli
kakao, kekew	*Theobroma cacao*	kakao	cacao	cacao
karî, kardî, kardû, marmaroşk	*Arum maculatum*	lekeli yılan yastığı	arum tacheté, gouet tacheté, pied de veau	lords and ladies, cuckoo pint
kartol, petate, qûnpir, ritax, kirtop, sêvik, kartofil	*Solanum tuberasum*	patates	pomme de terre	potatoe
kelendor, kerbeşa derewîn, zirkerbeş, kerbeşa keran	*Onopordum spp.*	adi eşek dikeni	chardon	cotton thistle
kelxa deveyan, qoleg	*Centaurea kurdica*	devedikeni	variété de centaurée	centaury
kergezik, gezing	*Urtica dioica*	büyük ısırgan	grande ortie, ortie dioïque	large nettle
kerbalcana bejî	*Atriplex hastata*	kara pazı	arroche hastée	hastate orache, iron root
kerengnebî, kengirker, kêngerê nebî, çîstole	*Eryngium campestre*	boğa dikeni	panicaut champêtre	sea holly
kevlepîr	*Boraginaceae*	hodan	myosotis	forget-me-not
kêrat, qereqaç	*Anagyris foetida*	zivircik	anagyre fétide, bois-puant	bean clover, stinking wood
kitan, kitaf, guş	*Linum*	keten	lin	flax
kitana kûvî	*Linum usitatissimum*	yararlı keten	lin utile (utilisé pour l'huile)	annual flax, linseed
kizink, kiznok, xulêr, kizina bejî, xurêl	*Vicia cracca*	kuşfiği	vesce craquette,	bird vetch
rihan, merzekew	*Ocimum basilicum*	fesleğen	basilic	basil
kîsikê şivanî, tûrikê şivanan, tarek (zaza)	*Capsella bursa pastoris*	çoban çantası, kuşkuş otu	capselle, bourse-à-pasteur	shepherd's purse
koksor, lûexandir (zaza)	*Amaranthus retroflexus*	kırmızı köklü tilki kuyruğu	amarante réfléchie, amarante à racine rouge	redroot amaranth, redroot pigweed
kulîlka cotarî, hanhanek, ciwanemerg, pîvok	*Merendera kurdica, Colchicum kurdica*	gül faki	colchique du Kurdistan	autumn crocus , meadow saffron
kuncîkerk	*Sesamum indicum*	yabani susam	sésame	sesame seed, sim sim
lavlavka avî	*convolvulus ssp*	kuzu sarmaşığı	fleurs violettes, grimpe aux arbres	
lavlavk, leflefok, malvênçe	*Convolvulus arvensis kurdica*	tarla sarmaşığı	liseron des champs	bindweed, lesser bindweed
lîmon, leymûn	*Citrus*	limon	citron	lemon
mamîran	*Gentiana lutea*	sarı jantian	gentiane jaune	yellow gentian
mastêrek, tiliya xanimê	*Digitalis purpurea*	yüksük otu (alrenkli)	digitale pourprée	foxglove
mastêrk, sinbêleşên (zaza)	*Polygonum persicaria*	kırmızı ayaklı kara buğden	renouée persicaire	persicaria
meroje, merje, mîrajo	*Asparagus officinalis*	kuşkonmaz	asperge	asparagus
nançivîk	*Thlapsi arvense*	tarla akça çiçeği	tabouret des champs, monnoyère, herbe-aux-écus	stinkweed, pennycress
nanê çûçê, nançivîk, nançûk, nançûçik	*Thlapsi kurdicum*	çoban dağarcığı	monnoyère, tabouret des champs	field penny-cress
naznaz	*Portulaca grandiflora*	ipek çiçeği	pourpier à grandes fleurs	moss rose
nefel	*Trifolium spp*	yonca	trèfle	clover

nefela nêr, nefela binêrik	*Trifolium hybridum*	melez yonca, isveç üçgülü	trèfle alsike, trèfle hybride	alsike clover
nefela sor, keta sor	*Trifolium pratense*	kızıl yonca, çayır üçgülü	trèfle rouge, trèfle des prés	red clover
okalîptus, tadar	*Eucalyptus globulus*	ökaliptus	eucalyptus	eucalyptus
pencepisîk	*Ranunculus repens*	horoz ibiği, sürünücü düğün çiçeği	pied de poule, renoncule rampante	creeping buttercup
peqpeqok, teqteqok, çeqçeqok	*Silene spp (caryophyllaceae)*	nakil, yapışkan otu	silènes	catchfly
pirpar, parpar, pêpîne	*Portulaca oleracea*	semiz otu	pourpier commun	purslane
pîvaz, piyaz	*Allium cepa*	soğan	oignon	onion
pîzel, pîzil	*Juncus*	hasır otu	jonc	rush
pûjan, naneya bejî	*Mentha arvensis*	kır nanesi	menthe des champs	mentha arvensis
qaçmûk, şewbor	*Hesperis kurdica*	acem menekşesi	variété de julienne	common dame's violet
qaco, şîrok, talîşk, xasa bejî, talika zerencam (zaza)	*Lactuca serriola*	küçük ağı marul, küçük eşek marolu	laitue serriole	prickly lettuce
qarûş, karîş, qarûç, bencere, bencira	*Sorghum halepense*	kanyas, geliç	sorgho d'Alep	Johnson grass
qerenfîl, qernefel, qurnefîl, mêxek, mêxik	*Dianthus*	karanfil	œillet	carnation
qesel mehmûd	*Teucrium chamaedrys*	kısa mahmut otu	germandrée petit-chêne	wall germander
qinêber	*Cardaria draba*	kır teresi, yabani tere	passerage, cardaire drave	hoary cress, hoary pepperwort
qirşsorik smartweed	*Polygonum lapathifolium*	ravend yapraklı çoban yaprağı	renouée à feuilles d'oseille	pale smartweed, dock-leaved
qurincok, giya qurincok, gorcal (zaza)	*Tribulus terrestris*	demir dikeni	tribule terrestre, croix-de-malte	caltrops
rebenok, mêlaq (cûreyek lale ye)	*Tulipa oculis-solis*	güneş gözü	variété de tulipe	a species of tulip
ribês, rêwas	*Rheum ribes*	ışgın	rhubarbe	rhubard
rihan, merzekene	*Ocimum basilicum*	fesleğen	basilic	sweet basil
rihana maran	*Salvia spp*	adaçayı	sauge	sage, clary
rîlik, rolik, rûl, ziqqum	*Nerium oleander*	zakkum, ağı çiçeği	laurier rose	oleander, rosebay
sabûnok	*Saponaria officinalis*	adi sabun otu	saponaire officinale, herbe à savon	soapwort
selmast, sêlmask, selmik, vilincê bizan (zaza)	*Chenopodium album*	akkaz ayağı	chénopode blanc, ansérine, chou gras	lamb's quarters, pigweed, goosefoot
sernixûnk	*Fritillaria persica*	acem ters lalesi	fritillaire de Perse	persian lily, persian fritillaria
sêva binerdê, sêvaxîn, saya binerdî	*Helianthus tuberosus*	yerelması	topinambour	Jerusalem artichoke
şirta çeman	*Calluna vulgaris*	adi süpürge çalısı	bruyère	heather
sîvanok	*Phlomis kurdica*	ayı kulağı	phlomis du Kurdistan	Kurdish sage
şoqilê hûr, mircor, çavreşk, baqilê hûr	*Vicia tetrasperma*	dört taneli fiğ	vesce à quatre graines	smooth tare
sorik, korek	*Panicum capillare*	kumdar, arnavut darısı	panic capillaire	witchgrass
sorsork, kitra sor, giyagêzk (gula wî : pîjildan, pîspîsk, pîspîsok, pîjik)	*Imperata cylindrica*	yelotu, kındıra, kan otu	paillote, paille de dys	cogon grass, blady grass
strîbeloq, strîşûjin, striyê çavbiloq, çavbeloq	*Centaurea*	deligöz	centaurée	centaurea
sumbil	*Hyacinthum orientalis*	sümbül	jacinthe	common hyacinth
şabelot	*Castane sativa*	kestane	châtaigne	sweet chestnut
şahtere	*Fumaria officinalis*	şahtere	fumeterre officinale	common fumitory
şembelîk, xencelîsk	*Trigonella foenum-graecum*	çemen	fenugrec, sénégrain, trigonelle	fenugreek
şeqşeqok, çeqçeqe	*Bongardia chrysogonum*	çatlak otu	bongardia	bongardia
şerabok, giya zirzirok, şofan	*Avena fatua*	yabani yulaf	folle avoine	wild oats
şêlmok, harik	*Sinapis arvensis*	yabani hardal	moutarde des champs	wild mustard
şîlan, gulşîlan, sûrgule	*Rosa canina*	kuşburnu	églantine	wild rose, dog rose, eglantine
şilêr	*Fritillaria*	ağlayan gelin	fritillaire	fritillary
şilêra sernixûnk	*Fritillaria persica*	acem ters lalesi	fritillaire de Perse	persian lily, persian fritillaria
şilêra sernuxwîn, şilêra sernixwînk, gulbenda şahî	*Fritillaria kurdica, Fritillaria imperialis*	ağlayan gelin, kral tuğu	fritillaire impériale (cette fleur est originaire du Kurdistan, pousse en altitude)	crown imperial
şînak, bedemçe, şivşînk	*Prunus arabica*	badem türü	variété d'amandier	prunus arabica
şirşirk, giyagenim, biragenim, xelvaş (zaza), şîlmok	*Bromus spp*	dibromlu	brome	brome grass
şolik, colik, şoqil, baqil, baqla, kêlih, kelî	*Lathyrus*	bezelye	pois	pea
şoqil, şolgenîk, baqilfisek, colgenî, kelîk, gasos (Bahdinan)	*Vicia sativa*	ehli fik, arpa fiği, buğday fiği	vesce	common vesce
şoqilê pisîkan, xişik	*Vicia hirsuta*	kaba tüylü fi	vesce hérissée	hairy tare
tîhnavk	*Labiate spp*	ballıbabagiller	variété de labiée	species of labiate
tiriyê dehlê	*Vaccinium myrtillus*	çoban üzümü	myrtille	whortleberry, blueberry
tiriyê hirçan	*Arctostaphylos uva-ursi*	ayı üzümü	busserole, raisin d'ours	bearberry
tiriyê maran	*Solanum nigrum*	köpek üzümü, köpek memesi	morelle noire	black nightshade
say mîrçikan	*Sorbus aucuparia*	kuş üvezi	sorbier des oiseleurs	mountain ash
tirşok, tirşoka xwarinê	*Rumex spp*	kuzukulağı	oseille	sorrel
tirşok, tirşoke	*Rumex acetosa*	kuzukulağı	oseille des prés	common sorrel
tirşoka gayan	*Rumex obtusifolius*	küt yapraklı labada	patience obtuse	broad-leaved dock
tirşoka keran	*Rumex dentatus*	labada	(oseille non comestible)	indian sorrel, toothed dock
tirşoka kewan	*Rumex acetosella*	küçük kuzukulağı	fausse oseille, petite oseille	sheep's sorrel, small sorrel
tirşoka zinaran	*Rumex crispus*	kıvırık labada	patience crépue	curly dock
tolik, xamazek (zaza)	*Malva neglecta*	ebegümeci	mauve à feuilles rondes	dwarf mallow
tûtirşk, drîsork	*Rubus idaeus*	ahu dudu	framboisier	raspberry
xelîlok, pêlegleg, xilok, poşmê, poşmêz (zaza)	*Geranium spp*	turnagagası	géranium	geranium
xerdela bejî, xerdela reş	*Brassica nigra*	kara hardel	moutarde noire	black mustard
xilîk, hilîk, hilûreşk	*Prunus spinosa*	çakal eriği	prunellier, épinette, épine noire	sloe, blackthorn
xweşîl, taleşîr, şîrmar, xagşîr, xwelîşîrik, şîrik, şîroke, delêk (zaza)	*Euphorbia helioscopia*	seher otu	euphorbe réveil-matin	sun spurge, wartweed
zimanxwînk, zeliqok, nûsek, nwîsek, padûseh (zaza), dûgune	*Gallium aparine*	yapışkan otu	gaillet, gratteron	goosegrass, cleavers
zingilzava, tusiyê keran	*Eryngium spp*	boğa dikeni	panicaut (variété de chardon)	sea holly, eryngo
zirtiq, fistiqa erdê, fisteqê bierdkî	*Arachis hypogaea*	yer fıstığı	arachide	peanut, groundnut, monkey nut
zirtolik, tolika keran, xamezeka sûre	*Malva sylvestris*	büyük ebegümeci	grande mauve	common mallow
kimê, dobelan	*Ascomycetes hypogés*	yermantarı, domalan	truffe	truffle
kimeya reş	*Tuber melanosporum*	kara yermantarı	truffe noire	black truffle
şoqilê hûr, mircor, çavresk, baqilê hûr	*Vicia tetrasperma*	dört taneli fiğ	vesce à quatre graines, lentillon, cicerole	smooth tare
beybûna mêrgan	*Leucanthenum vulgare*	çayır papatyası	marguerite de prés	ox-eye daisy
gurnîg, gurnîgamêş, gûrnûk, mwîsek	*Xanthium strumarium*	hakiki sıraca otu	lampourde aux écrouelles, lampourde glouteron	rough cockleburr
behîva bejî, badema çiya, çaqale	*Prunus carduchorum*	yabani badem	variété d'amandier	almond tree



Achillea millefolium, bêwîjan, pûjang, gulikê maran



Aconitum napellus, gurxenêq, kerxenêq



Agropyron repens, firêz (li hin deveran)



Alcea kurdica, hêro



Amaranthus retroflexus, koksor, lûexandir (zaza)



Annagyris foetida, kêrat, qereqaç



Anchusa azurea kurdica, gûriz, golmize, zimanê ga



Anchusa officinalis, guriz, gelziwan (zaza), gurisk



Anemone coranaria, adarok, gulalesûre, kurikmast



Arum maculatum, karî, kardî, kardû, marmaroşk



Asparagus officinalis, meroje, merje, mîrajo



Atriplex hastata, kerbalcana bejî



Avena fatua, şerabok, giya zirzirok, şofan



Bellevalia, gêleqir




Boraginaceae, kevlepîr




Brassica nigra, xerdela bejî, xerdela reş



Bromus spp, şirşirk, giyagenim, biragenim, xelvaş (zaza), şîlmok



Calendula arvensis, gula çavêşê, hemîşe bihar



Capsella bursa pastoris, kîsikê şivanî, tûrikê şivanan, tarek (zaza)



Cardamine hirsuta, bendika avî, vîzdorik (zaza)



Cardaria draba, qinêber



Centaurea, strîbeloq, strîşûjin, striyê çavbiloq, çavbeloq



Chenopodium album, selmast, sêlmask, selmik, vilincê bizan (zaza)



*Equisetum arvense,*dûvikê hespê, sipingê maran, singê maran, şitlê xezalan, tilîper, rûnîn (zaza), vaşbitrî (zaza)




Echinochloa crusgalli, darucan, şêrpûg



Hedera helix, dargerînk, daralînk, badar



Merendera kurdica, colchicum kurdica, kulîlka cotarî, hanhanek, ciwanemerg, pîvok



Euphorbia helioscopia, xweşîl, taleşîr, şîrmar, xagşîr, xwelîşîrik, şîrik, şîroke, delêk (zaza)



Fumaria officinalis, şahtere



Gallium aparine, zimanxwînk, zeliqok, nûsek, nwîsek, padûseh (zaza), dûgune



*Heliotropium europaeum,*giyagewrik, kifkedûpişk, giyadûpişk, vaşogewr (zaza)



Hesperis kurdica, qaçmûk, şewbor



Brassica oleracea, kelem



Lamium spp, hingivîn, mijmijok, vaşê mêşan (zaza)



Lathyrus tuberosus, colbenî, şolikê maran, baqilê maran, kelîmar



Linum, kitan, kitaf, guş



*Lolium temulentum,*çîm, giyareş



Malva neglecta, tolik, xamazek (zaza)



*Matricaria chamomilla,*beybûn, beybûna demanan, babûnc




*Mentha arvensis,*pûjan, naneya bejî



Myosotis arvensis, guriz, gelziwan, gûriz, gwîriz



Panicum capillare, sorik, korek



Papaver rhoea, bûkik, bûkanî, bûk, bwîk, nîsanok, patpatok, patpatole, bûkûzava, gulenîsan, rêywek



*Phaseolus vulgaris,*fasûlî, fasûlye, fasolî, fasla (zaza)



Phlomis grandiflora, guhbelok



Phlomis kurdica, sîvanok



Polygonum lapathifolium, qirşsorik



Polygonum persicaria, mastêrk, sinbêleşên (zaza)



*Portulaca oleracea,*pirpar, parpar, pêpîne



*Rumex obtusifolius,*tirşoka gayan

Termên rojnamevaniyê

Amadekar : Newzad HIRÛRÎ

kurmancî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
reklam	reklam	réclame, publicité	advertisement
reklam kirin	reklam yapmak	faire la réclame, faire la publicité	to advertise
reklamger	reklamcı	publiciste	advertiser
reklamgerî	reklamcılık	publicité	advertising, publicity
agahdarî	enformasyon	information	information
analîz	analiz	analyse	analysis
analîz kirin (n.f.)	analiz etmek	analyser	to analyze
analîst	analist	analyste	analyser
jînenigarî, jiyanname	biyografi	biographie	biography
peqoşk, peqoşka axaftinê, balon	balon	bulle (de BD)	balloon
bandrol	bandrol	banderole,	banner
diruşm (n.f.)	1) bayrak, sancak 2) slogan	1) bannière 2) slogan, mot d'ordre	1) banner 2) slogan
stûr, tîpên stûr	kalın harfler	caractère gras	bold
weşandin	yayınlamak	publier, diffuser	to broadcast
weşan	yayınlama, yayın	diffusion, publication	broadcasting
klîp	klip	clip	clip
têgeh (n.f.)	kavram, mefhum	concept	concept
têgehî	kovramsal	conceptuel	conceptual
têgehbar	kavranabilir, anlaşılabilir	concevable	conceivable
netêgehbar	anlaşılamaz, kavranamaz	inconcevable	unconceivable
mafê weşanê	telif hakkı	droit d'auteur	copyright

Dezgehên dewletê

Amadekar : Samî ERGOŞÎ

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
birêveber, rêveber	müdür	directeur	director
birêveberî, rêveberî	müdürlük	direction	directorate
navxwe	iç	interne	internal
navxweyî	dahili, iç	intérieur	internal, interior
elektrîk, kareba	elektrik	électricité	electricity, power
birêveberiya belavkirina elektrîkê (an karebayê)	elektrik dağıtım müdürlüğü	direction de distribution de l'électricité	electric power distribution directorate
sexbêrî	bakım	entretien	maintenance
tora elektrîkê (karebayê)	elektrik şebekesi	réseau électrique	power grid
avero	lağım, kanalizasyon	tout-à-l'égoût	sewers
birêveberiya av û averoyan	su ve kanalizasyon müdürlüğü	direction des eaux et des égoûts	directorate of water supply and sewage
birêveberiya kar û cîwarkirinê	istihdam ve iskan müdürlüğü	direction de l'emploi et du logement	directory of employment and housing
birêveberiya çandiniyê	ziraat müdürlüğü	direction de l'agriculture	directorate of agriculture
saman	kaynak, servet	ressource	resource
samanên ajelî	hayvan kaynakları	ressources animales	animal ressources
birêveberiya samanên ajelî û beytariyê	hayvan kaynakları ve baytarlık müdürlüğü	direction des ressources animales et des services vétérinaires	directorate of animal ressources and veterinarian services
birêveberiya gumrikê	gümrük müdürlüğü	direction des douanes	directorate of customs
plankirina bajêr	şehir planlaması	planification urbaine	city planing
birêveberiya gencîneyê	hazine müdürlüğü	direction du trésor	directorate of treasure or exchequer
birêveberiya weqfan û karûbarên dînî	vakıflar ve din işleri müdürlüğü	direction des biens de main-morte et des affaires religieuses	directory of mortmain and religious trusts
birêveberiya tapoyê	tapu müdürlüğü	direction des titres de propriété	land registry directory
birêveberiya baca hatiniyê (an derametê)	gelir vergisi müdürlüğü	direction de l'impôt sur le revenu	directorate of income tax
birêveberiya çavderiya bazirganiyê	ticaret denetleme müdürlüğü	direction de surveillance du commerce	directory of trade supervision/control
birêveberiya belavkirina sotemeniyê (an ardûyê)	yakıt dağıtım müdürlüğü	direction de distribution des combustibles	directory of fuel distribution
birêveberiya karûbarên civakî	sosyal işler müdürlüğü	direction des affaires sociales	directorate of social welfare
birêveberiya çavderiya darayî	maliye denetleme müdürlüğü	direction de contrôle financier	financial audit directory
birêveberiya spor (an werziş) û ciwanan	spor ve gençlik müdürlüğü	direction des sports et de la jeunesse	directorate of sports and youth
gola nelê	geçersiz gol	but invalide	invalid goal
golparêz, qelevan	kaleci	gardien de but	goalkeeper
kûpa	kupa	coupe	cup
kûpaya FFE (UEFA)yê	UEFA kupası	coupe de l'UEFA	UEFA cup
kûpaya şampîyonan	şampiyonlar kupası	coupe des champions	champions cup
lêdan, lêxistin	vuruş	tir	kick
lêdana aûtê, derlêderî	kale vuruşu, aut atışı	sortie de but	the goal kick
lêdana destpêkirinê	başlama vuruşu	coup d'envoi, engagement	kick off
lêdana ji goşeyê, goşelêderî	köşe atışı	tir de coin, corner	the corner kick
lêdana penaltîyê, lêdana cezayê, cezalêderî	penaltı atışı	penalty	the penalty kick
lêdana serbest a neyekser, serbestlêderîya neyekser	endirekt serbest vuruş	coup franc indirect	the indirect free kick
lêdana serbest a yekser, serbestlêderîya yekser	direkt serbest vuruş	coup franc direct	the direct free kick
lêdana serbest, serbestlêderî	serbest atış, serbest vuruş	coup franc	free kick
maç	maç	match	match
maça neteweyî	ulusal maç	match national	national match
şahê golan, şahê golavêjan	gol kralı	meilleur buteur	top scorer
şampîyon	şampiyon	champion	champion
şampîyonîya cîhanê	dünya şampiyonası	championnat du monde	world championship
şampîyonîya Ewrûpayê	Avrupa şampiyonası	championnat européen	European championship
taçavêtin, avêtina ji kenarê, kenaravêjî	taç atışı	remise en jeu	the throw-in
taxim	takım	équipe	team
taximê neteweyî	ulusal takım, milli takım	équipe nationale	national team
tora golê, tora qeleyê	kale ağı	filet de but	goal net

Paşgirên kurdî
-III-

Amadekar : Reşo ZÎLAN

-o (I) : Ji bo çêkirina navên hem jin û hem jî mêran bi dawîya peyvê ve tête girê dan.

Nimûne: Sor**o**, Mend**o**, Baz**o**, Sil**o**; m**o**, Zeyn**o**, Xec**o**, 'Eyş**o**, Wes**o.**

-o (II) : Ev paşgir ji bo piçûkxistina kesan, tişt, cih û deveran û jê bi gilî û gazin behskirinê, yan jî ji bo saloxdan û wesifdanê tête bi kar anîn. Ev dikare hem di forma dema rewşa gazîkirinê de be hem jî ji bo binavkirin û navlêdanînê be.

Nimûne: Hem**o**, Rem**o**, Şem**o**, Hes**o**, bav**o**, Sil**o**, xal**o**, ap**o**, gund**o**, çem**o**, gur**o**, şahîn**o**, heval**o**, lîç**o**, lîk**o**, xwar**o.**

-o / -yo (III) : Ji bo forma bangkirina zayenda nêr ya yekhejmar e.

Nimûne: kur**o**!, bav**o**!, kek**o**!, zava**yo**!, gêj**o**!, dîn**o**!

-ok / -yok (I) : Paşgirek e, ku ji bo salox û wesifdana mirovekî ye.

Nimûne: çep**ok**, tirs**ok**, ken**ok**, mirov**ok**, ger**ok**, rev**ok**, şerm**ok**, zar**ok**, girî**yok**, mizmiz**ok**, xapîn**ok**, xeyd**ok**, qarqar**ok**, qehr**ok**, dilbij**ok**

-ok (II) : Bi alîkarîya vê paşgirê ji navdêr yan jî rengdêran navdêrên nû têne afirandin.

Nimûne: gul**ok**, adar**ok**, nîsan**ok**, dev**ok**, nez**ok**, pel**ok**, kel**ok** /kelek, mişt**ok**, peqpeq**ok**, zelq**ok** /zeliqok, keçel**ok**, şemit**ok**, şîn**ok**, gezgez**ok**, xemrevîn**ok**, pêken**ok**, payîz**ok**, dîl**ok**

-ok / -yok (III) : Ev paşgira ji bo piçûkkirinê ye. Gava ku tête dawîya peyvekê, tiştê ku jê tête kad kirin, ji alîyê mezinahîyê ve piçûk dike.

Nimûne: ferheng**ok**, fetil**ok**, hêjîr**ok**, şekir**ok**, şemam**ok**, zengil**ok**, xeber**ok**, pîvaz**ok**, pifdan**ok**, kanî**yok** / kanyok, hestî**yok**, axa**yok**

-oke : Ji navdêran rengdêrekê diafirîne.

Nimûne: bîr**oke**, şil**oke** (şilope), şerm**oke**, fir**oke**, virr**oke**, tir**oke**

-okî : Ev paşgir ji navdêran rengdêrekê çêdike.

Nimûne: qirêj**okî**, perit**okî**, zerik**okî**, reşk**okî**, gemar**okî**, pitpit**okî**, girîn**okî**, gumgum**okî**, vinvin**okî**, ximxim**okî**

-olek : Bi vê paşgirê rengdêr tête afirandin.

Nimûne: tat**olek**

-ole : Bi vê paşgirê rengdêr têne afirandin.

Nimûne: zirt**ole**, tir**ole**,

-olek / -olik : Bi vê paşgirê rengdêr têne afirandin.

Nimûne: gul**olik**, çînç**olek** (cincîlk, çincîl), zirt**olek**

-olekî : Bi vê paşgirê rengdêreke pêvebrî (attrîbutîv) tête çêkirin.

Nimûne: reş**olekî**, şîn**olekî**, keşk**olekî**

-onek : Ev paşgira ji navdêrekê rengdêr yan jî navdêreke nû çêdike.

Nimûne: tirs**onek**, zirt**onek**, bizd**onek**, fitl**onek**, zîvr**onek**

-or : Bi vê paşgirê rengdêr tête afirandin.

Nimûne: şil**or**

-orik : Bi vê paşgirê rengdêr tête afirandin.

Nimûne: xil**orik**

-ose : Bi vê paşgirê rengdêr tête afirandin. Paşgira "-ose" kurtbûyîya paşgira "-asa" ye ku bi maneya „wek, mîna, fena, şubhê" ye.

Nimûne: ker**ose.**

-otankî : Bi vê paşgirê rengdêreke pêvebrî (attrîbutîv) tête çêkirin.

Nimûne: reş**otankî**, pîr**otankî.**

-over : Bi vê paşgirê rengdêr tête afirandin.

Nimûne: gir**over** / gil**over**, hil**over.**

-ox : Ev paşgir bi maneya "çêker, kesê ku dike, kesê ku bi wî karî radibe" dide peyvê. Paşgira "-ox" di zimanê pehlewî de heye û di farisîya îro de jî din peyvan de maye. Lê di kurdî de, herî zêde, di zaravayê zazakî (dimilî) de bi rengekî gelekî berfireh tête bi kar anîn. Wisan ku dikare bi maneya "çêker" ji bo her kar û pêşeyî bête bi kar anîn.

Nimûne: çêkir**ox**, kirr**ox**, kir**ox** (kiryox), sal**ox** (salix).

-oyî : Bi vê paşgirê ji navdêrekê rengdêrek tête afirandin.

Nimûne: pesn**oyî**, şer**oyî**, peyv**oyî**

-pare : Ev paşgir bi maneya "kerr, perçe, parçe" ye.

Nimûne: yek**pare**, dil**pare**, ciger**pare**,

-perwer : Ji lêkera "perwerandin"a îranî ye ku di maneya "perwerde kirin, xwedî (xudan) kirin, jê re xwedî derketin, mezin kirin, terbîye kirin, hebandin"ê de ye. Ev paşgir maneya "kesê / tiştê ku dihebîne / hez dike, jê re xwedî derdikeve" dide peyvê.

Nimûne: kurd**perwer**, mêvan**perwer**, nîştiman**perwer**, mirov**perwer**

-pêç : Paşgira ji lêkera "pêçandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê pêçandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: birîn**pêç**, ser**pêç**, dor**pêç**, rû**pêç**

-parêz : Paşgira ji lêkera "parastin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê parastinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: welat**parêz**, hawîr**parêz**

-perest : Paşgira ji lêkera "perestin"a ku di maneya "hebandin, jê re secde birin"ê de ye. Wek paşgir maneya "kesê ku wî tiştî dihebîne, ji wî tiştî re secdeyê dibe" dide peyvê.

Nimûne: agir**perest**, pût**perest**, xaç**perest**, keys**perest**, xwe**perest**, kevne**perest**, pûl**perest**, nijad**perest**

-pêj : Paşgira ji lêkera "pehtin / pijandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê pehtinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: xwarin**pêj**, nan**pêj**, rûn**pêj**, aş**pêj**

-pîv : Paşgira ji lêkera "pîvan / pîvandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê pîvandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: germ**pîv**, ba**pîv**

-poş : Paşgira ji lêkera "poşîn"a bi maneya "lixwekirin, wergirtin"ê ye. Gava ku tête dawîya peyvekê maneya "kesê / tiştê ku bi karê poşînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: zirî**poş**, reş**poş**, çav**poş**

-rax : Paşgira ji lêkera "raxistin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê raxistinê radibe dide" peyvê.

Nimûne: ser**rax**, bin**rax**, cî**rax.**

-rês : Paşgira ji lêkera "ristin / rêsîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê ristinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: teşî**rês.**

-revîn : Paşgira ji lêkera "revîn / revandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê revînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: xem**revîn**, dil**revîn**, xew**revîn**, heval**revîn.**

-rêj : Paşgira ji lêkera "rêtin / rotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê rêtinê radibe dide" peyvê.

Nimûne: av**rêj**, xwîn**rêj**

-saz : Paşgira ji lêkera "saxten"a farisî ye ku dibe "çêkirin"a kurdî û maneya "kesê / tiştê ku bi karê çêkirinê / sazkirinê" radibe dide peyvê.

Nimûne: derman**saz**, diran**saz**, dem**saz**, çek**saz**, kar**saz.**

-soj / -soz: Paşgira ji lêkera "sotin"ê, ango şewitîn / şewitandinê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê şewitandin / sotinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: dil**soj** /dil**soz**

-stîn: Paşgira ji lêkera "standin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê standinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: ruh**stîn**

-şikên: Paşgira ji lêkera "**ş**ikandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê **ş**ikandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: balafir**şikên**, ferman**şikên**, kevir**şikên**, qeşa**şikên**, ser**şikên**, deq**şikên**, dilşikên, şak**şikên** (=moralşikên)

-şo : Paşgira ji lêkera "şûştin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê şûştinê radibe"
dide peyvê.

Nimûne: mirî**şo**, tena**şo** (teneşo, teneşîr), dest**şo**, cil**şo**, çek**şo**, kinc**şo**, kiras**şo**, ser**şo**, firaq**şo**, aman**şo**, berx**şo**

-şok: Paşgireke hevedudanî ye, ji paşgira "-şo" û "-k" pëk hatîye. Maneya "cihê ku ew tişt tê de tête şûştinê" dide peyvê.

Nimûne: ser**şok**, dest**şok**, pê**şok**, firaq**şok**

-tir (I) : Paşgireke demê ye.

Nimûne: sibe**tir**, roj**tir**a din

-tir (II) : Paşgira forma kemper ya rengdêrî yan jî hokerî ya ji bo saloxdana rewşeke danberhevî û miqayesekirinê ye.

Nimûne: xweş**tir**, çê**tir**, germ**tir**, biha**tir**, bilind**tir**, xurt**tir**, mezin**tir**, pir**tir**, dûr**tir**, zû**tir**, derengtir, lez**tir**, beza**tir.**

-tiraş : Paşgira ji lêkera ”tiraşîn / tiraştin”ê ye û maneya kesê / tiştê ku bi karê tiraştinê radibe dide peyvê.

Nimûne: kevir**tiraş** (bertiraş), heykel**tiraş**, qelem**tiraş**, dar**tiraş**, ser**tiraş**, sim**tiraş.**

-tirîn : Paşgira forma lapekemper ya rengdêrî yan jî hokerî ya ji bo saloxdana rewşeke danberhevî û miqayesekirinê ye.

Nimûne: xweş**tirîn**, çê**tirîn**, germ**tirîn**, biha**tirîn**, bilind**tirîn**, xurt**tirîn**, mezin**tirîn**, pir**tirîn**, dûr**tirîn**, zû**tirîn**, derengtirîn, lez**tirîn**, beza**tirîn**

-tî : Paşgirek e ku ji bo çêkirina navdêrên abstrakt têtе bi kar anîn.

Nimûne: şivan**tî**, gavan**tî**, hoste**tî**, heval**tî**, bira**tî**, mirov**tî**, zava**tî**, kurdî**tî**, ker**tî**, har**tî**, beredayî**tî**, durû**tî**

-van / **-evan** (I) : Ev paşgira ku di zimanê farisî de “-ban” e, di kurdî de bûye “-van” yan jî “- wan”. Di zimanê kurdî de ew bi van çend awayên jêrîn têtе bi kar anîn. Wek di van nimûneyan de jî xuya dike, maneya bingehîn ya vê paşgira lêkerî “panêrî / çavnêrîya heywanan kirin, çûna ber heywanan, heywan xwedî kirin” e.
Li vir, hewce ye em bibêjin, ku peyva “şivan”a kurdî di zimanê pehlewî de “şuban” e û peyva “şu” ya ku ji zimanê sanskrîtî ye, di vê peyvê de maneya “pez” wergirtîye. Bi vî rengî, ew di farisî de bûye “çûban”, lê di kurdî de dengê “ş”yê hatîye parastin û bûye “şivan”. Ev peyv çûye nav zimanê tirkî û bûye “çoban”. Herwekî ku xuya dike, mîna ku hinek kes dibêjin, peywendîya vê peyvê bi gotina “ço, çov, şiv” nîn e.

Nimûne: ş**ivan**, ga**van**. berx**van**, kar**van** /kehrikvan, golik**van**, dîk**van**, masî**van**

-van / **-evan** (II) : Paşgira “-van”ê xwedî çend guhartoyên din e.Li vir, herwekî di nimûneyên jêrîn de jî dîyar dibe, ji bo çêkirina navên hin kar û pêşeyan e. Ev paşgir
maneya “ew kesê ku ji karê navbirî fêm û beşedike, ew şuxul ji destê wî têt û xwedan wî karî ye” dide.

Nimûne: nêçîr**van**, bax**van**, lîstik**van**, bêrî**van**, aş**van**, kelek**van**, mele**van**, dîde**van**, nêre**van**, seg**van**, baxçe**van**, rez**van**, melek**van** (serpale), melû**van**, qefle**van**

-van (III) : Paşgira ”-van”ê ya di vê guhartoyê de bi maneya “kesê ku ji lêdana alaveke mûzîkê fêm dike, jê dizane û bi wî kar û hunerî radibe” dide peyvê. Li vir hewce ye bête gotin, ku di zaravayên din yên kurdî de ji bo saloxdana ev celeb karê hunerî paşgira “- jen”ê têtе bi kar anîn, ku ji lêkera “jenîn”ê ye, ango “lê dan”. Bo nimûne, dibêjin “keça min kemanê xweş dijene”. Gava ku em bala xwe didin zaravayê kurmancî dibînin ku piranîya Kurmancan ji dêl “jenîn”ê ve lêkera “lê dan”ê bi kar tînin. Ji ber hindê, vê nimûneya me gotî, bi awayê “keça min kemanê xweş lê dide / keça min xweş li kemanê dixe” dibêjin. Ji vê jî dîyar dibe, ku kurmancî ji zaravayên din yên kurdî û herweha ji zimanên din yên îranî bi dûr ketîye.

Nimûne: bilûr**van**, zirne**van**, tembûr**van**

-van / **-evan** (IV) : Paşgira ”-van”ê ya di vê guhartoyê de bi maneya “kesê ku çavê wî li ser karê navbirî ye, kesê li tiştekî miqate ye, panêr” e.

Nimûne: dergeh**van**, piş**tevan**

-van (V) : Paşgira ”-van”ê ya di vê guhartoyê de ji navdêrekê rengdêrekê diafirîne.

Nimûne: dilo**van**

-wan (I) : Paşgira hevmaneya ”-van”ê. Ji bo maneya di vê nimûneya jêrîn de li guhartoya jorîn ya (**-van** / **-evan** (I)ê binihêre.

Nimûne: sel**wan** / serwan (ango şivanê deveyan)

-wan (II) : Paşgira hevmaneya ”-van”ê. Ji bo maneya di vê nimûneya jêrîn de li guhartoya jorîn ya (**-van** / **-evan** (IV)an binihêre.

Nimûne: pa**wan**, sî**wan**

-wer (I): Paşgira bi maneya ”xwedî kar û pêşeya navbirî“ dide peyvê.

Nimûne: pîlewer

-wer (II): Paşgira ”-wer“ ya di vê guhartoyê de bi maneya ”xwedîbûn”ê ye.
Nimûne: serwer

-wer (III): Ev paşgira ji navdêrekê rengdêrekê çêdike û dide nîşan dan ku ”ew tiştê navbirî ji çi materyalî“ çêbûye.

Nimûne: zîwer (zîvîn), pîlewer.

-weş : Ji lêkera ”weşîn“ê ye û gava ku wek paşgir têtе bi kar anînê maneya ”tiştê ku karê weşandinê dike dide“ peyvê.

Nimûne: pêlweş

-wî: Bi alîkarîya vê paşgirê ji navdêrekê rengdêr yan jî navdêreke nû têne afirandin.

Nimûne: ta**wî**, ba**wî**, efsane**wî**, rê**wî**

-xane (I): Paşgira bi maneya ”xanî, avahî“ ye.

Nimûne: nexweş**xane**, ders**xane**, çay**xane**, qehwe**xane**, şîr**xane**, mêvan**xane**, dîwan**xane**, kar**xane**, çap**xane**

-xane (II): Paşgira bi maneya ”derdana ku tê de tiştek têtе kirin“ e.

Nimûne: agir**xane**, qûş**xane**

-xane (III): Paşgira bi maneya ”xaneya çek û sîlehan“ e.

Nimûne: şeş**xane**

-xwar / xwer / -xur : Paşgira ji lêkera ”xwarin”ê ye û maneya ”kesê /tiştê ku bi karê xwarinê radibe“ dide peyvê.

Nimûne: xwîn**xwar**, goşt**xwar**, pir**xwar**, ked**xwar**, mîrat**xwar**, bertîl**xwar**, mirov**xwar**, heram**xwar**, selef**xwar**, xem**xwar**

-xwaz: Paşgira ji lêkera ”xwastin”ê ye û maneya ”kesê /tiştê ku bi karê xwastinê radibe“ dide peyvê.

Nimûne: mirad**xwaz**, azadî**xwaz**, xêr**xwaz**, qencî**xwaz**, da**xwaz**, dil**xwaz**, şer**xwaz**, aştî**xwaz**

-xenêq: Paşgira ji lêkera ”xeniqandin”ê ye û maneya kesê /tiştê ku bi karê xeniqandinê radibe dide peyvê.

Nimûne: gur**xenêq**, ker**xenêq**

-xur : bnr > xwar

-xwer : bnr > xwar

-xwez : bnr > xwaz

-xwên : bnr > xwîn

-xwîn : Paşgira ji lêkera ”xwendin”ê ye û maneya ”kesê /tiştê ku bi karê xwendinê radibe” dide peyvê.

Nimûne: quran**xwîn**

-yar /-iyar (I) : Ev paşgir bi maneya ”dost, heval” e.

Nimûne: bext**iyar**, hiş**yar**, zan**yar**, jî**yar**, nas**yar**, berpirs**iyar**, pe**yar**,

-yar /-iyar (II) : Ev paşgir maneya ”kesê ku wî karî dike” dide peyvê.

Nimûne: cot**yar**, kir**yar**, kirr**yar**, şandî**yar**

-za (I) : Paşgira ji lêkera ”zan / zayîn”ê ye û maneya ”ji dayîka bûye, hatîye dinê, zaye” dide peyvê.

Nimûne: nû**za** (=ber**za**), heval**za** (cêwî)

-za / -zî / -ze (II) : Bi maneya ”ji kesê navbirî çêûye, ji kesê navbirî dayîka bûye, hatîye dinê, zaye” dide peyvê.

Nimûne: bira**zî** /bira**za**, xwar**zî** /xwar**za**, mîr**za** / mîr**ze**

-zade : Ev paşgir bi maneya ”zarokê ji navbirî çêbûyî, zarokê ...” dide peyvê.

Nimûne: beg**zade**, esil**zade**, mîr**zade**, beg**zade**, şêx**zade**, şeh**zade**, perî**zade**

-zan : Paşgira ji lêkera ”zanîn”ê ye û maneya ”kesê / tiştê ku bi karê zanînê radibe”
dide peyvê.

Nimûne: kurdî**zan**, ziman**zan**, rê**zan**, ho**zan**, qedir**zan**

-zen / -ezen : Paşgira ji lêkera “zeden”a farisî ye ku bergindê “jenîn”a kurdî ye. Li gor kurdî diva bû ev pagir biba “jen” lê herwekî xuya ye, me ev form ji farisî bi deyn kiriye.

Nimûne: borî**zen**, şûr**zen**, qelp**ezen**, ney**zen**

-zar : Ev paşgir bi maneya cih e, cihê lê çandina tiştekî ye. Bi alîkarîya wê rengdêr yan jî navdêr tên çêkirin.

Nimûne: gul**zar**, ba**zar** (ji biha-zar).

-zed : Herwek paşgira “-zen”ê, ku me li jorê jê behs kiriye, ev paşgir jî ji lêkera “zeden”a farisî ye ku bergindê “jenîn”a kurdî ye. Wek paşgir maneya ”kesê ku hatiye pêşniyar / pêşkêş kirin” dide peyvê.

Nimûne: nam**zed**

-zede : Herwek paşgira “-zen” û “zed”ê, ku me li jorê jê behs kiriye, ev paşgir jî ji lêkera “zeden”a farisî ye ku bergindê “jenîn”a kurdî ye.. Wek paşgir maneya ”kesê ku tiştê navbirî lê ketîye” dide peyvê.

Nimûne: felaket**zede**, qeza**zede**

- firaz / fînaz /finyaz : Paşgira bi maneya “bilind” e.

Nimûne: ser**firaz**

-eng : Ev paşgir ji paşgira “-aheng” ya îranî kurt bûye û di kurdîya îro de bûye “-eng”. Ji hokerekê navdêr çêdike.

Nimûne: pêş**eng**

Peyvên di stranan de

Amadekar : Emîn NAROZÎ

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
liyan: dilê min liyan e	tedirgin, endişeli; kalbim endişe doludur	inquiet, anxieux; mon cœur est inquiet	anxious; my heart is anxious
yabo: bavo	ey baba	(rég. dans les parlers de la plaine de Mêrdîn) père	(reg.) father
akincî: dêmanî, dêmatî	yerleşik	sédentaire	sedentary
seyir kirin, sêr an se kirin	bakmak	regarder	to watch, to look at, to observe
sibeng, sibê, spêde	sabah	matin	morning
êmilk: berxê ber şîr	süt kuzusu	agneau de lait	suckling lamb
qelibîn: qulibîn	devrilmek	être renversé	upside down; spilt; somersault
gulm: qurt	yudum	gorgée	a mouthful (of food or drink especially)
bed	kötü	méchant, mauvais	bad, wicked
bedgiran	çok ağır	très lourd, implacable	very heavy, implacable
kefen	kefen	linceul	a shroud
dupa; dupa ez ji bo te hatim	çoğunlukla, çoğunlukla senin için geldim	surtout, principalement ; je suis venu surtout pour toi	mostly; principally, above all I have come for you
êlî: ê'lî; bi dengê ê'lî	yüksek; yüksek sesle	élevé, haut ; à haute voix	loud, speaking out loud
rîdan: rî, rû, ridên	sakal	barbe	beard
mûçing	cımbız	pince à épiler	tweezers
çêlî, çêlik: derziya gir	iri iğne	grosse aiguille	a big needle
berek	yamaç, yokuş	col	a pass
bereka çiyê	dağ yamacı	col de montagne	a mountain pass
bereka hespê	at yularının boyuna geçirilen bölümü	pièce d'harnachement entourant le cou du cheval	a part of a horse's harness going round its neck
çil	doruk	sommet, cime	summit, peak
çilê darê	ağaç doruğu	cime d'un arbre	the top of a tree
çilê çiyê	dağ zirvesi	sommet de montagne	mountain summit
li çil û çiyan	zirvelerde, yükseklerde	sur les hauteurs, sur les sommets	on high land
namil: navmil	omuz arası, sırt	le haut du dos, emplacement entre les deux épaules	top of the backe, a place between the shoulder
teng û ber: teng û berteng	gümül dürsük	sangle, pièces d'harnachement entourant le ventre et le collier d'un cheval	strap, girth
li ber guhê yekî xistîn: pê hisandin	kulağına çalmak	faire sentir, mettre la puce à l'oreille	to make s.o. feel, set s.o. thinking
jin berdan	boşanmak (kadından)	répudiation, divorce	repudiation, divorce
hozinan; hozê mîhan û berxan ; mîhan hoz kirin	oğlakları koyunlara salmak	lâcher des agneaux sous les brebis	to put lambs to suckle at ewes
hebûk	1) varlık, mal 2) atın bileği, bukağılık	1) (rég. dans le Caucase) richesse ; 2) paturon, articulation inférieure (au-dessus des sabots) du cheval	1) (regional in Caucasus) wealth; 2) a horse's pastern (a joint just above the hoof)
li ser darê piyan rawestan, li ser lingan rawestan	ayakta kalmak, sürekli çalışmak	rester debout, travailler sans cesse	to remain on one's feet, to work continuously
ramûsan: maç	öpücük, öpme	baiser	a kiss
ramûsîn	öpmek	embrasser	to kiss
hingivê zeyiyan	oğul balı	premier miel de jeunes abeilles	virgin honey, the first honey from a fresh swarm
seqlawî (seklawî)	seklavi, slav kökenli asıl at	cheval de race slave	a Slav breed of horse
nal	nal	fer à cheval	horseshoe
bizmar, mîx	çivi	clou	nail
şop	iz	trace, empreinte	a mark, stamp
selef, selefê siwaran	süvari alayı	convoi de cavalier	a cavalcade, a convoy of horsemen
cuhar, cuher, ceher, cehar	yem torbası	musette, mangeoire	nose bag, feed bag
qozax	yosma, şuh	coquette, belle	smart, good looking, pretty
ji ... û pêştir	den itibaren	à partir de	as from, starting with
dilober, dîlber	güzel kız, dilber	beauté, belle fille	a beauty, beautiful girl
evîndar	aşık	amoureux	in love
ceng	savaş	guerre	war
cangorî	kurban	sacrifice, victime	sacrifice, victim
hez kirin	sevmek	aimer	to love
guhdar	dinleyici	auditeur	a listener
dengbêj	ozan	barde, troubadour	a bard, minstrel
narîn	zarif, ince	fin, délicat, raffiné	fine, delicat, refined
xirxal	halhal	chaîne de cheville	anklet
guhar	küpe	boucle d'oreille	ear ring
rewal	tüysüz delikanlı	jeune homme imberbe	a young beardless man
qewal	yezidilikte deyiş söyleyen	chanteur d'hymnes religieux yézidis	singer of yezidi hymns
xelîn, stûyê te bixele! xanî xelîya	1) burkulma: boynu burkulası! 2) yıkılmak: ev yıkıldı	1) se briser, que ton cou se brise ! 2) s'effondre, la maison s'est effondrée	1) to be broken, may your neck be broken; 2) to have collapsed, the house has collapsed
xilxilîn	yıkılmak	s'effondre	to have collapsed
peya bûn: daketin	inmek	descendre, mettre pied à terre	to dismount
sîng û berê tiştîrî	el değmemiş, bakire	vierge ; dont nul n'a caressé les seins	a virgin, s.o whose breasts have not been caressed

kulxan	1) hamamları ısıtan, hamamın altında bulunan kupalı ve geniş ocak; (2) çöplük	1) chaufferie d'un hammam ; 2) décharge publique	1) the boiler room of a steam bath; 2) a public waste dump
tewrî = herî; tewrî pêşî = herî pêşî =	en; en öndeki	le plus ; le plus en avant	the most; the most in advance
gernas	kahraman	héros	heroes
navgiran	meşhur, ünlü	célèbre, fameux	celebrated, famous
boke	cesur, atılgan	courageux, audacieux	brave, daring
bokeberan, boxberan	cesur, atılgan gözüpek	hardi, audacieux (comme un bélier)	bold, daring (like a ram)
can bi can	can ciğer	intime, très proche	intimate, close
xwemalî	1) aileden veya yakınlardan biri; 2) yerli, kendi yapımı	1) la famille, proche ; 2) fait maison	1) the family, close relations; 2) home made
lomekar	yakınan, yakınmacı	plaintif	plaintiff
dîwan	divan	cour, salle de réception d'un seigneur	a court, a lord's reception room
litimîn, likumîn	tökezlemek	trébucher	stumble
keleşo	çamaşırı kaynar suda yıkama	lavage du linge dans de l'eau bouillante	washing clothes in boiling water
darê keleşoyê	çamaşır tokacı	battoir d'essorage du linge	a clothes wringer
miçiqîn: çikîn	(çeşme, göl, kuyu vb), kurumak	tarir	to dry up
mirûz, me'd, sikûm, rûçik	beniz, yüz ifadesi	figure, expression du visage	countenance, facial expression
pelweşîn	yaprak dökümü	chute de feuilles	falling leaves
çêrîn; biçêre	otlamak	paître	to graze (eg. cattle)
xwastek; xwestek	istek, dilek	demande, souhait	request, wish, desire
bermalî	1) ev hanımı; 2) eş, zevce	1) ménagère ; 2) épouse	1) housekeeper; 2) wife
xela	kıtlık	disette	scarcity,famine
dawestîn	durmak	s'arrêter	to stop oneself,
dawestandin	durdurmak	arrêter, stopper	to stop
dagestin	ısırmak	se mordre (les lèvres)	to bite (one's lips)
peqîn	patlamak	exploser	to explode
peqandin	patlatmak	faire exploser	to make or cause an explosion
kaphêşîn: kabhêşîn	ayakları masmavi at	cheval aux pieds bleus	a horse with blue hooves
qêrîn: qîrîn:	çığlık atmak, bağırmak	crier, lancer des cris	to shout to cry out
zelal	duru, berrak	limpide	limpid, clear
kember: kemer	kemer	ceinture	belt
şalwar: şelwer	şalvar	pantalon bouffant	baggy trousers
qulemişk: qulmişk, kunmişk	fare deliği	trou à rat	rat-hole
dizgîn: destgîn	dizgin	rênes	reins
rûçik	yüz, surat, çehre	visage	face
xelek	halka	anneau	ring
xeleka lêvê	üst dudak kenarı	le plis de la lèvre supérieure	the fold of the upper lip
şimşat: şahîk, hilîn	kaygan, parlak ve kaygan	brillant et glissant (sol, surface)	shiny or slippery (eg. ground or surface)
çengzêrîn	1) altın kollu; 2) zengin ve cömert	1) au bras d'or ; 2) riche et généreux	1) with golden arms; 2) rich and generous
bazin	bilezik	bracelet	bracelet, bangle
bazing	küçük bilezik	petit bracelet	bangle
dewkil: sirsûm, qom	yayık	baratte	a churn
hêl: quwet	kuvet	force	force, strength
wer: werkî, werkîno, wanî, wisan, welê, weha, wilo, wanîko	öyle, böyle	comme, ainsi	like, thus,
gewrî(k)	dağın yüksek yerlerinde geçit veren yer	col de montagne	a mountain pass
sitrandin	barındırmak, korumak	abriter, protéger	to shelter, to protect
veder	sapa	à l'écart, éloigné de la route	out of the way, isolated, off the beaten track
kuzot: bizot, perenoj, sotik	köz	braise	hot coals or charcoal
qulp	kulp	anse	handle
niqutîn	damlamak	s'égoutter	to drip
niqutandin	damlatmak	égoutter	to strain

Ferhenga Avestayî-Kurdî

Behrûz ŞUCAÎ

avestayî	**kurdî**	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
θri-gaye	sê-gav	üç adım	trois pas	three paces
**hurvan-*	rewan	ruh	âme	soul
**seveh-*	sibeh, spêde	sabah	matin	morning, east
**verev-, vouru*	freh, fereh	geniş	large	wide, broad, spacious
**zerey*	zer	sarı	jaune	yellow
baêşezya-	baş- (ji bo brîn û nexweşiyê)	tedavi etmek	soigner, guérir	to heal, cure
dentan-	dindan, didan, diran	diş	dent	tooth
dveêşe	(dij)min, (duj)min	düşman	ennemi	enemy
freêşte	fre	çok, çoğu	très	most
ham	havîn (hamîn), hamnan	yaz	été	summer

hame	hev, hema	benzer	semblable, similaire	equal, like, the same
hamîne	havîn, hamnan	yaz mevsimi	saison d'été	summer-time
hau	ew, hew(qas)	o	il/elle	he/she/that
havene-	haven, havan	havan	mortier	mortar
hem	hev	birlikte	ensemble	together
heme	hemî, heme	her	chaque	any, every
hepte	heft	yedi	sept	seven
heurve	her	tüm	tout, totalité	entire, whole
heve, hve, xwe-	xwe, ho	kendi	soi, le sien	own, one's own
hext	hêt	bud	cuisse	a thigh
hezeh-, hez	hêz	güç, kuvet	force, puissance	strength, power, force
heðe	di-	her zaman, Kürtçe geniş zaman ön eki	toujours, préverbe du duratif	always, (a Kurdish: durative verbal particle)
hişkev-, huşke-, heoş-	hişk	kuru	sec	dry
hizva-, hizveh-	ziman, ezman, ziwan	dil	langue	tongue
hunerevent	hunermend	yetenekli	habile, intelligent	skilled, clever
huşkō-zem	hişke-zevî	kuru toprak	terre sèche	dry earth
hve	eve, eva	bu	ceci	this, the, he
hver-, xwen-	xor- (xorhelat)	güneş	soleil	sun, sunshine
hverə-xşeête-	xurşîd	parlayan güneş	soleil radieux	the shining sun
jnev	jûnî, jinû, ejnû	diz	genou	knee
kerəşver	kişver, kişwer	coğrafi bölge	région de la terre	region of the earth
kere	kerî	sürü	troupeau d'ovins	herd (of sheep)
ma, me	me-	ma, olumsuzluk eki	ne pas, négation	not, negation marker
maêt-	ma-	kalmak	rester	to stay, abide,…
man-, meinye-,	(ra)man	düşünmek, inanmak	penser, croire	to think, believe
maneh-	(ra)man, mane	zihin, düşünce	esprit, pensée	mind, spirit, thinking
maneye-	man-	kalmak	rester	to stay, remain
mater	ma(k), may, dê(marî), mare	ana	mère	mother
me-	mi-, min	bana, benim	mon, moi	me
mede, meðe-	mey	güçlü içki	boisson forte	strong drink
meêş	mêşin, mîh, ga(mêş)	koyun	mouton	sheep,
meêγe	mij	sis	brouillard	cloud, mist, fog
meiδyane	meydan	orta	milieu	the middle
mer-	mir-	ölmek	mourir	to die
merəte	mêr, meriv	ölümcül, insan oğlu, insan	mortel, être humain	mortal, human being, man
merəγa	mêrg	çayır	prairie	meadow
mərəγe	mirîşk	kuş	oiseau	bird
mesen, mezent-	mezin	büyük, önemli, heybetli	grand, important, majestueux	great, important, greatness, majesty
mexşî-	mêş	sinek	mouche	fly
meðeye-	mest	sarhoş	ivre	drunk
miϑra	mitra	Mitra, bir tanrı adı	Mithra	Mithra, name of a god
mîjde	mijde, mizgîn	müjde	récompense pour une bonne nouvelle	reward, for binging good news
mîştî	hemîşe, mişe	daima	toujours	always
mrûre-	mirar-	ölesiye	mortellement	deadly
nafe	navik	göbek	nombril	navel
namen	nav/name	ad, isim	nom	name
namişte	nivişt	eğilmek	se courber, s'incliner	bowing down, bent
naveye	nav	gemi, denizcilik	bâteau, naviguer	boat, ship, navigate
neê-key	ne-kê (ne tukes)	hiçbiri	aucun	none
nəmah,	nimêj, nivêj	saygıyla eğilme, dua	révérence, prière	reverence, prayer
nevetá	nehwêd, not, nod, newe	doksan	quatre-vingt-dix	ninety
nitəma-	nizim	alçak	bas	low
nû	nuha, niha	şimdi	maintenant	now
paϑray-	parêz, parast	korumak	protéger	to protect
peyrîka	pîrik(hevok), pîrê	cadı	sorcière	sorceress, witch
peytî	bi-, pey	ile	avec	with, to
peoyryaêynî-	pêwir, perwîn	Süreyya	Pléiades	Pleiades
pera	perr-, têperr	geçiş	à travers	aside, across
pera	pêr, par,	geçmiş, eski	ancien, ex	former (times),
pere	berê	eskiden	anciennement	formerly
perşta-	pişt-, parast-	sırt, koruma	support, protection	back, protection, guard
petey-, peyti-, peyϑy-	peya	sahib, koca	maître, seigneur, mari	master, lord, husband
pezdeye	bizd-	ürkmek	craindre	to fear, to scare
ramen-	ramedan (vehesiyan)	huzur, dinlenmek	repos, paix	rest, repose, peace
rane	ran	bud	cuisse	thigh
raşte-, razişte-, raz-	rast, raşt (zazakî)	doğru	droit	straight
reêş-	rîş	zarar	dommage	damage, hurt
reoçeh	roj	ışık, gün, ışığı	jour, lumière du jour	light, day-light
reoçene-	rojene, rojin, rojîn	pencere	fenêtre	window

reoçine	roj, rohn	parlak, ışıldayan (Kürtçede gün, güneş)	brillant, radieux (en kurde, jour, soleil)	bright, radiant, shining (in Kurdish day, sun)
reod	rûwek, (ru)stin	yetişmek	pousser, grandir	to grow (in Kurdish growing plant)
reoje	rovî	tilki	renard	fox
reok-	ronî, ronak	parlamak, ışıldamak	briller	to shine, to be bright
reoxşne	roşin, rohn	parlak	brillant	bright
reoxşnev	roşnayî, rohnî	parlaklık	brillance	brightness, brilliance
reoγne	rûhn, rûn	tere yağı	beurre	butter
reoðeh-	(rû)bar	ırmak	rivière	river
reven, reon, urven	rewan	akışkan, ırmak	fluide, rivière	flowing river
şa-	şa-	neşeli, mutlu	joyeux, heureux	joyful, glad, happy
sarəd	sar, sal, ser	yıl	année	a year
şatey	şadî, şahî	neşe, zevk	joie, plaisir	joy, pleasure, comfort
sefe	sim	katır tırnağı	sabot (du cheval)	hoof (of the horse)
seyrye	(ser)gîn, (ser)go	tezek	bouse séchée	dung
seoçeye-	sûc, sûç	günah, hata	péché, faute	a sinful action
serəte-	sar, sard	soğuk	froid	cold
skend-, sçendeye-, sçədeye-, sçindeye-	şkand-, şkên-	kırmak	casser, briser	to break
spaðe	spah, supa	ordu	armée	host, army
speête	spî	beyaz	blanc	white
spen-	seh, seg	köpek	chien	dog
spiş	spîh, spih	bit	pou	louse
srû, srveêne	strû	diken	épine	thom
star	stêr	yıldız	étoile	star
steore	hêstir	büyükbaş hayvan	gros bétail (chameau, cheval)	largecattle, draught animal (camel, horse, ass)
stewre-	stûr	kalın, güçlü, sıkı	bien fixé, épais, ferme, fort	firmly fixed, stiff, firm, strong
stûna-, stûne-	stûn	sütun, direk	colonne, pilier	column, pillar, beam
suxre	suhr, sor	kırmızı	rouge	red (of fire)
şyev, şev-	şî, şo, çû-	gitmek	aller	to go
urven, urun-	rewan	ruh	âme	soul
va-, vaye, vayeh-	ba-, va-	rüzgar	vent	wind
vaçe	bêj-, bêje, vace	deyiş	adage	saying
vefre-	befr, berf, vewr	kar	neige	snow
var-	(bar)an	yağmur	pluie	rain
vareye-	barî-, var-	yağmur yağmak	pleuvoir	to rain
veêda-	peyda	bulma, elde etme	obtention	finding, obtaining
veêm-	em, me	biz	nous	we
veên-	vîn-, bîn-	görmek	voir	to see, to look at
vəhrke	verg, gurg, gur	kurt	loup	wolf
vehyeh	bêh(tir)	daha iyi	meilleur	better
vî-çiðe-, vî-çidyai	cida	ayrı, ayrılma	séparation	separation
vîsent	vîst, bîst	yirmi	vingt	twenty
vohunî	xûn, xwîn, gonî	kan	sang	blood
xweê	xwe	öz, kendi	soi, à soi	self, one's self
xweêd-	xwî (dan)	terlemek	suer	to sweat
xweiryen	xwarin (rader)	yemek, içmek	boire, manger	to eat, to drink
xweŋher	xweyng, xweh	bacı	sœur	sister
xwep-	xew	uyumak	dormir	to asleep
xwer-	xwi-, xwar-	yemek, tüketmek	manger, consommer	to eat, to consume
xwerəntî	xwarin (nav)	yemek	nourriture	food
xwe-wrîre	xwe-werar	faydalı meyveli	fructueux	fruitful, fruitbearing
yûşma, xşme	şima (zazakî)	siz	vous	you(pl.)
yvan, yûvan	ciwan	genc	jeune, jeune homme	young, young man
zan-, zazan-, zîzen	zê-, za-, zayîn	doğurmak	enfanter, donner naissance à	to give birth to a child, to bring forth
zate-	zayî-	doğmuş, hazır	né, présent	born, to be present
zaver	zor	beden gücü	force physique, vigueur	(bodily) strength, vigour
zərəd	zird, zerî, zil, dil	kalb	cœur	heart
zereneêne, zerəneêne-	zêrîn	altından	d'or, en or	golden
zerenye-	zêr	altın	or	gold
zeyene-	zivistan	kış (mevsimi)	hiver	winter (time)
zeyr.geone	zergûn	sarı	jaune	yellowcoloured
zî	jî, zî	gayet tabi, elbette	bien sûr	of course, surely, indeed
zrvan	zeman	zaman	temps	time
zya-	ziyan	zarar vermek	endommager	to damage
zyaney	ziyan	zarar	dommage	damage

Pêşgirên kurmancî

Amadekar: Reşo ZÎLAN

Pêşgir ew pirtik û xurdepeyv in ku têne pêşîya peyvan, bi wan ve têne zeliqandin da ku maneyeke nû bidinê.

Kurdî yek ji wan zimanan e ku, ji bilî çend rêyên din, ji vê rêyê sûd werdigire ku peyvan biafirîne. Xurdepeyvên ku wek pêşgir têne bi kar anîn, dikarin bi tena serê xwe maneyekê nedin. Lê hindek ji wan dikarin bi tena serê xwe maneyekê bidin jî. Ew maneya di wê rewşê de, ango maneya wê ya ferhengî û serekî, ji maneya ku ew wek pêşgir dide, yan gelekî dûr e yan jî hîç peywendî di gel nîne. Bo nimûne: Di hevoka "Baran qelemek da Zînê." de peyva "da"yê ji dema borî ya lêkera "dan / dayîn"ê ye. Mirov dizane ku ev "da"ya li vir bi me nîşan dide ku kesekî bi navê Baran tiştek ku qelem e, daye mirovekê ku navê wê Zîn e. Lê gava ku ev wek pêşgir, ango "da-", bête bi kar anîn, êdî peywendî di gel wê mefhûma ku lêkera "dan / dayîn"ê daye, namîne. Li vir xurdepeyvek e, bi tena serê xwe hîç maneyeke wê tune ye.
Hindek pêşgir hene ku di peyva ku ew tê de ne, maneyekê berpêş dikin. Bo nimûne: Xurdepeyva "hil-" wek pêşgir bi me dide zanîn ku tiştek "ber bi jor" diçe yan jî "ber bi jor" dibe. Rabûn û qilozbûnekê nîşan dide. Wek: "Avêtin" û "hilavêtin". Hilavêtin, avêtineke ber bi jor e.
Pêşgirên kurdî du cure ne, yek ji wan sade ye û ya din jî hevedudanî ye.

Pêşgirên sade

Pêşgirên sade bi tenê ji peyvekê pêk tên.

Ba-
Wek pêşgir maneya "fitil, fetil" dide, ku li hindek deveran jê re "ba" dibêjin. Bo nimûne: "Ka bayeke din bide vê birxûyê."
Nimûne: **Ba**dan, **ba**dek

Baz- /banz-
Bi maneya "qevaz" de ye.
Nimûne: **Baz**dan, **baz**danok, **baz**dok

Ber-
Peyva "ber" bi tena serê xwe xwedan gelek maneyan e. Lê, wek di vê nimûneyê de jî dîyar e, li vir, bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **Ber**dan

Bê-
Bi maneya "tune", "bêyî", "bêî"yê ye. Gava ku wek pêşgir têtе pêşîya peyvekê, maneya tunebûna tiştê navbirî, tunebûna wî tiştî dide peyva nû.
Nimûne: **Bê**bav, **bê**bext, **bê**dad, **bê**dil, **bê**hiş, **bê**mirês, **bê**mirûz, **bê**pere, **bê**rû, **bê**xwedî, **bê**zar, **bê**zirav

Bi (I) -
Bi maneya "yê ku dike", "yê ku wî karî dike" ye. Gava ku wek pêşgir têtе pêşîya peyvekê, maneya kesê ku wî karê navbirî dike dide peyva nû.
Nimûne: **Bi**ken, **bi**kirr, **bi**kuj

Bi (II) -
Bi maneya "heye, heyî", "di gel" e. Gava ku wek pêşgir têtе pêşîya peyvekê, maneya hebûna wî tiştê navbirî yan jî bi wî tiştî dide peyva nû.
Nimûne: **Bi**aqil, **bi**dil, **bi**ruh, **bi**tirs, **bi**ziman

Çe- = çeng
Bi maneya "avêtin"ê ye. Xurdepeyva "çe-" kurtbûna ji peyva "çeng" e.
Nimûne: **Çe**bûn, **çe**kirin

ÇÊ- =çak
Bi maneya "qenc, baş, rind" e.
Nimûne: **Çê**bûn, **çê**kirin

Da-
Bi tena serê xwe hîç maneyekê nade. Lê wek pêşgir carina, di hin peyvên hevedudanî de, maneya "ber bi jêr, ber bi xwarê" dide.
Nimûne: **da**belandin, **da**çikandin, **da**dan, **da**gerandin/**da**gerîn, **da**girtin, **da**ketin, **da**kirin, **da**kişandin, **da**nîn = **da**nan <**da**- nihan> <**da**- înan>, **da**niştin, **da**nizilandin/**da**nizilîn, **da**qurtandin, **da**rivîn/**da**rivandin, **da**werivandin / **da**werivîn, **da**weşandin / **da**weşîn, **da**westandin / **da**westîn, **da**xistin

Der (I)-
Bi maneya "derve, der, ber bi derve, ji hundir ber bi derve" ye.
Nimûne: **Der**bûn, **der**çûn, **der**dan, **der**dan, **der**ketin, **der**kirin, **der**xistin

Der (II)-
Di hin peyvên hevedudanî yên dem û zeman nîşan didin de, wek "derbihar, deraxlêve", bi maneya "destpêk"ê ye. Di hin peyvên din de maneya carina "tê de, di ... de, li" dide.
Nimûne: **Der**bihar, **der**axlêve, **der**dan(k), **der**pê, **der**ling, **der**male, **der**malî, **der**gûş, **der**xûn

He- =hi
Bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **He**bûn, **he**jmartin

Hil-
Wek xurdepeyveke pêşgir di maneya "ber bi jor, ber bi silal" de ye.
Nimûne: **Hil**anîn / **hil**andin, **hil**atin = **hil**hatin, **hil**avêtin, **hil**awistin, **hil**bijartin, **hil**bûn, **hil**çandin, **hil**çinîn, **hil**firîn, **hil**keftin, **hil**kirin, **hil**kişandin / **hil**kişîn, **hil**mijîn, **hil**pekandin / **hil**pekîn, **hil**perikîn, **hil**weşândin / **hil**weşîn, **hil**mij, **hil**bend

Î- / ev-
Bi maneya "ev" de ye.
Nimûne: **Î**car = evcar, **î**ro = evro, **î**sal = evsal, **î**şev = evşev

Ne -
Ji bo derbirîn û îfadekirina rewşeke neyînî ye.
Nimûne: **Ne**bixêr, **ne**bîna, **ne**dar, **ne**lirê, **ne**mir, **ne**mêr, **ne**xweş, **ne**yar, **ne**zan, **ne**zok, **ne**merd, **ne**lê, **ne**tê, **ne**çê

Na -
Ji bo derbirîn û îfadekirina rewşeke neyînî ye. Pêşgira "na-" hevmaneya "ne-"yê ye.
Nimûne: **Na**şirîn, **na**çar

Nû -
Çi bi tena serê xwe be, çi jî ne bi tena serê xwe be di maneya "ne kevn, teze, taze" de ye. Gava ku wek pêşgir têtе pêşîya peyvekê, maneya nûtîya wî tiştê navbirî dide peyva nû.
Nimûne: **Nû**bar = nûbihar, **nû**za, **nû**jen, **nû**çe

Ra (I)-
Wek pêşgir di hin peyvên hevedudanî de maneya "ber bi jor, hilbûneke şaqûlî" û "kişîn û belavbûneke asoyî" dide.
Nimûne: **Ra**berizandin / **ra**berzîn, **ra**bûn, **ra**dan, **ra**gihandin, **ra**girtin, **ra**hêlan = **ra**hiştin, **ra**hiştin, **ra**ketin, **ra**kirin, **ra**kişandin / **ra**kişîn, **ra**pelikîn, **ra**pêçandin / **ra**pêçan, **ra**westandin / **ra**westîn, **ra**xistin, **ra**zandin / **ra**zan

Ra (II)-
Wek pêşgir di hin peyvên hevedudanî de maneya "li, li alîyê" dide.
Nimûne: **Ra**jêr, **ra**jor, **ra**ser, **ra**ber

Ray-
Wek pêşgir di maneya "berpêşkirin, nîşandan"ê de ye.
Nimûne: **Ray**dan, **ray**kirin

Ro-
Wek pêşgir di maneya "rijandin"ê de ye.
Nimûne: **Ro**kirin, **Ro**bûn

Rû (I)-
Paşgira "rû-" ya di peyva jêrîn de bi maneya "rû, seth"a jorîn e
Nimûne: **Rû**dan

Rû (II)-
Paşgira "rû-" ya di peyva jêrîn de bi maneya "rû, seth"a jêrîn e
Nimûne: **Rû**niştin

Şe-
Bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **şe**kirin = şîyan, karîn

Tey-
Bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **Tey**îsîn

Ve-
Bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **Ve**bijartin, **ve**birrîn, **ve**bûn, **ve**çinîn / **ve**çinandin, **ve**çirandin, **ve**dan, **ve**dizîn, **ve**gerandin, **ve**gerîn = **ve**geran, **ve**gevizandin / **ve**gevizîn, **ve**guhastin, **ve**hêlan, **ve**helîn / **ve**helandin, **ve**hesîn / **ve**hesandin, **ve**hewîn / **ve**hewandin, **ve**hûnandin = **ve**hûnan, **ve**jandin, **ve**jenîn / **ve**jenandin, **ve**jîn, **ve**kirin, **ve**kişandin / **ve**kişîn, **ve**kolan, **ve**kuştin, **ve**lezandin, **ve**lîstin /**ve**leyîstin, **ve**maliştin /**ve**maltin, **ve**malîn, **ve**man, **ve**mirandin, **ve**mirandin = **ve**mirîn, **ve**mirîn, **ve**nandin / **ve**nan, **ve**nasîn, **ve**niştin, **ve**peritîn, **ve**pirtikîn, **ve**renîn, **ve**resandin, **ve**reşandin, **ve**resîn, **ve**reşîn, **ve**ristin, **ve**rotin, **ve**şartin, **ve**xistin, **ve**xurandin, **ve**xwarin, **ve**xwendin, **ve**zelandin, **ve**rûçikandin, **ve**kît, **ve**birr, **ve**der, **ve**ger, **ve**roşk, **ve**şartok

Vê-
Bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **Vê**xistin, **vê**ketin

We-
Bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **We**şandin / **we**şîn

Wer-
Bi tena serê xwe maneyekê nade.
Nimûne: **Wer**gerandin / **wer**gerîn, **ve**girtin

Pêşgirên hevedudanî yên kurtbûyî

Jê-
Pêşgira "jê-"yê daçekeke hevedudanî ye ku ji "ji vî, ji vê, ji wî, ji wê" kurt bûye. Çi bi tena serê xwe be û çi jî ne bi tena serê xwe be, yan jî gava ku wek pêşgir bi kar bêt, her heman maneyê dide peyva nûafirandî.
Nimûne: **Jê**birin, **jê**birrîn, **jê**çûn, **jê**ketin, **jê**kirin, **jê**xwarin, **jê**zan, **jê**der

Lê-
Pêşgira "lê-"yê daçekeke hevedudanî ye ku ji "li vî, li vê, li wî, li wê" kurt bûye. Çi bi tena serê xwe be û çi jî ne bi tena serê xwe be, yan jî gava ku wek pêşgir bi kar bêt, her heman maneyê dide peyva nûafirandî.
Nimûne: **Lê**kirin, **lê**xistin, **lê**ketin, **lê**kolîn, **lê**dan, **lê**hatin, **lê**mişt, **lê**ker

Pê-
Pêşgira "pê-"yê daçekeke hevedudanî ye ku ji "bi vî, bi vê, bi wî, bi wê" kurt bûye. Çi bi tena serê xwe be û çi jî ne bi tena serê xwe be, yan jî gava ku wek pêşgir bi kar bêt, her heman maneyê dide peyva nûafirandî.
Nimûne: **Pê**ketin, **pê**girtin, **pê**xistin, **pê**xwarin, **pê**xew, **pê**mahî, **pê**ketî

Tê-
Pêşgira "tê-"yê daçekeke hevedudanî ye ku ji "ddi vî, di vê, di wî, i wê" kurt bûye. Çi bi tena serê xwe be û çi jî ne bi tena serê xwe be, yan jî gava ku wek pêşgir bi kar bêt, her heman maneyê dide peyva nûafirandî.
Nimûne: **Tê**dan, **tê**gihîştin, **tê**bînî

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
Supplément du Bulletin de liaison et d'information
N° C.P. : 65913 A.S.

© INSTITUT KURDE DE PARIS
106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64
www.fikp.org
Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN**, *Réalisation :* **S. ILITCH & M. HASSAN**

hejmar 40 bihar 2007

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna 40î ya li Dihokê bihara 2007an

Civîna 40emîn ya Kurmancî di navbera rojên 14 – 20ê gulana 2007an de li Kurdistana azad û li bajarê Dihokê li dar ket. Beşdarên civînê careke din bûn xwedî keys ku bikaribin bêhna ba û hewaya azad ya welatê xwe hildin. Jîyana gelên Kurdistanê ya nû û rengîn bibînin û wê, ji bo çend rojan be jî, bi têra dilê xwe biçêjin.

Herwekî civînên berê yên li Dihokê çêbûyî, ev civîn jî bi alîkarîya hukûmeta Kurdistana azad pêk hat. Wê di her warî de xizmeteke bêhed pêşkêşî civînê kir da ku ew bikaribe di aramî, hêminî û ewlehîyê de bi karê xwe rabe. Bi saya vê xizmetê, nemaze bi saya per û baskên parastina hêzên ewlehî û pêşmergeyên dilêr, civînê dikarîbû pir rehet kar bike. Lewra civîn û beşdarên wê ji dil spasdarî vê xizmeta hukûmeta Kurdistana azad in.

Xala herî giring ya bernameya civînê, wek civînên berê yên li Kurdistana azad, her dîsan ji xebata li ser gulûgîyayên Kurdistanê, ango florayê, pêk dihat. Ji bo vî karî çend caran komikên kar yên ji pisporan pêk hatî çûn çîya û deverên ji alîyê gulûgîyayan ve dewlemend da ku xebata meydanî bikin. Di gel vê babeta giran li ser peyvên rojnamevanîyê û hin peyvên kêmnas jî hat kar kirin.

Taybetmendîyeke din ya vê civînê ew bû ku xebata Kurmancî 20 salîya xwe dadigirt. Bi civîna 40emîn ve dibû bîst sal ku ev xebat dom dike. Di mercên xweş û ne xweş de, nemaze di mercên li derveyî welat de, li Ewropayê, domkirina hinde salên xebatê ne karekî gengaz bû. Eger ne ji fedekarîya ji bo gelê xwe ba, ne gengaz bû ku evçend hevalên şareza, bi ser de jî xwedî kar û malbat, bi dirêjahîya hinde salan û salê du hefteyan bihatana ba hev û keda xwe têxistana xebatake weha. Ji ber vê yekê, diviya ev ked û west bi awayekî bihata teqdîr kirin, bilind bihata nirxandin. Loma ji bo vê hilkeftê şahîyeke piçûk hat li dar xistin. Çend hevalên ku di deh û jê bêtir civînan de beşdar bûyî lê ji ber sedemên têvel êdî nema dikarîn beşdar bibin ji bo vê şahîyê hatin vexwendin. Ew heval bi dîplomaya Bedirxanan ya ji bo xizmeta ziman û bi dîyarîyekê, herweha hemû hevalên din yên koma Kurmancî bi dîyarîyeke manedar hatin perû kirin.

Careke din, hezar spas ji bo hemû hevalên berê û yên niha ku keda xwe xistine vê xebatê û xwe ji kar nedane paş. Herweha hezar dilovanî û rehmet li hevalê koma Kurmancî rehmetî kek Ebdulah Emîn Salihê Bêtasî yê gorbehişt, ku di demeke bêwext de, ji nav me bar kiribû û tevî ezîzên ber dilê xwe em jî kiribûn xemgînîyeke giran.

Ev in beşdarên civîna 40î:
Îbrahîm Seydo Aydoğan (Mêrdîn), Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Rûken Bagdu-Keskin (Stenbol), Lutfî Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbekir), José Bertolino (Paris), Ebdulsetar Hemîd Berwarî (Dihok), Ehmedê Dirihî (Çewlîg), Elîşêr (Wan), Samî Ergoşî (Barzan), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mahmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Letîf Nêrwey (Nêrwey), Kendal Nezan (Diyarbekir), Selam Nûman (Qamişlo), Fadil Omer (Dihok), Cemal Onursal (Cizîr), Enwer Osman (Zanîngeha Selehadîn), Edîp Polat (Diyarbekir) Cewher Fetah Seîd (Zanîngeha Selehadîn), Zinar Soran (Dêrik), Behrûz Şucaî (Kotol), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agrî) û Zeynelabidîn Zinar (Batman).

Peyvên di rojnamevaniyê de

Newzad HIRORÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
çap	baskı	impression	edition
dawîdem, (dema) herî dawî	zaman sınırı, son dakika	dernière minute, date limite	deadline
daxwazî pêşkêş kirin	istekte bulunmak, dilekçe sunmak /takdim etmek	présenter une pétition	to submit petition
hindikayî	azınlık	minorité	minority
kampanya	kampanya	campagne	campaign
nav-	-arası	inter-	inter-
navdewletî	devletlerarası	inter-étatique	inter-states
navneteweyî	uluslararası	international	international
nişitmanî	milli, ulusal, vatanî	national	national
peywendiyên navneteweyî	uluslararası ilişkiler	relations internationales	international relations
pir-	çok-	multi-	multi-
piranî	çoğunluk	majorité	majority
pirneteweyî	çokuluslu	multi-national	multi-national
pîroz kirin	kutlamak	fêter	revive
vejiyandin	canlandırmak	célébrer	celebrate
bi bîr anîn	anmak	commémorer	commerote
pirziman	çokdilli	multilangue	multilingual
pirzimanî	çokdillilik	multilinguisme	multilingualism
rojnameya êvarî	akşam gazetesi	journal du soir	evening newspaper
rojnameya spêdeyî	sabah gazetesi	journal du matin	morning newspaper
şidet	şiddet	violence	violence
welatparêz	yurtsever, vatansever	patriotic	patriotic
xwenîşandan	gösteri	démonstration	demonstration
xweser	yalnız, sırf	exclusive	exclusive
zimanê dayikê	ana dil	langue maternelle	mother tongue
zimanê fermî	resmi dil	langue officielle	official language
zimanê hevbeş	ortak dil	langue commune	common language
zimanê yekgirtî	birliği sağlanmış dil, birleşik dil	langue unifiée	unified language

Flora Kurdistanê (II)

Amadekar: Ehmedê DIRIHÎ

azgilêr, dêdar, dîndar, gelberû	*Quercus Libani Olivier*	Lübnan meşesi	chêne du Liban	Lebanon oak
barêze, barêje, pareza, giya zavak, xaleres, *zaza* : giya lawa	*Adiantum venustum*	çamardı	adiante gracieuse, cheveux de vénus	himalayan maidenhair, evergreen maidenhair
babûnc, beybûn, beybûna demanan	*Matricaria chamomilla*	papatya	camomille	camomile
bêjan, bêwîjan, gula mêş, gulikê maran, pûjang	*Achillea millefolia*	adi civanperçemi	millefeuille, achillée	yarrow
benî, xilindor	*Smyrnium olusatrum*	izmirotu, yabani kereviz	grande ache, persil de cheval	alexanders, black-lovage, horse-parsley
berdî, berdû, birdî	*Typha spp.*	taşçı tokmağı, kaldırımcı tokmağı, sukamışı	typha, massette	bullrush, cattail
berûya spî	*Quercus alba*	beyaz meşe	chêne blanc	white oak
berzeling	*Lavandula angustifolia*	lavanta çiçeği	lavande	lavender
bî	*Salix*	söğüt	saule	willow
çavga, çawga, *zaza* : çimga	*Adonis dentata*		variété d'adonis	toothed pheasant's eye
çekem, *zaza* : dakone, bêûkane	*Viscum album*	ökse otu	gui	mistletoe
çeqçeqe, keproke, tirşoka kewan, şeqşeqok	*Bongardia liontesi*	çatlak otu	bongardia	bongardia
çevir, çevk, çexşûr (cûreyek heliz e)	*Ferula spp*	bir çeşit çakşır otu	variété de férule	variety of giant fennel
çevk, çexşûr	*Ferula communis*	çakşır otu	férule commune	giant fennel
çûng, genimok, pêmirîşk	*Ranunculus arvensis*	karnıbahar, düşün çiçeği	renoncule des champs, bouton d'or	corn buttercup, crowfoot
destarok	*Medicago polymorpha*	tüylü yonca	luzerne polymorphe, trèfle tiges minces	burclover, toothed medick
deqdelav	*Cyperus*	papirüs bitkisi	papyrus ou souchets	papyrus sedges, flatsedges, nutsedges, umbrella-sedges
derpîdîk	*Caryophyllus, silene spp*	gıvışkan otu, tavuk yastığı	silène	campion
derzikê pîrê, derziya pîrê, gêjing	*Scandix pecten-veneris*	zühre tarağı	peigne de vénus	shepherd's needle
fisgurk	*Colutea arborescens*	yalancı sinameki	baguenaudier	bladder senna
gêleqir	*Muscaria armeniacum*	salkımlı sümbül, salkımlı misksoğanı	muscari	grape hyacinth
gelziwan, guriz, (*zaza*) gurisk	*Anchusa officinalis*	sığır dili	buglosse officinale	common bugloss
gêzerê bejî, gêjing, zirgêzer	*Daucus carota*	yabani havuç	carotte sauvage	wild carrot
gezgezik, gezgezok, gezgezk, derzînk (zaza), geznik, gezgezing	*Urtica*	ısırganotu	ortie	stinging nettle
gingil, gungil, gwangil	*Acantholimon*	kar geveni, pişik geveni, at geveni, çobanyastığı	acantholimon, plante rampante de la famille du plumbago	prickly thrift
gîyahêsîl, qamir, kerro	*Typha latifolia*	su kamışı	canne de jonc, massette, quenouille	cattail, broadleaf cattail, bulrush
giya kevir	*Ajuga chamaepitys*	yerçamı	bugle petit pin	ground-pine
gîyabend	*Artemisia absinthium*	pelin otu	absinthe	absinth
giyagurg, gurge, giyagurok, gurik, *zaza* : vergvaş	*Orobanche kurdica*	Kürt süpürge otu, canavarotu	orobanche du Kurdistan	Kurdish broomrape
giyanîşol, giyazirzirok, perespî, şerabok, şofan	*Avena fatua*	yabani yulaf	folle avoine	wild oat
guhê ker, guhkerk, guhkerok	*Verbascum thapsus*		bouillon-blanc, molène blanche	great mullein
guhnîg, gulindok, *zaza* : goşê kutikan, zilindar, zirawend	*Aristolochia*	loğusa çiçeği	aristoloche	aristolochia
gulnîk, gulonîk	*Ixiolirion tataricum*	Sibiriya zambağı, tatarcık	lis de Sibérie	Siberian lily
gustîlok	*Astragalus spp*	bir çeşit geven	variété d'astragale	astragalus variety
hêjîr	*Ficus carica*	incir	figuier	fig-tree
hêro	*Alcea kurdica*	hatmi çiçeği	rose trémière sauvage	wild hollyhock
hevrist, hêvrist, wêrs, wers, hors	*Juniperus communis*	ardıç	genévrier commun	common juniper
hewaco, hewajo	*Alkanna tinctoria*	havaciva otu	orcanette des teinturiers	alkanet
kaja zawîte	*Pinus brutia, var. zawita*	kızıl çam	le pin de calabre, pin de turquie,	Turkish red pine, Calabrian pine
karîya kelê, kardûn, kardî	*Arum spp.*	yılan yastığı, domuz lahanası	arum tacheté, pied de veau	lords-and-ladies, cuckoopint
kemer, keber, şifehl, kemper: berkemer,	*Capparis spinosa*	kapari, kepere	câprier : câpre	caper
kenger, kengirok, kereng	*Gundelia tournefortii*	kenger, sakız otu	artichaut sauvage	tournefort's gundelia
kêrat, qereqaç	*Anagyris foetida*	katır kuyruğu, domuz dikeni	anagyre fétide, bois-puant	bean clover, stinking wood
kerbeş, *zaza* : teliyê heran	*Carduus pycnocephalus*	ince diken	chardon à capitules denses	carduus pycnocephalus (common names include italian thistle)
kevot	*Acer*	akçaağaç	érable	maple
